# Şewçira

## Refîq Sabir

### Tevaya helbestan (1976 – 2017)

**Vekolîn, berhevkirin û veguhaztina tîpên latînî**
**Xelîl Duhokî  2019**

Şewçira
Refîq Sabir
Tevaya helbestan (1976 – 2017)
Vekolîn, berhevkirin û veguhaztina tîpên latînî
Xelîl Duhokî
Çapa yekem 2019
ISBN:978-605-7535-17-7
@ Lîs, Xelîl Duhokî & Refîq Sabir

| | |
|---|---|
| **Ewînname** | **2017** |
| **Xewnêkî walla** | **2014** |
| **Le jiyan dirêjtir** | **2006** |
| **Rûnbûnewe** | **2001** |
| **Jiwanî rûnakî** | **1997** |
| **Awîne û sîber** | **1996** |
| **Werzeberdîne** | **1992** |
| **Karwansera** | **1990** |
| **Lawkî hellebce** | **1989** |
| **Werzî sehollbendan** | **1987** |
| **Sûtan le ber baran da** | **1985** |
| **Rêjne** | **1979** |
| **Pişkokan degeşênewe** | **1976** |

**Umrêk e be mîzanî edeb tuhfe firoş im**
**Zorim wit û kes têy negeyî, êste xemoş im**
**Nalî**

# Pêşgotin:

## Mirov û welat di helbestên Refîq Sabirî de.

*Dastana meşextbûna min, bi nivîsînê şirove nabe*
*Dê ji bo te vegêrim, ger çavê min bi yê te kete ve*

***Hacî Qadirê Koyî***

Refîq Sabir, helbestvan û şoreşgerekî Kurdistana başûr e, bi tîpên erebî û kurmanciya jêrî (soranî) dinivîse. Di destpêka xortaniya xwe de, dest bi nivîsînê kiriye. Wî ne bes ew barê giran rakiriye, belku bi germî, xwe avêtiye qada xebata siyasî jî. Ew di helbesta nû ya kurdî de helbestvanekî xwedan taqet û şiyanên bilind e. Bi dirêjiya van çil û pênc salên bûrî, wî cihekê taybet û bi hêz di qada edebyatê de hebûye. Helbestên wî li Kurdistana başûr pirr di belav in û cihê wî di dilên xwendevanan de heye. Di çendîn fêstîvalên edebî de jî, helbest xwendîne. Wî ne bes bi helbestên xwe xizmeta gelê kurd kiriye, belku di senger û çeperên, pêşmergetî û xweragirtinê de jî, xebata xwe berdewam kiriye. Ew xwedan bîr û bawerên rêncber û karkeran e. Kurd û Kurdistan, di evîna wî ya mezin de, du armanên here pîroz in. Ji aliyekê li dij faşiyên Îraqê û ji aliyê din jî, li dij axa û şêxan, rewiştên kevin û feodaliyê bizav kiriye. Lewre cihê wî yê dirust, nav rêzên komonîstan bû. Vê çendê rê li baweryên wî yên netewî negirtiye, çinku ew kurd e û sitema li ser milletî, dilê wî digivêşe û birînên wî kûr dike. Ew bi destekê qelemî digire û bi destê din jî, tivengê radike. Tevaya salên xortaniya xwe, dide xebatê û çendîn sala jî, li çiya û şkeftên Kurdistanê dibûrîne. Ew jiber rewşa aloza Kurdistanê û cidabûna bîr û baweran, nemaze giriftariyên şerê birakujiyê, xaça xwe heldigire û ber bi derveyî welatî diçe û heta niha jî, jiyana derbederiyê didûmîne, lê Kurdistan û gelê bêxwedî, di dil û mejiyê wî de ne.

Di sala 1970 ê de, gelê kurd bi xwîna hezaran şehîdan, karî pişkeka mafên xwe misûger bike û otonomiyekê li Kurdistana başûr bi dest xwe ve bîne. Hîngê rê li ber roşinbîrî û edebyata kurdî firehtir bû û bi dehan dezgehên kurdî vebûn, çendîn kovar û rojnaman jî bi zimanê kurdî serên xwe hildan. Vê çendê rê li ber nivîskarên kurd jî xweş kir û bi germî hatine qada xebatê. Belê; di wî demî de, bizaveka nû ya edebî bi mebesta peydakirina riyên nû, wek guherîna zimanê helbeestê, bûçûnên şiirî û teknîkên nû ji dayik bûn. Mebest ji wan riyên nû ew bû ku,

bikarin derbirînê ji kovan, azar, xem û xewnên mirovê kurd bikin. Ji wan nivîskarên ku rola xwe leyîztîn, yek ji wana Refîq Sabir bû.

Yê helbestên wî bixwîne, bo xuya dibe ku, ew berdewam ber bi pêş de çûye û helbesta kurdî ya nû gehandiye pileyên bilindtir. Ew xwedan behre û roşenbîriyeka berfirehe, xwedan tecrube û ezmûneka şiirî ya mezin e. Helbestvan û rexnegirê Îraniyê navdar Seyid Elî Salihî, di lêkolîneka xwe de, bi vî rengî helbestvaniya Refîq Sabirî disengîne: " *Refîq Sabir, xodîka helbesta nû û pêşrewa kurdî ye. Wî helsengandineka taze û geş di pêgehiştina helbesta kurdî de peyda kiriye. Soryalistekî yaxî ku, armancên bizava mirovatiya gelê xwe, bi şarezabûn xistiye nava zimanê nû yê helbestê. Soryalizma wî di helbestê de, çi aliyên hevpişk di gel soryalizma rojava nîne. Refîq Sabir, yekem şairê kurd e ku, bi rengekî berfireh, helbesta nû ya kurdî, ji wê girêkê rizgarkir ku digot, ji aliyê formê ve pêş nakeve. Helbesta Refîq Sabirî, mizgînî ya werzekê nû û derketineka geştir e. Derketina werzekê û hatina serdemekê din ku, diviya bû di helbesta gelê kurd de rû bidaba. Helbet geşehizir û şiyanên dahîneraneyên wî, bûne sedemên hindê ku, ew guherîn bi soryalista yaxî bêne nasîn!"***(1)**

Hemeseîd Hesen, di hevpeyvînek xwe de, dibêje*:" Refîq Sabir, helbestvanekî dahîner e. Her çend di jiyana xwe ya rojane de, pêtir bi karê siyasî ve mijûl e, neku helbestê, lê cihê sirinc û kêfxweşiyê ye ku, heta niha reşebayê siyasetê gula behre û mewhîba wî ne werandiye. Ev e jî min dilxweş û geşbîn dike ku, rojekê ew dê pêneka bi hêz li goka siyasetê de û êdî bi dirustî vegere cîhana pîroza helbest û edebî."* **(2)**

Her wesa Heval Kwêstanî, di gotareka xwe de, dibê: *" Di nav dengên diyarên salên heftêyan de, Refîq Sabir, bi pêngavên hêdî û liserxwe, lê bi hêz û xuya, ber bi pêş de çûye û salên heftêya bicê hêlaye û gehiştiye pileyên bilindtir û cihê xwe di nav helbesta nû de mukum û qayim kiriye. Ew dengê here bilind û dahînerê helbesta piştî salên heştêya ye û herdu dîwanên wî (Werzî Seholbendan û Lawikî Helebce) ji bo serketin û efrandinên wî, baştirîn nimûne ne."* **(3)**

Helbest li cem Refîq Sabirî, berî her tiştî, beramber jiyanê û tevaya rûdanên serdemî helwêst e. Ew li dij gişt sitem û zulmê radiweste. Ev çende jî, çîroka Keremani yê şair diîne bîra mirovî. Dibêjin:" Carekê Teymûrlengê hov, aheng û fêstîvaleka mezin ji bo serketinên xwe çêkir. Wî gelek hunermend, stiranbêj û helbestvan mêvan kirin. Her yekê li gor berjewendî û pêwîstiyên xwe, yan jî ji tirsa mirinê, pesnê mêranî û çakiyên wî da. Heta dor gehiştiye Keremaniyê helbestvan. Teymûrlengî ji Keremanî pirsî:
Tu çewan min dibînî û ez bi çi qasî tînim?
Keremanî bersiv da û got:
Tu bi vê rewşê hêjay bîst lîray î...
Wî bi hêris jê re got:
Tu çi dibêjî! Kemera pişta min bi tenê hêjay vî pereyî ye.
Keremanî lê vegerand:
Mebesta min jî kemera pişta te ye, nexo tu nehêjay tiştekê yî.
Hîngê Teymûrlengî fermana kuştina wî da.

Belê; Refîq Sabirî jî, bi dirêjiya jiyanê, helwêstên xwe parastîne, çi cara serê xwe ji bo dijminî neçemandî ye û nebûye zirna çi hukumeta. Ji ber vê çendê jî, berdewam derbeder û dûrewelat bûye. Erê; bi sedan zalim, dirrinde û hovên mîna Teymûrlengî û Firankoy, bi lanet û tif çûn û rûpelên reş jî, ji bo wan hatine nivîsîn, lê qareman û xwedan helwêstên şoreşgêr, mîna Keremanî û Lorkay, her di dilê mirovatiyê de dijîn û dîrokê jî rûpelên zêrîn ji bo wan xemlandin.

Ew helbestvanekî serketî ye û ji bo têgehiştina berhemên wî jî, xwendevan carna zehmetê dikişîne. Ew şairek şareza ye, lewre ew çend pîtey bi naverokê dike, hind jî bihayî dide formê jî. Helbestên wî, ji wênên şiirî mişt in û hevokên wî mukum darêjtî ne. Musîqa helbestên wî, nerm e û hêdî xwe davêje guhên mirovî û di nav xwînê de digere. Zimanê wî jî, rewan, sivik û xweş e. Hêvênê helbestên wî, li ser jiyan, giriftarî û kovanên mirovî ne. Bi derd, xem û azarên wî ve girêdayî ne. Bi rastî jî, mirov li cem wî mezintirîn sermaye ye. Ew bi xwe dibêje: *"Min welatê xwe, heta pileya perêstinê xweş divê, lê rastî, serbestî û parastina bîr û bawerên min, wek mirov, giringtir e."* **(4)** Belê; ew berî hemî tiştî mirov e. Lê mirovekî kurdê bê welat û jêrdest e. Barê wî giran e û xemên wî çiyan e. Çinku ew ser bi milletekî ye ku, hemî rojê diête çewsandin û welatê wî jî, diête şewitandin û wêrankirin. Ew her ji zaroktiya xwe de, di nav topbaran û mirinê de bûye. Ew dibê: *" Şerê li Kurdistanê, zaroktiya me kuşt. Lê wê çendê ne bes tirs, kerb û kîna me beramber dijminî zêdekir, belku her di wî demî de, em zû mezinkirîn û evîna welatî pêtir di dilê me de mukum kir."* **(5)** Belê; dema di sala 1961 ê de, şoreşa kurdî li Kurdistana başûr destpêkirî, hîngê Refîq Sabir, zarokekê yazde salî bû. Ew di gel wan karesat û şewatan mezin bû. Rojê çendîn firoka barê xwe yê bomban vala dikire ser gund û bajarên Kurdistanê û bi dehan xanî diherifandin û bi dehan kes jî dikuştin. Van kiryarên hovane her zû ew gehande baweriyê ku, divê xebateka gerim û bêrawestan ji bo rizgar kirina welatî bête kirin.

Zulm û sitema dijminê faşî li Îraqê, her zû Refîq Sabir fêrî xebat û xweragirtinê kir. Wênên dilşewatên zaroktiyê ji pêş çavan winda nabin. Her roj jin, zaro û kalên bajarî, bi topên hovan dihatine kuştin. Ew bi wê rewşê mezin bû û dema kêr gehiştiye ser hestî û sitema faşiyan berdewam bû, êdî ew neçar bû ku, dest bavêje tifengê û berevaniyê ji gel û doza xwe bike. Ew di helbesteka xwe de dibêje:

***" Min esmanekî şîn û ciwan hebû***
***dagîrkeran bi ser min de hirrifandin.***
***Min çend dilopên xwîna reş û***
***qefteka xewnên hingivînî û***
***çend pirtûk hebûn***
***ew jî talan kirin.***
***Lê dema viyan çermê min bi gurên***
***Serûçavên min, kirêt bikin***
***Min xwe bi befir û birûsiyê xemland***
***welat deyna ser milê xwe û***
***riya tivengê girt."(6)***

Sedan sale ku gelê kurd li ber sitema dijminan e. Welatê wî wêrankirin û terr û hişk bi hev re şewitandin. Bi dehan hezar bêguneh kuştin, lê çinku wî bawerî bi doza xwe heye û ew dizane ku dara azadiyê bi xwînê tê avdanê, lewre li ser xebatê berdewam e. Lê her wek helbestvanê Ispanî Lorka dibê:" Hemî tariya dinê nikare ronahiya fenerekê biveşêre." Refîq Sabirî jî li wê baweriyê ye û roja geş li pêşiya xwe dibîne û di nêzîk de wê ewrên tarî esmanê welatê wî çol ken û wê ronahî bigehe tevaya aliyên Kurdistanê. Ew di helbesteka xwe de, bi vî rengî rewşa xelkê gundî xuya dike, dema hêzên hovan hêrişê tînin ser wan:

***"Li nêzîk mala wan hawarek hat***
***Bi lez rabû û çira vemirand***
***Ji aliyekê pencerê, awirek li kolanê da***
***rêzên fişekên girrdar***
***tunelek dirêj, di şevê de çêkir***
***Mala beramber jî, çirayê xwe vemirand***
***Tax di nav bêdengiyê de winda bû***
***Lê li ser girê aliyê din***
***çirayek mîna stêreka qels***
***mîna agirê li ser kopekê dûr, dişewitî."(7)***

Zarok çûkên beheştên e, lê yên kurda, di dozex û ceheneme de dijîn. Di sersala de, zarokên dinê xelat û diyariya werdigirin, lê yên kurda napalim û tapon dibînin. Belê; rewşa zarokan jî bi karesatên milletî ve girêda ye. Lê heta dawiyê bîsta dijmina nakeve ser me. Dê rojek êt ku zarokên me jî, mîna yên dinê bi xweşiyê şad û kêfxweş bibin. Refîq Sabir, di vê helbestê de, basî rewşa zarok û dayikên kurd dike ku, çewan yên xelkê di nexweşxanan û cihên tena de, ji dayik dibin, lê yên kurda li bin topên firokan, di şkefta de, di nav tirumbêlên leşkerî de, gov û zinca de, di nav birîn û hawaran de, ji dayik dibin. Hindek dayik di wê rewşê de dimirin, hin zaro jî, bi nurmalî ronahiyê nabînin. Hene bi topên dijmina, kor, bêling dibin. Heta niho bi hezaran zaro bê dayik û bav mane û li kolanên bajar û gunadan jî şêt û dîn digerin. Ew bi dilekê pirr şewat dilorîne:

***"Di kolkekî sirêbirî de***
***li bin dilopan û***
***li ber tirs, birs û sermayê***
***bê dapîrk û bê kes, ji dayik dibe!***
***Di şkefta tarî de, li nav hewarê***
***Di pişta Zîla de***
***Li bin dewaran, ji dayik dibe!***
***Di nav birînan de, ji dayik dibe!***
***Li demê serbirrîna, ji dayik dibe!***
***Li nav topbaran û şewitandinê de***
***zarokekê kurd, ji dayik dibe!***
***Zarokê kurd ji bo yaxîbûn, azirîn û***
***pêşmergatiyê, ji dayik dibe..."(8)***

Ew mirov e û mîna yên din, hez mosîkê û ciwaniyê dike. Ew jî dixwaze di avahiyên tena de bijî. Ew jî dikare serê xwe neêşîne û berjewendiyên xwe biparêze. Lê çinku ew bi eşqa welatê xwe ve girêda ye û hemî cîhanê di çavên Kurdistanê de dibîne. Êdî bê welat çi çêj û tam di jiyanê de tune ye. Welatê wî kirêt dikin û pîlanên çepel yên herrifandinê digêrin. Helbet ew bi wê çendê razî nabe, lê ya ji wî tê ew e ku, tif û laneta li gişt paşa û xwînrêja dike. Ew di helbesteka xwe de dibêje:

***"Ev mirove jî***
***şeydayê mosîkê û ciwaniyê ye.***
***Ev mirove jî***
***mîna te, evîndarê jiyanê ye.***
***Lê dema welatê xwe li kolanê ketî dibîne û***
***kêr û çeqo, sîberê lê dikin***
***Hindî dikare,***
***dergehê bajarî kevrebaran dike***
***Hindî dikare,***
***serûçavên paşan bi tifê bûyax dike."(9)***

Ew tenahî û dilxweşiya xwe, di rizgaririn û serferaziya welatê xwe de, dibîne. Ew ji evîndarên mîna Weldîwane re dibêje: Derdê evîna te û Şemê, sivek e û xemên we hindik in. Kovanên welatî pirr in û evîna wî giran e. Were di sedsala bîstan de bibîne; ku hêşta mirovê kurd yê jêrdest e. Birsî û hejar e. Eger tu bi derdê rêncber û bêxwedanan bihesî, rewşa kembaxa welatî bibînî, ez bawer dikim dê evîna xwe jibîr bikî. Ew di vê helbesta xwe de, dilî dihelîne, lê rihên xweragirtinê diçîne.

***"Ew Dêwane!***
***Bajarê me, çavkaniya girî û xeman e.***
***Tevaya qulaç û aliyên wî, pirrî jan e.***
***Eşîr derbiderê deşt û çiyan e.***
***Bê zozan e.***
***Xelk li cihê bejna Şemê.***
***çaverê û şeydayê qeteke nan e.***
***Ew Dêwane!***
***Hemî çiya û zozan***
***bi laşên hezaran bê gunehan***
***Bi Tîzab û Barûtê, winda kiriye.***
***Tu Xwedê kî bo çi,***
***dengê Xwedê di bajarê min de, xeniqi ye!! " (10)***

Di buhara sala 1988 ê de, hukumeta faşiya Îraqê, bajarê Helebce, bi jehrê topbaran kir. Di çend hêrişên firokan de, ji pênc hejar kesa zêdetir, zarok, jin û kalên kurd kuştin û bajar di

bêdengiyekê de hêla. Ew roj, pinyeka reş e bi navçavên hovên Îraqê ve û birîneke kûr e di dilê tevaya mirovatiya bindest de. Dema navê Helebce tê, her kes axîna radihêle û çîroka wê jî, li gişt dinê belav e. Piştî karesata Helebce, dehan lafaw û lihiyên din jî bi ser kurda de hatin. Her çi gundên mayî jî, ew jî şewitandin û Kurdistan kavil kirin. Li her cihekê şivanek jî ketiba ber çavên dijminî, yekser dikuştin. Belê; di vê rewşa kambax de, wireyên xelkê şkestin û tevaya bingehên serkirde û pêşmergan, derbazî sinûra bûn û kunda li şûnewaran, stiranên şîn û giriyê digotin. Van karesatên mezin baweryên xelkê kêmkirin û gelek tûşî daşkestinê bûn. Perdeka reş xwe avête ser Kurdistanê û doza gelê kurd jî, çendîn sala paş de çû. Belê; vî derdê giran karekê mezin li ser tevaya mirovên xwedan wîjdan kir, nemaze di nav kurdan de û ev afat e bûne sedemên vehandina dehan berhemên jêhatî. Lê sed mixabin, cîhana bê wîjdan û dostên helperist, mirovatiya direw, aştiya saxte û civatên bi nav demokrat, awirek jî li gelê kurd nedan. Ew di xwîna xwe de, gevizî û bi tenê ma. Bi tenê û kesê xwe lê nekire xwedî. Refîq Sabirî, helbesteke dirêj û diltezîn bi vê helketina dilşewat vehandiye. Ew di parçeke wê de dibêje:

***"Em li ber lafaw û lihiya gaza jehrkirî û***
***bêrewiştiya vî çerxî, çend rût în...!***
***Em di taziya vî bajarokê şehîd de,***
***çend bi tenê ne!***
***Em di şînê de, çend bi tenê ne!***
***Em di govenda xwîn û kernevala serbirrînê de,***
***çend bi tenê ne!***
***Em çend bi tenê ne!***
***Çend bi tenê!***

***Bila Helebce***
***semfoniya dawiya vê şevê be...***
***Bila Helebce***
***bersiva sûra neviya be...***
***Bila kernevala dawiyê ya***
***xwîn û birîna ebediya gelî be...***
***Bila Helebce***
***heta hetayê, Helebce be...***
***Helebce be û Helebce be!"(11)***

Karesat û boblatên gelê kurd, bûne sedem ku bi hezaran kes ji welatî birevin û derbederî cîhanê bin. Gelek kes bi rêve dimirin yan dihatine kuştin. Yên bi derd û bela ve xwe gehandîne welatên biyanî jî, di xerîbiyê de gêj û sewdaser bûn û hindek jî, li kolanên biyaniyan dîn û şêt bûn. Ji xwe mezinên me gotiye:" Kevir di cihê xwe bi seng e." Belê; vê rewşa xerîbiya dehan sala, dilê Refîq Sabirî jî xariye û bêhna wî teng kiriye. Ew her êvarê pîlan û nexşan çêdike ku, welatê xwe yê winda bibîne. Lê ax ji dûriyê. Dijmina rê li dîtina welatî girtiye. Ew di helbesteke xwe de, derdê dûriya welatî tîne ziman û bi hesreta wî di xew diçe.

***"Dema rabûy***
***gotî: Dê di nav giriftarî û sergêjiya de, derbaz bim!***
***Gotî: Dê welatê xwe yê winda peyda kim!***
***Li ser merge, nexşa welatê xwe çêkir***
***Bi tîrêjê, ala bo dirust kir***
***Dema bûye êvar***
***mîna zarokekî, xewê dilê wî girt***
***careke din***
***xewê, welat û ala jê dizî."(12)***

Dagîrkeran bi tank û topan welatê şîrîn wêrankirîne. Her çi rengên bajarvaniyê hene, têkdayne û Kurdistan serûbin kirîne. Her çi çekên qedexe li dinê hene, wî dijminê hov li dijî gelê kurd bikar anîne. Şûnwarên dijminî li her çar aliyên welatî hene. Gundên herrifandî, daristanên şewitî, Bîr û kaniyên girtî, mirovên bê dest û pê, kore û seqet, sêwî û bîjin. Te çi rengê eşkence, sitem û ezyetê bihîstibe, ew li Kurdistanê hene û li dijî gelê kurd bikar anîne. Dijmina welatê wî yê şîrîn, pîs û kirêt kirîne. Lewre ew pêdivî tevaya ava cîhanê ye. Ew li avê digere, çinku her av dikare şûnwarên pîs û geniyên dijmin paqij bike.

***"Tu her av î!***
***Tu rengan geş bikiye ve... tu her av î!***
***Serhatiya rihan binivîsî... tu her av î!***
***Sinûra navbera tiştan paqij bikî... tu her av î!***
***Tu her av î... avî û her av î!***
***Min nejadê avê divê***
***ta ku demsala axê bişûm.***
***Min tevaya ava cîhanê divê***
***ta ku vî erdî ji guneh û şûnwarên dagîrkeran paqij bikim.***
***Min nejadê avê divê...***
***Min tevaya ava cîhanê divê!"(13)***

Mirovê kurd hest bi tenêbûnê dike. Çinku bêkes e, bê heval û hogir e. Eve dibîte sedemên bêhêvî û reşbûnê. Çinku ew jî mirov e û rûdanên dûrûber û giriftariyên cîhanê, karî li ser dikin û wî ber bi xerîbî û namobûnê dibin. Ev çende di vê helbesta wî de xuya dike.

***"Baş e, vê şevê naême cem te!***
***Dê di nav pêlekê de razêm***
***Dê aliyê serma û tenêbûnê, kime welatê xwe***
***Îşev roha min, kinarekî çûl kiriye***
***Baran wek dêmê miriye***
***Gerdûn tem û mij e***
***niyaza min jî, pêlên deryayê ne***
***Ev şeve jî naême cem te***

***li pişt vî demî***
***dê demsala axê, kime welatê xwe."(14)***

Li xerîbiyê, namobûn jiyana wî dagîr dike û roha wî diêşîne. Ji xwe mirov hinde cara hest bi reşbûn û tarîtiyeka giran dike. Di gelek helbestên wî de, ev bêzariye xuya dibin, lê ew ne revîn e. Çinku li dij rawestan û li ser nivîsîn, ew jî helwêstekî di cihê xwe de ye. Ew di helbesteka din de jî, vê çendê destnîşan dike.

***"Bi tenê nebûm...***
***Şev... li tenişta min, termekî razay bû***
***Dem ... tem, mij û nalîn bû***
***Welatê min jî***
***misteka toza ber bay bû***
***Li bejna roha min alya bû***
***Bi tenê nebûm***
***agirek bûm***
***nihêniyan geş dikirim***
***Pirtûkek bûm***
***deryayê dixwendim."(15)***

Gelek caran nivîskarên toşî namobûnê dibin, ji ber rewşa aloz û azarên derûnî, mîna Maykoviskî xwe dikujin jî. Refîq ketiye di demek nexweş de, êş û xeman ew dûrpêç kiriye. Lê ez bawer dikim ku, aliyên tarî di roha wî de, ronî dibin. Wek Hemingway dibêje: "Mirov dişkê, lê narev e." Fermon vê helbesta wî ya din jî bixwînin.

***"Bi ser roha min de,***
***pêngava bihavêje.***
***ku aso xewn be û***
***dem pêlên zer be û***
***baran jî leylan be***
***Tu min bihejîne.***
***Tu daristana baranê yî***
***Daristana demsala yî***
***Tu tem û toza rûyê dahatiya min dişoy***
***Min weku xewin û erdî dikî***
***Nihêniyên mirin û gerdûnê***
***ji deftera roha min tomar dikiye ve"(16)***

Helbestvanê me, şeydayê welaê xwe ye û di eşqa wî de helya ye. Çewan Ferhad ji bo xatirê Şirînê, amadeye çiyayê Bêstûnê kun bike û avê jê derbîne û Welîdêwane, hêvî û tika ji ewra dike ku lihî û lafawekê rake, da ku êl û eşîra Şemê, ji zozanan vegerin deştê û ew çavên xwe, bi dîtina Şemê têr bike. A wilo Refîq Sabir jî, aşiqê welatê xwe ye û amade ye hemî astengan bişkêne û xwe di riya wî de, gorî û qurban bike. Yê hewil bide evîna wan bikuje, bila here

karên entîke û giran encam bide. Çinku bi tenê mirin dikare wan ji hev dûr bike, lê hîngê jî, evîn ji dilê wî dernakeve. Ew bi vê eşqa mezin, welatê xwe himbêz dike. Di helbesteke xwe de, dibêje:

***" Ewê bixwaze kîşwera evîna min***
***winda bike.***
***Wênê te di derya xwîna min de***
***bişewitîne.***
***Bila ava rûbar û çeman,***
***bostekê ber bi paş de vegerîne." (17)***

Refîq Sabir, vê helbesta dilşewat, bi mirina babê xwe dinivîse. Hemî azar û xemên zaroktiya xwe, bi bîr tîne û kûr diçe nava roha xwe ya şepirze û westiyayî. Ew jiyana berê, mîna şerîteke sînemayê rêz dike. Her wesa dîroka gelê kurd, rewş û rewiştên civata kurdî ya aloz û paşdemayî, destnîşan dike. Basî welatê di xwînê werbûyî de dike. Welatê bêxwedî û wêran kirî. Belê; her tişt wêran kiriye. Emir, dîrok, laş û roha mirovê kurd wêran kiriye. Ew dixawze di vê wêrankirinê de, zaroktiya xwe bibîne. Lê her diçe, tenêtir û xerîbtir dibe. Bi xwendina vê helbestê, rûdan mirovî radikêşine cîhana zaroktiyê û bîreweriyên kevn zîndî dikine ve.

***" Patolên befrê bi ser êvarê de dibarin***
***Patolên befrê bi ser laşê te yê rût de dibarin û***
***dawiya demên jiyê te dipêçin.***
***Tabloya laşê te, li ser befrê çê dikim***
***Ew laşê derzek xistiye êvarê.***
***Ew laşê mîna xîçeka zîvî***
***di tarîgewrika êvarê de xuya…***
***Patolên befrê bi lez dibarin.***
***Bi ser tenêbûnê de***
***Bi ser rondikên diya min de***
***Bi ser zaroktiya min de***
***Bi ser xelkê tiriyayê di hewşa me de civyay.***
***Bi ser xemgînîtirîn êvarî de dibarin û dibarin.***
***Ne êvar di peyvên min digehe***
***ne ew darê bi tenê li jêr serê te, berfê girtî***
***Min di kolana sibê de xar dida***
***ez ji nişka ve di termê te hilingiftim***
***bi ser çarenûsê de ketim***
***Niha li jêr vê valatiya şêlî***
***min rengê termê te wergirtiye***
***Rê berze me***
***min dahatiya xwe winda kiriye***
***Li jêr vê valatiya şêlî, dibêy em du dîl în***
***Du bendên rêkeft, me bi hev re xerîb dike***
***Çarenûs jî, di dûryaneke ebedî de***

***me ber bi du windabûna dibe.***
***Patolên befrê westiyay dibarin***
***Ez zaroktiya xwe didim dest befrê***
***Tabloya laşekê çê dikim ku tariyê bişilqîne***
***Laşek ku derzek xistibe asoyê***
***Dixwazim jiyanê bikime***
***topeka befrê û pavême nav valatiyê***
***Dixwazim laşê te bikime pisyarek ebedî û***
***roha te ber bu gumanê bibim.***
***Dixwazim bi laşê zaroktiya xwe***
***pêşiyê li demî bigrim***
***Dixwazim ji dil bigrîm***
***Bigrîm... Bigrîm***
***Tu jî bê tirs di bin berfê de razayî***
***dibêy qimatkeka nivistiyî û şevê dihejînî***
***Bê tirs ji Xwedê razayî***
***Bê tirs ji demî***
***Bê tirs ji xemên giranên diya min***
***Ji dahatiya min…"*** (18)

Wî gelek salên jiyê xwe daye xebat û xweragirtinê. Di nav mirin û wêrankirinê de jiyaye. Ji ber hindê jî nikare welatê xwe ji bîra bike. Xemên wî mişt in. Ew hukumeta Îraqê ya çepel û kirêt gunehbar dike û tif û laneta lê dike. Wê rijêma xwînrêj, welatê Kurdistanê şewitand, wêran kir û xelkê bêguneh Enfal kir. Bi hezaran xelk kuştin û her kes karesat û boblata Helebce û kîmyabaranê ji bîra nake. Ew xemên Şaciwana devera Germiyana Kurdistana başûr, rêz dike û kovanên wê dike gelwaz û bi stûyê xelkê ve dike. Ew şeng, şoxa rind û sipehî bi bîr tîne û azarên wî digehîne cîhana bêwîjdan û rûreş.

**" Şaciwana Germiyanê, niha hatiye guherîn.**
**Bi tenê, xemgîn û reşxemilî,**
**bêdeng û dilşikestî.**
**Li jêr barê xedra welat û zemanê pîs**
**damay û dilperitî.**
**Kurekê Şaciwanê, bo dozexa Enfala û şewitî.**
**Şevekê kurê din jî,**
**di nîva şevê de û demê xewa şirîn girtî.**
**Di nav tirs, xwîn û tariyê de,**
**girtin û çavgirtî windakirin.**
**Roj hatin û çûn. Şaciwan çaverêyî saloxên wî bû.**
**Dîlkujên dest bi xwîn, navê wî gorîn: Bêserûşwîn e.**
**Divê bê jibîra kirin."(19)**

Refîq sabir, derbeder bû û kete welatên Ewropa. Hîngê rewşa civata wêrê, têkelî û peywendiyên xelkê û pêşketina teknolojiyê, karekê mezin li ser jiyan û boçûnên wî kir. Êdî ji jiyana pêşmergatî û kuştina rojane dûr ket. Bi çavekê din temaşay jiyanê kir. Ji evîn û hezkirinê nêzîk bû. Pêtir pîte bi naverok û formê helbestê jî kir. Mirov di vê helbesta kurt de, wênêyeke şîirî yê ciwan, zimanekê sivik û xweş  û naverokeke pir serketî dibîne.

**” Ewê şevê**
**di kujyekê kolanê da**
**te destê min girt û birim.**
**Li bîra min e**
**li ber çavên taveheyvê**
**te ez fêrî maçan kirim.” (20 )**

Di helbesteke din de, dîsan xwe bi ciwaniyê dixemlîne û wê dike kakilka naveroka helbesteka xweş û serketî.  Ji xwe ciwanî, mirovî bi hêz dike û jiyanê li ber dilê mirovî xweş dike. Kesê ji ciwaniyê hez bike, nikare bê rewişt û dilreq be. Nikare kerb û kînê di dilê xwe de xwedî bike. Belku ew evîn, rêz û dilovaniyê di dilê her kesî de, mişt û kûr dike.

**” Li her cihê jiyan hebe,**
**ciwanî li wêderê ye.**
**Bo her cihê bigehîn û negehîn jî,**
**li wêderê ciwanî çaverê ye.**
**Her jiyek û rindiya xwe,**
**ciwanî, heval e û hogirê rê ye.” (21 )**

Carna mirov li xerîbiyê bêhêvî dibe û çi tam û çêjê, ji jiyanê û berdewambûna wê nabîne. Mirov ku ji her tiştî agehdar dibe û bîr û bawerîyên nû li ser, hebûn, mirin û dawiya jiyanê peyda dike. Mirov dipirse û vekolîna jî dike. Dikare felsefê, boçûnên nû, pêşketinên zanistî, guherînên jiyan û civatê şirove bike. Êdî carna ew bawerî  mirovî xemgîn dikin û ji rastiya jiyanê dûr dixin.  Ew di vê helbesta xwe de, pir bê hêvî û dilşkestî ye û nizane ji bo çi hatiye û ji bo çi diçe. Li kûderê ye û ê bi kûde biçe. Ji xwe ew êdî ji bo wî, negiring e.

**” Ez li vêderê dijîm**
**lê wê li ciheke din bimirim.**
**Yan jî li vêderê dimirim û**
**li cihekê din dijîm.**
**Ez her li vêderê me û**
**her li wêderê.**
**Ez ne li vêderê me û**

**ne jî li wêderê. " (22)**

Refîq Sabir, ji aliyê mirovatiyê ve, pir pêgehiştî ye. Her çend ku dost û hezkiriya wî, jê dûrketiye û nikarin hevdu bibînin jî, lê dîsan ew dixwaze ku dilxweş û keyfîn be. Ji bo wî negiring e ew çi dike. Di gel kê dijî. Çewan ji jiyanê hez dike. Pîlanên wê çine. Çewan paşeroja xwe heldibijêre. Li cem wî, giring ew e ku ew bi serferazî û dilxweşî bijî.

**" Qet napirsim tu li kûderê bûyî û**
**ji bo kûderê diçî.**
**Li her cihekê bî, normal û asayî ye.**
**Çend ji min dîr bî, her nêzîkî**
**dûrî çi ye.**
**Ger bi laş di gel min nebî,**
**di gel her kesê bî, ne xem e û ne jî diltengi ye.**
**Her tu sax bî, dê xweragirim, ma laş çi ye.**
**Roha me heta hetayê,**
**himbêzkerên yektirî ye. " (23)**

Xerîbî û dûrewelatî, dilê wî digivêşe û bêhna wî teng dike. Xuyaye rindî û xweşikiya wê her li ber çavên wî ye. Nikare ji bîra bike û kes jî, nikare dilê wî dagîr bike. Eger ew li vira boya, wê ew biba evîndarekê mezin û wê her tişt jê re bikira.

**" Eger niha**
**çavrinda bajarî li vira baye,**
**Ez Zorbayê Kurdistanê bûm.**
**Evîndarekê berdewam û**
**rêvîngê rêya ciwaniyê bûm.**
**Min vê şevê xwe bi mîrê evîndara dizanî.**
**Min jiyana xwe wek qefteka gula**
**li ber desta didanî.**
**Heta sibehê,**
**maçbaran û şîir baran dikir û**
**sedcar dibûme qurbanî." (24)**

Bi rastî jî, mirovê kurd û welatê kurdan di dil û mejiyê Refîq Sabirî de ye. Hemû hizir û texmîn, bîr û baweriyên wî himbêz kirîne. Wî welatê xwe hilgirtiye û li herçar aliyên dinê gêrandiye. Ew bê welat nekariye bijî. Her çend wî di xebata xwe ya siyasî de, bawerî bi diruşmê " Ey karkerên cîhanê yek bigirin" û " sinûr di navbera karkeran de nîne" hebûye, lê ji helbestên wî xuyaye - nemaze di van salên dawiyê de - ku welatparêzekî bilind e û diruşmê Kurdistaneka azad û serbixwe, armaca wî ya herî mezin e. Girî, azar, xem, derd û kovanên gelê kurd, di helbestên wî de, serî hildidin û ew jî mîna Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî, hewar dike: Ax welatê min!

Refîq Sabir, di sala 1950 ê de, li bajarê Qeladizê ji dayik bûye. Di sala 1974 ê de, pişka kurdî li fakulta edebyatê li zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Her ji sala 1969 ê û vir de, dest daye nivîsîna helbestan û di rojname û kovarên kurdî de belav kirîne. Ji sala 1982 - 1987 ê, pişka felsefê li Bolgaristanê xwendiye û şehadetnama doktorayê wergirtiye. Heta niha bi dehan pirtûkên helbest, vekolînên edebî û hizrî belav kirîne.

**ÇAVKANÎ:**


1. Kovara Rabûn. Hejmar 9, sala 1994, rûp 69 - 70 Swêd. Soma ji farisî wergerandiye.
2. Hemeseîd Hesen. Goraniye Balnekirawekan. Çapxana Apek, Swêd 1994, rûp 58.
3. Kovara Nûserî Kurdistan. Hejmar 16, payîza 1989, rûpel 38. Swêd.
4. Dîwanî Refîq Sabir. Swêd 1993, rûp14.
5. Her ew çavkanî, rûp 11.
6. Her w çavkanî, rûp 375.
7. Her ew çavkanî, rûp 280 - 281.
8. Her ew çavkanî, rûp 315 - 316.
9. Her ew çavkanî, rûp 325 - 326.
10. Her ew çavkanî, rûp 382 - 383.
11. Her ew çavkanî, rûp 139 û 147.
12. Her ew çavkanî, rûp 53.
13. Her ew çavkanî, rûp 40 - 41
14. Her ew çavkanî, rûp 236.
15. Her ew çavkanî, rûp 225.
16. Her ew çavkanî, rûp 237.
17. Her ew çavkanî, rûp 417.
18. Awêne û sêber. Helbest, Swêd 1996, rûp 7 – 28.
19. Ewînname. Weşanxaneya Mang. Iran 2017, rûp 53.
20. Her ew çavkanî, rûp 24.
21. Her ew çavkanî, rûp 13.
22. Her ew çavkanî, rûp 36.
23. Dîwana Refîq Sabirî. Nawendî Xezelnûs. Tehran 2014, rûpel 47.
24. Her ew çavkanî, rûpel 53.

# Ewînname

# 2017

**Witeyek**

(Ewînname) stayişî ewîn û ciwanî ye, cext û pêdagirî ye le ser pîrozîy ewîn, dillgîrîy ciwanî, xewnî bextewerî û azadî, ke wek diyarde û hêz beramber şerr û tundutîjî û wêranî dewestin, demênin û meydanî jiyan bo tarîkî û dizêwî û sitem çol naken. Herçende tarmayî şerr û mirdin şiwênpêy ciwanîyekan helldegirin, bellam şikoy ewîn û şwênî nemirî jin le naw dill û bîrewerîy da, wek hêzêkî xorragrtir û nefesdrêjtir le hemû nûçdan û karesatêk, roşanîyekî rohî be honrawekan dedat.
Diwabeşî (Ewînname) çepke honraweyekî hayko ye, ke zorbeyan peywendîyan be siruştewe heye. Şî'rî Hayko, nawdartirîn şêwazî şî'rîy Yabanî ye û ezmûnêkî hestîy mirov, ke le kurte satêk da rû dedat û dûbare nabêtewe, be puxtetirîn şêwe û kemtirîn wişe, pêşan dedat. Le Hayko da, siruşt û peywendîy nêwan mirov û siruşt û ew gorrankariyaney ke siruşt be ser jiyan û layenî saykolocî û rohîy mirovî dehênêt, babetî serek în."*"
(Eewînname) çend babetêkî ciyay ezmûnî ciwanî û xoşewîstî ye, be staylêkî taybet nûsrawe, le rûy şêwazî derbirrîn û hunerî şî'rîyewe, ta radeyek le komelle honrawekanî tirim ciyawaze. emeş peywendîy be ezmûnî şî'rîy min û ezmûnî ewîn û ciwanîyewe heye. Le zorbey honrawekan da rîtim, kêş û qafiye parêziraw in, bellam be şêwazî ciyawaz û corawcor bekar hêndirawin, eger le yek yan dû honrawe da core sadeyiyek hebêt, beşêke le sadeyî ciwanî, yan ciwanîy sadeyî ye.

**Refîq Sabîr**
Swêd, Upsala 2017.7.29

(*) Bo Perawêzî honrawekan_birwane kotayî em kitêbe .

# I

**Rûnakî**

Rûnakî helldekşê
dadekşê
wek evîn demanbat
Giring nîye berew kiwê!
Her sate û hîywayek
Xewnêk û
ciwaniyek le her cê
le pêçî temawîy zeman da
mindallîy le ser rê.

Rûnakî derrwa û dê
Pêkewe biyaban û derya,
şar û dê û kêw debirrîn
Her care rengî niwê
bonî niwê û
şêwazî niwê degrîn.
Pêkewe awêzanî ciwanî,
deçîn û her deçîn
Be naxî xoman û
jiyan û
qûllayî zeman da ro deçîn
ro deçîn.

## Le gell ciwanî

**1**

Le her kiwêyek jiyan hebê
ciwanîy lê ye
Be her cêyek bigeyin, negeyin
le wê ciwanî çawerrê ye

Her temenêk û ciwanîy xoy,
ciwanî hawrraz û
hawrrê ye.

**2**

Ciwanî cimkî bextiyarî ye
Rûn wek ewîn
sade wêney rûnakî ye.
Ciwanî wek jiyan diyarî ye.

**3**

Derwêşane wek dêwane
berew pîrî ciwanî derrom
Mindallane
Aşiqane
le ber gizing da be rûtî
radekşêm û
dillim deşom.

**4**

Min le gell xom aşit debmewe
rû le jiyan
Awêzanî ciwanî debim
Be rêy îşqa
berew lay xom derromewe.

## Rojgarî ewîn

(Nostalciya)

1

Jiyan be to we rûnak û awa
Ciwanîş le to da şanaz, geşawe
Wexte roh le suyî îşiq û dîdarit
xamoş bêt wêney momî kujawe.

2

Serdemî ciwanî, rojgarî ewîn
Xewnêkî hawbeş hellî degirtîn
Be rêy xewin da awasa rewan
be ballî xewin bo hercê defrrîn.

3

Be xewin dejyayin ew rojgarane
Bo ewîn dejyayin wêney dêwane
Jiyan hawwatay ciwanî û hîwa bû
Xewin delîl û îşiq çira bû.

4

Way lew xewnaney rojan û şewan
wext û nawext dehatine jiwan!
Xewin degorrdra, xewin deygorrîn
êmeş şanaz û şageşkey jiyan.

5

Kiwan ew xewnaney be cût demandîn?
Çêyan be ser hat, berew kiwê rewîn?
Çend bênazane tenya manewe
bêmuradane gullasa werîn!

6

Ew rojgarane çend zû be ser çûn
Xewin û ewînman rewîn û win bûn
Wek willat kujran, wek ciwanî nêjran,
Rêy xewin û ewîn dekşên ta şêtbûn.

7

Le bîrit mawe be xewin dejyayin
Bew xewnanewe dinya berîn bû
Ême ciwantir û dill pir ewîn bû
Însan însan û jiyan pirr jîn bû.

## Stayiş

Tawê le tawî to ye
Tawê le ber jiyan e
Dill herasan, çawerrê
wek poluwî agirdan e.

Xewnêkî şêtane ye
le nakaw hellî girtûm
Rêşanderî ciwanî ye
berew ewînî birdûm.

Rojê tenya û hellwe da
çollnişîn wek dêwane
Rojê sermestî jiyan
şageşke wek perwane.

Aşiq, sakar û xoşbîn
Xoşxeyall car car winrrê
Dellên balldarî şeyda
le tarîkîş da defrrê.

Dillim rûnakî degrê
Goranî ewîn deçrrê
Îşiq berew kiwêm debat?
wexte ballim pê bigrê!

Îşiq ruwew lutke ye
Yan helldêr û roçûn e
Aşiqbûn çarenûs e
Rêgay bûn û nebûn e.

Derrwanim û nabînim
Wirr û wêll sermestane
Bellam le kiwê demzanî
ewîn hênde be jan e!

Car be car derwêşane
çad, yan damaw rê debirrim
Xwaye hêzê, tiwanay
bergey em îşqe bigrim?

Tawê le tawî to ye
Tawê le taw tenyayî
Em îşqe demtirsênê
çend be siwê ye cudayî!

## Be rûtî ciwantir î

Be rûtî ciwantir î

Rût bewe wek hetaw!
Ba ciwanî bête go
şepolî rûnakî
Wek ballat hellbikişê
Roh rûn û
direwşaw

*

Rûn bewe wêney aw!
Ke cestey gullrrengit
rûnakî dedwênê
Ke ciwanî le to da
caduy xoy
şikoy xoy denwênê.

*

Be rutî ciwantir î
ciwanî ciwan
Wêney jîn.
Be rutî rûntir î
rûnî rûn.
wek ewîn.

## kizebonêk

Le pirr dillim dadexorpê
Nim nim bonê
be cestem da rodeçêt û
roh detenê.

Kizebonê demhejênê
Bonê be dill aşna û gullîn
Rûn û pirr hewes û pirr jîn
wêney bonî pirçî baranawîy jinê.

## Şabon

Şew wek min le hîç ramabû
Dinya xamoş û
le her la bêdengî
Le nawerrastî rêgaş da
zeman westabû.

Ew şewe min be xo namo
Zîz û le dunya dabirraw
Keçî şabonê, bonî to
be cestemewe her mabû.

## Şew bû

Ewê şewê
Le goşeyekî kollan da
destit girtim
Her le bîrme
be ber çawî tirîfewe
fêre maçit kirdim.

## Taraw

Le diway cudayî
xewnî hawbeşman êsta gorraw e
Îtir hîç şitîk wek xoy nemaw e,
Min terîk, taraw
rohîş sergerdan le wê cê maw e

Le diway dillşikan, paşî cudayî
dellêy bûmete mîrî tenyayî.

## Diway to

Werzêkî tir û rojgarêkî tir
bê to ret debin
Hemû şit rengî bêtoyî degirin.

Diway to ne zeman
wek caran mawe
ne min, ne jiyan.

Rojgar dêt.  Deçêt
Hercê çollewar
jiyanîş bonî xerîbî degrêt.

## Her to

Tawê diyar û win tawê
Le kiwê bît, be her nawê
Hemû rêyek berew to
jiyan awêtey îşqit
kes na
to, tenya her to!

## Ciwanî her lawe

Temen têperrî ciwanî her lawe
Xewnî me jakan jiyan geşawe
Dill sed car şika
keçî roh wek xoy be ewîn aşna,
be to we mawe.

## Ta berge bigrim

1

Ta berge bigrim
le tarîkî da goranî deçirr im
Le tenyayî da ciwanî dedwên im
Le xerîbîş da yarî niwê degr im.
Şîir denûs im
be rêyy ewîn da berew her cêyek
bixwazim deyfirr im.

2

Ta ciwan wek însan bimênêmewe
Min azad dejîm, rûn wêney kanî
Sade weku xak, zar pirr goranî
Roh tijî ciwanî.

3

Ciwanane dejîm, ciwanane demir im
Min berge degirim
Dilldar û dillrrûn, xewbînerane
rêy jiyan debirim.

# II

## Car be carê

1

Car be carê le jîn toraw
ciwanî aştim dekatewe.
Le xom zîz, le dunya rencaw
xewin dillim dedatewe.

2

Min kêm û çîm? Le xom nagem!
Min çîm dewê
yan çîm nawê
Boçî le gell xom hellnakem?

3

Le xom torawim demewê
satê zûtir serhellbigrim
Wek perresêlkey cêhêllraw
ta ewserî dunya bifirrim.

4

Rojêk perêşan û xempoş
be tenyayî da rê debirrim
Mindall asa le xorra zîz
nazanim bo girru degrim!

5

Rojêkî dî şad û xendan
berew pîrî ciwanî deçim
Aşiqane be hellpewe
awêzanî jiyan debim.

6

Tawêk xemoş, goşenşîn
Tawêk be deng û pirr tîn im
Ciwanperwer bedem rêgawe
bêdarane xew debînim.

7

Bîrpertên û le xo ramaw
Be bêdengî xom dedwên im
Be hellpewe dill be ciwanaw
roh be zerdeperr derrşên im.

8
Car be carê zilbînana
be rojî rûnak nabînim
Hendêk carîş "Hekîmane"
le tenganeş da pêşbîn im.

9

Bellam min kêm û çîm dewê?
Bo le hîç kiwê
tawê dillim heda nada
rohîş le cêyek nasrewê?

## Le kiwêm?

Min hem lêrem û

hem le wê
Min lêre dedwêm û
dengim le cêyekî dî debîstirê
Bêdar im û xewin debînim
Be êsta da derrwanim û
le kollanî mindallî da sergerdan
Jinêk awêzanme û
bîrim bo lay jinêkî dî deçê.

Min lêre dejîm
keçê le cêyekî tir demirim.
Yan lêre demirm û
le cêyekî dî dejîm.
Min hem lêrem û
hem le wêm
Min ne lêrem û
ne le wê
Min le kiwêm?!

## Her xoyetî

1

Her xoyetî
Giwêy bo bêdengî girtuwe
Çinarasa tenketemê têy allawe
Xemêkî rûn wek tirîfe rûy tenîwe.
Le xoy nebê le kes naçê
Gullekêwîy ser tawêr û
laskegiyay pena kelawe.

2

Her xoyetî
Wek gellayekî babirdû
le çollayî da sergerdan.
Dellêy çorrê rûnakî ye
be ser xoy da
be ser zeman da rijawe.
Her xoyetî
le nawewe dagîrsawe.

## Tenyayî

1

Ke tenya ye

jiyan be rutî deybînê
Hawellî ciwanî û hîwa ye
Wa dezanê
hemû şitê, be wêney xoy
bê kota ye.

2

Ew sataney her xoyetî
rûn denwênê
wek xoyetî.

3

Ke tenya ye
le bûnî xoy
dillniya ye.

## Ewê şewê

Min le kiwê bûm?

Zeman heta kiwêy birdibûm?
Bîrme şew bû
le her la kipî û çollayî
Asman tempoş,
tarîkî wek wişkegella
le bin pêm da wird wird debû
Şew bê culle
berew qûllayî xoy deçû.

Bo kiwê deçûm!
Bo çî deçûm!
Peşokaw dillim delerizî
Temêkî çirr day poşîbûm
Wamdezanî le pirr dunya
Le gell min da
nixro debê.
Hestim dekird hemû şitê
be min deçê.

Ewê şewê
nemdezanî
min berew kiwêm û
çîm dewê!

## Xulyayek

1

Xulyayek be diway xoy xistûm
berew kiwê ye?
Dengê ne aşna
ne namo
le naxewe demdiwênê
dengî kê ye?

2

Şew nimawî
minîş herasan û winrrê
derrwanim û
giwêm le çirpey bêdengî ye
Şew pirr le şê
pirr xurbet û
bonî xoll û tarîkî ye.

Derrwanim û
çollayî gemarom dedat
Tenyayîyekem demtirsênê
Helldêm hana bo xom debem
Tarîkî le pêm deallê
degem
nagem!
Le pirr bîrî daykim dekem.

3

Dengê hem aşna
hem namo
le naxewe demdiwênê!
Xulya be kiwêm degeynê?

## Bo mirdin

Xo to her dêy êsta were
Demî ewîn
katî kamillbûn, pêgeyîn
Satî ciwanî
demî raman û xewbînîn.

Katê degey ciwanî, jiyan
îşiq û zeman
tenanet bûn, wêney nebûn
Manay nîye
katê hatî îtir hîç şitêk
giring nîye.

Xo to her dêy
çawerrêy çît êsta were?
Be her nawê
le her kiwêwe dexwazît bêy
Bê bak were
bîrit neçê
dergay wallay mallî şaîr:
Dill e.

## Şaîrê demirê

Şaîrê demirê
Ew rojeş jiyan, wek hemû rojan
be heman rîtm û şîwazî caran
rêgay xoy debirrê.

Ew roje dellêy hîç rûy nedawe
Hîç negorrawe
Rûnakî û ciwanî geş û direwşaw
Jiyan xoyasa
pirrjîn û lawe.

Ew roje tenya to kiz û xemoş
perêşan, xempoş
Dû dillop esrîn car car berçawit
lêll dadehênin
Diway tawêk wêney xewnî hawbeşman
be bê şiwênewar derron namênin.

Wek hemû rojan ciwanî depişkiwê
Ewîn berdegrê
Jiyanîş bê bak rêgay xoy debirrê.
Hewallêk dega û her zû kon debê:
    Şaîrê demirê.

## Min bîrî zêdekem dekem

Min bîrî zêdekem dekem
Bîrî mallekem ke êsta kelawe ye
Bîrî darmêw, gullebax û
rîhaney hewşekey dekem
ke malliyan bonrrêj dekird û
jiyan ciwanpoş
Bîrî mindallî û hellmatên
Bîrî şerrebefir û çawşarkê û toptopên
Bîrî jiwanî şewanî tarîkî kollan
Bîrî lasarîy mindallî û
serkeşîy caranim dekem
Ke manayan deda be bûn
Ciwanî be jiyan.

Min bîrî hîç kesêk nakem
Her bîrî zêdekem dekem."*"

(*) Bo perawêzî em honraweye û ewaneytir, birwane kotayî em kitêbe, le **Perawêzî honrawekan.**

## Şaciwanî germiyan

Şaciwanekey germiyan êsta gorra we
Çîtir şadî û ciwanî û nazî lê nabarê,
Weku caran şanaz û rûxoş rê naka

le mêje gerrek û kollan
bonî şaciwaniyan berda we.

Êsta hîç kesê le ser rê
dill pirr hîwa
le ber serma û tînî sutênerî germa
boy nawestê û bîrî naka.

Şaciwanekey germiyan êsta gorra we.
Tenya û xembar û dillşikaw
Mat û reşpoş
le jêr barî xedrî willat û zeman da xemoş.

Şaciwan kurrêkî le dozexî Enfal da
kira be sûtû
Kurrey tirî nîweşewê
Satî awêzanbûnî yar, germey xewê
hatin birdiyan
Be naw tirs û bonî xwên û tarîkî da
çawbestiraw birdiyan.

Rojhat û çû
Şaciwan çawerrêy hewallî kurrekey bû.
Hewall geyişt:
Dîlkujanî sermestî xwên
nawî niwêyan le kurre na:
        Bêseruşwên!

Êsta şaciwan le willat zîz
Le jiyan tora we
Le mêje Şaciwanî germiyan
wek caran nema we.

## Awêtebûn

Kesêk le tarîkî da momêkî dagîrsand
be penceyek, ke rûnakîy lê deçora
Rêgayekî niwêy pêşan dayin.
Ew le ber hemuwan û be nawî azadî û jiyan
momekey dagîrsand û çû
Ew awêtey rûnakî bû.

Ew destey momekey dagîrsand
Bîrî hênaynewe momê, take momê
le waneye şew bigorrê be çiraxan,
Deşê destê baxî ciwanî awa bika û
manay niwê bidat be jiyan.

Ew însan bû
Sade wek xak, dost û hevallî hemuwan bû.
Şewê be bêdengî hat û
bêdengane be rêy xoy da gerrayewe
Ew çû
rûnakî mayewe.

# III

# Bellam le hemûyan ciwantir

**(29 Hayko û haykoy azad)**

**Şewgerr**

Şew aram û şar nustuwe
Kollan be kollan
mang diwam kewtuwe.

## Winrrê

Min asa winrrê
Şeket û tezîw, be nêw hewir da
mang têdeperrê.

## Perrînewe

Le pirr tarîkî rewîyewe
be nêw deryaçeke da mang
Wêney belemêk perrîyewe.

## Nuqimbûn

Kes be hanayewe neçû
Êware bû le derya da
xor nuqim bû.

## Bînîn

Le tarîkîş da

gullebax dedrewşêtewe
be bon debînm.

## Sema

Dîsan kizeba
le gell qersîl da mestane
kewtote sema.

## Paraw

Wişkesall e
Her darberruweke parasa
paraw mawe.

## Gijeba

Le nakaw gijeba
be nêw gellarrêzan da
payizî hêna.

## Xemrrewên

Tenanet şew
be bonekey rûn denwênê
Gullenêrgiz xemrrewêne.

## Serhellgirtin

Wek şêt serî hellgirtuwe
Be nêw şew da pepûleke
be diway billêse kewtuwe.

## Sermest

Dellêy halliyan lê hatuwe
le ber tirîfe da pepûle
sema deken.

## Xewbîner

Le nêwanî
dû laperrey kitêbêk da
pepuleke xew debînê.

## Hana

Were xwarê le ser darê
ey çoleke çikoleke
zûke fêrî firrînim ke. (**).

## Bulbûl

Le ser tiropkî çinarê
bûlbul dexwênê
Ciwanî, bextiyarî dênê.

## Dû yar

Le kenarî deryaçeke
be tirîfe xoyan deşon
dû qazekêwî.

## Pasarî

Pasarîyekan decrîwênin
Dellîy heman şit pêkewe
dellênewe.

## Le dûre

Le dûrewe dê
qajeqajî qajuweke
tarîkî debirrê.

## Riwanîn

Wadezanê beharî hênawetewe
şad û şanaz le awêney golawêk da
leqleqêk bo xoy derwanê.

## Zerdeperr

Xor awa bû
zerdeperr le çawanta
her mabû.

## Şanaz

Ciwan wêney jiyan

be naz û şanaz:
jinêkî dûgiyan.

## Mîwan

Wek mindall nûstûn
Leserxo be pencere da
mang deçête xaney pîran.

## Yarî

Kewt û rabowe
Be diway sêberî xoy da radeka
mindalleke.

## Xoşuştin

Le gell polê çoleke da
be xoll xoy deşwa:
mindalleke.

## Tazyebar

Le naw hemuwan da
her reşpoşan çawterr in,
cenazeyek be rrê we ye.

# Şîrreşîrr

Le hercê şîrrey gumrrayî

debû le billindgokanewe
mosîqa bibîstiraye.

## Pirsiyar

Kiwa rewa ye!
Be tenya cêt hêştûm
Xwaye! (4)

## Pirsiyar (***)

Xewin be xewin
Şar be şar derrwat
key be xoy degat?

## Winbûn

Le nakaw bizirbû
Sêberim, awêtey
sêberî hewir bû.

## Ciwantirînyan

Bellam le hemûyan ciwantir
baraneke bû ke nim. nim
be ruxsarta dehate xwar.

# Xewnêkî walla

# 2014

## Diway to

Jiyan xewnêkî walla ye
Cestey toyiş mêrgî rûnakî.
le çawanta geşexewnêk direxşane
Le riwanînta wirşey hîwa
awêzanî jiyan e.

To bêdengane rûnakî deçrrît
Zeman ciwanîrrişên û
jiyan be aga dehênît.

Min le gell xom dediwêm û
rûy peyvînim le to ye.
Dellêy ber şewarekewtûm
yan dû tîşkî girrdar le nakaw
tarîkîy dinyayan rijandote çawanmewe
Wek perresêlkey ber ziryan delerizim û
henaset germim dadênêt.

Le tarîkîş da detbînim
Destekanit weku caran rêşander in.
Bê to min çîm?
Darêk le tafî behar da
gellakanî werîw in
Şewêk ke mang û estêrekanî
be cêyan hêştuwe.

Bê to min kêm?
Hellatûyekî ber nefret,
Sofîyekî gumrrawî eşiq
ke Xwaş le bîrî kirduwe.

## Ruwanîn be tarîkî da

**I**

Şew wek min mat û çawerrê
Mang torawe
Tarîkî hemû şitêkî dapoşîwe
Be espayî
dest bo rêgayek degêrrim
bonî toy lê dê.

**II**

Dinya şewîn û
aso win
Tallêk rûnakî wek delîl
diway xoy xistûm
berew lay to ye
yan mirdin?

**III**

Şew weku deryaçey nûstû mend
le xemoşî da deziringêtewe.
Şew be bêdengî
mêjûy tenyayî degêrrêtewe.

**IV**

Dellêy le pirr weku rêjne
dabarîwe
Tarîkî hemû cêyekî tenîwe û
be bê cûlle
berew lîwarî roh
dekşêt.
Way çend be jane cudayî!

**V**

Ta lay ejno be tarîkîy da ro deçim.
Kip û şewpoş,
le çawerrwanî to da
ruwamewe.

**VI**

Minasa perêşan, winrrê
Zayelleyek wek bruske
le qûllayî tarîkî da
win debê.

**VII**

Asmanasa jiyan şîn
Evîn şîn û
bêdengbûn û peyvînit şîn
Şîn şarreng û
şîn şewnişîn.
Nemdezanî
tenanet mirdinîş her şîn!

Wek nabîna le tarîkî da
debînim.

**VIII**

Gellayek be dem semawe dewerê.
Mirdinêkî le serxo ye
bêtoyî.

**IX**

Giwê bo bêdengî helldexem
Şew be bê cûlle
debizwê
le naw wirşey tarîkî da
bonî peşîmanî dê.

**X**

Wek tarmayî be çollistan da
degerrê,
Be diway to da roh sergerdan,
roh çawerrê.

**XI**

Çend dillopê tirîfe ruxsarim terr dekat
Min tenya nîm
le nêwan hewrekanewe
mang dembînê.

**XII**

Şewezeng e û
min tarîkîm lê deçorrê
Ke çî be rûnî debînim
rûn dedwêm û
rûn denwênim.

Çend be ceste namo ye roh!

**XIII**

Tenketemêk, rûn û şêdar
le tiropkî çinarêkewe
dadekişê
Be hêminî
wek desmallêkî ketanî
damdepoşê
lew sate da
bîrim be lay bextewerî da deçê.

**XIV**

Şew le nakaw dadeçllekê
Tarîkî delerêtewe
Le ber samall da qullingêk
weku mirwarî debirîskêtewe.

**XV**

Şew le tenyayî xoy bêzar

şeketane
be ser çollîy da rakişaw.
Şew weku min xemoş,
tasaw.

**XVI**

Be tarîkî da derrwanim
Çawim lêye le dûrewe
tarmayiyek, bawerr nakem to bît
berew êre
Be rrêweye.
Çawerrêtim
be çollayî da derrwanim
Mirdin dêt û
min herasan
her derrwanim.

**XVII**

Be drêjayî ew katane
min le wê bûm
Şew hat, roj çû
Sall hat, sall çû
hêşta le wêm
Le ber pencerey temgirtûy tenyayî da
çawerrêt bûm û
çawerrêm.

Çawerrwanî corêkî tirî mirdin e.

**XVIII**

Şew bêdar û
minîş le naw tarîkî da
mat û dillpert
Wek termêkî teqetkiraw çawerrê
Rohim wêney Hesareyek (*)
be bêdengî
berew lay to dexizê.

## Satêk û temenêk

Satêkeçirr û pirr ewendey umrêk e.
Le berdem çollayî zeman da derrwanît:
Rabirdû wêney tem berçawtî girtuwe
Dahatûwîş xotasa
rengperrîw çawerrê.
Deştêkî çollewar ta roxî winbûn û ebediyet
Fezayek çemawew têkqupaw
le şînîy xoy helldêt.

Le kiwêwe û berew kiwê,
kam niyaz niyaz te?
Ruxsart xollawî û
çawanit zistanî, derrwanît
Tenya xot debînît
Ke wêney nenasêk lewberta westawe
dexwazît bîdwênît,
Ne peyvêk dête jiwan
ne nîga û ruxsarî pirsiyarpoş detwanin
Razî dill beyan ken.
Tezûyek sertapat depêwêt
Hellmêkî nimawî wek şîfon
be serta helldekşêt.

Wa rêkewt şêtanegemey xoy be jiyan,
be ciwanî dekat û gewcane bazineyek
be dewrî zeman da dekêşêt.
Satêkî şînpoşerûnakî helldemjêt
şînasa şêwazêk bo dûrî

nawêk bo çollayî û
pîrozî bo feza dadênêt.

Satêk e, ewendey umrêke û rengî xoy
dekate ber jiyan
Wek temî gerrîdew şipirze çollayî depêwêt
Xotasa bedguman be xoy da
be şiwênî zeman da rodeçêt.
Şêwey xoy le ser rûy zerdbawî siruşt û
bêdengî cê dêllêt.
Satêke awalle daxiraw
To hêşta derrwanît:
Hîç şitêk nabînît
Her şitêk debînît.

Satêk e
Wek ciwanî le nawya dîl kirabêt
Wek jiyan çawerrêy destêkî tezîw bêt
be agayî bihênêt
Çawerrêy kipbûn bêt
bîdiwênêt
Yan zeman westabêt.

## Be ber baran da

Şeqamêkî cencall û
piyawêk be ber baran da derrwat.

Aporeyekî şad û behellpe
çend destgêrrêkî rûtelle
pîrejnêkî siwallker û
segêkî sermabirdelle,
Lew berîşewe dû yar-
dû yarî awêzan
xoyan daweteber baran.
"Cêgam hîç cê û
zemanim win". Piyaw dellê.
Piyawêk şellallî baran û wehim û bonawî êware
çawî birrîwete dûrî,
Dellêy çawerrêy kesêke le wêwe,
le binî qûllayîyewe bêtewe
Yan peşokaw
bo naxî xoy derrwanêt.

Piyaw be dem ramanewe dellê:
"Zemîn çend biçûk e bo – çûn
Jiyan bo jîn
evîn çend berîn bo firrîn"!

Le derewe ba helldekat
Le nêw dill da tezuwî hesret.
Be dû baskî awawellewe
le ber baran da rawestaw
pêş be wehim û zeman degrêt.
Piyawe bedem wirrênewe dellê:
"Ne êre cêm e
Ne ewê."

Rojgar dêt û şewgar derrwat
Hemîşe piyawêk le şiwîn û zeman,
le tenyayî xoy radekat.

## Bê hîwa çon bijîm

**I**

Bê hîwa çon bijîm!
Bê asmanî eşqit çon bifrrim!
To nebît
fêrim ke çon dillim hellbigirm!

**II**

Le diway to
em dilleşkawem wek çiray ber ziryan
dexemeser destim
Le yekem rêkewt da
Her kesêk bêterêm
pîr yan ciwan
dillmî pê debexşim,
Giring nîye her kes bêt
Giring nîye,
to nebît
Min dillim bo çî ye?

**III**

To nebît roh sara
Roh tenya

le germey sutanya
damirkaw be xoy da rodeçêt.
Roh nebêt
Serdarî roh nebêt, ke xotî
min cestem bo çi ye?

**IV**

Le diway to
giring nîye ger cestem baxêk bêt
Rûnakî û gull bigrêt,
Yan cestem xakêkî wêran bêt
termêk bêt aw bîbat
Seg bîxwat
giring nîye
To nebît
min cestem bo çi ye?
Le diway to

Hîç şitêk giring nîye.

## V

To nebît
çîmdawe lem nawe
Derrom û em şare cê dêllim
Şar bê to çollistan
şewistan.
Le diway to
be min çî xêllixaney jinkujan,
awa bêt
yan wêran?

**VI**

Pêm witî bêtoyî mirdin e
Cêhêşitin tundtirîn şêwazî kuştin e.
Le ser xo gullegiyan, le ser xo!
kuştinîş behaney xoy heye
kuştinîş rêsay xoy,
wadey xoy
êtîkî xoy heye.
Wirya be giyanekem, wirya be!
Em gemey kuştine janî xoy

kotayî xoy heye.

**VII**

Le diway to
staylî jiyanim degorrim
Nawî xom
Ayinim
Zimanim degorrim.
Çend sexte le diway to
debêt xom be dinyay bîtoyî rabênim
Debêt xom, bebê to
jiyanim rayî kem
Xom şiwên û
zemanî mirdinim diyarî kem.

**VIII**

Le diway to
le ciwanî derrencêm
Le şîir detorêm
Şaîrane demirim
Şaîrane dejîm û
qet şîir nanûsim
To nebît roh wêran
Dill wêll û sergerdan
Ciwanîy çî?
Şîirî çî?
Bo şîir binûsim gullegiyan?

**IX**

Le diway to
le willat zîz debim
Le jiyan, le xoşim derrencêm
Giring nîye çon dejîm
Giring nîye çon demrim
Wek piyawêkî winrrê
berew kam cêy dûr û laçepe
bê amanc
serî xom helldegrim.
Xom xerîbî şaran,
Xom namoy zemane
Tenyayî debête willatim

Şêtbûnîş diwa pena, diwa lane
wek mîrî aşiqanî dillşikaw
debm bedêwane.

**X**

Le diway to
çon nemirim?
Fêrimke to nebît
çon bijîm?
Çon dillim hellbigrim?

To nebît
hîç şitêk giring nîye
Le diway to
jiyanm bo çi ye?

## Awêzanbûn

To dezanît ême le kiwên?
Çend dûr çuyin û
berew kiwê ballman girtuwe?
To dezanît eşiq ta kiwê
êmey le gell xoy birduwe?
Ême rohman be yektirî siparduwe.

Qet napirsm le kiwê bûyt û
bo kiwê deçît
Le hercê bît asayî ye.
Çend lêm dûr bît her nizîkît
Dûrî çi ye?
Ger be ceste lay min nebît
lay her kes bît
Giring nîye
Her to şad bît bergedegrim
Ceste çi ye!
Ême rohman ta hetaye
awêzanî yektirî ye.

## Ew katane

Ew kataney le baweşmayt
Wek kitêbêkî kirawe
le naw destmayt
Yan le jîr baranemaç da
be rûtî rakişawît
Bîrit dekem.

Ew katane
ne to xotît
ne minîş xom;
Minî şipirze û peşokaw,
tînû
weku nemamî ber hetaw.
Toş aram, wêney rûnakî
Kip weku pelkezêrrîne û
rûn wek aw.

## Baxî rûnakî

Le ser çirpake be rûtî rakişawît
Çawxewallû
ruxsar aram
Xoretawî beyan be dem semawe
daypoşîwît
Min detşêlim
Maçbaranit dekem û
wek hemû carê detşêlim.

To rakişaw
minîş be dem şêlanewe
le naw bêdengî da be pencem
cestet dedwênim.
Cestet baxî rûnakî ye û
le naw destim da ber degrê
Ciwanî wek xunçey sersurmaw
le ser cestet depşkiwêt û
şêwe degrê.

## Şewî yellda (*)

*Şewî yellda ye, ya Deycure emşew*
*Ke dîdem dûr le to bê nûr e emşew*
***Nalî***

Şewî yellda şewî eşiq û çawerrwanî
Şewî şîir
Şewî raman
Şewî serdarekey roh û
şewî derkewtinî ciwanî.

*     *     *

Eger êsta lem şewe da
gullebaxekey şar lêre buwaye
min debûmewe be mindall
Şerreaw û çawşarkêm le gell dekird
Demew êwaran le pêçî kollan da
heta "Awî pêm dadehat"(*) boy dewestam
Be niyazî êwarebaşêk
Be hîway maçêk dewestam û dewestam
Be dem tirs û dillexurpê û lerzînewe
le ber demî da lall debûm
Deşllejam û
bêdengane dadegîrsam.

*     *     *

Eger êsta
Çawciwanî şar lêre buwaye
min Zorbay Kurdistanî bûm
Aşiqêkî hemîşeyî û
rêbwarî rêgay ciwanî bûm.
Min emşew xom be mîrî aşiqan dezanî
Jiyanî xom wek çepkegull
dexiste naw destekanî
Ta beyanî maçbaran û
şîirbaranim dekird û
sed car debûm be qurbanî.

*     *     *

Eger êsta

Şaciwanekey şewî yellda lêre buwaye
Min demtiwanî bergebigrim;
Bergey tenyayî û namobûn
Tenanet bergey mirdinîş bigrim
Heta mawim
dill pirr hîwa goranîy aşiqane biçrrim.
Min demtiwanî le şewêk da
yan tenanet le xewnêk da
jiyan gullasa biçênim
Bê bak, bê xem
dîdepirr nûr
le tarîkî da bibînim.

*     *     *

Eger êsta
le şewî şîir û raman û ciwanî da
Serdarî roheşeydakem lêre buwaye
tirsî şêtbûn
tirsî winbûn û awabûn
herasaniyan nedekirdim;
Winbûn çi ye!
Serdarî dilleşeydakem winbûn çi ye!
Min le naw to da win debim
Şêtbûn, yan awabûn çî ye!
Min le xoşîy to şêt debim
awêtey eşqî to debim.

*     *     *

Xozge êsta
serdarî dilleşeydakem
Serdarî rohetenyakem lêre buwaye
Xozge êsta lêre buwaye…
Xozge êsta

## Piyawêkî tenya

Piyawêkî tenya
Çawerrêy Xwa ye.
Dezanê Xwa nîye
Xwa naye.

Piyawêkî tenya
Çawerrêy Xwa ye.

## Jiwan

Dellên, hemû şitêk wek yarî ye:
Peyvîn - nûsîn
Dozex - beheşt
Dîlî - azadî
Şerr - aştî
her mirdin takerastî ye.

Bellam kiwa eme yarî ye!
Dillawa, lêre rawestaw
herasan û xeyallpertên
Hîwapoş û dem pirr dirûd
niyaz jiwanî ciwanî ye.

Roj derrwat, şew dêt
Sall derrwat, sall dêt
Dellêy zeman le to deçêt.

Hemîşe piyawêk, piyawêkî winrrê
bo jiwanî ciwanî çawerrê.

## Berew kiwê?

Zeman xoyasa berrêwe
Rastîş hemîşe û le hercê
bê yar û yawer çawerrê.

Le bêdengbûnewe hellmî tarîkî
Le witnewebonî rûnakî.

To bîr le çî dekeytewe?
Lew dîw xotewe: wêran e
Şiwên hîç cêyek û
zeman efsan e.

Ho xalloy winrrê
berew kiwê?
Xuda çorrêk rûnakî ye
le nêw dill da
yan le hîç cê.

# Le jiyan dirêjtir
# 2006

**Le jiyan dirêjtir**

Min weku zayelle berrêwe boşayî depoşim be xom da,
be xewnîtawêr da rodeçim.
Dexwazim wek çorrêk rûnakîy şillejaw
şêwazî xom bigirim.
Ruxsarim rengperrî û debête awêney temgirtûy dûrayî
Dillîşim depêwêt rêy jiyan be pêwan.

To le kiwêyit ta dillim hellbigirît!
Nîgarî fezakem bikêşît
be rîtmit kewtinim rabigirît!

Zemanim wek rubar bê mebest rê dekat
le berdem saradapert debêt,
Degorrdirêt be rengû sêberû xewnegull,
debête dûrrîyanî witin û bêdengî.

Şewgarî peyvîn e bêdengî dedwênim
ke wirişey rastî ye, çira ye.
Bêdengî xoy baxî mecazû mana ye.

Berrêwe.
Zemanim le gellim rê dekat.
Le sîmay xunaw da
wêney xom debînim;
Beşêkim wek ballî werîwî pepûle bo nîşan,
bo gemey rêkewit cêmawe,
Beşêkî dîkeşim be nêw nadîyarî da
diway mana û çarenûs kewtuwe.

Rêgayek le jiyan dirêjitir
berrêwe
Zemanî pertênim wek dillim helldegirim
Demewêt wek tallêk rûnakîy şipirze
diwa mewday xom bibirrim.

## Pencereyek wala

Pencereyek be rûy sara û şew da wala
Şiwên be çirpe hîkayetî pîrbûnî xoy degêrêtewe.
Toyiş le çawerrwanîy hîç da yarî be tarîkî dekyit
Wek bitewêt şew û ballindekanî bişellejênît,
yan tarîkî bikeyte dawêk dahatûy pê bigirît.

Le tarkîyewe hellmêk helldestêt
le daçorranî rûnakîyewe
bongulaw,
Şewîş be çirayekî şînewe êşik le jiyan degrêt.
Renge rêgakan be hîç cêyek negen,
keçî behaney koç her demênêt;
Weçey tarmayî hemîşe berrêwen.
Ballindey koçerî rûnakî helldegirin,
be çirrîn zemanîyan
Be firrîn fezayan dadehênin.

Pencereyek be ser dûrî da wala
Şiwên pallî be ebedîyetewe dawe,
Toyiş hêşta bêdengîyit poşîwe
detewêt be kipbûn
Peyvîn şikodar bikeyit.
Dest bew gelayane da dênît
ke rengî oktoberîyan gorrîwe.

Çolayîyek le nêw bazney kat da
ke bo gemjeyî rêkewit cêmawe.
Perêzêkî şîn le nêwanî şew û roj da
ke ne hogirî debîn,
ne detwanîn lêyî rakeyin.
Zeman hestêk e le xot da
Şiwên le towe ta ebedîyet,
Rastîş wek tallêk rûnakî
le nêw xot da.

## Jiwange

Be şêwazêkî dî û
rengêkî wenewşewîy kalltirewe dêt
Wêney sêberî nenasêk be serim da denuştêtewe.
Şiwên mêrgêke le asowe ta qûlayî kat,
Minîş nîwe lêll, nîwe rûn
bo xom degerrêm,
Le neçûn da lêkçûn debînim.
Dest le jiyan dedem û ciwanî dedwênim
Peyvekan zayelleasa le boşayî da wêll debin.
Pertênbûnî zeman ciwanî lall û
rastî be xo namo dekat.
Xerîbêk ke rojêk le rojan min bû
weku sêberî temawî damdepoşêt û
win debêt.
Xerîbêk win debêt ta pêk bigeynewe;
Renge le rûnakistanêk da
ke ciwanî amancî witin bêt,
yan le cêyekî ew dî û şiwên û kat
ke şîyawî jiwanî mindallî,
yan mallî mehall bêt.

## Le gell zeman da

Dellêy zeman le tenyayî xoy radekat
Peyvîn le mana
To le xot
Jiyanîş le çawerrwanî da
rûtbûnî xoy dexwênêtewe.
Rengekan leber zeman da weku sîmat kall debinewe
To dest le rabirdû dedeyit ke wêney sirrepişkoyek
le jêr xollemêş da nûstuwe
Be êsta da hellderrwanît ke çolle wek rêgay mehall;
Satekan le lêkçûnyan da dellêy yeksat in
Şiwênîş fezayekî betall.

Ne le mirdine tirsanit, ne le jiyan
bellku le zeman.

Tenya rengêk
le bêdengî da çîrokî hemuwan degêrrêtewe
Tenya dengêk
le tarîkî da wek çeqo debirîskêtewe.

Le gell rojgar da her şitêk bîr deçêtewe
Le gell rojgar da hîç şitêk bîr naçêtewe.

## Çûn

Le gell xemî xoyan da hellîyan girtûyit rojekan
Satî zîwînî wek şewnim be her kiwê da depirrjêt û
win debêt
Şiwênîş le bêsinûrî da
teng wek zîndan.
Rêgayekî yeksere ye;
Bazneasa sereta û kotayî awêzan
ciwanî û bênaz û
heqîqet le kolanêkî daxiraw da segerdan

## Gerran

Bûmelêlle û
temêk be naw kolan da ret debêt
Be tiropkî daranewe degîrsêtewe.
Toyiş her xotî
hemîşe asa berrêweyit;
Be naw şiwên da
ke bonî tabûtêkî nimawîy girtuwe.
Berew xot berrêweyit
ke dellêy le şiwênêkî dûr winit kirduwe,
Be to çî ke befrî zistan
jiyanî sersipêtî xistibêt
Ke rojan wek mêrgî bînîn wala
le nawya rengekan aram û direxşan.
— ((To namoyî helldekollît nek xak
Be hîç û hîç degeyit nek aw).

Leber tînî zeman da her şitêk kall debêtewe
mirdin nebêt;
Ne detewêt be manewet birrwa bênît,
ne detwanît be heman rê da birroytewe.

## Bo tenyayî

Dellêy juwanêke le gell azadî: Satî tenyayî,
Pirdî nêwanî rûnî û tarîkî
yan rişey kat û şiwêne tenyayî.

Rêgakan wala, şew tirîfepoş
Minîş berrêwem be tenyayî da
daristanêkî tarîk le serrrê,
mang bom derrwanê û
aso çawerrê.
Le naw awêney rûnî tenyayî min xom debînim;
Heqîqetêkim awêtey guman
Cestem xallêkî şînî kutrawe le ser tarîkî,
Giyanim dillopêk le deryay zeman.
Dellêy çarenûs pêşim kewtuwe
be tenyayî da berew xom deçim
Şew bom derrwanêt.
Min nîm be kipî le gell xoy dediwêt,
Min nîm goranîy tenyayî deçirrêt
bellke tenyayî demxwênêtewe,
Min le hizûr da çorrêk rûnak îm
Şewîş be wirşem dedirewşêtewe.

Min dillopêk im le deryay zeman
Heqîqetêk im awêtey guman.

5 / 7 / 1999

## Le roxî daristaneke da

I

Le roxî daristaneke da
be aga hatmewe;
Goranîyekanim be naw xubar da pertên û
sêberekem weku bermall
le ser gulawêkî nustuwe
be cê mabû.
Min le bêdarîy da tenya bûm
Wêney agirêkî tarîk dagîrsabûm.

II

Şew biyabanasa çollewarêkî nabowe
baran cestey tarîkîy deşuştewe
Minîş tenya, be nêw şew da
cestey xomim hellgirtibû
le çawerrwanîy mehall da
Xollemêşî xom bo baran ragirtibû.
Şew şêwey tenyayî û xurbetî girtibû
Lew sate da hemû şitêk le min deçû.

III

Her debû bew demamke xollemêşîyewe
xom bibînim ke wek agirêkî tarîk desûtam
Hest bew boşayîye bazneyîye bikem
ke le bêagayîm da gemaroy dabûm.
Debû be sergerdanîy giyan û
kenefteyî ceste û
tenyayî xom bawerr bênim.
Min bendbûm le nêw şiwênî zeman da
Azadbûm le boşayî da.

VI

Le tenyayî da ajaweyekim le nêw xom da nabowe;

Bêzar le bêzarî
Bêzar le xoşbawerrî
Çawim bo destî tezîwim degêrra
ke le tarîkayî daristaneke da win bû bûn
Be xom da derriwanî
ke peykerêk bûm le wahîme û kirîstall.
Min hawdemî bêdarbûn bûm.
Nîşaney sereta û kotabûn bûm.

V

Le roxî daristaneke da be aga hatmewe;
Min xom bûm û
xoyşim nebûm
Her le wê
hemû şitêkim bînî
Katêk le takbûnewem da
xom awêney xom bûm.

## Rût le beramberî xot da

Rût le beramberî xot da
ruxsarî tirîfegirtût awêney tenyayî
Cestet katê şepolî zeman helldebirrêt,
elbûmî renge payîzîyekan e
Hengawekanit, le nêw wêraney şiwên da
ruwew dûrîn.
Nîgay şipirzet wêllî qûlayî.

Regekan le tarîkî da gewre debin,
Toş le tenyayî da.

Satekan be lat da derron û dezanî
umrî to katêk e le wehim, dezanî.
Le nebûn deverêk bo xewin çêdekeyit
Le peyv zemanêk bo ciwanî.

Asman be qûlayî xoy da rodeçêt
Toş leber şewqî zîwînî mangeşew da
be naxî xot da.

Tînû weku laskegîyayek
ke be rûnakî xoy deşwa û tînûtir debêt,
Xewbîner wêney gelayek
ke bêbak le çarenûsî xoy
berew juwanî payiz deçêt.

Rût le berdem heqîqet da
Tenya û xendan le jiwanî ebedîyet da.

## Tabloyek

Berdekan leber baran da nûstûn
Şar le nêw şûre berzekanî da.

Min be nêw rişeyekî fênik da
berew mall degerrêmewe
Pêm be tarîkî da rodeçêt
Boşayî bêdar dekatewe
Şiwênewarêk le ser cade xelluzîyeke cêdêllêt
gewahî winbûn e.

Şew be direwşanewe
nîgarî xoy dekêşêt
Minîş be zayelley peyv
tabloy bêdengî.

Şar nustû leber baran da
Aram le nêw direwşanewey şew da,
Dirextêkî tenyaş le roxî cadewe
bom derrwanêt
Giwêm lêye be çirpe le gell xoy dediwêt
Hest dekem bîr le tenyayî
dirêjitirîn şew dekatewe.

## Çûn

Be çûnî bêbakaneyan çollewarêkî bê sinûr denênewe şitekan
Derron êmeş wêney lanewazanî şerr, tenya û sergerdan
Be diyar wêranewe,
Be diyar yadgar û nehatewe
cê demênîn.

Bê mallawayî, bê gerranewe derron û
boşayîyek le nêwanî ême û bûn da dexenewe;
Rojekan: Yadgargelêk bendî zemanman deken
Payîz: Gelay piwawî ser rêgawban
Evîn: Peşîmanî û jan
Temenîş: Xollemêşî gunahekan û tellxesêberê
Ke xirûrî lawane û ciwanîy xoy bîrçotewe
xewbînerane bo sîmay winbûy degerra.

## Rênîşander

Rêkewit yarî be çarenûs dekat,
Minîş wek dillope şewnimêk çawerrê,
Le renge şillejawekan rademênim û
bo rîşallekanî sereta çaw degêrrim, le her kiwê cêman.
le xom depirsim:
Be çi pêşbînîyekewe deçîte jiwan?

Le xom depirsim:
ew xurbet û lasarîye le kiwêwe dên
Ew demey
dahatû le ser rêy yeqîn çawerrê.
Sîmay serabîy peyvekan awêne bê û
rêkewt: Qeder.
Mirdin aşnatirîn hawell bê û
jiyan: Rênîşander?

## Berew dûrîy

Be yekewe ser hellgirtin,
le rêkewt da hawçarenûs û hawaso
Le awêne da pêk namo.
Be tenyayî da rakirdin
wek siwarêkî tirîfepoş, jiyanhellgir
ta satî bexogeyiştin.
Rûbarasa xurrû rewan
berew dûrî... Berew dûrîy
regasa hêmin û tînû
ruwew dozînî qûlayî.

## Sefer

I

Ewende dûr kewtûytewe
hergîz nageytewe sereta;
Destekanit le nêw tellxerûnakî da delerzin
To hîç nallêyit,
Pêdeçêt giwêt nabêt be tirpey dilltewe.
Namo bûn gemaroy dawît
Demamkekan le her lawe
wek reşayî cadeke dedrewşênewe,
Ciwanîyiş be dîyar pîrbûnewe damawe.

II

Şepolekan şiwêncestet le ser kenar desirrnewe
Toyiş le jêr gumezî şînî asman da
awêneyekî dirizbirdût ruwew dûrîy ragirtuwe
Keçî tenya
zayelley xot debîstîyewe.
Dellêy şiwên seraw kewtuwe
ruxsarekanîş sertirs.

III

Rengekan şitêk dedwênin wek biyanewêt êware rabigrin,

belam kiwa to carêkî dî
bergey bawerrhênan degrît!
To detewêt
le her şitêk da şêwey xot bibînît;
To pêtwaye mêjû mozexaney xurafate
Zeman xot û
jiyan xotît,
le wirrêneş da azadî debînît!

IV

Çawerrwanî û winbûn e, yan corêke le koylayetî
Keçî ne sereta diyar e ne kotayî.
Kewate awênekan dirizbirdû nîn!
Rût le ser rêy bê kotayî
rûberrûy xot rawestawît;
Seferêk le temen dirêjitir
Belam zeman debînêt.

## Berew kiwêman debat zeman?

Peyvekan xoyan denûsnewe
Êmeş xoman.

Berew kiwêman debat zeman?
Ême detwanîn bipirsîn
Keçî hîç nallêyin
weku bêmana bêt peyvîn.

Berêgawe şiwên helldebirrîn
ta rastî bibînîn: Çirrbûnewey boşayî
ebedîyet bibînîn ke wêneyekî xoman e.

Berew kiwêman debat zeman?
Ne bo mirdin katman heye
ne bo jiyan.

## Hellbijardin

Bîrt naye çon rêt kewte em devere
Temî zeman her şitêkî dapoşîwe
tiruskeyek hîwa nebêt.
Xewnî mezin janî gewrey bediwaweye
Lewaneye
ta roxî şêtbûnit berêt.

To be xot da
be her çiwarla da derrwanî
Jiyan bo dahatû wala,
Dewruberit bo tenyayî û
rojekan bo çawerrwanî.

Pêtwabû ciwanî lêre bêt
Peyvekan zayelley rastî û
rastî rêgay azadî bêt.

Azadî: Wîstî azad û hellbijardin e;
Deşêt tenyayî dûrrîyan bêt
berew wêllbûn yan xonasîn
Jiyanîş hellemûtêk bêt
bo helldêran yan hellfirrîn.

# Rûnbûnewe
# 2001

# I
# Sêrmonî

*Belam Xiwakan napeyv in*
*ewan dexulqênin û le naw deben*
*Keçî mirov depeyvê.*
*Xiwakan bebê axawtin*
*yarîy samnakî xuyan deken*

***Oktavyo Paz***

## Sêrmonî

Le xoll û bonî bixûr cestem detekênm û bebê mallawayî
êre cêdehêllim.
Le tînuwêtî rademênim keşkoy dawe be aw,
sêber be reng
Berdîş be raçenînêk
Tarîkî leber xoy dademallêt.

Hîç stayişêk nemawe nebîstirabêt
Keçî nawit denîm ciwanî
Katîk be xewin aşnam dekeyit,
Katêk wek behar ballinde koçkerîyekan dênîtewe,
nawit denêm tiwana
Katîk be pêşbînî nîgarî ayindem dekêşît.

Min şewekanim wek tor bo hîwa nawnewe,
Cestem le rûy ew baye da ragirtuwe ke bestellek û
tawêr û derbend bêdar dekatewe,
Wek melêkî beharnişîn werze taqanekem
nîştmanm e.
Le şêtbûn rademênim ke be direwşanewey: Rûnakî
be bêbakî: Sêbûrî û tiwanam pêdebexşêt.

Hîç stayişêk nemawe newitrabêt.

Şefeq zêrrasa be tewawî tiwanawe dedrewşêtewe,
Tîşk le ser cestey gela, ta qûlayî sewzayî dexlîskêt
Rêga gullrrêjekan be tasewe çawerrên,
Mîratgiranî efsaneyiş le jêr kewane agir da
yarî be şêwaz deken
Zeman be şimşêr depêwin
Serwerî be term û
tiwana be stayiş.

Ho kajelake rengperrî û ramaweke
xemî hîçit nebêt!
Birrwane!
Şengerojekan be nêw rayellegerd da
bot derrwanin
Cestey hewesbazî şorrekenîzekanit hêşta
bonî hetaw û mêxek û deryayan bernedawe.
Meger emane bes nîn?

Birrwane!
Çi sêrmonîyekî pirr şiko ye
Newekanit, begzadekanî pêşkarî bo stayişt
berd dênne peyvîn!
Meger emane bes nîn?
Em pêşwazîye bê wêne ye,
Heybetî aporey em xellke hedanedere
ke wek derya şepol dedat
Be tekanêkî xorrskî şêweyekî çiwargoşeyî
Be şeqam û şêwazêkî qoqizî be şar debexşêt.

Meger em sêrmonîye efsaneyî ye bes nîye!
Ke hemû tuxmekan, bedem agirbazî û zergweşandinewe,
yeksanane bo naw tekyey sereta debatewe.

Birrwane!
Birrwane!
Her rûmetêk kalanî zergêk e
Her zarêk kulaney zimanegirrêk
Şewkwêranî naw kolanî temgirtû
bon be mangewe deken ke wek qellxanî
siware reşpoşekane
Le stayşî rêkewt da
çawerêy lêkdabirranêkî tirin,
ta le pêşwazîy şikodarî berberîstan da
le billindtirîn minarewe

surey Enfal
bixwênin
Yan be dillêkî nîwe çawerrê, nîwe pirsedar
Giwê hellxen bo peyvînî tînuwelmî be hetawbirjawî bîyaban
ke bonî cestey girtuwe.

Be cestey şeket û bixûrgirtûmewe
pişt lem sêrmonîye dekem
Wek ballindeyekî beharnişîn werze taqanekem
nîştman me
Wek cadugerêkî dinyadîde le ser aw
agirêk dekemewe
ta le çawerrwanî da win nebim
Ta qullîngekan çirrînîyan bîrneçêtewe.

Kiwa stayişêk mawe newitrabêt?
Kiwa stayişêk mawe nebîstrabêt?
Belam silaw le feramoşî û bergegirtin
katêk hawdemî koylekane.
Silaw le rêkkewit, ke êwe le tawêr, xewin dadetaşin
Le hîç, tiwana dadehênin
Le çawerrwanî: Nîyaz û pêşbînî
Le xurafat: Serwerî
Wek hemîşeş tînwêtîtan
be tînuwêtî deşkênin.

## Be zirêyekewe le meidenî mêjû

Rojêkî niwê, wala be rûy serwerî û çirrîn da,
Direxşan le naw gemey pêşwazî û
xurafatî şanazî da,
Aporeyekî şillejawîş leber derwazey be gizing şorawî şar da çaw le rrê.

Çi satêkî pirr şiko ye!
Kejaweket pêşengî rojêkî niwêye û
şar be diway xoy da kêş dekat
Direwşanewet tarmayî dênête deng,
Be şewqêkî fênik rengekan pêk aşna,
Baxçew hewa û tawêr şageşke dekat,
Siware zirêdarekanîş le pêşewey kejawe xubargireket da
şefeqîyan hellgirtuwe
Be tîre girrdarekanîyan, le soraxî mehall da,
dûrîy depişkinin.

Dellêy rêkewt gemey qeder dûbare dekatewe;
Aporeyekî çaw le rê, pol pol le ser rêy pêşwazît,
qetarî bestuwe
Wêney mêgelêkî hol û hepesaw bon be hewawe dekat,
Bon be rûnakîy beyanewe dekat ke sêber û xubar dewirûjênêt,
Le nêw gerdî kejaweket da bo dahatûy xoy degerrêt.
Wêneket qîblenumaye û
direwşanewet nûrî ezelî.

Îdî jiyan herçonêk be ser çêt
Şew çend dirêj, rojekan her çeşnêk binwênin
yan werzekan her pêşhat û razêkî sersurrhêner bênin
To le endêşey kogel da her xotî
Şiwênîş be to aşnaw hogir,
Be to şanaz û direxşan.
To her xotî,
Xorragir wêney tawêrêk le rûy tewjimî ziryan û baran û zeman da
Heybetî bawkanet mange le şewî hemuwan da.
Dellêy rojanî dûrdestî be xêrayî tîşk
toyan be naw zeman da birduwe!
Dellêy jiyan şêwe û rengî toy girtuwe!

* * *

Şiwên heman şiwên

ke serqallî pêşwazî û agirbazî ye,
Toyiş her xotî,
Pêşengî aporeyekî rasaw keperstin deperstêt.
Le heray em sêrmoniye da (ke şanû bazuwe girjekan kejawet in)
Hemûman debînît;
wek ew rojaney wêneket le asmanî şar da helloasa
lengerî girtibû
Sêbereket
penay hîwaw pêşbînî bû,
Ruxsarî bironzît:
Aso.

To her xotî, rend û mêrxas
Le endîşey kogel da biruske taw dedey
Sîmay mend û riwanînî be perêzit nîgarî hîkmet in.
Xotasa şanaz derrwanî wek ew sataney be hêma
gewallehewrit radegirt,
Be zimanî xeyb, ke peyvekanî wek gizing û gulleestêre
direwşawe bûn
Dar, şemall û rûnakît dedwand,
Ew pole ballindanet dediwand ke wêney hewrêkî pemeyî
sêberîyan le ser helldabûyit
Ewsa, xotasa, be gulaw û wehm û bonî bixûr
Murîde hall lêhatuwekanit derrşand,
Be ezmûnî pîrêkî karame û xeyibnas
riwew derbendî yeqîn û kelî qeder
Mêgelasa pêşxot dedan.

To her xotî
Le xeyallî mêgel da efsaneasa
berew kotanebûn pel dawêyit
Le ser zînkoy espeket dahatût hellgirtuwe,
Be maskêkewe le şefeq û tem
le koçêkewe bo koçêk, şar û pole ballinde diway xot dexeyit.
Be zirêyekewe le meidenî mêjû
le gemey qederêkewe bo gemey qederêk berewpîrî
ebedîyet deçît.

* * *

Le perawêzî em roje şillejawe da,
ke bonî bixûr û serwerîy lêdêt
Weçekanit, begzadey pêşkarî, be hetaw wêneket
zêrkifit deken.

Le sêrmonîyekî şayane da
wefadar be peyameket, mêjûyek etik deken û
heybet be xurafat deden.
Destewnezer leber tekîye û baregay bawkanet da
çawerêy hêmayekî ton ta reşeba û xubar biwirujênin,
Be xencerî bawkayetîyit perdey tolle û
kone qîn û
yeqîn helldenewe.

Tolle kiwêr e
Xwênîş be xwên tînuwêtîy xoy deşkênêt.
Tolle kiwêr e û
tenanet gorrekanîş helldedatewe.
Toyiş her xotî, mendû kemdû
Be ser şanî aporeyekî holewe, ke heybetî bawkanet
heyranî kirduwe, derrwanît
Be tîley çaw reng û şêwazî her şitê depêwît
Dirrdongane derrwanît û le ser her sîmayek
xayele û razekanî nax debînît.
Wek pîreşêrêkî naw qefes morre le azadîy beleseman dekeyit
Morre le neweyek dekeyit
Ke yarî be yeqîn û
tabuwekan dekat.
Xotasa le naw baziney wehim da
serqallî gemey caranî;
gemey hellkirdin û dagirtinewey ala le şew û rojêk da.

Serqallî ew şerraney
ke xeyallî kêwîyanet dayan dênêt,
Şerrî pepûle û reşeba
Şerrî saçmezen û asman
Şerrî xurafatû rastî.
Keçî şerrî şarawey to şerrî cawêdanîy bawkayetî ye
Şerrî pîrozî tolleye ke xêllêkî rasaw wek mîgel be nêw
xubar û wêrane û xwên da taw dedat,
Ta le pêşbirrkêyî pêşkarî da
bedem rimbazîyewe term û kajelakî hevalan bikeyte dîyarî û
dirêje be gemey xot bideyit;
Gemey girtinî pişîle reşe le jûrêkî tarîk da! (*)
Gemey hellkirdin û
dagirtinewey ala
le şew û rojêk da.

Belam ême çon le gell rojekan hellkeyin

katêk rengî terim degirin?
Katêk tîregirrdarekan le nêw tarîkî da rê win deken?
Ême lêre çî bikeyin
katêk derwazekan be ser dûrî da dekirênewe
Tîre û xêl û netewekan be naw serwerîy wêrane û
edem da
serhelldegirin?

* * *

Êware be xêrayî be ser şar da dekişêt.
Şiwên heman şiwên,
Êmeyiş tenya û hepesaw
debê êre bo aporeyêkî destbetall
çoll bikeyin ke mestî tolle ye
Aporeyek ke çelengane le rûy asman da
wek dawell rat degrrêt
Dexwazêt le zemanêkewe be zemanêk
le cênzirgeyekewe be cênzirgeyekit bispêrêt.

Her xot lem raze mezine serderdekeyit
Detwanît be çawî dûrnasêk pêşbînîy çarenûs bikeyit,
Aqîbetî weçekanit bibînît ke hewesî tolle û deselat
mestî kirdûn
Ke le gemekant da hîkmet debînin
le şewqî xencereket da dahatû
Le nêrayetît da serwerî û
le termeket da jiyan.

Her xot detwanît mêjûyek bo em mêgele tadare dabênît
ke pallî dawe be kewtinewe,
Ke be stayîş şefeq detenêt
Be ((Peyame))  ket asman.
Nawêk lew azadîye binêyit
ke be erik û boşayî jîyanî kirdûyin be zîndan.
Xot detwanît be hîkmetî dûrnasêk encamî
gemey qeder bibînît
Katêk termêk, be zirêyekewe le meidenî mêjû
dekate sîmbulî jiyan.

## Koçêkî dî

Wek koçêkî nakawî dî berêwe bêt
yan çarenûs çawerê;
Şepolekan durgeke wek keştî radejênin
Mang xewallû be nêw hewrekan da dexşêt.
Darekan bêdar û
rengekan le têkçirrjan da lêkçû.
Rêga çollekanîş le terim samnaktir,
le pirse xemnaktir.

Cestekan le kotere deçin
Ruxsare bê riwalletekan le berd,
Wek hemîşeyiş deselat direxşan
heqîqet xamoş.

Renge eme şêtîyetî bêt, yan pêwîstî,
Keçî kes napirsêt boçî lem deryaye bideyin katêk
cesteman le kenar da cê bimênêt.
Kes napirsêt mebest lem azadîye çi ye!
Bo toyiş ke natewêt dû ball le ((Afrodît)) bixwazît,
Asan nîye birrwabênît:
Şiwên wêran e û
zeman le rakirdinî da kiwêr.

## Zêwan

Dellîy firrîn lasayî tîşk dekatewe
Roj le stayişî pêşbînî da le yeqîn dillnîya
Rûnakî le rûy ebedîyet da heyran.
Gewallekan wek ballinde yarî be zerdey hetaw û
((Ba)) deken
Heybetêkî efsaneyî deden be firrîn
Reng û bonî niwê be siruşt,
Tellxîyiş bew sêberaney ke borman deken.
Gewallekan sîmay rojeke be rengî kibrît û tînuwêtî
derrengênin.
Asman be qûlayî xoy da deçêt
Tînwêtîş be tînwêtî da
dellêy mirdin lasayî tîşk dekatewe.

* * *

Ta dêt hewa sardtir debêt
Xor lewdîw dîwarî xollînî asowe nustuwe
Êmeyiş le sêrmonî takbûnewe da xeyb dedwênîn,
Le komergî le nakawî ballinde toqîwekan rademênîn
Bedem şillejanewe bê hude begij hîç da deçîn
Herdû çingman pirrdekeyin lew lime tînuwey
Ke le ser bonî şêdarî rubar be gijman da dêt.
Bêumêdane çaw bo sîmay Xwa degêrrîn,
Ke mangasa nîmçe kewaneyî û
bê adgar e.

Eger şêwazêkî xêratir bo mirdin dahêndirawe
pêşanman biden!
Dena ême çi karêkman bem agirdane tezîwaneye ke reşebayan
be gij da kirdûyin!
Boçî le jêr em kewane xollemêşîye zerdbawe da
tiwanist û
rûtbûn birrazênînewe?
Yan le pall tarmayî lerzokman da serwerîy yeqîn
binûsînewe?

Helley to bû ey çawerrwanî!
Ke serqallî gorreboşekan û
jimardinî termekanit kirdîn
Toyiş ey jiyan! Bêaga ratihênayin
be şikoy efsane,
Be mêjûyek ke sererrimî çetekan le ser lutkey çollewanî,
Zîkir û zergî derwêşan le ser şûrey billindî şaran

hellîyan kollî
Ratihênayin be serwerî, ke awêney diroyek bû mirduwekan
le ahengî meynet da aşkirayan kird.

Êsta îtir mêjûy xoll xoy dexwênêtewe
Îtir sate asnînekan manayek bo pêşbînî nahêllnewe,
Şitekanîş le çawerwanîy çarenûs da
be xo namo û bê şêwaz in:
Zayelle û segwerr ke termekan detirsênin
Mindalanî ruxsar berdîn ke yarî be ebedîyet deken û
be riwanînî sirrîyan sîmay zeman degorrin,
Kefî zîwîn û reqhelatûy naw deme dapiçrrawekan
ke jiyan gemaro deden.

Êmeyiş le şewnixunî da wek nezîndû bîn,
ne mirdû
Be cesteman boşayîye temgirtuwekan pirr dekeynewe
Bêagayane xo le pêşbînî deparêzîn,
Be rûtbûn şageşke debîn katêk şêwey xoy be tînuwêtîy kêllge
debexşêt,
Tarîkîş hewellîn şayetî kiwêrbûnewey terrayî ye
katêk mirdin
lasayî tîşk dekatewe.

* * *

Ta dehat dinya sardtir debû
Darekan le nêw zuqmî zîwînî şew da helldelerzîn
Asman sîma xollemêşî, estêrekan şîn deçûnewe
Şew tenya sêberêkî ême bû,
Şew çawerrê wek ême
ke bêagayane xewnî xoman debizirrkand.
Şew bonî îspirto û tirs û barûtî lê dehat
Sêberî qurquşmînî siwarekanîş herdû zarkî
gelîyekeyan dîwar bend kirdibû.
((Eger negeyin bekiwê degeyin?))
((Êsta katî pirsîn nîye, bîstuhewit))
{Yekêkman bedem jimardinî termekanewe welamî dayewe}
Êmeyiş le çallêkî şewîn û şêdar da
rengî xoll û borehewrman girtibû
Destman bo rengî tawêrekan degêrra ke le tarîkî alabûn
Be çawî nîwekirawe deman riwanîye tîregirrdarekan
ke le gewalle deçeqîn,
Deman riwanîye tirîfe ke maskêkî bironzîy toxî be ruxsare

dukelawyekan dabû,
Lew kateyş da
nime baranêkî lînc bedem sûtanewe debarî û
debarî.

* * *

Ewaney ew şewe be rêkewit le rûbarî gelîyeke perrînewe
renge êsta nemnasnewe,
Keçî min wûrdtirîn rûdawim le bîre;
Janî deste tezîwekanim ke wek kotere le tarîkî çeqîwin
Tellxîy ser ruxsare qoqzîyekan ke hêşta şiwênewarîyan
be rojekanmewe mawe
Diwa çirîkey mêrmindallêkî birîndar
ke wek zayelle le tengey derbendeke da pertên debû:
((Aştîxwaz în,
belam azadî be hîç şitêk nagorrênewe)).

Min ta êsta hemû rudawekanim le bîrin
Hêşta le jêr kewanêkî mêxekî da ke germayî xor helldemjêt
Awirr le rabirdû dedemewe,
Le sêrmonî takbûnewe da
be hêma xeyb dedwênim,
Dillîşim le pêşwazî yeqîn da
wek şewî bîyaban çawerrê ye.

Hêşta zewî be bonî zerdedukell û mîwe û asin helamsawe
Winbuwekan le endêşey şipirzey ême da nayanewêt
Bem lêkdabirrane ebedîye û
be kotayîhatinî cîhan birrwabênin,
Le qûlayî bîyaban da
cesteyan le lim û tez û detekênin
Lasarane be diway rêgay gerranewe da degerên û
degerên.
((Gij û gîyay naw baxçe)) keyiş (*) wek hemîşe bêbakane
pêşwazîy roje limrrengekanîyan deken,
Dellêy çarenûsî xoyan lê rûne,
Dellêy dezanin ke mirdin
aêwanî
rohe bêdarekane.

## Pêşwazî

I

Hemû şitêk em şew le pêşwazîda ye;
Rûnakî le rûy zerdeba da
gelasa sema dekat
Tirîfe şimşêrekan zîw kefit dekatewe
Tîregirrdarekan wek tîşk cestey tarîkî û
aso desimin
Sîmayekî nûranî deden be şew
Manayekî efsaneyî û ezelî be asman.

Hemû şitêk le sêrmonî pêşwazî da
bonî lim û mis û yeqînî girtuwe
Hemû şitêk le çawerrwanîy ême da
wek ebedîyet direxşan.

II

Limistan germayî dirêjtirîn rojî
be rûy zuqmî şew da dedatewe
Şepolî lim xewnistan degorrêt be sara
Rengî ruxsare şillejawekan be rengî xollistan.
Rêyekanî edem be (Sûrey) tarîkî rûnak dekirênewe
Yeqîn be şewqî şimşêr û
mehall be fantazya.

Leber direwşanewey tirîfe da
lim xoy denûsêtewe.

III

Lem boşayîye şewîne da
siruşt awêneyeke tellxewêney xoman pêşan dedatewe,
Asman delaqeyeke hêndey birîn
Xudawend penageyeke be endazey bêumêdî,
mewdayeke ta sinûrî bînîn.

Hemû şitêk bo pêşwazî ragîrawe
Hemû şitêk pêşwext be nawî êmewe

birryar dirawe.

IV

Rêkewit nîye
ke rûnakî le gell gerdelûlî lim da sema dekat
Xak razî xoy bo ceste tînuwekan dedirkênêt,
Sam serdarîy xoy be ser tiwanstû
Endêşe da desepênêt.
Rêkewit nîye
êmeyiş em şew rengî bîyabanman girtuwe;

Êsta hemûman wek yek în
Hawçarenûs û hawbeş în.

V

Debêt yeqîn be şewqî şimşêr bidrewşêtewe
Rastî be wehim
Peyamîş be zayelley (Sûrey) xwên
Debêt tîre agirdarekan riwalletî ayinde le ser edem
binexşênin
Şimşêrîş riwalletî mêjû le ser ceste.

Beber çawî hemuwanewe
lim be xwên xoy denûsêtewe.

VI

Her xomanîn,
le dewrî agirdanêkî kujawe da
sûretekanî tarîkî ravedekeyin
Pîşwazkar û pêşwazîkiraw her xoman în
Çawerrwan û çawerrêkiraw her xoman în.
Le tenyay da eme beşêkîn le sêrmonîy limistan
beşêk în le bûn, le nebûn
Le direwşanewey ebedîyet.
hemû şitêk beşêk e le serwerîy bîyaban.

## Şewî kirîstall (*)

I

Lêkdabirran weku satî gîyandan dijwar
Wêney termnaştin xemgîn;
Bom nebû awêzanit bim
neşim tiwanî şitêk billêm.
Deşêt riwanîn
manadartir bêt le peyvîn.

II

Wek şeqam be şeqam şew
diway şitêk kewtibêt;
Dengî şeypûr têkelawî
zayelley zengî killêsa debêt
Dellêyî le gell ême da şar
berew çarenûsî xoy
be rê dekrêt.

III

Xor le naw tarîkîy tarîkayî da nustuwe
Peyv û estêre pêkewe desûtêndirîn,
Heqîqetîş bê xawen çawerrê.
Şew le gorrêkî berîn û şêdar deçêt
Debêt êmey lerzlêhatû
le roxî da
sema bikeyin.

IV

Hezar şêwey hebêt mirdin
her mirdin e
Ey em kernevalle boçî?

V

Şemendefer wek biruske
be naw tarîktirîn tarîkî da têdeperrêt
Le her wêstgayek be pele dewestêt;
Jiyan berew (Awişwîtiz) helldegirêt.

VI

Dellêy em şew
Jiyan geştêk e be rêy nebûn da
Mirdinîş zamêk
le cestey bûn da.

VII

Herçî billêyin peyv lall e
Dellêy hêşta
zeman (Şewî kirîstall) e.

## Diwa jiwan

## I

Renge eme diwa jiwan bêt
Êmeyiş bedem perewazebûnewe degeyin
Be demamkî gillînewe
Be diwa perdey nimayişnameke radegeyin;
Şew reşmallêkî dirrawe,
Birîskanewey qurquşim qîble numa ye
Çalle şewînekan penagey ebedî,
Camanekanîş bo pêşwazî berberîstan
be xwên sûr.
Êsta şew şikomendane
le nêw zayelley (Sûre)y tarîkî da deşekêtewe,
Hemû şitêk
lew sere reş deçêtewe:
Binar, gill, sirûdekan, tawêr, ceste şipirzekanî bîyaban, xêllî edem,
Xwa, daristan, baran ke tarîkî û segwerr deşwatewe, zayelle
ke mewdakan bêdar dekatewe.
Hemû şitêk le ahengî reşbûn da dedirewşêtewe
Tenya asman le nêw çawî min da hengwî nîye,
Hemû şitêk
le nêw zayelley Sûrey tarîkî da deşekêtewe.
.................................
.................................

II

Pêşbînî ta lêwarî bîrçûnewe birrdekat,
Min feramoşî hênawmî û
winbûn winî kirdûm.
Deşêt eme diwa jiwan–mallawayî bêt.
Diwa dirûdî darriman–hellzinîn bêt
Belam min detwanim çi mucîzeyek pêşan bidem
ta baran û derya û ((Ba))
giwêrayellim bin?
Detwanim çi bew aso direwşawe billêm katêk:
Rûtbûnim awêne ye,
Peyvînîş binibestî mana

# II

## Şewanî axawtin

Şew xewall û berew kotayî xoy deçû
Êmeş hêşta le germey axawtin da bûyin,
Seretayek be seretayekî dî despardîn
Xewnêk be xewnêkî dî.
Şewane le germey axawtin da
xoman le bîr dekird
Bê aga le seferî şew, ke wek keştî be naw deryay
endêşe da hellî degirtîn
Bê aga le şite bêdar û xewtuwekan dediwayin û dediwayin
Pêman wabû jiyan şêwey bîr û peyvekanman degirêt,
Pêman wabû her bew şewe
le fezay peyvînewe rastî
le delaqey şewîşewe azadî wek tirîfe
rût xo derxen.

Şew direnganêk, ke dergay çayxane û meyxane û barrekan
be rûman da dadexran,
Ême bedem peyvînewe be naw şeqame çollekan da degerrayin,
Polîs û segî xewallûy ser cadekan be gumanewe
boyan derriwanîn.
Hestman dekird şew û rûnakîy dartêlekan
ta roxî rûbarî Dîcle le tekman da rê deken.
Îtir le wê,
ser le niwê be heman hemasî
yekemîn şewewe dedwayin.
Axawtin hem be xoaşna û
hem be xo namoy dekirdîn
Basekan berew kolanî daxrawî mêtafîzîk û
kenarî temgirtuy heqîqet deyan biridîn.

Ême dediwayin û dediwayin
wek bimanewêt be peyvîn
Zemanî xoman dabênîn,
Yan be sîhrî peyv û bîre pêk nakokekan
dahatû bênîne juwan.
Axawtin heybetêkî dîkey deda be şew ke xewbînerane
giwêy bo peyvînman girtbû;
Şew pirr debû le direwşanewe û şîr û dukellecigere,
Pirr debû le endêşaney
ke nîgarî cîhanîyan le berçawman dekêşayewe
Êmeyan le nêwan guman û bawerr da
dehênaw debird.
Ême xoman bûyin, xoyişman nebûyin
Şewane be berçawî tirîfe û şitekanewe
dehatîne gorran.
Belam çon peyvîn deyitwanî şew bigorrêt
be efirandin?
Çon bîrekan deyantwanî hênde hîwa biden be ême û
mana be jiyan?

*

Şewêkî mangî oktober to le caran hêmintir û
kemdutir bûyit
Hêndey nemamêkî tenya şiwênewarî payiz
be rûtewe dîyar bû
Xotasa le ber xotewe dediwayit,
Bedem cigerekêşanewe çawit le rûbareke birrî bû,
wek rûy peyvînit le aw bêt
Yan çawerrêy kesêk bît ke le qûlayîyewe
berêy bin aw da bigerrêtewe.

Le pirr pirsît:
((Axo êmeyin le fezay bîr û peyv da
be diway ciwanî û rastî û azadî da degerrêyin
Yan ême tenya awêneyek în?))
Ew şewe to bem pirsîyare rewtî basekan û
sîmay şeweket gorrî,
Ew şewe to le her katêkî dî
direxşantir bûyit.
To le ber xotewe dediwayit
Be çîlkeyek bazinet be dewrî wêney estêreyek da denexşand
ke le tenkayî rûbareke da dedrewşayewe,

Bazineke bedem gewrebûnewe dekrayewe û
bizir debû.
Îdî bê mebest limû tarîkî û berdekanit terr dekird,
Be zimanêkî namo le ber xotewe dediwayit wek bûn û
ebedîyet bidiwênît.

Le nakaw wek welamî kesêk bideytewe be dengêkî pirr le yeqîn,
ke le to nedehat witit:
((Xo ême nebûyin jiyanman hellbijard
Jiyan xoy êmey hellbijard)).
To her be cestey lay ême bûyit û
le ber xotewe dediwayit
Şew wek ême be peroşewe giwêy bo peyvînit girtibû,
Ristekan şipirze û
wişekan le nêwanî lêwantewe
debîndiran.
Nîga be pirsekanîşt bê aram dûrîyan depişkinî,
Weku le çawî jiyan da sîmay mirdinit dîbêt
Yan çawerrê bît bew şewe ebedîyet xoy bête juwan
ta be çawî xot hemû şitêk bibînît.

Keçî le nakaw ruxsarit rengî golawêkî sêbernişînî girt
Cesteşt halletî nemamî ber baran.
To çît dî katêk le rûy êmew şew da dengit hellbirrî?
((Renge jiyan her hîndî xallêkî kutrawî sercestey aw
heqîqet bêt
Êmeyiş wek estêrey naw aw
tenya sêber û wêne bîn))
Peyvekanit şewekeyan şillejand û wek zayelle
dûrîyan bêdar kirdewe.
To xotasa le ber xotewe dediwayt û
dediwayit
Destit le şitekan deda wek bitewêt le bûn û
rastîy her şitêk dillnîya bît.
Le rûbareke rademayit,

Ne le wêney estêre û sêberî xot rademayit
ke le naw aweke da têkalabûn
Keçî le nakaw destit be rûbareke da kird, wek bitewêt
meşxellêk bikujênîtewe,
Yan bixwazît
estêreke bigirît ke wek çorrêk rûnakîy rijaw têkelawî
rûbareke bû.
To seyrêkî asmanit kird,

Em careyan estêreke le serewe boy derriwanît.
Çawit birrîye qûlayî,
ke wek gomêkî şilwê rûn debowe
Detwit le rûnbûney şew da xot debînît
Heqîqet debînît,
yan çawerrêyit şew nihênîyekî samnak bidirkênêt
Şew wek keştî be nêw deryay endêşe da hellî degirtîn
berebeyan bê aga le bûnî xoman û seferî şew,
Bê bak le çawî gumanawî polîsekan
Bedem peyvînewe berew mall debûynewe.
Ême le axawtin da efirandinman debînî
ke le gell spêdey beyan da çawerrêyî dekirdîn
Xoman debînî ke wek mindallêkî hepesaw
be dalanî guman û bawerr da
dêyn û deçîn.
Ew berebeyane to le hemûman mattir bûyit
Bedem rêwe mindalane le payîz ramabûyit
Ke rengî xoy bedar û beyan û
tenanet be ruwanînekanit dabû,
Le ber xotewe şitêkit wit û
be wirdî, belam xembarane seyirt kirdîn
Wek diwacar bêt biman bînîtewe,
yan pêşbînî rûdawêkî çawerrwan nekirawit kirdbêt
Riwanînekanit samû xemî diwa mallawabûnîyan pêwe
dîyar bû.
Le pirr witit:
((Belam deşêt jiyan xoy koylayetî bêt
Hellekeş helley ême bêt,
nek zeman)).

* *

To le ber xotewe dedwayit
Wek beyan û payîz bedeng bênît
Na, hawrrêm to wirrênet dekird
Wek bitewêt le rêgay wirrênewe
Be heqîqet bigeyit,
Yan be wirrêne zemanî xot dabênît!

* * *

Belam hawrrêm,
lew sate da eger nore qisey min baye,

demwit:
Deşêt zeman tenya wêneyekî xoman bêt
Yan ême awêneyek bîn ke şêwe û rengî şitekanî girtbêt
Keçî ême eweyin ke heyin
Eweyin ke deykeyin û nayikeyin.

Demwit:
Ême wêne bîn, yan cewher
Bûnman rêkewit bêt, yan qeder
Eweta mehkûmî jiyan în
Mehkûmî şiwên û zeman în.

Belam çon le dahatû dillnîya bîn
katêk bîretazekan samnak û
azadî wehim bêt?
Katêk heqîqet geme bêt?

Kewate hawrrêm be yadî towe dellêm:
Çon bitwanîn şiwênêk peydakeyin
ke pabendî zeman û mirdinman nekat?
Le kiwê kesêk bidozînewe ke qûlayî pişknîbêt,
wek ((Lazaros)) * be çawî xoy hemû şitêkî bînîbêt?

## Portirêtî hunermendêk

Kitupirr wek sîhirbazêk yarî be şitekan dekeyit
Yarî bew rengane dekeyit ke behar û xewin û payîz dênin
Yarî bew werzane dekeyit ke bêbakane
le ser ceste û ruxsar cêgorrkê deken.
Le nêw pencekanit da zeman direxşan,
Jiyan şageşke
Dahatû çawerrê û
xeyib heyran.

Îtir serdem serdemî raman û pêşbînî ye
Katêk rengekan dênîte peyvîn,
Serdem serdemî bêdarbûnewey ciwanî ye;
Riwanîn manayekî taze dedat be bînîn
Peyvîn rîtmêkî niwê be tîpekan
Bonkirdinîş xoyasa bepirs û pêşbîn.

Îdî kiwa awazêk, yan rengêk demênêt
Pence ney diwênêt!
Kiwa razêkî nax demênêt
ruxsar ney dirkênêt!

Le gemey reng û peyv da
zeman be rût da ta lêwarî ebedîyet wala

Şiwên penayek e şayistey şefeq,
Boşayî: Mollgey sêbere şeketekan
Rêgakanîş: Talletîşkêk le bolêll da
Şepolerengêk ke ta ebed dekşêt
hewesêk le bestelanî ceste da.

Pîşey xote parastinî ciwanî ta ewdî û serdemî gewicêtî
giwêgirtin le peyivînî reng û
gorrînî ruxsar be razistan.

Pîşey xote, yan çarenûs: Xewbînîn ta lêwarî şêtbûn
Yarîkirdin be mehall û
bêdarkirdinewey tawêrekan.

Be balat xoy depêwêt roj
be bêdarîy xewbîneranet şew.

Tenya xeyb katêk spêde bêdar dekatewe;
Her heqîqet ke le takbûnewey xoy rademênêt
Le to deçin
meger jiyan bitwanêt lasayît bikatewe.

## Berdekan

I

Dapoşraw be kipîy reng, roçû be aramî da
Bêdar û direwşawen berdekan
Matbûnîyan wek şkoy peyvî ne
Ramanîyan xewbînîn.
Be xoretaw gewire debin
Le gulle tow,
Le bonî derya û gill rengekan gullbijêr deken
le hewir û mehall şêwazyan.

Cesteyan rehayî rûtbûn e
Pênasey ser le niwêyşitekan.
Yaqût û gewher bin yan tawêr û çew, riwalletî rengînyan
awêney naxîyan e
Reng weku nasname û ruxsar e,
Şêwazî lêk neçû: Hendesey mehall û
yekbûnî dijekan.

II

Bêagayane, le xoman helldêyin ruwew şepolî rengekan
Ke jiwangey şiwên û zeman in
Le wê hêş û tîşk belqî bestellekewe gullûkasa
dekrênewe
Rengekan qûlayî be wêney awêne radegirin,
Boşayî degorrin be mew da,
Be jiwangey sêber û rûnakî
be ruxsarî xeyib.
Sêberî roşnîyan regekan dediwênin,
Aramî debexşin be serma.

Bêaga derroyin ta bêynewe.
Êre ye menzillgay ebedî, ke rûnî rêy be stuwe,
Cestey be hetaw şorawe renge
razgirekan dênête peyvîn û
rûnakî degorrêt be kirîstall,
Ta dundî şikoy arezû taw dedat,

III

Roçû be aramî da dellêy be raman dediwên,
Yan fêrî xewbînînman deken berdekan.
Şanaz wêney baxêk ke mîwekey hêşu û reng û rûnakî bêt
Sayekey: Penagey ebedî
Bonekey: Sêbûrî û dillnewayî.
Dapoşraw be kipîy reng, beyan rengî cesteyanî girtuwe
Dellêy le arambûnyan da bo naxî xoyan derrwanin;
Yan pallîyan dawe be xewnewe û bo bêdengbûnî xoyan
Giwêyan girtuwe.
Serwerî: Peyvînî ceste ye
Rehabûn: Cîyawazîy şêwaz û
şepolî lêkneçûy rengekan.
Axo çi pêşbînîyekyan pê bêt em rengane?
Çi hîkmetêkman fêrbiken bêdengbûnî em berdane?

# III
# Bo ciwanî

## Goranîyek bo ciwanî

1

Be sersurrmanêkî mindalanewe dest le beyan dedem
Bonî gizing û şînayî dekem
Le gelaw xunaw û rubar rademênim ew kataney
rûnakî helldemjin
Be hellpewe rengî pirrjaw deçinmewe,
wek mindallêk hawar dekem:
Bidrewşêwe ey ciwanî!
Be heman sersurrmanewe zayelley to
le nêw mosîqayekî dûr da debîstmewe.

2

Hêşta çawanî xewallût şiwênewarî xewnêkyan pêwe dîyare
Pirçî şewînit wek qersîl bonî gill û nim û hetaw
be nêw beyan da pexiş dekat
Pence xewalluwekanîşit yarî be rûnakî deken,
Tarîkî leber dillim dademallin û
rût û sersam le rûy xom da ram degirin!

3

Her bew destaney le hewrim des û
berd û regekanim bêdar dekirdinewe.
Her bew destaney paşerrojî xom
wek gull pê bexşît
Le rûy her şitêk, le rûy her kesêk
be xirûrêkî minalanewe pirotêstim deniwand,

Be rûy yeqîn da
dergam dadexist
Be ser pêşbînî û be rûy guman da
pencerey dillim dexiste ser pişt
Her bew destane le kelepçe da killollîm bînî
Hawrrêy dîlî bû
le ser cesteşit, her bew destane bextîyarîm bînî
Hawrrêy ciwanî bû.

4

Şew le ser şeqame baranawyeke rakişawe
Tirîfe boşayîyekan be sêber û direwşanewe pirr dekatewe
Minîş hêşta rût û sersam bonî gill û baran û
rengî êwarem bernedawe.
Destekanim ber nihênîyekî dî dekewin
Tezûyekî sard be cestem da dê û
leber direwşanewey şew da helldelerzim
Be tirsewe bangit dekem
Tirîfe û tarîkî wek min dadeçllekên
terrtir debim,
Le nêw zirînganewey şew da
zayelley to debîstmewe.

5

Be heman sersurrmanî mindalanewe le gell balldare xewalluwekan da
be pîr beyanewe deçim,
Wek pepûle pelkegull û awing, bon dekem ew satey
rûnakî helldemijin.
Be heman lasarî û şewqewe reng deçinmewe
Şiwên bêdarî dekewim ta berew tom bênêtewe!
Le koçêkî dike da mindalane be yekemîn rêbwar dellêm:
Beyanît baş hawrrê mîhrebanekem!
Le berdem her beyan û xorawabûnêk da,
be heman sersurrmanewe hawar dekem:
Takey be efsûnit hellweda û
be razekanit şeydam dekeyit
ey ciwanî?

## Bellênşikênî

Belam gîyane!
Her şitêk sinûrî heye
tenanet bellên şikênîş.

Çon wa debêt?
Em çûnejuwane xêrayey ebedîyet
her le gull û pepûle dêt.

Çon bem koçe le nakawet birrwa bikem
katêk ciwanî
hêşta wêneyekî to ye?
Çon bitwanim le gell bê to yî hellbikem
katêk jiyan
le pêşwazît da minasa çawerrê ye?

Bê to kat le baizneyekî daxiraw deçêt
Aso: Boştirîn boşayî
Şiwênîş meger bo gorr bişêt.

Mîhrebanî key wa debêt!
Le gell xot da, to hemû şitêkit bird
min nebêt.

## Ta bitbinim

Çawekanim denûqênim
ta bibînim;

Le ser aw nîgart dekêşim
Hemû şitêk şêwet degirêt
Be zimanî to
rûnakî le gellim dedwêt.
Dellêyî şêwe cewherîş e
Peyv seretay ciwanîş e

## Aşnabûn

To bêdengîyit be deng hêna û
be şeqamî rûnakî da
diway xot xistim,
Bêkotayît le kotabûn da nîşandam,
Le wise da be efrandin
Le zayelley bêdengî da be xom
aşnat kirdim.

## Le herkiwê bît

Le herkwê bît xewnistan e
Berew herkiwê ser hellbigirît
kejaweket rûnakî ye
Rastî: Hawell
hewart şiwênî zeman e.

## Pêkewe

Tenya yektirî şik debeyin
Pallman dawe beyekewe
Cesteman bonî yektirî û
bonî baran û tirîfey girtuwe.

Wek dû pişko pallman dawe be sermawe
yarî be rûnakî dekeyin,
Pallman dawe be xewin û tenyayîyewe
yarî be jiyan û mehall dekeyin.

Her tenya yektirî şik debeyin
pêkewe wilatêk le xewin
Mallêk le rûnakî û
dahatû le evîn çê dekeyin.

## Le gell to da

Be bonî gullasay cestet bêdar debimewe
Min hêşta nazanim le kiwêm,
Pêlluwekanim daxistûn û
derrwanim!
Cestet: Kitêbî rûnakî
Şêwey rûnit: Awêney bê kotayî.

Min ne bêdarim, ne razaw
Wek hemîşe le gell to da
dellêy zeman ne têdeperrêt,
ne westaw.

## Pena

Şew hêşta minasa bêdar
toyiş wek mindall le jûrekey dî razawît.
Le derewe tenya dengî tarîkî dêt
Le derewe hîç dîyar nîye
tirs nebêt,
Le jûreweş min le nêw zirînganewey bêdengî da
helldelerzim
Wêney çille mêlaqeyek le jêr baran da.

Le amêzî xewallût da
germim kewe!
Yan le nêw destekant da
ceste û gîyanim bişarewe!

## Bêdengbûnit

Bêdengbûnit seferêkî berdewamî
nêwan guman û yeqîn e
Bêdengbûnit wek bêdengbûnî rûnakî
şêwazêkî niwêy peyvîn e.

To le lutkey bêdengbûn û ramant da
Direwşaweyit wek rojêkî beharane
Şad û heyranît wek xunçe
le beyanî pişkutin da.

Em şêwazey xoderbirrîn her le xot dêt
Her le xot dêt axawtinî bêdengane
Le meşyan da le kes naçît
le xot nebêt.

Min bêdengbûntim xoşdewêt
Le kes neçûntim xoşdewêt;

Razekanî tom xoşdewên
ke le fezay şewînî çawekant da
wek polêk gulleestêre sema deken
Çawekanî tom xoşdewên
ew kataney
qûlayî tom pêşan deden.

## To hîwat pêdam

((To hîwat pêdam
ta bijîm))
Xetay to bû
fêrî xewbînînit kirdim
ta bifirrim.

Jiyan wêneyekî to ye
Peyvîn: Nîyaz û behan e
Her şitêk be towe şit e
Evîn û ciwanî: Nîşan e.

Le nêw to da xellwetinşîn
rastî be xom aşna dekat
Le fezat da mestî firrîn
ciwanî demhênêt û dembat.

Dellêyî dahatû demdiwênêt
Le gell to da
xoşbîn wek gullezsitane
ke dexwazêt behar bênêt.

Xetay min e yan xetay to
Peyv hênde sinûrdar e
deselatî ciwanî: Perco?

## Xewin... Xewin

Le her cêyek bîn ciwanî le wê ye
Bo her kiwê biçîn xewin hawrrê ye.
Le gell xewin da rêyî mehall debirrîn
her le xewnewe fêrdebîn bifirrîn.

Çi pirsîyarêkî temgire waqî!
Çi welamêkî roşne xewin!
Çend gumrrakare tîşkî hoşyarî û
rênîşandere tiruskey xewin.

Kat rûbarasa be pirtaw derrwat
Ciwantirîn ruxsar, bo jiwanî edem gullbjêr dekat
Xewnîş mirdin û kat û şiwên debirrêt
berew dîdarî yaranman debat.
Eger le nêwan min û xewin da
mewdayek hebêt, renge xewin bêt.

Eger le nêwan min û xoşim da
hawrrazêk hebêt, debêt xewin bêt.
Xewin rûnakî dênête peyvîn
Kiwa ewe min im xewin dey diwênêt?
Xewin rengekan wek to û derrêjêt
To billêy min bim xewin bîçênêt?

Xewin şêwaz e, minîş ruxsar im
Xewin hellfirrîn, min cûtê ball im.
Xewin cewiher e, min şêwe û wêne
Xewin rûnakîy nûrî ezel e, minîş awêne.

# Jiwanî rûnakî
# 1997

# I
# Meditasion

*Hemîşe hezim dekird weku ewanî dî bim*
*belam zeman be ciwanîy xoyewe*
*le sikalam be hêztir e û*
*deyewêt wek min bêt.*

***Borîs Pastêrnak***

## Eger bitwanim

1

Eger bitwanim!
Bigerrêmewe bo seretay sereta
xom mewday xom bixullqênim
Xom şêweyek dabênim bo riwanîn
Derfetêk bo rahatin be şiwên û kat,
Yan cestem bihênme peyvîn
ta razekanî xoy
Raze ezelîyekanî roh
pexişkat.

2

Eger bitwanim!
Le zîndanî şiwên û zeman azadbim û
xollemêşî rojekan pêkem
Sêberkem wek bermallêk
bo şitekan raxem û
formêk bidem be rûnakî
Derfetêk be dayalogî nax,
yan werzêk dabênim!
Bo mirdinêkî dî
Bo raman û evîn
Bo rehabûnî xeyall û
le dayikbûnêkî dî.

3

Eger bitwanim!
Le rûy xom da bikrêmewe û
be zimanêkî dî xom bidiwênim.
Le peyvînî razekanî nax bige û
herşaneyekî cestem
be harmonyay roh rabênim

4

Min êwe bûm, hemûtan bûm û

xom nebûm;
Xomî zarok, ke baweşî daykim winkirduwe
Ke mindallîm le ser rêgay
sehollînî şew cêmawe
Xomî hogirî guman, ke tewêllim rengî tawêr
Ruxsarî xewbîneranem şêwey êwarey girtuwe.
Min êwe bûm û xom nebûm
Ger bitwanim xom bim!

5

Be lêwarekanî xom da helldezinêm
Wek şepol be tawêr da
yan wek derya be kenar da.
Eger bitwanim!
Rêga win nekem
ta be naxî xom degem.

6

Belam êsta
axo çîm be berewe mabêt?
Ta çend cestew roh pêk aşnan?
Axo çî caranî xomim pêwe mabêt?

7

Le hizûrî rûnakî da
wek xunçeyekî xewallû dekrêmewe
Cestem be şewnimî rojekan terrdekem
Rohîş be guman û hetaw.
Ax! Ger bitwanim
le xom bigem û
le gel xom hellkem!
Yan ta detwanim
leber xom rakem.

## Mêdîtasion

I

Rakişaw le naw sirewitin da wek sêber
bêdar wek direwşanewey agir, derrwanim
Yadekan biruske asa be pirtaw ret debin
Derwazekanî riwanîn awalle be rûy xeyb da
Be rûy ebedîyet da ke wek beyan
le tafî lawî daye
Şiwên hemû cêyek û hîç şiwênêk
Feza: Sara
Kat hemû satêk û hîç katêk
Min le xom da bo sêberekanî bûn derrwanim
Rîşey xollemêşî rabirdû depişkinim û
giwê le peyvînî razekan radegirim
Le xom da bo sertakanim degerrêm
ke wek zeman bê sereta û
wek xewin û zayelle bê şiwênewarin

Lewdîw şitekanewe çaw bo rûnî degêrrim
Destekanim le spêde helldekêşim û
gizing bêdar dekemewe.
Ey takbûnewey roh mewdakanim çê bike!
Ruwew lutkey direwşanewem bere!
Min gerranim bo dozînewey winbûn e
Dîyalog e le gell rûnakî,
Dabirranim ramane le raman da
Seferêkî ebedî ye be guman da.

Le takbûnewem da razekan azadim deken
Peyvînim: Hêma  ye
Tenyayîm: Serbestîy riwanîn û pirsîn.
Min detwanim tînwêtîm be serab bispêrim û
be rûnakî billêm:
Hellimbirre berew lêwarî kotayî!
Ta şitekan handem şêwey bê şêwazî to bigirin
Ta le aso da xom bibînim!

Ey xulyakanî ceste serwerîy xotan derxen
Behaney manewew

manay çawerrwanî û seferim bidirkênin!
Min şeketîy şepolim pêye
Peyvekan zîndanm in
Şefeq hawrraz,
belam çon be tenya tînuwêtîy gill bişkênim?
Çon seferî bê birranewey ((Ba)) be nêw şepolî
roşnayî da lêkbidemewe?
Çon pakane bikem bo xulyay cestey le gill tînûtir?
Çon behaney sefer û
manay manewem biselmênim?

Wek talletîşkêkî gumrra le sêberî tellxî daristan û
tarîkî alawîn
Winbûn rênîşanderman e û xulyakan weku şepol
Berew xeyib hellîyangirtûyin!
Ewe çarenûsî cesteye ke le dalanî gunah û lezet da
mewdayekan win dekat û
pişt dekate sereta û kotayî xoy,
Dewruberîş wek sewzayî gelayekî tînû kall debinewe
Çollewar û hesret û boşayî denênewe.
Çon razekan bidwênîn?
Katêk peyvekan le mana tengtir in
Çon amadebûn bo beserçûn,
Forim bo riwanîn dabênin?
Birrwane
çi nehatêk rûy têkirdûyin!

Şitekan awêney seretakanîyan bûn
Rastîş be awkirdinî serab
Min wek çawekanit rûnîy aw û şînîy samallim poşî bû
Le pall şefeq da mindallasa çillêk rûnakîm bo baran ragirtbû
Le ser rûy xewallûy êware
renge pirjawekanim deçnîyewe
Le lêwarî winbûn da
mat wek pelkezêrrîne çawerrê bûm
To şêwey şitekan bûyit û
nûrit aso û awedanî.
Xot rût kewe!
Ba ciyografyay roh bibînim
Ba le ser cestet şiwênewarî xom bixwênmewe.
Xot rût kewe!
Ta pêbigem
Ta rûnî xeyb û kotayîyekan bibînim.

Min be kesim newit çawerrêm ke
Be kesîşim newit şiwênim kewe
Le ciyatî min rûnakî razî dedirkand,
Êware bedem xemekanîyewe goranî deçirrî
Deryayiş kenar û şepolî xoy dediwand.

Asman bo qûlayî xoy derrwanêt
minîş le awêney şepol da bo xom,
hewa baranawî
Beyan rengekanî xoy deçnêtewe,
Sara mawey nêwan min û bûn pirrdekatewe.
Çawekanim bo qûlayî çawekanim derrwanin.

Ey takbûnewey roh rênîşanderim be!
Ewe direwşanewey to ye daygîrsandûm
yan pirdetîşkî nêwan min û aso ye?
Birrwane çi şêtbûn û xeyallêk seryan têkirdûm.

Min seferim le westan da
direwşanewey heqîqetim le guman da.
Min piştim kirdote serdemî lêkdabirranî cestew gîyan,
Rêgakanî xom wek xaçekem hellgirtuwe,
Piştim kirdote herêmêk ke bêbakane
zemanî xoy dedorrênêt
Diwanehatin nîyazme û
sêberekem be ser şitekan da raxistuwe.
Min kujanewem hellbûn e
Zayelle ye bêdengîm
Bûnim cewherî bûn e,
Min parsengî şitekanim be harmonyay roh ragirtuwe.

II

Şew wek mindallêk le ser baskim pallkewtuwe
Min şewnixunî şew dexwênmewe
Heremekî rengekan têkelaw dekem
Demewêt mewdayek çêkem bo sefer û
tenyayî û çawerrwanî
Demewêt rû le dahatû bikem
ke xeybî hellgirtwe.

Deşêt zemanî min lewdîw zemanewe ser hellbidat
Mêjûy min lewdîw mêjuwewe dest pêbikat.
Min le naxî xom rademênim

ta razekanî ceste bidirkênim
Rewayî pirsîyare ezelîyekanî roh biselmênim,
Dest bo regekanî beyan degêrrim û herfekan wek mom
le ser pencekanim dadegîrsên
Xewnêk wek dillopêk rûnakî
le ser tewêllim dedirewşêtewe.

Bêhude bû katêk asom dexiste ser ran û
cestem wek mêrgêkî tînû bo baran radexist,
Zemanîş weku yadekan be pirtaw ret debû,
Dalanî serabîy mehallim depişkinî û
sirûdî şepolim denûsîyewe
Be nîyazî xorûnak kirdinewe beqûlayî
tarîkî da rodeçûm
Le naxî bestellek da
xom gerim dekirdewe,
Yan serkizane le ser şoste temawîyekan
spîyetîy befrim deçnîyewe.

Kiwa rewa bû be cestey mêrmindalanem penageyek
le winbûn û boşayî
Aramgeyek
le tirs çêkem!
Be pêye sawayekanim mêjûyek le ser berd binûsmewe,
Yan be tenya terme şipirzekan aram kemewe,
Mirdûşor û
gorrhellken û
zêwan her tenya xom bim!

Çi şerrêkî na beraber û dorraw bû!
Gelayekim wek şimşêr le rûy asman da helldebirrî û
hawarim dekird:
Kiwa reway heqe? Ke min nazanim bo lêrem!
Ke rûnakî gumrray kirdûm
Ke pena debem bo mirdin
Dalldem nadat!
Birrwane!
Bazuwekanim çi şiwênewarêkîyan le ser tawêr û
tarîkî û şostekan cêhêştuwe?
Birrwane!
Rêkewit çi ajaweyekî nawetewe
Zeruret çi belayek.

Le sêberî gerrokî dirextêk da pallim dawe be tenyayîyewe
Gumanekanim dediwênim
Baskekanim weku dû liqerûnakî berew rût ragirtuwe.
To le daykbûnêkî dîkeyit û
şêwey xeybit girtuwe.
To şitêkit le gell xot hênawe ne le beyan deçêt
ne le şêwan
Ne le bûn deçêt
ne le nebûn.
Zerya kenarî xoy dexullqênêt
Toyiş seretay zemanî min.
Min xom dawete deste razgirekanit
her xot çarenûsî minît.

Rêgayekan be dalanî tarîkîy da şorrdebnewe
Heq reşmallî serkewtuwane
Mêjûyiş awêney deselat.
Bo her peyamêk be xewin dest pêdekat
keçî be xwênbaran tewaw debêt?
Çend pêkdeçin peyamekanî zemîn asman!
Bo ta êsta zemîn dîlî asman e?
Rastî: Serab
Bo ta êsta zeman textî bikujan e?

Pêş hatinî be pirtaw be serçû zemanî ême
Ne êwarekan hî êmen,
Ne ayinde sîmay razekan e
Xot rût kewe!
Ba ceste serwerîy roh biselmênêt

Eme nefretî guman e yan yeqîn?
Ke wêney lêll û serewxwarî xom riwalletî bûn me
Ke bîrçûnewe rûnaktirîn heqîqet e
Hoşyarîş: Efsan e
Ke merg take şayetew
êmeyiş nazanîn le kiwêyin,
Eme evîn e
yan winbûn?

Rêgayekan be kolanî winbûn da şorr debinewe
Weku cogelebarane le kenarî hîç da kiwêr debinewe.
Eger êsta le wê mangeşewe yan engusteçaw,
Beyan e yan şêwan
Be min çî!

Min bîrî baweşî daykim dekem
Bîrî ew rojane dekem ke çingim bo beyan degirtewe
Be diway pepûle û zayelle dekewtim
Xewim le çawî şew dedizî û
le tirîfe xanuçkem dirust dekird
Le nêw gîya da estêre rijawekanim deçnîyewe.

Min çîm dawe le naw û şêwey bitekem
Çîm dawe le rengî kifnekem
Le nasnamey bikujekem
Be min çî daremirduwekem le çinar bêt
yan xollemêş
Be min çî şiwênî gorrekem
Min bîrî baweşî daykim dekem.

Kiwa em koçe sereta bû?
Kiwa serhellgirtin be diway agir da
Be diway bawerr û jiyan da
Derkewtinî werzî rûnakî û
dahênanî mana bû?
Kiwa em koçe sereta bû?

III

Rojekan retdebin û temêkî pemeyî wek sêber damdepoşêt
Şew be ser destim da deçemêtewe.
Tarîkî sinûrî xoy debezênêt,
Rojekan boşayî nêwan min û bûn pirr dekenewe
Tarîkî ayetekanî xoy le ser cestem denûsêtewe,
Min lewdîw tarîkîyewe çaw degêrrim
Şite bîndiraw û nebîndirawekan debînim
Ew razane dexwênmewe ke xoll û aw û hetaw
le ser hellçûnî dirext, tînuwêtî
le ser gela deynûsnewe.
Lewdîw çakew gunahewe
xulyakanî cesete delawênmewe.
Be boşayî da derrwanim
rûnî dexwênmewe
ke wek awêneyekî lêll, wêney şêwawî xom pêşan dedatewe.
Pena debem bo kîmyay şitekan
ke be xom namo deken.

Min xom im û xoyşim nîm
Şitekanîş tenya wêney kall û be xoneçûy xoyan in.

Min çirayekî tarîk û pişkoyekî sehollîn im, tawêrêkî nerim û hewrêkî reqhelatû,
pîrêkî nûranîm gunah û tarîkî têm alawin.
Termêkî gerrok im tenrawim be nefretî xwawend û peşîmanî, be metirsîyek
ke le jiyanewe serçawe degirêt.
Axo em dabirrane berew kiwêm debat?
Lewdîw minewe satekan çon denwênin?
Mewdayekan be kiwê degen?

Perdey pencereke lade!
Ba rûnakî bête peyvîn
Ba şepolî rûnakî ramanjênêt,
daman bibirrêt le şiwên û kat û
bêdarman katewe,
Ba rûnakî xollemêşî rojekanim pêkatewe.
Perdey pencereke lade!

Ser le niwê degerrêmewe bo penayekanî roh,
ke pirr in le goman û hesret,
Pirr in le pirrî û çolayî,
Mewday nêwan xom û ayinde be pirsîyar detenim.
Min kêm? Le kiwêrra hatûm? Ke sinûrekanî nêwan bûn û nebûnim dapoşîwe.
Min çîm? Ke em boşayîyem pirrkirdotewe û sêberekem riwalletî bûn me!
Çon rêm kewtote naw em qulayîye? Hellebû yan sîstemî tebayî dijekan? Rêkewit bû yan siza:
Sizay xwêndinewey tarîkî û pirrkirdinewey boşayî, sizay nîştecêbûn le nêw tîşk da,
Sizay gunahî baweşlêkdanî aso û gizing, qersîl û şewnim
Dirext û baran
Min û xewin.
Eme rêkewt e, yan zeruret?

Mirdin hat û to nehatît
Min ewdallî firrîn im, fezam serdabe û le roxî golaw da çawerrê me
Wêllî rûnakî û rehabûnî rohim
Rêgayekem bazneyî ye û ruwew lêwarî xomim dênêtewe.
Meger rêgayekî dîke nebû
berew winbûnêkî tirim berêt?
Aşnam kat be mirdinêkî dî?
Mirdinêk ke rîtmî zeman û
harmonyay jiyan bêt,
Yan bo herêmêkim bibat cige le tirs û tarîkî
şitêkî key tê da birrwêt?
Herêmêk le gorrekem berîntirbêt.
Axo fezayekî dîke nebû bo firrînim?

Tarîkistanêkî tir nebû be ser mergî xoy da bikişêt

ta nawî lê binêm wilat?
Şar be şar, durge be durge bîgêrrim
Be dîyarîyewe şewnixunî bikêşim û
aşnay kem be dilldaranêk
ke zeman le evîn degirin.
Arîleyekî dî nebû bebê mercî bawerrhênan
Be xom û xwam aşna bikat?
Le peyvêk da,
yan le dillopêk rûnakî da
şêwey roh û
heqîqetim pêşan bidat?

Mirdin hat û to nehatît!
Deşêt min le winbûn çawerrwanî da bend bim,
Bendî guman,
Bendî gunah û peşîmanî,
Bendî hogirbûnî ceste û sat û şiwên,
Bendî peyve bêdeng û bêmanakan,
Yan bendî tenyayî û xeyalatî xom.
Sîbîl! (*) Eme pêşbînî ye, yan rastî?
Sereta ye yan kotayî? Ke min nazanim le kiwêm!
Ke asokem dîwarew minîş weku mindallêkî girrugir
be ser dey kutim,
Dezanim serşikaw minim, keçî...
Boşayîyek be cêdêllim qûlayîyek le ser rê me
Qûlayîyek dekeme şiwên boşayîyek çawerrê me
Keçî...

Le êwarewe ba diwam kewtuwe
Ba yarî be sêbere baranawyekem dekat
Şewîş balay xoy wek awêneyekî lêll le rûm da ragirtuwe
Sersam û çawerrê be xom da derrwanim, ke şelallî şeketî û tirs û baran im.
Yadekan têkelawî yadekan debin,
Zeman têkelawî zeman,
Dîmenekanîş biruskeasa têdeperrin:
Çallêkî gewre hêndey şew, berîn wek bîyaban,
Lete mangêkî xewallû,
Gele segêk ke be werrîn şew depişkinin
Yarî be şorrelqî dirextekan û
bon be tirîfewe deken.
Rasanêk şew deşllejênêt,
Min bo lêrem?
Bo ((Ba)) berokim bernadat?
Bem bêwexte terze û rehêlle û tirîşqe le kiwêwe dên?

Bem sermaye bo kiwê deçîn?
Kordêlîya! Eger jehrawit hênawe bêne bînoşim (**)
Eme zîndexewn e, yan rastî
Ke min nazanim bo lêrem
Ke ayindem le çawerrwanî û tenyayî çêdekem
Cêgam le pûş û bestellek,
Fezam le giryan
Sêbûrîm le şêtbûn û
azadîm le hîç.
Kiwa eme pîşey min e?
Kiwa eme cêgey min e?

Em tarîkistan e xulîyakanî ceste desrrêtewe
Wek lêkdabirran û zebûnî, rewneqî roh dekujêt
Be rehêlle û xollemêş û bonî mirdin
gemaroy jiyan dedat û
pûçî û bêmanayî deselmênêt.
Çon golawî tarîkî derdem û
pelley ser cestem bişomewe?
Çon şêwey rûnakî bigirmewe?
Çon le winbûn da bo rêga
le kotabûn da bo sereta bigerrêm?
Çon bew deste şeketanem, ke guman dekem hî min bin,
xom binêjim?
Kiwa eme şêwey min e?
Kiwa eme rêgay min e?
Ba rêgam berew her goşeyekî dinya bêt
Termekem xollemêş û
gorrekem derya bêt.

IV

Bixûreşewêk, daristanêk le estêre
ke le qûlayî samall da wek paporr mele dekat
Textexewêk le tirîfe û zerdegela
ke bonî cestey girtuwe.
Rakişawim le naw sirewtin da bêbak wek terim,
çawerrwan wek denke çewêk ke şepol
berew kenarî retandibêt.
Gijeba yarî be rengekan dekat
Gijeba le gell xoy gelawerîwekan û
şepolî tarîkî deşllejênêt
Razekan û paşmawey yadekan dewrujênêt.

Şewêkî awênebende,
Şitekan sermestî direwşanewen,
Şew pasarêk e pirrawpirrî ceste,
Pirrawpirrî xewin û direşanewe û riwanîn
Şew belemêkî sirewtgirtû ye û minîş le nawî da
wek masîgirêkî mandû le serpişt rakişawim.
Xewnekan dên û be xêrayî le kolanî bêdarî da win debin.

Axo zeman xewnasa awalle ye
Yan wêney bêdarî tenraw?
Seferekem sereta ye,
yan kotayî?

Gijeba yarî be rengekan dekat û
çend gelayek le ser cestem becê dêllêt
Dîmenekan le tafî direwşaneweyan da
dellêy deçine jiwan be pirtaw retdebin:
Mindallîyim, ke wek nenasêk bom derrwanêt
Mirdin, ke be nêwan şepolekan da dêt
Nîwey şewîn
Nîwey wek tirîfe zîwîn.
Bonî xollî ber tazebaran
Bonî şêdarî daristan, ke le wê gela be nexmey bulbul û çirpey şewnim depişkiwêt
Polêk pepûle, ke le deştî direwşawey şew da yarî be tirîfe deken
Gelesegêkî çawerrwan, ke le tarîkî da çawekanyan wek hêşuwe estêrey dûr denwênin.
Rewe siwarêk ke temyan kirdote demamk û şimşêrekanyan le rûy direwşanewe û şew da hellbirrîwe
Estêreyekî xizîw ke le nawerrastî derya da dekujêtewe
Roje sîma payizîyekan, ke le şeqamî nehat da bê şiwênewar win debin
Ruxsarî dostêkî dêrîn: Ebedîyet,
Ke le fezay endêşe da xermaney dawe.

Yadekan wek zeman be pirtaw ret debin
Derwazekanî riwanîn awallen be rûy rêkewt da
be rûy guman û
direwşanewe û
raze ezelîyekan da.
Debû min le serdemêkî dî û le şiwênêkî dike da
çawerrêt bim,
Le rêkewtêkî dike da direwşanewet dabirrim bikat le şiwên û kat.

Min çon be ser em rêkewte da kewtim?
Le kiwê sate kurtekanî azadîm win kird?

Çon le soraxî xewin û mehall da
bûme serhelqey gunahkaran? (***)
Çon heqîqetim gorrîyewe be guman?!

Xot rûtkewe!
Ta le ber awêney cestet da
roh bibînim,
Xot rûtkewe!
Min le rûnî da pêdegem,
Le rûnî da radebmewe.

Bêdar le pantayî sirewitin da
wek jîlemoy jêr xollemêş bo naxî xom derrwanim,
Giwê bo peyvînî guman helldexem
Dest bo regekanî rûnî degêrrim û
rengî ser rûm pertên debin
Herfekan le ser pencem wek mom dadegîrsên,
Helldelerzim wek mindallêk le tarîkî da,
sêberî terrbûm wek mînayekî şkaw
be ser xoy da harre dekat
Le soraxî parçekanim da bêaga
derrijême naw tewjimî rûnakîyewe.

To werzêkit dahêna bo pirsîn û sefer,
Peyvînit pêşnîyazî xewin û azadî bû.
Bidwê! Ta şitekan direwşanewey xoyan derbixen,
Ta le ser lutkey bêkotayî bitbînîn û
rastî wek meşxell hellbibirrîn.
Zerdey serkel çawerrê ye
Dar, tînuwêtîy gill, qersîl, kêlegorr, mana,
sewzîy gela, pirsîn, bêdengbûn, kiwêrerrêy nêw daristan,
min û matbûnî berdîş
Bidwê! Ta jiyan bête peyvîn.
Îdî le kiwê bot bigerrêm?
Xotît cewherî şitekan
Xotît sereta û kotayî
Manay bûn û man û zeman
Çawerrwanî be to we sayew hîwa ye
Sarakanî gîyan awedan.
Xot zeruret, cebrî rêkewit
be to we jiyane, jiyan.

Yadekan wek zeman bepirtaw ret debin
Le pall aso da raze ebedîyekan dedwênim

Cestem wek çepke gullêkî baranawî le ber tavgey zîwînî
tirîfe da helldexem,
Baskim wêney dû liqe rûnakî
berew rût helldebirrim.
To spêdeyit le şêwan da
Direwşanewey heqîqetît le guman da
Le to da manakan yektirî tewaw deken
Weku şepol yektirî desirrinewe
Ayinekan beyek degen
Dijekan teba debnewe.

To le dayikbûnêkî dîkeyit şêwey xeybit girtuwe
Minîş le serdemêkî dike da wek zarokêk
bo baweşt hatûmewe.
Wenewşeyîn pelle şewnimawîyekanî rûm
hetawgirin nisarekanî dill.
Hatûmewe, le xellwet da sozdekem û
le ber çorrawgey rûnakît da dadegîrsêm û
nasûtêm,
Desûtêm û
weku qeqnes carêkî dî radebmewe
Be dem janî sûtan û şeketîy berzefirrîyewe
le fezay to da sozdekem
Sozdekem û
cestey billêseasam goranîy gîyan deçirrêt
Gîyanîşim şêwey to degirêt.
To wek zeman bê sereta û bê kotayît
Wek rûnakî bê şêwazît.

Be min çî sereta gill bûbêt yan hewa
Agir bûbêt yan aw
Seretay min pizîskêkî ceste bû
le nêw roh da tiwayewe
Çorre nûrêkî roh bû
be cestewe gîrsayewe
Seretay min
le gell to da dest pêdekat
Seretay min:
Lewdîw to we tewaw debêt.

## Hesretekanî Odêsa

*Bo Frans / diway hejde sall*

Le kenarî derya da êware bo ballinde awiyekan
be cêdêllim
Tarîkî wek kitêbêk depêçmewe,
Demewêt şewekî bigemewe lat
serkizane gunahekanim wek alayekî spî
beramberit hellbirrim
Xewnekanîşim wek baweşêk gelay piwaw
le ber pêt da hellirrêjim.

* * *

Jine azîzekem Pênêlopê! (*)
Le mêje şerreke tewaw buwe, keçî hêşta
aştî nehatuwe,
Bîrim nayet le keyewe be cêm hêştûyit
Min zeman û rêgay gerranewem win kirduwe.
Be aso da derrwanim û hîçim le bîr nîye
Ne diwa jiwan
Ne rojanî samnakî şerr
Ne şeketî û winbûnî naw gerdelûl û ziryan.
Êsta bêbakim le siza û nefretî ((Posêydon))
ke deryay be gij da kirdim
Nawî hawrrê kujrawekanîşim le bîrnîn
ke neyanzanî bo be şerrhatin,
Neyanzanî û neşyan pirsî bo debû bimirin!
Pirsînî çî?

Katêk çarenûs tîrêk bêt le kewanî xudawend da.

* * *

Jine mîhrebanekem Pênêlopê
Min bê mebest be aso da derrwanim û hîçim le bîr nîye.
Diway to çîm mawe be xeybî bispêrim?
Kiwa razêkim laye bo rûnakîy bidirkênim?
Min şiwênhellgirî ciwanî bûm
Xewin berew însanî birdim.
Evîn berew to
Bê to ne satêk le zeman şik debem,
ne cêgayek le şiwên.
Şitekanîş be diway yek da pertên debin û
diriz dexene bûn û naxewe.
Nemdezanî evîn hênde pirr fîtne û jan e û
deşêt em şerre bêkotaye binêtewe
Nemdezanî lêkdabirran em birîne ebedîye dexate gîyan.
Ger bibînît çi xollistanêk e cestem!
Ger bizanît çi sarayek e roh!

* * *

Pêş spêde dexwazim bigemewe lat
Xewnekanim weku çepke gullî jakaw
le ber pêye ciwanekanit da hellirrêjim
Belam ax jine hêjakem! Rêgay gerranewe
le jiyan dirêjitir e.
Min le seferî bêkotayîm da zemanim win kirduwe
Le durgeyekî sara da be boşayî da derrwanim
Min cîhanim birdotewe, keçî xomim dorranduwe.

## Şewrrew

Razî êwarey le gell xoy bird û negerrayewe.
Êsta le nêw zemanêkî xollemêşî da rakişawe
Nîgay rengî payizîyan girtuwe
Tem be ser cestey da
be ser şepolekan da dekşêt
Tarîkî kêllgey estêre detenêt
Tarîkî gerdûn wek çallêkî qûll pirr dekatewe.
Le awêney şepolekanewe xoy debînêt
ke wek tarmayî le nêw aw da dêt û deçêt
Şewba areqey ser ruxsarî desrrêt û
gelabaranî dekat.
Şewba diwa çirkey payîz le gell xoy debat.

Êsta tenya û sergerdan e
wek perresêlkeyekî sermabirdû
ke le wilatêkî dûr da
hawînî win kirdibêt.
Şepolekanî şew cestey deşonewe
Ruxsarî genimrrengî, rengî tawêrî girtuwe.
Wek xewbînerêkî bêdar bê mebest derrwanêt:
Bo ew ballinde awiyaney ke le kenarî xewin da
rûnakî dexonewe
Bo ew şepolaney berew şiwênêkî nadîyar
deryayan pêş xoyan dawe
Bo feza ke le reşmallêkî baranawî,
yan le bîyabanêkî şewîn deçêt
Bo tenyayî
Bo ew tawêraney le nêw dillyan da
Rûnakîy hemû serdemekanyan heşardawe
Bo ew direxte tenyayey liqekanî benêw hewr da çûn
Bo ew sataney wek dillope baran be tînwêtî da
şorr debinewe

Bo temen ke be wêraney zeman da dekşêt û
boşayî direwşawe dadepoşêt
Bo xudî xoy derrwanêt
ke rengî tellxehewrî girtuwe.

Min le sereta da hemû şitêkim bînî:
Katêk le sûtan da balam dekird û
le mirdin da le dayik debûmewe.
Katêk mindallîm le nîwey rê girruy girt û
le dalanî tarîkî tirs û nehat da sergerdan bû
Mindallîm le goşeyekî zeman da cê ma,
Lawyetîyşim be diway ew pasarîyane kewt
ke ceng beyan û darekanî
lê zewt kirdin.
Min wek segêkî ber çorrawgey kolanan manay sitem û
birisîyetîm zanî.
Rojan, êware û werzekanîşim be nore taqîkirdinewe
ke bêbakane gullî temenyan deçnîyewe û
wek yarêkî bêwefa be cêyan dehêştim.
Tenanet evîn û bawerr
ke wek nenasêk piştîyan têkirdim.
Tenyayîm nasî ew sataney wek gelayekî werî û tezî û
le bestellek da helldelerzêm û
be peroşewe çawerrêy hîç bûm.
Le tenyayîm da hawarim bo diwaestêrey şew dekird:
Merro!
Ewe amêzim ke wek feza awalle ye
Ewe destim ke şewyan hellgirtuwe
Ewe cestem ke wek êwarezistane
şelallî bulêlle.

Êsta tenya ye xoy be rêkewit despêrêt
Wek estêreyek ke le qûlayî şew da
rêgay win kirdibêt,
Be diway spêde da dillî şew depişkinêt
le ser rûperrî bîr yadêk denûsêtewe
Le pirr yadêkî be gurrtir deysirrêtewe
wek çon şepolêk şepolêkî dî desrrêtewe.
Diwa peyvekanî bo boşayî dedirkênêt û
bo naxî xoy derrwanêt
Le xoy depirsêt:
Çon be şitekan mitmane dekeyit?
Çon be rûnakî gîyan deşoytewe?
Le xoy depirsêt:

Çon le gell şiwên û zeman helldekeyit?

Êsta şeket û tenya ye
wek rûbarêk ke her derrwat û derrwat
keçî qet nagat
Tînû ye wek xakêkî dêmekar,
bo ew hewrane derrwanêt ke:
Şîtall Şîtall
le nêw dillî şew da detwênewe.

Biruskeyek tarîkayî let dekat
Ew çingî pirr dekat le rûnakî û
ruxsarî le ber dillopî terrî rûnakî da radegirêt
Şew kitupirr gemaroy dedatewe û
sertapay şelallî tarîkî debêtewe.
Wek dirextêk ke liqekanî le jêr befir da nûstibin
Wek agirêkî xumarîn, bo qûlayî şew derrwanêt
Bêbakane derrwanêt û
baweş bo çarenûs degirêtewe.

# II

## Pencereyek dekemewe

Pencereyek be ser peyvekan da dekemewe:
Ruxsarim nuqmî tirîfe ye
Evîn: Xellwetga
Qersîl: Textî xew
Şewîş le nêw destim da: Spêde ye
Şew şepolêk e rûnakî hellgirtuwe
yan herêmî zayelle ye.
Pencereyek be ser rûnakî da dekemewe.

## Geda

Êsta: Spêdey beyane, yan direwşanewey tarîkî
Şiwênîş: Berderga astengeket
dezanim lewdîw êstawe zemanêkî dî nîye
Lewdîw êrewe bo min hîç şiwênêkî dî nîye
Minî gumirra
ke mergî xom rênîşanderim bû
minî geda
ke bermallekem le ber dergaket raxistuwe
Le destekanit siwalldekem
Siwallî şite le destçuwekan û
sate le nakaw winbuwekan
Siwallî rûnakî
Siwallî azadî
Siwallî ew peyve bê wefayaney
qet nehatine jiwan.

## Bînîn

Rûnakî le ser pêllwekanit
Dahatû le ser destekanit
Şewîş reşmallêkî çollkiraw e
Evînî to awedanî kirdotewe.
Baskim bo tirîfe raxistûn
Şew bon dekem
Pelke gullêkî werîw bon dekem
Ke dellêy çawerrêy şitêke
hellmî daristan û
ew şepolane bon dekem ke şewba
rûtîyan dekatewe.

Le çawekanit da feza awêne ye
Pirsîyarekan bêkotayî
Zemanîş zayelle.
Min dahatû debînim
Jiyan û mirdin debînim.

Rûnakî le ser pêlluwekanit
Jiyan le ser destekanit.

## Azadî

Bo azadîm degerrêm û
destekanim be cestet bêdar debinewe
To cewherî şitekanît
Fezay xewin û xellwetî gîyan.
Cestet gullûkî rûnakî girtuwe
Destekanit dahatûyan wek awêne
beramberim ragirtuwe.
Rûnakît qîbley ebedî me
Bendbûnim le to da azadî me. (*)

## Werzêkî niwê

Bejin zirav wek tenyayî
Niwê wek beyan
Mehall wek efsane û rastî.
Destekanit şêwazêk deden be zeman
Nîgat manayekî tir be peyvîn
Peyvînî rûnakî, ke werzêkî niwê ye
bo xewin û evîn.

## Zemanî evîn

Êsta her ême lêre mawîn
Her êmeyin goşegîr, jiyan le raman degirîn,
Sayeman: Çillêk hetaw e
Qîbleman: Şepol
Cesteman: Kitêbî êware.
Her şitêk zemanî xoy heye
Êwareyiş: Zemanî evînî ême ye.

## Beyanî bû wek êsta

Beyanî bû wek êsta
ciwantirîn sat bo winbûn:
To le çawerrwanîy min da
minîş le soraxî hîç da
Beyanî bû wek êsta
ne hetaw bû, ne sêber
Ne bêdengî, ne peyvîn
Ne kotayî dîyar bû, ne sereta
Be tenya rêyekî walla û
dû cestey şeket
Dû tarmayî direwşawey
satêkî ewdî û zeman.
Lewdî û satekanewe
bulêll û çawerrwanî bû
Wek kiwêr destim degêrra
Çingim pirrî boşayî bû
Pirrî guman û tirs
Pirrî bêkotayî bû
Lewserî mewdayekanîş
to dîyar nemayit,
Zeman westa
Beyanî bû wek êsta

## Tablo

Le ser ruxsarî tarîkî şêwet debînim:
Pirrbûnewey boşayî
Birîskanewey dillopêk rûnakî
Gullegenmêk ke rengî tirîfey girtuwe
Jîlemoyekî xewallû
Estêreyek ke debîndirêt û nabîndirêt
Hengawî zeman û
lêwarî bêkotayî
le ser tarîkî şêwet nexiş dekem

## Dahênan

Le kiwêwe ew hemû rûnakîyet hênawe?
Kiwa şewekanim ewende direwşawe bûn?
Kiwa asmanim samall,
rojekanim hênde rûnak û
sûtanim billêsedar bû?
Kiwa temen şiwênewarêkî le diwa cêmaw e?
Em hemû rûnakîyet çon dahênaw e?

## Jiwan

Şepolekan kokerewe!
Kiwa lêre derfetî raman û peyvîn,
mewday riwanîn
yan penayek bo roh mawe?

Kiwa êre to dallde dedat
çawerêyî çît?
Key daristan le xemî xokuştinî
ballinde da ye?
Kiwa derya termî xinkaw dedatewe
Key kenar giwê bo hawarî
şepol helldexat?

Çawerrêyî çît?
Şepolekan kokerewe!
Le wê hemûyan çawerêt in:
Ew ballindaney mestî seferin û
be ball rûnakî degwaznewe,
Ew kanyaney dillî tawêryan let kirduwe,
şefeq û hewir ke be xot deçin
Razî sped û şêwan
Derya ke le berpêy aso da rakişawe
Şînîy asman
Sewzayî daristan ke wek aso û awêne ye
Xokuştin û
gelay werîwî ser şeqam
Şewîş le amêzt da
cesteyekî wirujaw e.

Şepolekan kokerewe!
Norey koçêkî dîkeye
Êsta xewin rênîşander e
Ciwanî behaney sefer e
Wadey jiwanêkî dîkeye.

Çawerrêyî çît?
Le wê rûnakî şewnişînman e
Rûnakî awêney evînman e

## Şewçira

Serewjûr be rêgay temen da
Serewjêr be nêwan şepolî zeman da
Şewane
le penay aso ra xewnekan wek xunaw
deruber terr deken
Wek polêk ballindey dinya gerr be ballîyan
werzekan helldegirin
Xewnekan wek nemamî hetaw
gullûkî rûnakî der deken.

Şewane
be ballî xewnekan zemeneberdîne û xollistan cê dêllîn, rê dekeyin, be penay aso da,
be nêwan hewrêkî zîwîn da ke balay şepol û lutkey dirextî tenîwe.
Le baxçey wenewşe û xunaw da le gell mang çawşarkê dekeyin û colane helldexeyin,
deykeyne hêlaney bulbul û rûnakî. Bo jiwanî mindallî, kazîwe le dill da helldegirîn.
Çepkêk gull deçnîn, şepolêk dekeyne awêne.
Bo roxî rubarêk mil denêyin tirîfe û estêre le nêwîya xo deşon.
Le penay hewir da xo degirîn, hewreke debarêt be bonî baran û dirext mest debîn.
Cesteman gull degirêt cesteman wek gela sewiz debêt.
Berew rûy eşkewtêk mil denêyin tarîkî zarkekey tenîwe. Detirsêyin radekeyin, şepolêk wek esp taw dedeyin, tarîkî ser rêman pê degirêt, xar dedeyin.
Xar dedeyin degeyne ber tavgey xoretaw.
Le nakaw weku dû çolekey ballzêrîn pêkewe girr degirîn, le germey semay ber hetaw û baran da girr degirîn.  Nasutêyin debîne dû ask, dû sêber be pirtaw be fezay mehall û şeqamî payiz da ret debîn. Le deştî zêrrînî beyan da windebîn.

Jiwangeyek le rûnakî

Baxçeyek le rûnakî
Tavgeyek le rûnakî.

Şewane
le rêgay mehall da
dû gumrra be rêkewit pêk degen
Le peyv û evîn û zayelle
zemanêk çê deken
Pêkewe ta ebed rê deken,
Rê deken.

Serewjûr be rêgay temen da
serewjêr be nêwan şepolî zeman da
Dû şeyday şewnişîn, dû gumrra
gîyanîyan wek zayelley şewane
Cesteyan: Şewçira

## Perelêl

1

Le penam da rakişawît
Cestet: Bilurî temgirtû
Ruxsarit: Xewnistan
wek dû kenarî beramber yekîn
Şew rûbarî nêwanmane
dellêy dû hêllî perelêl în û
boşayî nêwanman
behaney bûnman e.

2

Le penam da rakişawît
Razêk le çawekan da
dedrewşêtewe
Min lêre nîm, dûr derrwanim:
Bo naxî boşayî
Bo rabirdû, ke awêney êsta ye
Bo mewday nêwanman
derrwanim û tarîkî dexwênmewe
Be bêdengî le gell cestet
le gell xom dedwêm.
Weku şepolêkî avrrêm
şeketane berew kenarî to dêm

3

Lewdîw cestetewe: Boşayî
Kallbûnewey sinûrî nêwan
bûn û nebûn
Lewdîw nîgatewe: Gumirrayî û
gumrrayî

4

Le penat da weku termêk rakişawim
Dinya aramew
Namobûn: Taman
Dellêy şew tateşorêk e û
bêdengbûn: Zêwan.

5

To wek rûnakîyit:
Natwanim bitgirim
yan wek tarîkîyit
natwanim lêt derbazbim.

6

Le penam da rakişawît
Tewêllit le sirewtin da
gullûk e xewnî girtuwe
Memkekanit le nêw tarîkî da
wek dû estêrey be cirîwen
Henaset şew gerim dadênêt
Nîgakanit hendê car pertim deken
Hendê carîş awedan im dekenewe û
rûnakî deden be zeman.

7

Çon bitwanim lêt azad bim?
Ke weku perelêlêk în
Boşayî nêwanman nîşaney bûnman e
Çon bitwanim bitgirim?
Ke dû kenarî beramber yek în
Rûnakî rubarî nêwanman e.

# III
# Şewane

## Destekanit nagene şew

Destekanit nagene şew
gela dekeyte bermall û
tirîfe be awêne!

Destekanit nagene şew
hewrêkit poşîwe
Sirûdekanit bonî xokuştinyan lêdêt
Dirûdekanîşt dîyalogî bêzar în.

Eme çi seretayek e
ke nagate ber derwazey guman?
Nagate ew şepolaney be xot deçin?
Eme çi seretayek e
ke netbate xellwetî peyvekan?

Destekanit nagene şew!
Temenîş berdebazêk e
le naw golawî zeman da
be ser goreket da birro!
Ke manit tenya rêkewte
le perawêzî rêkewt da.

## Gerranewe

Ew bo pirsîn gerrayewe
Le kenarî xokuştinrra gerrayewe
Pirsî: Be bîrit dêt jiyanman le amêz degirt?
Le kolane barîkekanî temen da
çawşarkêman le gell ayinde da dekird?

Be bîrit dêt şepolekan serînman bûn?
Heqîqet: Mallêk bû bo hîwa,
asoyek bo têrraman?
Şefeqîş: Memleketî gîyan?

Be bîrit dêt pasarîyekan be cirîwey pirr xiroşyan
beyanîyan dênaye nêw jûrekeman?
Le siruşt da bo sîmay mindallîy degerrayin?
Razekanî bûn û
dahatûman dexwêndewe?

Be bîrit dêt le nêw dillman da
êwarekanman pena deda?
Hogirî ew tawêrane bûyin ke berengarî şepol û
tînî sutênerî hetaw û
zeman debûnewe?

Le lêwarî xokuştinrra gerrayewe
Pirsî: Bo ((Kesêk lew qulayîyewe nehatuwe? (*)
Pirsî: Bo temen ewende kurt û
rojekan hênde dirêj in?
Boçî zeman tonêllêkî daxiraw e?
Roh awêney şitekan e û
ceste jêrdestî û kelaw e?

Ew bo pirsîn gerrayewe
Amêzî bo rûnakî girtewe,
Bedem bize û ramanewe
baskekanî be ser şefeq û xeyb da
şorrkirdewe.

## Şewnişîn

Şewim xistote ser ranim
dellêy agirdanêk im
bo jîlemom derrwanim.

Tarîkî sinuwekanî bînîn detenêt
Baran direxte xewtuwekan bêdar dekatewe,
Serma tawêrekan.
Minîş giwa bo rengekan helldexem û
bo naxî xom derrwanim.

Deşêt em xollbarane naw binêyin: Behar
Deşêt tem bikeyin: Be demamik,
Şew bikeyin: Be mall
yan be fezay gîyan.
Belam kiwa ajawe be lojîk lêk dedrêtewe?
Çon em boşayîye bê kotayî ye
be ceste pirr debêtewe
Kiwa mirdin perawêzêk bo azadî dêllêtewe?

Êsta tenyayî wek ala helldebirrim
Şew betirîfe dadepoşim
cestem be bulêll.
Ne çillêk hetaw ciwanî debexşêt be xollbaran
Ne sirûd şanazî be nîştiman
Daristanîş dillî pirr razî xoy nakatewe
bo hewre gerrokekan.
Îtir bo ballindey serhellgirtû
le bîrî gerranewe da bin?
Bo bawerrbênîn be beyan
katêk gizingî xoy perrewaze dekat?
Ême bo bimirîn
katêk mirdin manayek nadat be jiyan?

Şewim xistote ser ranim
dellêy agirdanêk im
bo semay xollemêş derrwanim!

## Şewekanim

Şewekanim wek kitêbî xeyb degirmewe:
Şewekanim gullûk in le baxçey zeman da
Zayellen le daristanî bêdengîrra helldeken
Gerranin bedway xom da
Bediway winbûn û
regî rûnakî da.

Şewekanim awêney gîyanin
Her ewanin
gunahekanim denêjin
Her ewanin
le dillyan da razekanim deparêzin
Şewekanim dîyalogî nêwan roh û cesten
Le rûy xom da
Le rûy bûn da
Pirsîyar in, şewekanim.

* * *

Şewekanim sefer in berew naxî xom
Berew serçawey şepol û
hewrazî guman
Berew herêmêkî nadîyar
ke le wê, xoman serdarî temen în
Xoman xudanî zeman în
Le wê şew fezay azadî ye
Jiwanêk e le gell ebedîyet da
Şew aramtirîn penage ye
yan ciwantirîn sate bo xokuştin.

## Leber baran da

Sêbereket leber baran da raxistuwe
Peyvekanî biruske dexwênîtewe
Baran cestey tarîkî deşwatewe
Şew awêne ye û
sîmat tirsêk terrî kirduwe
Razêk rûnakî kirdotewe
Le nêw destekanîşit da
estêreyek nustuwe.

## Gumanbar

1

Çingit pirrî xollemêş û xewn e
Nîgat pirrî pirsîn
Tirîfeyiş le ser tewêllit.
Tenyayit wek estêrey şew
detewêt be dem tenyayî û ramanewe
peyvînî rûnakî û
razî derûn rave keyit.
Le ber rûnakîy sewzî gela da
detewêt be gunah
ceste serwer keyit.

2

Şew belemî tenyayî ye
Tallêk rûnakî rêçke ye
Toyiş cêgayek be xot nagirêt
dillit pirrî peşîmanî û xem e.
To detewîst be zimanêkî dî bidwêyit
Detewîst razêk bo serdem bidirkênît
yan pirsîyar bikeyit:
Le manaw bêmanayî rastî
Le lojîkî siruşt
Le bûn û ebedîyet,
Detewîst le nêw dillî rûnakî da
şetllêk tarîkî birrwênît.

3

Wek kolanêk ke hetawî nîwerro letî kirdibêt
Nîwet sêber / nîwet hetaw
Dillîşit pirrî çawerrwanî û xem e
Detewêt bo xot, bo her kesêk
şitêk bidirkênît
Detewêt le wêraney ceste da
dîyalogî roh dabênît.

# Awêne û sêber
# 1996

## Pirsîyare bê welamekan

***Bo bawkim***

Kilwebefirekan be ser êware da debarên
Kilwe befirekan be ser ceste rûteket da debarên û
diwa satî temenit dadepoşin.
Min be pencey mindalanem tabloy cestet
le ser befir dekêşim
Ew cesteyey dirzêkî xistote êware
Ew cesteyey wek xetêkî zîwîn
be bolêllewe dîyare.

Kilwe befirekan be pirtaw debarên: Be ser tenyayît da
Be ser firmêskekanî daykim da
Be ser mindallîm da
Be ser ew xellke toqîwe da ke le hewşekeman
aporreyan dawe
Be ser xemnaktirîn êware da debarên û
debarên

Ne êware le peyvînim degat
Ne ew direxte tenyayey jêr serit
ke befir gelay girtuwe.
Min le kolanî beyan da ram dekird
le nakaw be ser termeket da kewtim
Be ser çarenûs da kewtim
Êsta le jêr em feza lêlle da
min rengî termim lê nîştuwe
Gumrrayek im
dahatûy xom winkirduwe.
Le jêr em feza lêlle da
dellêyî dû dîl în, dû koyleyin
rêkewit pêkman namo dekat
Çarenûsîş, le dûrryanêkî ebedîy da,
berew dû winbûnman debat.

Kilwe befirekan be pirtaw debarên
Toyiş leber sermay êware da wek xaçêkî kewtû,
yan wek sawayekî rût bêbakane rakişawît
Bêbak le çarenûs
Bêbak le zeman
Bêbak le dahatûy min
Bêbak le dizenîgay dost û dijmin

Êsta rûtît û kilwe befirekan cestet wek kêllgey
pemo spî deken
Wek kifnêkî dirraw datdepoşin.

To zû hatît...
Be ser cîhanêk da kewtît le nêwan rastî û efsane da bû.
Rêgayekan be şewêkyan despardît ke mang û estêrekanî xoyderretand.
Mindallêk bûyit le mindallît bêzar, le korrewî şewe
qetranîyekan da mindallît degorrîyewe be camêk şîr û letêk nan,
Lawîyetîşit le bazarrî bêkarî da, le meydanî şerr û
sengerî heres da becêdehêşt.
Geştêkî çend bê mana bû! Be nêw tarîkî û teputozî
rojgar da ratdekird û sege birsî û lerrekan hawellit bûn. Segekan diway to dekewtin, toyiş xot be xeyb û tenyayî despard.
Ratdekird û rêyekan hellîyan degirtît, mêjûyek berokî degirtît le xollemêş tellxtir bû.
Zû hatît û temenit dîrokêk bû: Xewin û hesret û evîn deyan nûsîyewe...
Tabloyek bû: Ceng û stem deyan sirrîyewe.

Geştêkî çend nawext bû.
Katêk hatît be ser tênwêtî da kewtît...
Be ser wilatêk da kewtît ke
be zebrî niza û sitem û derwêşî ragîra bû
Wilatêk le sêberî minare da serbirra bû.
Rojekanit çawerrwanî û rêkewit zewtîyan dekird, şewekanîşt tirs û bêdarî.
Katêk hatît: Tînuwêtî werzî pêncem bû, tînuwêtî fezay serdem bû.
To le şewî zuqmawî da be gunah xot gerim dekirdewe. Le xollbaran da
be evîn tînuwêtîy xot deşkand û,
wilatîş be xwên û efyûnî ayîn û
aydolojîya.

Geştêkî çend xurafî bû.
Tînuwêtî nisêy temen bû.
Tînuwêtî sîmay zemen bû.

Zû hatît û jiyan rotînêkî rût bû
Jiyan geştêk bû be nêw rêkewt da,
Seferêk bû berew mehall. Tenyabûyt û le şewe qetranîyekan da tenyayî xot dediwand.
Tenyayî fezay azadî bû. Tenyayî çiray
şewanew hawrrêyî sefere dûrekanit bû.
Tenyabûyit û berew mehall ratdekird. Rêyekan rênîşanderêkî napak bûn, bêbakane, le herêmî serab da winyan dekirdît.
Tenya bûyit û roje şeketekanit le kolanî xurbet û tenyayî da denaştin û
tenyayît be ser şitekan da debeşîyewe
Le ser cestey mindalanet ayindet denûsîyewe.

Aşiqêk e wêll, be zeman namo
Hîkayetêk e pirr xem û nisko
Mewda dûrekan be roh helldegirêt
Xoy dedate dest razî rêkewt û
xewnî sererro.

Aşiqêke wêll, be mêgel namo
Dahatûy fezay xeyb û xurbet e
Rabirdûy gillko.
Le tenyayî da
Şewnim û gizing bo beyan dênêt
çawî debirrête êware û aso.

* * *

Kilwe befirekan be pirtaw be ser cestet da debarên
Toyiş le jêr gumezî êware da rakişawît
Tenya û bêbak, rût û xemnak rakişawît
Zuqmî êware tezûrrêjit dekat
Kilwe befirekanîş wek kifnêkî dirraw
cestet dadepoşin.

Êsta rûtît le beramber çarenûs da
Rûtît wek ew sate pirr (Wecd) aney le çirkeyêkî lezet da
zemanit çirr dekirdewe
Le tarîkîy şewe zuqmawîyekan da
dahatûy xot be evîn û bîrçûnewe despard û
le nêw gunahekant da dadegîrsayit.

Killpey nêw sopayeke damirkayewe û
 jûreke bowe bestellek.
Xwaye em şewe çon be ser deçêt?
Meger dîyalogî ceste zuqmî em şewe birretênêt?
Bebê gunahî lezet çon temen têdeperrêt?
Çon em rohe wirujawe
aram debêtewe?
Killpey nêw sopayeke damirkayewe û
şeweke bowe bestellek
To le germey dîyalogî ceste da
le satêkî wirujanî gîyan da
zilleyekit da le zeman û
şiwênewarêkit cêhêşt le nêw qûlayî û nêw zeman da
le ser cestey şewe qetiranîyeke.

Eme rêkewt e, yan çarenûs?
Êsta min be agirî gunahêk desûtêm
gunahî min nîye
Bacî hejanêk dedem ke to sardtirîn şewanî zistan û
herêmekanî rohit pê gerim dekirdewe.

Eme rêkewt e, yan çarenûs?
Êsta min estêreyek im
medarî xom win kirduwe
Birînêk im
tarîkî sarrêjim dekat
Xetakarêk im
rengî gunah û şewim girtuwe

* * *

Kilwe befirekan be pirtaw debarên:
be ser ceste sirreket da
ke bistêk le tateşoreke dirêjitire
Be ser pirsîyarî mindalanem da
Be ser ew awe şiletêne da ke mirdûşoreke debengane le ser cestet roy dekat
Be ser dirêjtirîn êware da debarên û
debarên
To çon bergey em bestellek û tenyayîye degirît?
Çon le gell em tarîkîye ebedîye da helldekeyit?

Êsta temen pirdî nêwan dû boşayî ye
Temen wilatî hesret û
gumezî tenyayî ye.
Min le êware rademênim
Derrwanim û nabînim
Nabînim û derrwanim
Kiwan ew rojaney leber baran da dadegîrsayit û beramberî
xorawabûn le dayik debûytewe?
Kiwa ew amêzey şewane deykirdîtewe be mindall û
le nêw colaney tirîfe da ray dejandît?
Ew evîne çî be serhat ke xewne mehallekanî
wek melotke dexiste ser ranit?
Le kiwên satî dagîrsanî ceste û
wirujanî gîyan?
Le kiwên lezete nemirekan ke dirêjtirîn şewîyan
le çirkeyêk da çirrdekirdewe?
Le kiwên rewe gunah û
tezuwe ebedîyekan?

Le kiwên?
Le kiwên?
Bo hîçyan tirsî ser ruxsarit nasirrnewe?
Bo hîçyan skalayek le gell rohî killollit naken (*) û
cestey tezîwit gerim nakenewe?

Kilwe befirekan bê bakane debarên
Min xewnekanî mindallîm le nêw befir da ko dekemewe
demewêt tabloy ruxsarî nûranît
le ser bulêll bikêşim
Demewêt be pirsîyar cestet gerim bikemewe
Demewêt be guman rohe şipirzeket bişom û
le balay êwarey bigirim.

Çi jîrîyek bû hênde zû hatîn! Rêgayekan delîlêkî gemje bûn û winyan kirdîn.
Mindallîman le nawext da be cêy hêştîn
Mindallîman le nêw
şeypûrî şerr û le hewrazî hesret da perewaze bû.
Lawîyetîşman ber nefretî ayîn û aydiyolojîya kewit.
Ême be namoyî le dayik bûyin: Namobûyin be xoman... Be serdemî mêgel... Be mêjû…
Be heqîqete durruwekan. Ême namoyane gewre bûyin!
Temenêkî çend dorraw bû! Azadîman gumrray kirdîn, Azadîman berew dîlêtî debirdîn.
Ême bo ezmûnge kîmyayîyekan dadebestirayin.
Yekemîn kujrawî şerrekan ême bûyin.
Dekujrayn û ser le niwê bo
şerr û bezîn û ciwanemergbûn le dayik debûynewe.

Geştêkî çend bê mana bû.
Temenman: Şewêk bû mangekey xoy torandibû...
Yan mangêk bû tirîfekanî xoy naştibû.

Zû hatîn û be ser çarenûs da kewtîn.
Wilat xurafîtirîn heqîqet bû. Wilat nemamêkî şikawey tînû bû le rûy gerdelulî bîyaban da...
Momêkî kujawe bû le tarîkistanî ayîn da.
Hatîn û be ser wêrane da kewtîn:
Wêraney zeman… Wêraney mêjû… Wêraney temen... Wêraney ceste û roh... Wêraney rewişt... Wêraney evîn û wêraney wêrane...

Pirsîman eyême le gell kê zemawend bikeyin?
Pirsîman çon le nêw em wêranistane da mindallîman bidozînewe?
Pirsîman çon bitwanîn em aso xolawîye rabigrîn?
Pirsîman eme çi xwênêkî beleseye, ke tenya be xwên tînuwêtîy deşkêt?
Pirsîman eger mirdin take yeqîn bêt, eger xokuştin diwaperdey em komêdyaye bêt, eyême le pall kam kelawe da bimirîn?

Pirsîman û pirsîman...
Geştêkî çend bê mana bû!
Pirsîman û tenyatir bûyin…
Pirsîman û namotir bûyin.
Babe gîyan!
Eme aso bû çawman têy debirrî,
yan tateşor?
Eme wilat bû pêt bexşîm,
yan gorr?

Katêk hatîn be ser ajewe da kewtîn… Be ser winbûn da kewtîn.
Jiyan geştêk bû be nêw sitem û hesret û rêkewit da, evînîş tawan û mehall.
Tenya bûyin û rastî û evîn amancman bûn…
Tenyayî fezay azadîman bû. Eme rêkewte, yan çarenûs? Êstayiş tenyayin...
Ême dû dîl, yan dû koyley?
Tenyayin û narrewayane hukimdiraw în:
To hukimdirawît be mirdin, minîş be jiyan.

Ême dû tenyay hukimdiraw în û dûrryanêkî befirawî
koman dekatewe...
Zeman wek dirrketelî sinûrekan lêkman dadebirrêt...
Zeman sinûrêkî ebedî be nêwan cestew gîyan da dekêşêt.

Herdûkman tenyayin be zeman namo
Dû hîkayet în pirrxem û nisko
Ayinde fezay xeyib û xurbet e
Rabirdû gillko.
Le tenyayî da
mewda dûrekan be roh depêwîn
Çawman debirrîne êwarew aso.
Dû berzefirrîn
be xoyişman namo!

* * *

Kilwe befirekan şeketane debarên:
Be ser dirêjtirîn şew da
Be ser firmêskekanî daykim da
Be ser mindallîm da
Be ser pirsîyare bê welamekanim da
debarên û debarên
Le nêwan kilwe befirekanewe
aso şêwey tateşor degirêt.
Temenîş gumrrayane

bo dahatûy xoy degerrêt.
Ewe bo amêz lem kêle şikawe dedeyit?
Bo ser bem gorre tepîwe dekeyit?
Eme gorr e, yan şiwênewarî neweyekî win bû?
Eme tateşor e, yan sîmay umrêkî babirdû?

Kilwe befirekan şeketane debarên
Min mindallîm be befir despêrim
Tabloy cesteyek dekêşim
Tarîkayî deşlleqênêt
cesteyek ke dirzêkî xistote aso.
Dexwazim jiyan bikeme topellebefirêk û firrêy bideme
nêw boşayîyewe
Dexwazim cestet bikeme pirsîyarêkî ebedî û
rohit le guman hellkêşim
Dexwazim be cestey mindalanem
pêş be zeman bigirim
Dexwazim be kull bigirîm...
Bigirîm
Bigirîm
Toyiş bêbakane
le jêr kilwe befirekan da rakişawît
Dellêy melotkeyekî nustûyit û
şew raydejênêt
Rakişawît bêbak le Xuda
Bêbak le zeman
Bêbak le xeme reşpoşekanî daykm û
le dahatûy min.

Kilwe befirekan bêbakane debarên û debarên
Minîş gumrrayek im
dahatûy xom win kirduwe
Çille gîyayek im
le ser tawêrêkî nustû riwawim
Xetakarêk im
rengî gunah û şewim girtuwe.
Ne şew le peyvînim degat
ne ew direxte tenyayey jûr serit
ke befiregelay girtuwe
Ne cestet manayek dedat be bûn
ne pirsîyare bê welamekanî min.

## **Mewday nêwanman: Wilat me**

I

Ême le petaw ajawerra hatînewe
Xewnekanman be derya spard û belemekeman be kenar
Ayindeman kiwêrêk bû le nêw zeman da pelî dekuta
mêjûşman gorêkî bê şiwênewar.
Le cenge dorrawekan da xoman be rêkewit despard û
mewdakanman bizirdekird
Balaman wek alayekî spî le ser dund û
le nêw tarîkî û
beyan da helldebirrî.
Çekekanman deda be paketêk cigerey Winston
Serkirdekanîşman wek kirase dirrawekanman degorrîn.

Wêrane bûn herêmekanî xewbînîn
Efsane bûn ayetekanî evîn.
Hatînewe bo sereta
Alakeman: Teputoz e
Çarenûsman: Çawerrwanî
Rojekanman: Fezay boşayî û xurbet in
Tabloyêk in le hesret û peşîmanî.

II

Be tenyayî hatînewe
Ayindeman perewaze bû le ser rêgay baran
Gorrekan le rûy reşeba û zuqim da awalle bûn
Termekanîş bo tenyayî û
dall û ziryan cêman.
Hatîtewe
Ne manayekman da be bûn
ne nawnîşanêk be xewin û beyan.

Be tenyayî hatînewe.
Berew ew êwareyey mewday nêwan wehim û rastî desrrêtewe
Le tarîkî da be diway segwerr û awedanî da degerrêyin
Le ser rûy gelawerîwekanîş
ayinde dexwênînewe
Çawerrwanî baranêk în gunahekanman bişwatewe.
Ême le çawerrwanî da xoman win kird
Serman be şostey tenyayî kird û
xewnekanman leber zerdey xoretaw da awalle kird.

Êware bû
Razêkit be giwêy min û sirûşt da çirpand û
wek rûnakî rijayte nêw rojekanmewe
Wek hesret û çawerrwanî temenit dapoşî.
Êware bû
To rengî xorawabûn û
min bonî sinewberim girt.

Ke tom nasî xom bizirkird
Ke tom nasî xom dozîyewe
To ne manayek dedeyit be bûnim,
ne bêmanayî
Ne be cêm dêlît ta bimirim,
ne evînim pêdebexşît ta bijîm.

Çi rêkewtêk bû? Bew gunahe terrî kirdîn
Kam dûrryan bû? Berew dû winbûnî biridîn
To: Cesteyek le gîyan hellbirraw
Min: Gîyanêk le ceste bêzar û toraw
Min le mêgell helldehatim û le soraxî
tenyayî da bizir debûm
Le ser rêgay beyan herêmî hesretim depişkinî
Le ber baran da desutam û
be semay gizing radebûmewe
Tenyayî xom le ser gullegenim û baran denûsîyewe.

Tenya bûm û
le efsane da bo rastî degerram
Le firîşte dûrruwekan da
ruxsarî sozanîm bedî dekird
Le janî sozanîş da
peyamî firîştem dexwêndewe.

Ewey koçêk le nêw teputozî zeman da perrewazey kird
Ewey be diway mehall kewt û
ta ebed negerrayewe min bûm.
Gemeyekî çend seyr bû!
Peyvîn corêk
Nîyaz corêk
Kirdarîş corêkî tir bû
gemeyekî çend seyr bû!

III

Tenya bûm û
be ser temenî xom da gerramewe
Evîn: Reşmallî tembellî û pirdî nêwan
dû boşayî bû
Zemanîş: Koç û awerro
Xwênekem: Tallêk gizing bû
Cestem: Aso.

IV

Terim bû le çawerrwanî û hesret da le dayik bû
Efsane bû ew werzey bedem nefretewe
pêşwazî lêkirdîn
Le ser baran tabloy wilatêkman kêşa efsane bû.
To çît dawe le efsane û ajawe
Le waney le her penayek firîşteyek hellkewê
berew şêtbûn
yan berew sozanî bûnî deben.
To çît dawe le waney temenî xoyan be boşayî û
gumrrayî da helldewasin
Le waney le dewrî derbar xirr bûnewe
ewan çûn ta neyenewe
çûn serwerîy xolawî xêll le ser aso
le ser ceste û
xorawabûn helldekollin
Le jêr sêberî şimşêr da mêjû denûsnewe.

Tenya bûyit û be ser temenî xot da gerraytewe
Êsta wilat berew kam winbûn debeyit?
Le kam zongaw da bo mêjû degerrêyit?
Êsta tenyayit wek qerecêk ke tenya le goranî da
wêney wilatî xoy dîwe
Tenyayit weku şehîdêkî bê naw ke jinekey
cestey firîşteyîyaney xoy defroşêt bo nanî jiyan
Tenyayit wêney wilateket tenyayit
Tenyayit wek xot
Tenyayit wek tenyayî tenyayit...
Tenyayit.

Gerraytewe bo sereta
kebûnit ewdallî şêwew
temenit wêllî mana ye
Sûtanit bê kotayî ye
her koçêkit sereta ye.

V

Tenya bûyit û be tenyaş hatîtewe
Xewnekanit be ser mewdayek da dekişan: Boşayî bû
asoyeket rengî xwênî girtbû!
Roje tembellekan, zerdexeney dûrruwane, hîway pukawey gewrekiçan, çawerrwanî jine
reşpoşekan, sirûdî zibrî mindalan,
Şîrreşîrrî şaîranî derbar... Şaîranî Rohfeqîr (*)
Direxte xolawiye zerdhellgerrawekanî şar, tablow diruşme debengekanî serdîwar, billindgoy
mizgewt û beyanî başî dirawsêyanit hemûyan, her hemûyan bonî xwênîyan lêdehat.
To piştit kirde bonî xwên
Piştit kirde ew mêjuwey tateşor,
yan fezay temawîy mêgele
Ew mêjuwey tarîkîy tê da derrwêt
Ew mêjuwey be sitem aw dedrêt
Ew mêjuwey tîyay da tarîkî ber degirêt.

Tenya bûyit û xewnekanit weku çepkê gullî jakaw
helldaye amêzî derya.
To mindallît, le dalanî hesret da, çawbegiryan cê hêşt
Dahatûyişt spard be xewin û
çawerrwanî û raman.

Efsanebûn herêmekanî xewbînîn

Min çîm dawe le efsane, le ajawe
bo êwe bin
Mezadxaney peyv û hesret û xewbînîn
bo êwe bin.
Min çîm dawe le waney le nêw kifnêkî bor da rakişawin
Min tenyayî: Nîyaz me
Ciwantirîn şêt: Dilldar me
Mewday nêwan min û êwe: Wilat me.

## Pakbûnewe

I

Êwareyekî dî em nawe dadepoşêt
Xollbaran temen deşwatewe û
evîn le ser rêga xolawiyekan cê demênêt
Kat wek çingêk limî şêdar
be nêwanî pencekanim da ret debêt
Çawerwanî ta roxî winbûn dem retênêt
Çawerrwanî dûrryanêk e
gîyan le ceste detrazênêt

Ême temen wek awêne berew asmanêk helldebirrîn
ke estêrekanî lê şardînewe
Asmanêk be rûtî le ber serma da be cêy hêştîn
Raspardeyêk desrrînewe
ke ceste le ser kêllgey kîmyayî nûsîyewe.

Le çî deçît?
Katêk hetaw le ser balat sema dekat
Katêk cestet peristgay tenyayî ye
Le çî deçît?
Katêk le ballkonî nebûnewe beyanêkî şeket be diway xot da radekêşît!
Katêk xor le ser cestet awêneyeke ayindew
bûn û
şitekan berceste dekat.

Em wêraneye cesteyêkî nefret lê kirawe
Gorrstanî hesret û
nîştmanî tarmayîye şêdarekan e
Em wêraneye mafûrêk e
le tîşk û şewnim çinrawe
Maçêk e

le ser sêdarey wenewşe be cêmaw e.
Rêkewte rastî gumezî winbûn e?
Rêkewte ceste qîbley gunahkaran e?
Dozexî xudawendan e?
Rêkewte ceste zîndanî gîyan e?

2

Êwareyekîtir be ser temen da dekişêt
Toyiş le awêneyekî dirizbirdû da derrwanît
Le guman rademênît
Cestet wek dirextêkî xolawî detekênît
Nemamêk sêberekey xoy cêdêllê û gela narincîyekan
be nêw winbûn da dekişên
Dekişên
Dekişên û
awêneke be ser boşayî da harre dekat.

To bawerrêkî rarrayit
Zêwanî mêjûyekî bîjûyit
To rastîyekî gumrrayit
le bestellokewe berew agirdan
le agirdanewe berew ziryan dexzêyit
Dexzêyit û
sêbereket le pena gorristanêkî bor da
be cêt dêllêt
Evîn be dem tînuwêtî koçewe dat depoşêt
be niwêjekanî hesretbaranit dekat.

Êwareyekî tir mewdakan dadepoşêt
Toyiş le kute awênekanewe
çaw bo xot degêrrît
le raman rademênît
Hêşta zeman: Dare meytêk e
Bonî xamoşî û
rengî tînuwêtî girtuwe
Şiwên: Cesteyek e
Minarekan weku şimşêr têy çeqîun
Rastî: Segwerrêk e
Wilat berew kewşen deretênêt.
Min pirsîyarêk le rûy to da dekem be aso
be awêne.
Razêk be sîmay winbûn.

Razêk be rûtî xoy pêşan dedat
berew lêwarî mehallim debat
Razêk bulêll û temen detenêt
gîyanî jakawim be guman deşwat.

Razêkî sewz razêkî perc û
terrim dekat û demkate pişko
Kam biruskey wêll? Kam geşe guman
em dirize larey xistote aso.

III

Xerîke xor awadebêt mirdin nehat!
Min pall be to we dedem ruxsarim rengî pelle hewrêkî
rawinraw degirêt.
Rêkewte mewda tozawiyekan termî kat denêjin?
Rêkewte rojekan be dem bawêşkdanewe
derron berew bîrçûnewe?
Xollbaran temen deşwatewe, hajeyiş
tarmayîyekan ta pişt qelat derretênêt
Toyiş be dengit rabirdûm dadepoşît
Le ser xollî rêga xolaweyekan
Le ser tenyayî demnûsîtewe
Ta reşeba û
çawerrwanî
bimxwênnewe!
Min ciwanemergîm wek awêne berew bîrçûnewe hellbirrî
Sirûdêkim nûsîyewe le ser şepol
le ser dîware xusawekan.
Çend gumrra bûyin! Katêk le zemawendî şehîd da balay xoman berew dundekan helldebirrî!
Roh çend cerbeze û serşête!
Çend tenya bûyin! Katêk le serlutke û
le ser şoste tezîwekan serbestî û
evîn û
temenî xoman denaşt!
Êstaş wek helloyekî zamdar
Wek dawellêkî sermabirdû çawit birrîwete aso
Evîn le ser çeqî rêga
wek gelayêkî rencaw becêt dêllît.

Ne, êsta to wêney qebre culekeyekî tenya û bê naw
berdibaran dekrêyit
Gewcêtî û sitemî mêjût pê dadepoşrêt
Keçî hemû berdibaranêk

balat ziravtir dekat
Hemû nefret û recmkirdinêk
tarmayît le nîw çawî mêruweswaran û
şiwênewarit le nêw zeman û
bîrewerî da qûlltir dekat.

To serbestî dîlit dekat
Ajawe kot dekatewe
Jîrî perewazet dekat!
Em terme bo kiwê berîn?
Le kam diriz da rabirdû binêjîn?
Hêşta cestet kelawey rojhelatî kelawe ye
Cestet kalanî şimşêrî mêjû ye
ajawey rojhelatî ajawe ye.

IV

Temenêkî tir be ser winbûn da dekêşêt
Toyiş zeman wek perdey jûreket dadedeytewe û
mewdakanî pê dadepoşît
Le kute awênewe çaw bo xot degêrrît
yan bo min
cestet wek palltoyekî befrawî detekênît.

Berew em hejane zirave dêm,
katêk balat awêneyek e
Şêwe be ber bûn da dekat
katêk pencet mang dekate dû kenarî pemeyî.
Berew em hejane zirave dêm
katêk şanî pîrozit bo termêk newî dekeyit
Nawî wilat e.

Em wêraneye rastîyekî gumangir e
Cesteyekî nefret lê kirawe.
Lêre tenyayî: Mask e
Ceste: Peristgayekî tepênraw e
Gumezî tawan e
Tawêrêk e
bo gîyan dataşraw e.
Min demewêt bitgirim
ta şêweyêk be ber gîyanim da bikeyit.
Em wêraneye rastîyekî gumanawî ye.
Wilatêk le ser wêraney wilatêk
Cesteyek be sirrînewey cesteyek pê degirêt

Xwên, be xwên tînuwêtî deşkêt
Minîş talle tîşkêk degirm û
dadegîrsêm
be şiwên û zeman namo debim.

Le Budam pirsî:
Em hemû rûnakîye çî lê bikem?
Çon gîyanim lem hemû gunahe û
cestem
Nîgam
Destim
lem hemû xwêne pak bikemewe?

Buda witî:
Ceste jiwar e
Jiyan–mirdin, rûnakî–tarîkî,
derewe–nawewe,
Serewe–xwarewe jiwar in...
Jiwar in
Jiwar!

Êsta janekan çon radejênît?
Gîyanî şeketit be çî deçwênît?
Çon rojekanit bedem nizawe
berew lay aso helldefirrênît?

Razêkî hêja, razêkî perco
terrim dekat û demkate pişko
Kam biruskey wêll? Kam geşe guman
ew dirze larey xistote aso?

V

Xerîke xorawa debêt mirdin nehat!
Min pencereyêkim be ser to da derrwanim,
Katêk cestet:
Perstgay tenyayî ye,
Bermallêk e gunahekanim denêjêt
berew ew hejane zirave dêm
Katêk mewdakan wek bermall depêçîtewe û
mang dekeyte dû kenarî pemeyî
Katêk le dalanî nebûnewe be nêw qûlayî
tîşk da şorrdebîtewe.

Min demewêt bitgirim:
Serbestîm le dest dedem
Demewêt be rûnakît sûtanim bişomewe:
Be şiwên û serdem namo debim.
Berew to dêm ta lêwarî winbûn
Ta roxî şêtbûn
berew to dêm.
To: Dabirranît le yeqînî tozgirtû
To: Pakbûnewey ceste û gîyanît
Berew to dêm temen bêdar dekemewe
Cestem wek melotkeyekî yekşewe helldegirm û
berew menfay gîyan degerrêmewe.

## Eger rojêk le rojan

Eger rojêk le rojan pêk bigeynewe
axo yektirî binasînewe?
Axo le zimanî yektir bigeyin?
Eger rojêk le rojan pêk bigeynewe
axo behaneyek bidozînewe bo axaftin?
Yan derfetêk bo lêburdin?

Ême be meylî şêtbûn dilldarîman dekird
Be meylî gumrrabûn bawerrman dehêna
Be meylî koç be wilatêk da raman dekird
ke xoy be şerrewe girtibû,
Wilatêk ke qet rojêk le rojan
wilatî min û to nebû!

Bûnî ême rêkewtêk bû
le perawêzî rojgar da
Tasan bû le nêw çawerrwanîyekî ebedî da
Ême leber kirrêwe da
be meylî xokuştin semaman dekird.
Satekanî çawerrwanîy nefretî xudawendan bû
Mirdinêkî le serxo û bê kotayî bû,
yan winbûn bû satekanî çawerrwanî:
Çawerrwanîy berderwazey wilatî xollemêş
Çawerrwanîy mergî ballinde koçerîyekan
ke le nêw dillyan da êwareyan heşar dabû,
Çawerrwanîy sûtanî qersîl û gulle bax
Çawerrwanîy napakîy dostan
Çawerrwanîy gerranewey siwarekan be nêw teputoz da
Çawerrwanîy berberîstan (*) ke hem hatinyan
hem nehatinyan karesat bû
Çawerrwanîy termî xinkawekan û
tirsî le dergadanî nîweşewan
Çawerrwanîy to
dozexêk bû satekanî çawerrwanî.
Ême le soraxî hîç da
Kolane tarîkekanî mêjûman depişkinî
be peyv rêgay temawîman rûnak dekirdewe.

Ême dû gumrrabûyin
le tarîkstanî bawerr da yektirîman nasî
Katêk be diway mergî xoman da
yan be diway azadîman da degerrayin

Katêk giwêman bo cirîwey ballindekoçerîyekan
helldexist
Le semay gelay werî û rademayn û
wêney werzekanman dekêşa
Ew werzaney kitumit be yektirî deçûn
yan ew kataney
le ser kenare şêdarekan wilatêkman dademezrand
Be çawerrwanî û
be şepolman despard.

Ême le katêkî helle da pêk geyiştîn
Be helleyiş lêk dabirrayin.
Her yeqîn nebû gumrray kirdîn
Her zeman nebû be yektirî namo kirdîn.

* * *

Eger rojêk le rojan pêk bigeynewe
axo behaneyek bidozînewe bo axaftin?
Yan derfetêk bo lêbûrdin?
Axo rêgakanî tenyayî berew kiwêman bernewe?
Xorawabûn çi razêkman bo bidirkênêt?
Êwarekan çi xurbetêk be ser ême û
be ser nîştiman da bibeşnewe?
Axo şepol wêney caran bonî koç û
bonî azadîyan lê bêt?

Bîrte êwareyek le kenarî "Dîcle "pêşit be şepolêk girt û
qîjandit be rûy da:
{Le gell xotim bere hawrrê dêrînekem!
Berew şêtbûn
Berew evîn
Berew winbûn
Bo kotayî dinyam bere
hawrrê bêwefakem!

Ême be meylî şêtbûn dilldarîman dekird
Be meylî koç be wilatêk da raman dekird
ke qet rojêk le rojan nabête wilatî min û to.
Ême dû dilldar bûyin pêkewe razî xoman
bo dahatû dedirkand
Pêkewe be meylî xokuştin le ber agirbaran da
semaman dekird!
Her guman berew winbûnî nebirdûyin

Her zeman be yektirî namo nekirdûyin
Ême dû sergerdanîn le kolanî tenyayî da
Ne min û to be yektirî deçîn,
ne xewnekanman
Ne peyvekan wek caran seretayek in
ne evîn û bawerr manayek deden be jiyan.
Wilatîş êsta hîkayetêkî xurrafî ye
Wilat kolanêkî bestirawe
Bonî tenyayî
Bonî tirs û
barût û
namoyî lê dêt

Wilat termêkî helamsawe
Şepolêk diway xorawabûn bêbakane
tûrrî dedate kenar
Mindallêkî birsîye wilat
le pêkenîn û girrugall kewtuwe
Şayirêk e
"Le janî şewekanî da wişey bîrçotewe"
Gewrekiçêk e
le fincanêkî qawe da bo dahatûy xoy degerrêt
Şûşeyekî betalle wilat
berebeyan serxoşêk le meyxaneyek da be cêyî dêllêt
Bêwejinêk e
bikujêk û şayirêkî derbar pêkewe zewtî deken
yan wilat dû dilldarî lêkdabirrawî wek min û to ye
ke renge yektirî nenasnewe
Eger be rêkewit
rojêk le rojan
pêk bigenewe.

## Le xorgîranî kolaneke da

Le nêwan dû boşayî da tawêrêk le kenarî roh da denêjît
Be diway-Ba–da be ser rubar da radekeyit
To estêreyêkî xizîwît medareket rawit denêt
Rawit denêt û
be nêw êware da şordebîtewe
Le herêmî bestelok da be talletîşk
tabloy mangêkî qupaw
Mangêkî şikaw
le ser aw dekêşît
Berûy şepolêkî şilwê da deqîjênît:
Minim pişko!

Şepolî dengit be nêw mewdakan da dekşêt û
le ser gumezî sate berdînekan pertên debêt.

Heman rabûne
Gelazîzekan payîz cê dêllin,
Cestey şeketîş daristanî roh
heman winbûne!

Le nêwanî dû medar da asoyekît rût
wek saway yeksate rût û hepesaw
Gerdî şaran û
tirîfe şilwêyekan têt alaw in
Ruxsarit le xorgîran
le xollbaran
le xakêkî dêmekar deçêt.

To le şewe qetranîyekan da hellot fêre ballefirrê û
rubart fêre xoşrroyî dekird
Xulyay hellçûnit le nêw qersîl da deçand

Ewdallî çî bûyit?
Ewdallî çî nebûyit?
Katêk le çiwarlawe gîyantiyan binkoll dekird
tementîyan le boşayî degirt.

To bo ruxsarî xot degerrayit?
Ew rexsare bê enwayey her riwalletey le wilatêk da
le îstgay şemendefer û
bender û
meyxaney şarêk da perewaze bûn!
To be diway mindallîyit da wêllbûyit?
Ke le wê
le nêw xollî kolane kujrawekanî "Qeladizê "da
Baweşt bo girtewe û ney nasîtewe
Ney Na Sî Te We!

Wêllî çî bûyit.?
Wêllî çî nebûyit?
Ew satane (Belam tenya ew satane?) to le namoyî
le mêrgêkî ber kîmyayî deçûyit
le boşayî nêwan dû boşayî deçûyit
Ne, kitumit le terim deçûyit
keçî mindallît:
Estêreyek bû le medar tirsaw
Çingêk şewnim bû le beyan bêzar
Binçke gîyayek bû le mêrgî gîyan toraw
Toraw.Toraw

To pênasey herêmêkît xwayekanî le jimardin nayen
Ruxsarî asoyekî diriz birdûyit
Asoyekî rût, katêk
le rûy lêşawî gumrayî da paşekişê dekat:
Min mêjûy biruske wêllekanî şar denûsmewe
keçî wilat tabûtêk e
be cestey şeketim teng e.

Min kitêbî hetaw (Bo neteweyêk ke xew be menfawe debînêt) degirmewe
keçî menfa bermallêk e niwêjekanim denêjêt!
Wilat mergêkî hemin e!
Menfa: Çallêkî bê bin e
Kiwa eme wilatî min e?
Key eme serdemî min e?

To şepolêkî avirêyit be stênêk be xoyit nagirêt

Helloyekî gîyan zamdarît, şewane,
tarîkayî wek perde ladedeyit û mewdakan
le jêr balle şeketekanit da radexeyit
Parçe dengekanî xot, ke le estêrey harrdiraw deçin kodekeytewe
Detewêt le sirkesatî nêwan xewin û bêdarî da bîyan keyit:
Be lutke bo balay mandût
Be asman bo tewareket
Be riwallet bo sîmay winbûnit
ta be dû dest le derwazey daxirawî–Ba–bideyit:
Minim deryaçe, ramjêne!

## Rêgayekan napaktirîn delîl in

I

Hêşta temen xerabat e
Hêşta temen gîrodey ajawe ye
le rûy şalawî mêgelî çewaşe da
pirînsîpekan derrewnewe
Sinûrî nêwan: Firîştew sozanî
Rastî û efsane
Boşayîyekî temawî ye
Mêjuwêkî xolawî ye.

Şiwênim kewe be nêw ew cengelle da!
ke lewa, le ser şanoy dûrrûyî
peyamî xêllî perro le rûy winbûn da helldebirrin
Le xollemêşî babirdû
le napakî û
tîror
peykerî ciwamêrî detaşin.

Xerîke xom nenasmewe
Le nîgam da
asoyekî temawîm heşardawe
Estêrekan be nêw çawim da dexzên
Gîyanim le nêw pencekanit da
bûke şûşeyekî qupawe!

To be kejawey tenyayî dembeytewe bo ew roje gêlaney
peyvekanîyan le damênî xoyan da naşt
Dembeytewe bo ew çarenûse temawîyey
le bîyabanî sutû da
winî kirdim.
Dezanim min xembartirîn şehîdim û
rîgakanîş napaktirîn delîl in
Rîgakan nambenewe bo seretay seretakan
ta le ser şostey mindallî pêş be zeman bigirim û
çawerêt bim.

Rêgayekan napaktirîn delîl in û
nambenewe bo kenarî rûnakî
ke le wê:
Hetaw le ser cestet semay dekird
Serman be xeyib despard û leber nûrî xudawend da
gunahekanman helldexist.

Ne efsane bû, ne sîhir
Kenarî peristgay şewnim û wenewşe bû
Deryayiş pirsîyarî ezel û ebedîyet.
To sîhrawî bûyit wek derya
Minîş peşokaw be wêney xorawabûn.

Ême rût bûyin weku rojanî sereta
wêney nîwerro
wek satî dîyalogî ceste rût bûyin
Zeman şepolêkî bê enwa bû
le ser cestet semay dekird.
Tenya bûyin û tenyayiş nebûyin
Le kernevallî ceste da hawtemen û
hawrrazî kiçanî xwa bûyin.

Ne efsane bû, ne sîhir
Xudawend çorre nurêk bû,
To be awêne û minî bê qîble
be cestem deçwand.
Tenya bûm û tenyayiş nebûm
Satî koç û lêkdabirran kenar debû be wêrane û
temen be pirdêkî rûxaw.
Kiçanî hetaw û derya be lerînewey cesteyan
rûnakîyan radejand û
sinûrêkîyan be nêwanî min û zeman da dekêşa
Toyiş bêhude be ber çawî êwarewe
dillî minit wek çepke gullêkî jakaw
dedaye dest kiçanî xwa
Gîyanî minit le gell xor û pelke moz da
firê dedaye binî derya.

II

Ke gizingêk le ser asoyekî niwê sema dekat
feza rengî ruxsarî mindalanet
Beyan bonî pirçî baranawît degirêt.
Ke gizingêk le ser asoyekî niwa sema dekat
min rêgayekî niwa
Yarêkî niwa
yan, pizîskî honraweyekî niwê degirim.

To bo kam serdem xullqawît?
Le kam efsane cêmawît?
To kêyit? Ke baran û
zirîyan û
xorawabûn giwê rayelltin!
To kêyit? Ke be peyvînêk,
berriwanînêkî çawanit
xerîke hemû, her hemû jiyanî min bigorrît!

Dîsan razêk wek biruske terrim dekat
Rêkewit ruwew kam helldêre?
Evîn berew kam dundî gumrrayîm debat?
Berew wilatêk
ke efsane ye?
Berew jiwanêk Ke şêtxane ye?
Xerîke xom bizir dekem
pêşimkewe bo ber nûrî xudawendan!
Ta xom le gunahekanim pak kemewe
gunahekanîşim le xom.
Şiwênim kewe berew ew beyanîye reşpoşey ke be diwa amêzlêkdan û
be diwa maçî firmêskawî bûyne peykerêk bo jiwan û
bê miradî û
mallawayî.
Min ta êsta: Seretayek im bo winbûn
Sirudêk im bo namoyî û bê bawerrî
Pirrojeyek im bo şêtbûn.

Dezanim to nazdartirîn şehîdît
Rêgakanîş napaktirîn delîl in
Rêgayekan nambenewe bo mîhrabî peykerekanî ciwanî
Bo bender û
îstgey şemendefer û
firrîngey çawerrwanî
Ta ser le niwê,
bedem amêzlêkdanewe, guman bikeyit:

Le min
Le wilate be wilat neçuwekem
Le rojhelatêkî wêrane ke be zebrî: Espêrîn
Niza
Hîroyîn
Aydolojîya û
be zebirî xokuştin ragîrawe.
Minî sîma rojhelatîş guman bikem:
le bûn
Le xom
Le Xuda û
le dahatûy bê dahatûm.

Dezanim min xembartirîn şehîd im û
rêgakanîş napaktirîn delîl.
Rêgakan nambenewe bo satî
hellbûnî ceste û gîyan
ta bo çendemîn car be giwêy yek da biçirpênîn:
-Xwaye gîyan!
Xwaye gîyan!
Bo be tenya be cêt hêştim! (*)

# Werzeberdîne
# 1992

*Ey badî seba min bibe sûdî nîye name*
*Teşrîhî zeîfî min û xem nayete tehrîr.*

***Hacî Qadirî Koyî***

## Werzeberdîne

I

Be çirîkey giryanawît radebimewe
Le dûrewe
ruxsarî firîşteasat namo dîyar e
Janî zanî lê debarêt,
dellêy peykerî hawar e.
Be nêw bulêllî winbûn da
berew rût dêm
Tezûyek serapay gîyanim dagîr dekat
ta dêm û dêm sîmat kalltir debêtewe
Xoşbezane wek ciwanûy toqîw rê dekem
(Sehray Edem) be rûy wêllima dekrêtewe.

Le nêw em çolleware da çaw bo zineyek degêrrim
berew mergêkî tir derrom
Rê win dekem
Çarenûsim be sêlawî koç despêrim.
Şewêkî çend tirsinak e!
Pencereyek dekemewe
zerdebaranêkî be taw be ser guman da dadekat
Estêrekan le pêdeşt da sermayane
Mang tirîfey xoy denêjêt
Rewekoçî daristan e!

Ajawe ye rê win dekem
Serim be to despêrim û
temen bem tirs û hejane
Be mergî pîrî Geylanî dillim her mekoy yaran e
Sûtanim heman sûtan e

Her demê xoşewîstîy to
sêbûrî û xellwetî gîyan e.

Axoran û baxorane û ser dernakem
Keşkollekem helldegirim û
rû le koçêkî dî dekem.
Her sirûd û evînim hes hawkoçim bin
Hemû rojê
sûtanî nîwe şewanim le ser gorrekem
pêdekem.

Ke le wêş bûm, ger bîrt bêt, hellweda bûm
Ewê şewê
le diwa jiwan gerraynewe
Le berdem tenyayî xom da hepesa bûm.
Min namoy nêw şarekem bûm
Her xom terim û
gorrhellken û
xom zêwanî gorrekem bûm.
Geyiştîne ser kolane tarîkeke
baran barî
Rastîyekan leber baran da dûrrû bûn
Ayinde wêll
razekanman le rûy baran da sûtû bûn.

Baran barî û
le pall to da le semay baran rademam
Baran barî û
le tenyayî xom rademam.
Pirsît: Çîte?
Bonî pirçî baranawît şewekey gulawpirrjên kird
Maçim kirdî û hemû gîyanim
nuqmî rûnakî û gulaw bû
Ger bîrt bêt, le hoş xom çûm
Mang le nêw zîndanî hewra
berrela bû.

Her ew şewe
bedem fêwe rawyan denam
Le nêwanî dû tawêr da
Le sêberî dû şimşêr da
dadegîrsam.
Hawarim kird: Xot penade!
Zemanêkî bê amane

Temenman be xoll dedêrêt
Çarenûsman be koçêkî wêll despêrêt.
Zemanî agirbaran e!
Çend hawar keyin
cîhan mestî kernevallî ajawe ye
Çend dûr barkeyin
hewargeman kelawe ye.
Zemanêk e
evîn temenî xolawî naşwatewe
Dirizî dill pirr nakatewe
Gullekem çawerrê meke!
Rubarî lêll xinkawekan nadatewe.
Rubarî lêll xinkawekan nadatewe.

Le jêr em kelawane da
çaw bo pesêwê degêrrim
Be nêw temî çarenûs da
rû le koçêkî dî dekem
temenim be to despêrim.

II

To nehatî
Tirsêkî wêll le gell polû da deyçandim
Xinkawêk bûm
çepolekan şêtane deyan retandim
Çawerrwanî bû yan raman
wek zuqim hellî tekandim?
Her nehatî
Biruskeyek day le gîyanim
gumrrayî bû be çarenûs
Tenyayî be nîştimanim.

III

Pencereyek le rûy koç da dekemewe
Zerdebaranêkî be taw be ser sûtan da dadekat
Billindgoy şar
bangî gumrrayî deçênê.
Şew şeket û xewallû ye
Aso lêll û
estêrekan helldelerzin
Şeqamekan all deçnewe

Sermame be girr dampoşe!
Be nêw heman rehêlle da dembenewe
Dîsan le ser (Rêyî awrîşim) rûtim deken
Le nêw zuqma req debmewe,
yan ser le niwê
wek koyleyekî genimrreng
be çend qat demfiroşnewe.

Le wetey heyin
êwe çeqon, ême birîn
Êwe kînen, ême evîn
Çon têk degeyin?
Nêwanman deryaçey xwên e
çon pêk degeyin?
Çon beyekewe helldekeyin?

Pencerekan le rûy koç da dekirênewe
le nêw cengellî hawar da
her zû dengit denasmewe
Be rakirdin berew lat dêm
satme debem
Le nêwanî dû rewez da asê debim
Hawarî to û çirîke pêkrawekem
wek dû pelle hewrî şeyda têk deallên
le pall heresî agir da radebmewe.

Le keyewe hawar dekeyin
keçî dengman weku rastî
Wek wîjdan û
xoşewîstî
hêşta be cîhan namo ye.
Le cengêkewe bo mergê
Le mergêkewe bo cengê
radekeyin û
hewargeman her pişko ye!
Be rêjney xwên “Darî azadî aw dedeyin” (*)
Keçî hêşta destbeser în
Le nêw wilatî xoman da
her aware û penaber în.

Lem segwerr û ajawe da sirûdêkim pêbirrrawe
zamdarim sarrêjim nakat
Bistêk xakim bo cêmawe
beşî xom û gillkoy şehîdanim nakat

Renc û sermaye û mêjûy min:
Çepkêk jan e
bote sîmay em jiyan e!

Her derrom û be to nagem
Serim be to despêrim û
temen bem koçîkoçan e
Be xo namo
rû le mergêkî dî dekem.
Min xwênekem weku ciwanûyekî serkeş
berew lay to hellimdigrê
Le nêw temî çarenûs da
mergî xom berokim degrê.

Min peyamî neweyekim hellgirtuwe
le nêw giyanma
gerdawêk hellîkirduwe
Brûskerêy win kirduwe.
Min Hellacî zemanem û
dillim tijî nûrî Xwa ye
Peyamekem serkeşîy mewcî derya ye.
Min Mesîhî willatêkî wêranim û
xaçekem janî Asya ye.

Her derrom û be to nagem
Serim be to despêrm û
temen bem koçî koçane
Be şeketî
le ser tateberdêkî sirr palldekewim
xom be serma dadepoşim.

Xew debînim:
{Xollbaran e...
Rûbar hajew kenarekanî raw denê. Rû le bêşelanêk dekem dawellê morrem lê dekat.
Şeketane termî mêjû le bin berdêka denêjim.

Pena bo gewirrê debem daristan wek rewe siwarê,
pirtaw be nêw teputoz da berew binar dête xwarê.
Çend gumrra bûm katê be bangî çaweşan berew pîrî kazîwe çûm.
Xom dekujim. Rewe dalla dewrim degirê. Be rakirdin termekey xom be cê dêllim.
Ser be meyxane da dekem. Şayî xwên e.
Ta çaw birrkat kelle ser kemançejen in.
Begwêy (Kilîyan Pitrosîyan) da ((**)) deçirpênim:
Kernevallêkî çend seyr e!

-Emane kên?
Kam sirûdî mîllî deçirrin?
+ Mindalanî kuştareken rabûnewe
Mêjû berdebaran deken
Sêmfonyay girr
denûsnewe}!

Xew debînim:
Le nêw meytxaney şar da le gell çend termêkî geçilaw rakişawim. Jinanî sîma nûranî, kakollzêrrîn be tîley çaw bom derrwanin.
Hest be rûtîyetî xom dekem, areqey şerim derrêjim.
Le çawanî xemnakîyan da bêumêdî pelle dedat.
Demewêt be destekanim xom dapoşim, azarêkî merghêner demhejênê û jinanî sîma nûranî namnasnewe.
Lew serewe dû pêpanî çaw şaqûllî didan asin be dem nerre û hawarewe daykim le xem helldekêşin
deçirîkênim...
Le dengî giryanawî xom bexeber dêm
ke debînim:
Şanî çepim be tatekewe nûsawe
Gelorêkî çaw zeqî bor,
hol û liçşorr
Şimşêr be dest be ser sermewe westawe!
Dîsan hatûn le ser terme jakawekem
Mêjûy xotan denûsnewe?
(Surey Enfal), ayetî xwên
dexwênnewe?

Agirbaran e, agirbaran e!
Koçî em care, koçî koçan e
Koçî emcare
Koçî koçan e.

IV

Be cirîwey çolekekan da dezanim rabûnewe
Be rengî aso û hetaw û tirîfe da
Be kazîwe û
lencey qumrî û
şiney sirwe û

çirpe çirpî dilldaran da
Hest pêdekem hatûnewe.
Be hatintan tarîkî dirizî birduwe
Nemanî xwên sewiz buwe
Madonakanî Kurdstan dest be xenen
çawanîyan be kil riştuwe.
Hatûnewe asoy wilat
Hêşuwe hetawî girtuwe
Çend satêke hatûnewe
keçî hêndey temenêke
mêjûyeke
Merronewe! Merronewe!
Êwe sîmay hemûmanin
Alay be xwên hellkirawî
wilatî eşiq û baran in
Êwe xewnî ew mêrxasen
zirêyekey le lawk û dar berrû ye
Êwe gîyanî ew rênasen
sedan salle serî debirrin her zîndû ye
Her zîndû ye.

Merronewe!
Serbestîman pelley dawe
Be êwewe wîjdan û xoşmêrî mawe
Asmanî şar be bazûtan ragîrawe.
Merronewe! Merronewe!

Bo kiwê derron?
Kê dezanêt le kam çoll û kam bajêrrî xerîban da
bê naz demirin!
Derron xêllî şirrexoran be xwên berî xorman degirin
Alay le tîşk çinrawman
be kellpe û nêze daderrin
Derron ta le nêw wilat û
şar û
kelawey xoman da
be penaber raman bigirin?

Bo nazanin?
Bexda tofanî zelkawe nîştotewe
Petayeke rojhelatî girtote
Bexda kûrey agirêk e halawekey rû bikate her hewarê
rez û baxî ber nagirin
Cengellêk e şaristanî Bedewîyaney bigate her gund û şarê

mindalanî pê nagirin.
Bo kiwê derron?
Bo kiwê derron?

Le nêwanî dû tawêr da
ême rencêkî babirdûyin
Le sêberî dû şimşêr da
ême şehîdêkî zîndûyin.
Merronewe!
Çend satêke hatûnewe:
Temenêk e
Mêjûyek e
Merronewe!
Merronewe!

Derron dîsan bo koyleyî cêman dêllin?
Derron serleniwê şehîdan şîn degêrrin
Çarenûsman
be koçêkî wêll despêrin.
Emcareyan şorriş bo kam menfa deben?
Şorriş le kiwê herrac deken?
Derron meger xwa bizanê
kam werzî evîn dênewe?
Derron agirdan: Bê pişko
Şar: Bê aso
Bûk: Bê zawa
Dund: Bê hello demênnewe.
Derron netewe rencerro!
Derron şehîdan bê gillko!

Megrî rolle!
Key êsta katî rorro ye
Çend bigiryeyt, girye û nallet
hêşta be cîhan namo ye!
Le firîşte û befrî yekşewe paktirî
em cengelle
key serdem û şiwênî to ye?
Megrî rolle
jiyan hêşta wek berwankeket perro ye.

Megrî gîyane!
Key êsta katî giryan e
“Boçî degrî, hênde hogirî giryan î?
Xo to hêşta le xem nagey” (***)

Le manay şerr
bê wilatî
le manay girye nazanî!

Megrî gîyane!
Key em şew katî gîyandan e!
Le wetey heyin
le cengêkewe bo mergê
Le mergêkewe bo cengê
Radekeyin û
her çiwar werizman tawan e
Tenya em şew xot rabigre
bergey birsêtî û rawnan û serma bigre
Sibey hetawit bo dekem be colan e.
Sibey degeyin
lewdîw, malle xalloyanit awedan e
Sibey jane wirdîle û ziravekanit le gîyabend û
nan û
beyan û
şîr degirim
deyankem be ala û çiray em cîhan e
Deyankem be ala û
çiray em cîhan e.

Megrî gîyane!
Key êsta katî giryan e
Key em şew norey gîyandan e
Megrî gîyane!
Megrî gîyane!

V

Pencerekan le gell koç da dekrênewe
Zerdebaranêkî betaw be ser sûtan da dadekat.
Be wêranexak da derrom
Çaw bo pesîwê degêrrim
Bizir debim
Çarenûsim be tofane koç despêrim.

Şar çend çoll û tirsnak e!
Şar wek daremeytî şêdar
bonî kifin û
bonî henasey mirduwanî lê helldestê.
Demewêt birînekanim gullbijêr kem

Firrokekan heda naden
dexwazim şehîdekan serjimêr kem
Firrokekan mollet naden.
le nêw geweyekî terr da
serim le jêr zerdegela da denêjim
Êre kiwê ye?
Çon rêm kewtote em nawe?
Bo çiwardewrem be ajawe û girr gîrawe?

Be nêw cengellî hawar da
Be rew mergêkî dî derrom
sêberî helamsawî xom rêm pêdegirê
Le dûrewe
tarmayî to û zineyekî lêll debînim
be ser tînuwêtî da decmêm
Baskekanim be ser golawêkî sar da şorr debnewe
Carêkî dî
le nêw zuqim û jîlemo da helldebimewe.

Ho wilate şeketekem!
Be kam şarî girrgirtû da
Be kam kêllge û
kanî û
karêzî tînû da
Be kam dundî tazîyebar û
kam daristanî rejû da
Bitnasmewe?
Le nêw kam temî kîmyayî û
le jêr kam rewe rinû da
Bitdozmewe?
Wêney em tofane koçe le laperrey:
Quran?
Încîl?
Meshef?
Tewrat?
Le kam perrey zerdhellgerrawî mêjû da
bixwênmewe?

Her derrom û be to nagem
Be nakamî
rû le mergêkî dî dekem.
Wa xwênekem wek espeşê berew lay to
hellimdegirê
Le bûlêllî gumrrayî da

mergî xom berokim degirê.
Min şewane
be nallet bêdar debimewe
Le gell hemû şehîdêkta
dekujrêm û radebmewe.

Min Hellacî wilatêkî wêranem û
dillim tijî nûrî xwa ye
Peyamekem: Serkeşî mewcî derya ye
Min Mesîhî zemanem û
xaçekem janî Asya ye.

Her derrom û be to nagem
Le dalanî çarenûs da
rû be rûy mêjû debmewe,
Mêjû kolanêkî teng û daxirawe
Rastîyek e
ser berewxwar dakirawe.

Mêjû nisêy seferber û koç û ceng e
Yan celladêkî debeng e
Şimşêrekey le rûy ayinde û evîn da
hellkêşawe.

Min be mêjû da deçimewe
daristanî şimşêr debirrim
Rengî jeng û mis û ceng û
rengî celladekem degrim
Le jêr heresî mêjû da helldestimewe
serî mandûm
le ser sêdare dadegrim
Carêkî dî
berew lay to rêge debirrim
Rêge debirrim.

Min birînêkî jêr çeqom
Killpeyekî serhellgirtûm
Le gell hezaran şehîd da hatûmewe
Bê wilatim, wilatî xom dewêtewe,
Termî bawkim
Gorrî daykim
cênzirgey tepêndirawî bapîranim dewêtewe.
Ta xakî le xaç diraw im
Aw û mêjû asmanî dagîrkirawim nestênmewe

le siruştî însanîtan be guman im
Le hawsêyî û
le nasîntan peşîman im
Peşîman im.

# Karwansera
# 1990

*Lem şerhî derdî xurbete lem sozî hîcrete*
*Dill wexte bê be aw û be çawma bika ibûr*
***Nalî***

*Bellê dezanim min kêm, le kiwê gewre bûm:*
*Min ew billêse be coşem*
*Desûtêm û xom dexomewe,*
*Her şitêk degirim: Rûnakî ye.*
*Her şitêk cêdêllim: Xollemêş e.*
*Bellê, be rastî min billêsem!*
***Nîtşê***

# I
# Karwansera

**Honraweyek bo daykim**

Le gorristanî em menfaye da
tenya wêney tom le tîşk çinîwe
Be gerûy nuqmî serab û xollim
goranîy umrim bo to çirrîwe.

Dayegîyan rojgar, rojgarî menfa
weku mindallîm kerrûy hellêna
Rohî hellwedam heta hetaye
le nêw şakezî û baweşta cêma.

Wa le rojanî dûr wilatî da
xor le nêw dill da sêber deçênêt
Bimbûre daye!
Em şewîş nallem wek xewnêkî tall
yan weku zuqmî gorre sirreket
le şîrînxew da ratdeçllekênêt!

Xozge çawanî be kil rêjrawit
Xozge çawanî le xem gîrawit
be çepkêk nîga
rohî şikawim, wek çiray nêw ba,
helldekatewe
Yan çingêk xollî ser gorrî tînût
wek nûrî yezdan le gunahanim pak dekatewe.

Ewa termeket le tenyayî da
be ser winbûn da şorrdebêtewe
Dirextî gerde le nêw hetaw da deşekêtewe
Ewa termeket, goranîyek e
xak ray dejênêt,
Çingêk şewnime serab terr dekat
le pall aso da helldebêtewe.

Herwa le yadme
laylayekanit baranî xwa bûn
Wek dirextî xoll, deyan tekandim
Hêşta sawabûm
be dest û pencey firîşteyîyanet
bo rêy azadî û
şewî rencderan datdegîrsandim.

Le to we fêrbûm
dundekan bikem be nisêy gîyanim
Wek espî agir le aso we bêm
kam şepol qûçe negate şanim
Le to we fêrbûm berzefirr bimirim
Berzefirr bijîm
Beriz birrwanim.

Bimbûre daye!
Ewa dîsan xor, xorî xerîbî
le kêllgey roh da sêber deçênêt
Bang û hawarim wek xewnêkî reş
yan weku zuqmî gorre sirreket
le şîrînxew da ratdeçllekênêt.
Daye!
Bimbûre
Xwaye!
Bimbûre.

## Sêwexan

Sêwexanî perçem zêrrîn
hat û be laman da ret bû.
Wek polêk tirîfe û xewin
le perêzî şew da hell bû.
Hawarman kird:
Sêwexanê!
Çon le gell reweziryanê
rêt kewtewe herîmî agirbaranê.

Sêwexan deng e bo gerû
Baran e bo kêllgey sutû
Bînayî û pêllû ye bo çaw
Sêwexan adgare bo rû

Hawarman kird:
Sêwexanê!
Sall diwanzey mang çawerrêtîn
lem heware...

Keçî Sêwexanî evîn
Sêwexanî bisk zêrrîn
le nêw tem da tiwayewe
Wek gulleyekî agirdar
lew serî tunêlî şew da
kujayewe.

Sofya 1985

## Portirêtî

Em şew le çawerrwanît da
sirûdî xollemêş deçrrim.
Rohim be ser pellehewrêkî gerrok da
helldewasim,
Temen le şepolan degrim.
Berebeyan
wilatekem, le nêw şirre buxçeyek da depêçmewe,
bîyabanî nebûn debirrim.
Gîyane le çawerrwanît da
çend carî dî
debêt bimrim!

Şam 1989

## Kenar… Kenar

I

Le baranewe hatûyit û werzekanit hellgirtuwe
Le sûtanewe hatûyit û balat wek lawik hellçuwe
Ta piştit neçemêtewe lutket dewêt pallî pêdeyit
xak, yan birusket gereke serî pêkeyit.
Le binarî ewber şar da
pellehewrêk bûyit nebarît
Hello bûyit tem û mewdakan le amêzit da dexewtin
Dirextêk bûyit biruskey tewir neyharrît.

II

To ne tenyayît, ne wilat
keçî temen çolekeyekî zamdar e le ser lepî destekanit
Perruballî xwênawîy xoy desrrêtewe.
Le bulêllî dûrryanî hatunehat da
çawekanit wek dû hawar...
Wêney dû gizingî zamdar
bangim deken...
Çawekanit be kilî şew demşonewe,
be hewrazî nihênî da serim dexen.

III

Le pêşwazît da westawim
rûbarî kat ramdemallê
Le pêşwazît da westawim
êware wek rewe dallê
le zamekanim deallê.
Berew lat dêm
Yan bimkuje,
yan heres bem mergem bêne.

IV

Ewa dîsan ruwe û kenarekan derroyin
Şar be şar, wilat be wilat
Kenar le nêw xewin û xwênman da helldegirîn...
Be rengî nihênî û payîz daydepoşîn...
Be ser balay sirûd da hellîdewasîn.
Keçî kenar cêman dêllê û
demandate destî derya.
Demanxate ber tewjimî şepolî well û berela.

V

Le sûtanewe hatûm û balam wek lawik hellçuwe.
Le baranewe hatûm û werzekanim hellgirtuwe.
Ba temen rêgay nehat bêt
goranîyekanim wek tem û zerdegela mewda û êware bitenin
Ba tînuwêtî be ser daristanî gerî da hellimwasêt.
Rohim hêşta askêk e
be ser gulle da baz dedat...
Peresêlkey rawinrawe
le ser lepî destekanit helldenîşêt.
Wa em hewraneyiş ret debin
Goranîyekem le samall da netwayewe...
Ne mangeşew le to deçêt
ne tînuwêtî le şemall da geşayewe.

VI

Le kam medarewe hatît?
Kam kiwêrerrê
berew dillî pirr kudêtay minî hênayit?
Nîweşewêk
wek dû biruskey rawinraw
le dûrryanêkî asê da le yekman da
gerdûn lerzî
Kat le şiwênî xoy da tezî
Le yekman da û
rohim bû be mêrgî hetaw
balam be dirextî xunaw.

VII

Le tînuwêtî werzekan da
çawekanit wek dû rûbar bangim deken
Ruwe û nihênîyekan derrom
Çawekanit le nêw kejawey baran da pallim dexen
Be biruske demşonewe,
Be sûtan da serim dexen.
Temenêke kurt:
wek behar
be taw:
Wêney espî balldar
De bimkuje û diwayî bem gîyandane bêne!
Leber baranî mêjû da
wek şitlle hetaw bimçêne!

VIII

Le binarewe hatûm û
lutkem dewêt pallî pêdem.
Le sûtanewe hatûm û
kanîy biruskem gereke serî pêkem
Baskit bêne!
Ba şepol û binar hellkem...
Baskit bêne!
Kanî biruskem gereke serî pêkem...
Baskit bêne! Baskit bêne!

## Honrawey aw

Tirîfe be ser kêllgey–Ba– û be ser balat da helldekişêt
Le pall pencerey payîz da
tînuwêtî dirextî xewin detekênêt
Nihênîyekan gull derdeken.
Nihênîyekan le ser ballî pepûle hellimdekollin,
wek sinûrî nêwan aw û çawekanit
Serbestîm lê zewit deken.
Rojekan be ser mewda da şorrdebinewe
Çawanit, be nêw aso da
reng pexiş deken.

Tirîfe be ser kêllgey–Ba–û be ser balat da helldekşêt
Çon detwanît
hênde le ciwanemergîm û le aw biçît!

Şehîdekan be ser aw da hengaw denên
Rojekanyan be şepol da helldewasin.
Be ser şepol û mawe da helldegerrêm
Winbûnekem bizirdekem,
Rojekanim le nêw gîya da niqum debin.
Demewêt payîzêk bigrim ke le çawekantewe dêt
Şeqamekan wêney diruşim û pellexwên
demnûsnewe...
Tavgey befir damdepoşêt.
Tavgey befir le ser balam tabloy biruske dekêşêt.

Eme sirûdî rabûn e, zewî bêdar dekatewe
yan xopêşandanî aw e?
Deba çekekan rabin û weku meçekî rawinraw
derwazey bikutin,
Deba çînekan lêk rasên
sirûdekan tînuwêtî û payiz rajênin,
Qonaxekan wek çepke mom le ser penceman
dagîrsên.

Rojekan be ser şepol da şorr debinewe
Be çi rengêk em xollbarîne terr dekeyit?
Kam şêy kenar dekeyit be reşmallî birîn?
Çi şepolêk le penay roh da helldekeyit?
Le xollbarîn da hewarê
be ser rohim da debarê.

Çawerrêy biruske meke!
Bem sûtane bimnûsewe
To her aw ît!
Desutêyit û to her aw ît!
Mewdakan depêçîtewe... To her aw ît!
Gunahî hemû sedekan deşoytewe... To her aw ît
Ne derya û çem le to deçin
ne tofan û
kanî û
baran.
Rengekan be to namon û
keçî toy wizey rengekan
Ey nihênî em gerdûne û serdarî kat û mewdakan.

Be ser balam da serkewe ta şitekan le aw bigrim
kelawekan bişomewe.
Xollbarîn e
Ser be baskî çepim dekeyit
Kêllgey genim ramdejênêt.
Biruskeyek dam depoşêt
le nêw tawêr da şîn debim.
Xollbarîn e!
Qollekanim debin be dû cogeley lêll
to nawyan lê denêyit sinûr.

Dirextêk le daristan da balldegirêt û
debête kejawey baran.
Le nêw xoll da birînêk helldegirmewe
aso le pencem deallêt.
Hawar dekem: Gîyane le kiwêyit?
Hawar dekem: Çend sallî dî
bergey çawerrwanî degirît?
Çend sallî dî? Willatekem!

Çawekanit kanîy hemû rengekan in
Çi rengêk le aw dexwazît?

Çawekanit nihênî xewn in. Lafaw in. kêllgey befir in.
Mangirtinî kirrêwen, dû meçek in zincîrekan dekene xew
Heresî xoll in. Hetaw in.
Çawekanit tînwêt în û
tînwêt în û
Tînwêt în!
Çawekanit nihên în û
nihên în û
nihên în!
Çi rengêk le aw dexwazît?
Em termane be gelay xunaw dapoşewe
ta aw rengî şehîd bigirêt.
Em termane be gelay baran dapoşe.

Le pall pencerey payîz da
şepolêk dekem be ala le ser sirûd hellîdekem
Lêt depirsim: Le kiwê pencerekanim cêman?
To her aw ît!
Lêt depirsim: Kiwa sinûrî nêwanî sûtan û baran?
To her aw ît
Ey sinûrî nêwanî roh û şitekan!
le kiwê
pencekanim
cêman?

Çawekanit rengekan be nêw aso da pexiş deken
Le binarî rojekan da
tînuwêtî dirextî xewin detekênêt
Tînuwêtî le nêw mawe da
winim dekat
Le giwê daristanî aw da
wek alay leşkirî şikaw hellimdekat
Çi hersêk daypoşîn û
le xollbarîn da dagîrsayin?

Be ser balam da serkewe!
Ta birînekan tirîfe bişonewe
Sirûdekan xak rajênin
werzî xoll bêdarkenewe.
Tenya le germey sûtan da em şemalle
rûy têkirdîn.
Biruskeyek daypoşîm û
le nêw tawêr da sewiz bûm
Çawerrêyî rehêlle meke!

Bem sûtane bimnûsnewe
To her aw ît!
Rengekan helldekeytewe
to her aw ît!
Beserhatî rengekan denûsîtewe
To her aw ît!
Sinûrî nêwan şitekan desrrîtewe
Xot her aw ît!
Her aw ît
Aw ît. Her aw ît!

Min regezî awim dewêt
ta werzî xoll bişomewe.
Awî cîhanim gereke
ta em xake le tawan û şiwênewarî
dagîrkeran pak kemewe.
Min regezî awim dewêt...
Min
awî
cîhanim
dewêt!

Batumî. Gurcistan 1987

## Karwansera

1

Karwansera ye.
Le bêşelanî ajawe û xoll da, bê to rojekan
delaqey jan in
Be ser boşayî û çirredukell û
be ser temenî çoll da derrwanin.
Be pol xewin û maç le gulleyek da dekujênewe
Satekan deglên, be xo nazanin!

II

Benêw gerdaw da hengaw denêyn û
temen helldekeyin
Le ser şepolan sirûdî agir denûsînewe,
Le nêw kejawey gullegenim da şehîd denêjîn
Qîn û turreyî hemû koylekan be ser payîz da debeşînewe.
Bazûman kalay bazarrî xwên e
Şostey beyan e
Eme xencere şew radejênêt
yan pole pişkoy bê agirdan e?
Mergêkî tir e û temenêkî tir
Werzêkî tir e û lafawî pengir.

III

Karwansera ye
Le bêşelanî şexte û sûtan da berew lat dêm û
be pencet xom dadepoşim
Le nêwan aso û çawekant da
biruskey tezû be ser hawar da hellimdewasêt.
Kipî daristan wek temêkî çirr damdegîrsênêt.
Be nêw kirrêwey nîwe şewan da ser helldegirm û
gulleyekî gêl le ser tarîkî demnûsêtewe,
Şepolêkî wêll wek termî xinkaw
bo baweşî tom dehênêtewe.

Min le amêzta
goranîyek bûm rûbar deyçirrîm
Çolekeyekî sermabirdelle û çaw begiryan bûm
hetawî dinyat be bala debirrîm.

Min le amêzta
pelle hewrêk bûm samall deyçandim
Liqêk hetaw bûm şew deytekandim
Wek perresêlke le nêw colaney xewna denûstim
Pelkezêrrîne û
şepolî gizing rayandejandim.

Mergêkî tir e
temenêkî tir!
Werzêkî tir e
lafawî pengir!

IV

Lew binare siwarekan dên û reşmallî agir
le perawêzî şew da helldeden.
Be rimekanyan, tabloy biruske
le ser tarîkî û gelî dekêşin.
Be gerd û hawar, boşayîyekanî nêwan mawe û roh
pirr dekenewe.
To dêyit agirî nêw eşkewtekan helldekeytewe
Xakî xollemêş be tîşk û şewnim awrrişên dekeyit
Le ser heres û gelazerdekan dastanî reg û
ciwanemergîman denûsîtewe.
Be ser kelawe û zerdegela da henga û denêyt û
zemawendî xwên berokit degirêt

Zemawendî xwên be balay gerd da
hellitdewasêt.

Karwansera ye!
Çi ajawayek be ser binar û gîyan da dadekat?
Kam reşbigîrî bo em namoyîye û
bo tarmayîyekan destemom dekat?

V

Le ser zuqim memnûsewe
em kirrêwem pê hellnabêt!
Le tawêrim mebestewe
rewe dallim pê têrnabêt!
Rohim le billêse megire
werzî xollim pê terrnabêt!

VI

Karwansera ye!
Em koçe sûre dûrryanî nêwan menfa û menfa ye
Le nîweşewî em kiwêstane da
rohim jîlemoy ber terse û ba ye.
Karwansera ye
Le serxo gîyane, karwansera ye!
Mergêkî tir e, temenêkî tir!
Werzêkî tir e, lafawî pengir!

VII

Karwansera ye
Berew lat dêm û hêşta roxsarim xewnêkî kalle
Le ser lutkey xoll
wêney tînuwêtî û serab helldebêt.
Diwa şiwênewarî awareyeke
le çiraxanî şarda win debêt.
Be nêw gerdaw da berew lat dêm û
temen helldekem.
Le bêşelanî ajawe û xoll da
polegoranî tînû dedêrim
Be pencekanit roh bijardekem.

To nîştmanît min awarebûn,
Le ser tînuwêtî û
le ser regekan hellimdekollît
Demkeyte ala û sirûdî rabûn.
To: Nîştman ît
Min: Awarebûn.

VIII

Karwansera ye
Em koçe sûre dûrryanî nêwan
merg û menfa ye.
Karwansera ye
Wilat jîlemoy ber terse û ba ye!
Eme rêkewte, yan zebrî mêjû?
Awa nîştiman: Karwansera ye
Karwansera ye.

Kabûl 1988

## Colane

Pellehewrêk daderrm û
deykem be demamk û lane
Deykem be alay winbûn û
çawerrwanî û
tamanî em gorristane.
Pellehewrêk daderrim û
le asmanî rojekanma wek kolare hellî dedem.
Ne, wek wilate dûrekem
bo roh deykem be colane.

Şam 1989

## Ewê şewê

Ewê şewê
wilat: Perjînî guman bû
Çingê pişkoy berbaran bû.
Wilat: Dîwarî dukell û
xewnêkî kallî pejmirde û
şoste û
golawî tawan bû!
Ewê şewê
wilat hawarêkî dûr bû
Şirrecanta û
hêroyîn û
kernevallî serbirrîn û
gelesegî ser sinûr bû
Wilat şepolî biruske,
mehall û
keprî ziryan bû.

Ewê şewê,
le menfa da,
wilat: Bo gerdin qenare û
bo dill xencerî deban bû.
Sofya 1985

## Nexşe

Ke rabowe
witî: Be nêw ajawe da deperrmewe
Witî: Wilate winekem
dedozmewe!
Le sermezra nexşey wilatekey kêşa
Be tîşk alay bo çinî
Lay êwarê,
mindallasa, xew birdîyewe.
Carêkî dî
xew, wilat û alayekey lê dizîyewe!

Swîd 1990

## Terim

*Bo Rehman*

Em terme le tenyayî da
dellêy xwênawî beyan e,
Be ser şewnim û gizing da rakişawe.
Dellêy telbendî sinûr e
yan çirîkeyekî dûr e
Le bîyabanî sutû da be cêmawe.
Em terme le bêdarî da dagîrsawe
Birînêk e
le ser nêwçawanî mêjû hellkendirawe.

Şam 1989

## Werzî cengell

Werzî cengell hat!
Wek rewe dukell dagîrim dekat
Le naw bulêllî bêkotayî da sererrom dekat
Le rûy serab û
şepolî xoll û
bîrçûnewe da awallem dekat.

Werzî cengell hat!
Le êware da
be ser herêmî roh da dadekat.
Werzî cengell hat!
Berew winbûn û helletim debat
Rohî ber rêjnem wek çiray ber ba,
wek hewarêkî jêrdeste û tenya
be tirs û heres gemaro dedat!
Werzî cengell e demkate kêllgey tînuwêtî û sût û
yan şarstanîy çirre dukelle?

Honsêy merg û xewnî pemeyî!
Lem cengelle da hellimtekêne
Rohî hellwedam, bo take satêk
be roh biçwêne!
Be xotim bigire û
be sererroyî û rastîm biçwêne!
Le pall biruske û termî mêjû da
dam bigîrsêne!

Werzî cengell hat
dagîrim dekat
Le rûy serab û bîrçûnewe da awallem dekat
Werzî cengell hat...
Werzî cengell....
Werzî....

1986

# Şayet

*Be yadî Yelmaz Guney*

## Çira

Pellehewrêk
nîweşewêk be xoy girtim
Pellehewrêk
berew rêy nehatî birdim
Le nêw cengellî kirrêwe û xerîbî da
winî kirdim.
Pelle hewrêk hellî girtim...
Nîweşewêk
le herêmî tenyayî da
çiraasa hellî kirdim.

Sofya 1985

## Be kiwê da hatît

Bem nîweşewe le kiwêwe hatît
Çon gerdî dîlît le xot tekand û
êwaranêkî temawî zistan,
wek xor hellhatît?

Sehollbendan bû. Be kiwê da hatît?
Agirbaran bû. Be kiwê da hatît
Kurdstan tijî segî bêgane û
nuqmî tawan bû
Be kiwê da hatît
Çon le herêmî gelegurg da
be şaristanî û
lawik rahatît?
Be kiwê da hatît?

Leber heresî em barane da
toy nuqmî xewin, pelkezêrrîneyit
Yan tavgey hellim
le seferber û
le jêr kelawey em werzane da
ruxsarî asoyit
yan gullegenim?

Le beyanêkî dagîrkiraw da
ême le gell to radebînewe...
Le xewnekanta, ruxsarî winman dedozînewe
Be xoşewîstî û
pelkezêrrîne û
lawk û
rastî
Kurdistanî dîl detenînewe.

Sofya 1985

## Yelmaz Guney

Ay le rohî serşêtim emşew çon wirujawe
Lafawêkî nawexte û
le hawîn da hestawe.
Rohî sirk û sererrom
dellêyî le rûy desrrêj û sêdare da, westawe
Be goranî û tûrreyî û lasarî helamsawe.

Ay le rohî çeprrewim emşew çon wirujawe
Xerîb û tak û tenya
dijî mehall westawe
Berew mêrgî serbestî
jiyanî pêş xoy dawe.

Sofya 1985

## Şayet

Hêşta zûye nawexte, sehollbendan e
Sedey şorreswar gilan e
Hevall!
Ke be cêman dêllît
Bimanke be gullûkî girr,
be kêllge bo em barane.

Le nêw em hewre sirke da
çon estêre deçnîyewe?
Çon temenî dagîrsawman
be cengell da
bere lutkey bê kotayî degwazîyewe?
Le sûtan da be kam liqegirr û tawan?
Be kam (Rêga) û
be kam baran
gunahe dêrînekan û
lekey mêjû desrrîyewe?

Xollbarîn e û
em tawane diwayî naye
Goranî tînû dedêrîn
rojan be gelay daristan dadepoşîn
Em sûtane sereta ye.
Hevall!
Zû ye, nawext e, sehollbendan e
Sedey şorreswar gilan e
Ke her be cêman dehêllît
Bimanke be gullûkî girr,
Be şayet
bo em tawan e.

Sofya 1986

# II
# Raz û guman

## Beyan

Le gell beyanî peyv da geşayewe
Peyvî hellçû
Katê wek sêberî şeket be mewdakan da helldezinêt,
peyvî rabû
wek estêre be tunêlî kat da dexzêt
Le rûy beyanî peyv da geşayewe!

1990

## Raz

Le kiwêra demî to rêy kewte xellwetî şewan im?
Gumrrabûm, yan dilldar?
Razabûm, yan bêdar?
Nazanim
kam rêkewt, kam rastî toy kirde behaney sûtan im
Ewendem le yade
min heman zaroke şeydakey caran im
Ke heman nîyaz û
heman raz
manayek be bûnim debexşin, germayî
be hemû jiyan im.

1990

## Be xo namo

Le nêwan pencekanit da çille gîyayekî jakaw im
Sêberêk im be xo namo
Kêle gorrêk im bê gillko
Hawarêk im
Le ser guman hellkendraw im.

Le nêwan pencekant da derextêk im
tînuwêtî deyrrinêtewe
çîrokêk im
namoyî deygêrêtewe.

Swîd 1990

## Bêdarî

Le ser hewrêkî pemeyî nawnîşanî xoy nûsîyewe.
Nihênîyekan le herêmî nebûnewe
carêkî dî
berew bêdarîy şewekey şorrbûnewe.

Le ser aso nawnîşanî xoy nûsîyewe
şew raneza
hewrêkî koçerî guşî
ke çî tînuwêtîy her neşka.

Şew raneza
Xewnekanî wek tem temenyan detenî û
be xoyan da deçûnewe
Xewnekanî, çingêk xunawî tînû bûn
le nêw beyanêkî lêll da hellbûnewe.

Swîd 1990

## Hellbûn

Be nêw winbûn da ret debêt
Berebeyan
be ser xakî xollemêş da dadekat û
wek biruske le nêw cengell da helldebêt.

Le winbûn da
be tirîfe tînuwêtî û şewnim dedêrêt
Rabirdûman be çingexoll deşwatewe.
Le rabûn da
çirîkeye şew deyçênêt
guman hellî dekatewe.

Şam 1989

## Kejawe

Le nêw gêjawî ew koçe nakawe da
ser bem cengelleş da dekeyin
Rengzerdîman wek termî kat
wek tînuwêtî û awareyî,
wek karesat

Le ser xezan helldekollîn
alay xollemêş helldekeyin.
Le gêjawî em koçe da
çawekanim
debin be cûtêk estêrey le tem gîra û
debin be gomî serab û
kêllgey xunaw.

Le nêw gêjawî em koçe nakawe da
ser bem sûtaneş da dekeyin
Alakeman le biruske dadetaşîn
Ciwanemergîman wek hetaw, wek honrawe
bo xak dekeyin be kejawe
Deykeyin be asoy em koçe,
be karwanseray ajawe.
Şam 1989

## Tîşk

*Bo ceza*

Çingêk pişkoy le nêw pelle hewrêk da çand
Balay wek dirextî şewnim
be ser mewdakan da tekand.
Em tîşke le kam zamewe hellqulawe?
Be kam gîyanî pepûleyî,
be kam şewbêdarî û evîn goşkirawe?
Ba le nêwan xollemêş û çirîke da
tîşk awêne û ruxsar bêt
Lem gorristane boreyeş da
tîşk hawdemî em koçe û
asoy şar bêt.

Şam 1989

## Tiruske

Le nêwanî heres û gerdî menfa da
şetllêk şewnim
le kenarî roh da derrwêt
Pelle hewrêk
wêney lawik le nêw xerman da helldebêt
Balay êware detenêt.

Le nakaw dêt
wek goranî derwazey em koçe dekutêt.
Le nakaw dêt
tiruskeyek le nêw baran da helldebêt
Le pall roh da awa debêt.

Şam 1989

## Le gell em koçe, koç meke!

Le ser em hewre geroke memnûsewe
Qollekanim herêmî em gumane nîn.
Qollekanim çollewar û
laney tînuwêtî û
hawar û
çeperî em sûtane nîn.
Le ser em hewre gerroke memnûsewe
Lem şewe da
qollekanim colaney em hejane nîn.

Ziryan e, Ziryan e. Ziryan
Zamekanim kilawrojney em koçen û
gullûke payîzey baran.

Êwe bêdartan kirdmewe!
Le sêberî em nemame lerzoke da
çingêk xoll û
pelkezêrrîne radexem
Kejaweyek bo koç le şepol sazdekem.
Le gell em koçe, koç meke!
Bazuwekanman
kejawey em tofane nîn
Nîgakanman
şewnimî em beyane nîn

Ziryan e... Ziryn e... Ziryan
Serim le hewir alawe
Bazuwekanim kejawen û
balam dirextî hetawe.

Şam 1989

## Be nêw tem da

***Bo Kemal Mîrawdelî***

Bem rêgaye temawiye da hengaw denêyin
Be balay zerd hellgerrawman
qûlayî aso depêwîn
Tînûyin... Mêjû be wêney lîmo deguşîn.
Hengaw denêyin le herêmî xerîbî da
gerdî wilate dûrekan,
temî beyan be dirûd û
be sêberî dagîrsawman dadepoşîn.

Hawrrêm lem xollbarîne da
ajawe daristanî şew radejênêt
Birînî xak rûbarekan deşwatewe
golawî kat deşlleqênêt.

Ewa lem çolleware da
gerdaw gemaroman dedat
Rastîyekan dûrrûyîn û
segwerr mewdakan terr dekat
Rêga dûr û temawiyekan ruwe û jan in
Xewnekanman kilawrojnen
be ser birîn û tînuwêtî û
be ser heres da derrwanin.

Bem rêgaye temawiye da
rû le nihênîyekan dekeyin
Le tarîkî em koçeyiş da
her nihênîyekan helldekeyin.

Şam 1989

## Bazû

Le nêw yekem tirîfe da palldekewêt
Dêrrexewne xolawyekan radebinewe:
Herçî degrêt rûnakî ye.
Bazuwekanî
wek tînuwêtî le gizing û xoll nabinewe.
Bazuwekanî
boşayîyekan dadepoşin,
Beyan bêdar dekenewe.
Bazuwekanî
dû nemamî dagîrsaw in
Dû kêlegorrî bê naw in
Bem xake da rodeçnewe.

## Cîyawazî

Le nakaw dêyit
be çingexoll terrim dekeyit
Le kolanî em koçe da rêm pê degrît
Ser berew xwar, be sûtan da hellim dexeyit
Çon le nêw gullegenim da şîn bibmewe?
To be şexte demşoytewe
Be ser balay ajawe da serim dexeyit
Çon cîyawazî le nêwanî
tateşor û
nîştîman da bidozmewe!

Şam 1989

## Tînû

Be nêw beyan da radekat
sêberekey boşayîyekan dadepoşêt
Xakî xollemêş ter dekat
keçî hêşta her tînû ye.
Sêberekey pelle hewrêkî gerok e
Xakêkî le tem gîrawe,
Xopêşandanî sutû ye.

Be nêw gizing da radekat
Be kêl aso depêwêt û
sêberekey
wek tenyayî, le ser lutkey xoll helldekat
Her tînû ye.
Ew serdarî tenyayî ye
Her tînû ye
(Heçî degrêt rûnakî ye)
Her tînû ye.
Be nêw beyan da radekat
(Herçî cêdêllêt sutû ye)
Keçî hêşta her tînû ye!
Her tînû ye!
Şam 1989

## Sûtan

Wek biruske le nêw hewra gîrsayewe
Wek tînuwêtî le nêw roh da geşayewe.

Gîyane em koçe sûtan e!
Rojekanman nuqmî tarîkî û serab in
jiyan kilawrojney jan e.

Wek biruske le nêw hewra gîrsayewe
Wek terim le jêr neşter da,
yan guman le rûy yeqîn da
hestayewe.

Şam 1989

## Gerdelûl

Pêş gerdelûl kejawekey be amêzî dadepoşêt
be nêw tem da sinûrî em koçe debirrêt.
Kejawekey
hêşta kellekî ser aw e.
Kejawekey
le ser çeqî rêyî xollemêş, alay leşkirî şikawe.

Gerdelûleke nîştewe
ne nawêk le ser kêle gorr
ne tabloy xwên be ser dîwarewe mawe.

Şam 1989

## Karwan

Lem sinûre tengeber û serabîye da
barge û barim berew nebûn berrêweye!
Nihênîyekan wek gêjaw hellimdelûşin,
Serim gorristanî kat e
Nîştîmanî kirrêwe ye.

Lem sinûre serabîye da
çarenûsim
berew guman berrêweye.

Şam 1989

## Hengaw

Be nêw sûtan da ret debêt
sirûdekey be dirextî tînuwêtî da helldewasêt
Rojekanî wek gorewî,
yan çepkezam
le nêw rûbar helldekêşêt.

Be nêw gerdaw da ret debêt
satekan gullbijêr dekat
Ta rabirdûy
be zerdegela dapoşêt.

Şam 1989

## Namo

Serit çiray tunêlêkî daxiraw e
Serit kûrey polêk razî wirujaw e
Ruwew her werzêk mil denêyit
le berdem derwazekey da,
bikujeket,
balay le gizing gîrawe!

1990

## Rabûn

Hemûyan le gell heres da rabûnewe:
Termî mêjû
Nisêyî reng û
lawk û
gizingî sirr bû.
Masî rûbar lê dizraw û
rewe ballindey bê lane û tem lênîştû!

Hemûyan le rûy heres da rabûnewe.

Sofya 1985

## Mehall

Deyewêt tarîkî û hetaw be yekewe le perde kat
Deyewêt le nêw gerdûn da
çiray birîn û
nihênî û
peyv û
rastî û
alay rojekanî helldekat.
Deyewêt.
...................
...................
Deyewêt estêre zîn kat

Sofya 1986

## Adgar

Amêz dedem le baranî bêkotayî û
debim be dilldarî rûbar.
Gerdûn be gullûk detenim,
Şew: Be beyan
Yeqîn: Be pirsîyar û guman
Şarî xamoşan: Be hawar.

Amêz dedem le baranî bêkotayî û
biruske dekem be adgar

Sofya 1986

## Nihênî

Çend carî dî
le ber heres da ramdegirît?
Be ser neşterî guman da ramdekêşêt,
Balam le girrî kat degirît?

Takey le nêw xollistanî sedekan da
winim dekeyit?
Çend carî dî
wek biruske terrim dekeyit?
Wek şimşêr serim dadegirît?
Ey nihênî

Sofya 1986

## Êşikgir

Le kolanî kirrêwe da
ta beyanî
êşik lem hejane degirim,
Wek polêk nihênî tînû
asmanî kat dagîr dekem
çeperî xamoşî debirrim.

Ta beyanî
Le herêmî ajawe da
sirûdî em jane deçrrim
balam bem sûtane degirim,
Hewir dekem be demamik û
êşik le evîn û rastî
Êşik lem cîhane degirim.

Sofya 1986

## To

To serabît yan kanî?
Winbûn û
durgey menfa û
rastî û
tirs û
goranî?
Yan kejawey hejan î?

Emşew be çîm deçwênît?
Le pall kam hellemut û heres da
becêm dêllît
Çend car damdegîrsênît?

To çît? Xewn ît, yan jan ît?
Yeqîn ît, yan guman ît?

Sofya 1986

## Tenyayî

Car becarêk
le nêw agir da demçênît
Wek tawanbar diwam dekewît
be çingêk xollim deçwênît.

Car be carêk
destemoy nebûnim dekeyit!
Weku rinû be ser roh da heres dênît.

Car be carîş
demkeyit be serdarî gerdûn
Be nîşane û ruxsarî bûn,
ey tenyayî.

Sofya 1986

## Alla

Lem herême berdîne da
goranîyek
be gerdinî tarîkî da helldewasê,
Estêreyek dekat be kejawey winbûn,
Tawêr: Be mall
Şepol û rastî: Be hevall
Biruske: Be alay rabûn.

Lem herême berdîne da
serim dekeyit be daristanî tûrreyî û
rohim be colaney gerdûn.

Sofya 1986

## Serdarî girr

Ho agirgir!
Bo le jêr pêllwî awsawima
daristan xoy derrinêtewe?
Beyan nuqmî nêw xoll debêt
le bîyabanî terze da
gizing û xunawî ser rûy desrrêtewe?

Ho agirgir
Bo le nêw temî pêllum da
lutke hewir cê dehêllêt
Debêt be serabêkî çirr
Wilat: Be polêk nihênî
Nihênîş: Be kêllgey pengir!

Xuday agir!
Were fallim bo bigirewe
Le razekanim hellkêşe û
paşerrojim wêney goranî biçrrewe.
Were........................
..................................
Were le girrim bigirewe
Serdarî girr!
Sofya 1986

## Mask

Qullekanî kird be keprî awareyî
Pêllwî be tacî namoyî!

Le pawanî serbirrîn da
sîpallî mêjû daypoşî
Nihênî destemo kird û
maskî regekanî poşî.

Sofya 1986

## Tenya carêk

Tenya carêk
girrî em sere hellbuwem xefekewe,
le pall nisêy rengekan da hellimwase
Bimke be rûpoş û adgar
bo hawarêk!

Tenya carêk
le nêw bulêllî yeqîn da
bimke kazîwey pirsîyarêk

Sofya 1986

## Siwar

Ke biruskey kirde şanî
gerdûn: Le amêzî girtîn
Nihênî: Le nêw xunaw da winî kirdîn
Daristan: Le rengî sewzî hellkêşayin û
lutke: Weku tem û gizing hellî kirdîn.

Ke biruskey kirde şanî
zewî bû be nêrgizecarr
Aso be lankey goranî.

Sofya 1986

## Goranîyek

Şew ta beyanî
dellêy le xwênî xoy da degewizêt
Çing dedat le–Ba– û tawêr û kanî.

Şew ta beyanî
gilênekanî rojney tarîkî û kanî hesret in
Ruxsarî serab,
hengawekanî ruwe û hellet in!

Çunke mergî xoy dawe be kola
Rêgay nehat û ebedî debirrêt
Le nêw bulêllî ajawe û xola
pole gizingî heqîqet degirêt.

Sofya 1986

## Lasar

Bo yeqîn destemo nabêt
Be hewrazî razekan da serdekewêt
Tîşkî rastî
bo dahatû derrnêtewe,
Le nêw şepolî mehall da
palldekewêt.

Sofya 1986

## Nehat!

Be ser pengir da radekat
Be ser kelawe û
hawar û
namoyî û
merga dadekat.
Rojekanî bo ajawe dekatewe
çiray nihênî helldekat.

Be nêw winbûn da radekat
Le nêw bêşelanî kat da
Le herêmî reşbigîrî û karesat da
Balay hellçûy
wek tenyayî be diway xoy da radekêşêt
Pişko û rêkewit dekat be yexey nehat da.

1986

## Ta bimênim

Ta bimênim
perjînî mendî deşkênim
Le nêw kelawey mawe da
Le herêmî ajawe da
şetlle tîşk û
nemamî mehall deçênim.

Ta bimênim
roh be colaney biruske radejênim.

Sofya 1986

## Rabûn 2

Çon dîsan le serbirrîn da rabûnewe?
Çon desrrêj û
lutkey xoll û
çeperî çeqotan birrî û
be rêy mehall da çûnewe?

Çon dîsan le serbirrîn da rabûnewe?

Sofya 1985

# Lawkî Hellebce
# 1989

## Lawkî Hellebce

Be tenya cêy mehêllin
emşew ziryan deyçênêt
Tem û mij daydepoşêt
mangeşew deyrrifênêt.

Gerûy be gizing terrken
zamekanî be şîlan
Be goranî daypoşin
yan be sewzîy daristan.

Serî be şepolan ken
ba em şewe rayjênêt
Balay le hewir bigirin
biruske û–Ba–deçênêt.

Be tenya cêy mehêllin
mindallêkî lasar e
Şar berdebaran dekat
mang dekat be kolar e.

Siware, çi şorreswarêk
espî hetaw zîn dekat
Be goranî û tîşk û maç
ser zemîn berîn dekat.

Ba kejawey le gull bêt
yan le pelkezêrrîne
Zemawendî xwên degirêt
em şew paşay evîn e.

Aşiqêkî lasar e
biruske û–Ba–deçênêt
Be tenya cêyî mehêllin
mangeşew deyfirrênêt.

Be nêw kêllgey xollemêş da hengaw denêm
çingêk şepol deçinmewe,
Be ser balay êware da
hellî dexem.
Le nêwanî sûtan û gullegenim da
sirûdêk demnusêtewe.
Baweşt bo degirmewe
qollekanim le dirextî xoll deallên
Qollekanim, wek talle xwên
be ser binar û aso da şorr debinewe.
Em hewranem lê dûrxewe!
Serim ne lutke û gewirr e
Ne bina re.
Tarmayîyekan berew lam dên
keçî rohim ne eşkewtî pîyawkujan e,
Ne cênzirg e û sêdar e
Şehîdekan be balat da ser dekewin,
Le zêyî çawekanit deden
bo nagene em binare?

Em binare
hêşta bonî xwênî lêdêt.
Hêşta rûbar, rengî birînî poşîwe
xoy be serab û tînuwêtî dapoşîwe.
Ne daristan emşew serim radejênêt,
ne birûske!
Negulleyek demgirête xoy
ne lutke!

Be nêw kêllgey zuqim û pişko da rêdekem
Firrokekan
bîrkirdinewem dadebêjin.
Wek çîyay girr, be ser xom da heres dênim.

Sêberî le xwên da winbûm
Tawêrekan dadepoşêt.
berew lat dêm
Qaçekanim le nêw tem da detwênewe.
Baweşit bo degirmewe,
qollekanim le dirextî xoll deallên.

Be nêw kêllgey jîlemo da hengaw denêm
Pellehewrêk borim dekat
Êware xom têhelldeswêt
Tarîkayî terrim dekat.
Le rûbarî mêjû dedem
singim debête gorrepan
Qollekanim debin be tenge derbendêk
bo leşkirî dagîrkeran.

Firrokekan le nakaw dên
Rût în, xoman be gijûgîya û
zerdegela û
be ajawe dadepoşîn.
Firrokekan le nakaw dên
Rût în, xoman be asman û
daristan û
lepî destman
dadepoşîn.
Çingêk şepol deçnînewe
deykeyin be demamik û reşmall
Tawêrêk helldekollîn û
keçî rût în,
Xoman be saçme û hewrî jehrawî dadepoşîn
Hêşta rût în...
Rût în...!
Rût în...!

Em termanem lê dûrxewe!
Serim ne mirdûxane ye
ne binary e.
Tarmayîyekanim lê derke!
Rohim ne eşkewtî çete û pîyawkujan e,
ne cênzerge û sêdar e.

Pellehewrêk em herême dadepoşêt
Biruskeyek em xake sûtemeroye
tawêk rûnak dekatewe û

xew le çawî terme jakawekan dedzêt
Bore xewnîyan le ser daristanî gerd û
sehollbendan helldekollêt.

Berew lat dêm
Şiwênpêy tirîfe helldegirim
Bonî gerdinî zêrrîn û
pirçî baranawît dekem,
Baskim le balay xolawît deallênim.
Rêjneyekî sûr dadekat
bîrewerî deşwatewe û
dirextî xoll detekênêt
Rêjneyek pelley rengawreng le ser berd û
nêw henase û
jêr pêlluman da deçênêt

Biruskeyek em xake sûtemeroye tawêk rûnak dekatewe
Dirextekan le nêw zuqma çiro deken.
Çirîkeyek cengelleke deşlleqênêt
Çirîkeyek termekan radeçllekênêt.
Wirya be gîyane! Xoyan in
Berberîst û
şirrexor û
çekmerreq û
Beduwekan in
Be wêney mişkî nêw cewall lem nawe teratên deken.
Xoyan in. Bellê xoyan in
Dîsan bo niwêj û
zekat û
kiç firandin
xirrbûnewe.
Melabangdan
wek gelegurgî dem be xwên hatûnewe.
Xoyan in
Bellê
xoyan in
Le soraxî rewştî dorrawiyan da
pence dexene nêw dem û gîrfanî mirduwekanewe
Be çingexoll
çawanî nuqmî nêw tirs û
çawanî pirr le pirsîyaryan dadepoşin.
Xoyan in
Tewaw
xoyan in

Çend sedeye negorraw in, wek xoyan in
Wek xoyan in... Wek xoyan in.

Dagîrkeran be nêw hawar da ret debin
Peleyan e!
Le girdekey ewberewe–le nêw gerd da–awa debin,
Peleyan e!
Le diway xoyan (weku sedan sall lemewber)
şiwên postal û
pelley xollemêşî û all û
bogenîwî henase û areqe û rohîyan
cêdehêllin!
Hêllincim dêt!
Qaçekanim hellimnagirin.
Çi hewayekî bogen e!
Mêjûyekî çend çend çillkin e!
Çi serdemêkî bogen e!
Hêllincim dêt
em gîyandane diwayî naye
Hêllincim dêt
em sûtane sereta ye!

Çirayekan dagîrsêne!
Ba hêndey dî tînû nebîn...
Alayek le şew da hellke
nawî denêyin liqebaran
Be tirîfe û tem terrmanke!
Debîne geşe,
yan xerman.

Emşew temen le nêw xoll da dagîrsawe.
Temen çiray berbaran e,
nemamî berdem lafaw e.
Emşew dellêy le nêw roh da
rûbarî (Xapûr) hellsaw e
Ziryanî (Qendîl) rasaw e.
Emşew dellêy hemû celladanî mêjû
şimşêryan le rûy rohim da hellkêşawe.

Kê dezanêt?
Min bêhude le kiwê demirim
Ba zewî hêmin bêtewe, weku ballindey ber baran le penay birînekanit da
aram bigirêt,
Ba lafawî dukell û jan bo satêk binîşêtewe

ta pîyawkujan be nêze û gazî jehrawî
wêney xoyan le ser laşeket hellkollin.
Em binare
ta dêt tengtir debêtewe!
Emşew çend termî tirman çand?
Çend pelle hewrî serkeşman
le aso ra
berew binar til kirdewe?
Çend sirûd û
lutke û
xewinman
dagîrsand?
Em binare
ta dêt tengtir debêtewe!

Lêman bibûrin birayne!
Neman dewîst zamekanman bikeyne ber em gelarrêzan û çeme...
Neman dewîst pelley sersingî jinan û
zerdexeney meyîwî rûy mindalanman
bibine sîmay em serdeme.

Bibûrin. Lêman. Bibûrin!
(Êweş ey zirrbirayekan)
Neman dewîst le nêw segwerr û cengell da
mergî xoman le pall lutke da hellkeyin û
weku gizing bîkeyne ber gullegenim,
Bîkeyne ber awareyî û
dareben û
kêllge û
şewnim.

Bibûrin gîyane bibûrin!
Namanewê mergî le nakawî xoman
bikeyin be pêwerî wîjdan
Dadperwerî
Birayetî û
be pêwerî mafî gelan.

Ême çend rût în le berdem tofanî gazî jehrawî û
bêrrewştî em çerxe da!
Ême çend tenyayin le pirsey
em şaroçke şehîde da!
Ême çend tenyayin le şîn da!
Çend tenyayin le şayî xwên û

kernevallî serbirrîn da!
Ême çend tenyayin!
Çend tenyayin!

Em careşyan çarenûsman be xetî dirişt
le ser hewir û–Ba–nûsîyewe
Çarenûsman weku mîrat,
be ser xêllî gurg û çeqell da beşîyewe.
Çend sedeye xwên deçênîn?
Temî mêjû, xollî ser ruxsarî aso desrrînewe
Tawêr û rûbar dekêllîn.
Çend sedeye nemamî mehall dedêrîn,
keçî hêşta tînûyin:
Wek aw!
Be xo namoyin:
Wêney mêgelî hellbirraw
Temawîyin:
Çeşnî daristan
tenyayin:
Wek qewanî siwaw
çend sedeye tînûyin:
Wek aw
tînûyin:
Wek aw!

Lem xake xollemêşeyîye da
çingêk şepol deçinmewe
be ser balay êware da hellî dexem.
Kejaweyek bo em koçe le tirîfe û gîya sazdekem.
Em binare
hêşta bonî xwênî lê dêt!
Em binare
hêşta bonî mergî lê dêt!

Be rûbarî çawekanta deperrmewe
Binar le aw dam detaşêt
Le şepol û limim degirêt.
Wek hewir demdate dem (Ba)
Binar le nêw kirrêwe da hellimdekat
Herrêmekî be her çiwarlaw
taze menfa û
be ser wilatî xellkî da
beşim dekat.

Em binare
hêşta bonî mergî lê dêt!
Berew binar nedehatim
belam lutke wek dêrexewnêkî lasar
wek maçe girr û cadûkar,
hellî girtim
Be şewarey baranetîşk û nihênî
gumirray kirdim.

Le bulêllî werzekan da
Le temomêk le pall lutke da biçêne!
Kêllge be goranî terrke
Roh: Be şewnim,
Tînuwêtî: Be gullegenim.
Ba aşiq û şehîdekan, şewan be dîyar zirrexewin û tenyayîyewe danemênin
Ba weku biruskey xencer, le pall metirsî û tawan da werzekan bêdarkenewe û şew rajênin.

Rabe rolle neberdekem!
Rabe şare şehîdekem!
Rabe hawar û firmêskî xollemêşîy
korpekanit bişorewe.
Rabe wîjdan û ciwamêrî
be ser em dinya dune da bibeşewe.
Rabe lekey şermezarî ser ruxsarî
dostekanman bo bisrrewe.
Manayekî niwê bo tawan
Bo yeksanî û
birayetîy dirozinaney torr û masî
Pet û gerdin bidozewe!
Rabe rolle ciwamêrekem!
Rabe şare şehîdekem!

Hellebce awêney roh e
Şepolêkî penaber e
Şew le yexey tarîkî û metirsîy dedat.
Termêk e
le kifin û tateşor yaxî buwe.
Çirayek e
hejaranî em serdeme hellîdeken.
Hellebce herêmî jan e
Alay sûrî "Komone "ye
Wilatî bê wilatan e.

Hellebce heresî heq e
Çingê xoll e, xwên deydêrêt.
Dastanêk e, beyan le zam daydetaşêt
le ser tem û
daristan û
xollemêş deynûsêtewe,
Rûbar bedem giryanewe
bo gîya
derya
kenar
tirîfey degêrrêtewe.

Hellebce awêney roh e
Hellebce dirextî xwên e
xoll deydêrêt
Serî birrawî "Huseyin "e
Be wilatan da deygêrrin
Çirîkeyekî zamdar e
em herême dehejênêt
Zewî bêdardekatewe
Lutke û binar radejênêt.
Hellebce dirextî xoll e
xwên deydêrêt.
Meçekêkî perrêndirawe, le gorrewe derhatuwe
Derwazey gerdûn û
aştî û
wîjdan dekutêt
Sirûdêk e
zehmetkêşan be yek gerû deyçirrnewe:
Hellebce janî serdem e
Hellebce herêmî tem e
Hellebce ayindema ne
Hellebce mergî yezdan e
Hellebce
mergî Yezdan e!

Ba hellebce
diwa sîmfonyay em şewe bêt
Ba hellebce
peyamî sûrî newe bêt
Ba diwa kernevallî xwên û
birînî ebedî rohî netewe bêt
Ba hellebce
tahetaye hellebce bêt

Hellebce bêt
Hellebce bêt!

Şew ret debêt sirûdekem tewaw nabêt.
Şew ret debêt gerûm be gizing terr nabêt
Temen wek gerd, wek zerdegela û gaşeberd
payîz û binar detenêt.
Be ser pirdebaz da derrom lawkekanim, honrawe awarekanim
wêney çolekey çawnûsaw, ber dîwar
rûnakayî
ber hawar û
taşeberdekan dekewin.
Be nakamî,
le ser term û şepolekan cê demênin
Birînêk le ser gizing û
dirext û
rûbar cêdêllin.

Werin lewdî û şûşebend û le ballkonî sinûrewe
bo em termane birrwanin
Bergî Newrozyan poşîwe
Herremekî, wêney heresî çîyay reng
mewdakanyan dapoşîwe.
Ew termaney
wek zerdegelay payîzan
be jakawî, giwê rûbar û
werz û
şeqam û
binar û
berebeyanîyan tenîwe.

Şew derrwat û goranîyekem tewaw nabêt
Şew derrwat û gerûm be hetaw terr nabêt.
Le nêwanî tînuwêtî û bîrewerîy da dadegîrsêm.
Beyan xollemêşekem be gizing,
be tenketem deşwatewe.
Gîyane hemû rêgayekan
le desttewe serhelldeden.
Le ser lepî destekanit
şehîdekan
le niwê le dayik debinewe,
Şehîdekan
le sengerî destekanta
ser le niwê şehîd debinewe.

Be tenya cêy mehêllin
em şew birîn deyçênêt
Tem û mij daydepoşêt
mangeşew deyfirrênêt

Gerûy be gizing terrken
zamekanî be şîlan
Be goranî daypoşin
yan be sewzîy daristan

Serî be şepolan ken
ba em şewe rajênêt
Balay le hewir bigirin
biruske û–Ba–deçênê

Be tenya cêy mehêllin
mindallêkî lasar e
Em şewe dehejênêt
mang dekat be kolar e

*

Kejaweyek bo em koçe le tirîfe û gîya sazdekem.
Berew em sûtane derrom
Kê dezanêt min bêhude le kiwê demirim?
Berew em sûtane derrom
Le ser sewzayî daristan hellimkolle,
yan le çirîke bimtaşe
ta balam wek dirextî girr
şew rajênêt!

Kejaweyek bo em koçe le tirîfe û xoll sazdekem.
Biruskeyek em xake sûtemeroye terr dekat û xew le çawî
terme bênazekan dedzêt
Çi hengawnanêkî sext e!
Çi helldêr û werçerxanêkî mêjûyî ye
Binar ruwew hewraz hellman degirêt,
Hewraz berew sinûr û
tînwûêtî û
menfa!

Ta le sinûr awa debîn

tenya çeperî ziryan e!
Dengdanewey bêdengî ye
Awazî agirbaran e
Lûrey gurg e
Nisêy dall e
Rewînewey tenketemî nêwan yeqîn û guman e.
Ta le sinûr awa debîn boşayî ye
Boşayî ye
Boşayî!
Ta le sinûr awa debîn bonî gazî jehrawî ye
Jehrawî ye
Jehrawî!
Ne daristan em şew serim radejênêt,
ne biruske!
Ne gulleyek be xoyim degirêt,
ne lutke!

Be nêw kêllgey jîlemo da berew lat dêm
pêyekanim le dum nayen.
Ser be her dewen û berd û gîyayek dekem
jehrawî ye
Baweş be her haje û lawkêk da dekem
jehrawî ye
Pena bo her dostêk debem
pel bo şepolêkî aşna dirêj dekem
Jehrawî ye
Bonî baran e behar e
Tavge
ballefirrey ballinde
segwerr û
maçî lêwanman
Jehraw în û jehraw în û jehraw în!
Nîgay sirr û hepesawman
dadperwerî
peresêlke
callcalloke
kurdayetî
qaspey kew û
niza û hawarî xinkawman
jehraw în û jehraw în û jehraw în!

Em çirayane dagîrsêne!
Ba hêndey dê tînû nebîn,
Alayek le şew da hellke

nawî denêyin liqebaran
Be tirîfe û tem terrimanke!
Debîne geşe,
yan xerman.

Kejaweyek bo em koçe le tirîfe û gîya sazdekeyin
Le nêw şew da
gorrêkî qûllî be komell helldekenîn
keçî debêt be delaqe û
be ser desrrêj da derrwanêt.
Ba lawkêk bikeyin be keprî em jane
yan sirûdêk
be colaney em gîyandane!
Ziryanêkî nawext hat
be ser tawêr û rûbar da çemayewe,
Ême balay werzekanman le lawik girt
Çiray neweyekî wêllman
be nêw tunêlî ziryan da berê dekird.
Neweyekî bê dahatû û sererro bûyin
le nêw xoll û
paşkoy zîl û
awareyî û
desrrêj da çawman hellhêna,
Berxoley berdem çeqo bûyin.
Neweyekî
bê dahatû û sererro bûyin.
Sererro bûyin.

Nihênîyekan depişkinim
ta le nêwan heqîqet û çawekanta
sinûrêk bo em gumane bidozmewe
ta alakem le ser kelawekan hellkem,
Gerdî sedekan le ser roh
şiwênewarî dagîrkeran le ser kanî û
zerdexene û
baran û
gîya
le ser pencerey jûrekem bisirrmewe.
Nihênîyekan depişkinim
ta dastanî em dastane
yan tawanî em tawane
bo newekem binûsmewe.

Ewa dîsan, zamekanman kirdewe ber

em gelarrêzan û çem e
Pelley ser singî jinan û
zerdexeney tezîwî rûy mindalanman
bûne sîmay em serdem e.
Ewa dîsan le nêw segwerr û cengell da
ciwanemergîman helldekeyin
Wêney gizing dekeyne ber gullegenim
Deykeyne ber awareyî û
dareben û
kêllge û
şewnim.
Ême çend rût în le berdem tofanî gazî jehrawî û
bêrrewştîy em çerxe da!
Ême çend tenyayin le pirsey
em şaroçke şehîde da!

Binû korpe şîrînekem!
Çîtir dengî destrrêj û firroke nayet
Binû rohe şeketekem!
Bonî gaz û xwên û caneweran nayet.

Binû be xak
Be rûtêtîm
Be mergî xom û
tînuwêtîm datdepoşim,
Em sûtane sereta ye.

Binû be pelke zêrrîne
Be nêrgiz û
cemedanî û
lawkesûre û
be amêzî dagîrsawim datdepoşim
Em tawane diwayî naye

Binû korpe lasarekem!
Em tawane sereta ye
Binû rohe şeketem!
Binû
cigergoşem
Binû!

Gerûy be gizing terrken
Zamekanî be şîlan
Be goranî daypoşin

yan be sewzîy daristan

Ba kejawey le gull bêt
yan le pelkezêrrîne
Zemawendî xwên degirêt
em şew paşay evîn e

Siware çi şorreswarêk
espî hetaw zîn dekat
Be lawik û tîşk û maç
serzemîn berîn dekat.

Aşiqêkî lasar e
biruske û ba deçênêt
Be tenya cêm mehêllin
mangeşew deyrrfênêt.

Januwarî 1989

# Werzî sehollbendan
# 1987

***Bo Eka***

*Be rastî le serdemêkî tarîk da dejîm*
*Gemjî ye be nerim û nîyanî bidwêyit.*
*Nêwçewanî sift û lûs nîşaney debengî ye.*
*A ew kesey pêdekenêt*
*hêşta hewallî metirsîy pênegeyiştuwe.*

***Birêxt***

*Katî koç hat*
*Ême, her yekeman be rêgay xoman da derroyin*
*Min ta bimirim*
*toyiş ta bijît,*
*Be tenê xwawend dezanêt*
*lem dû rêgaye kamyan çêtir e.*

***Eflatûn***

**Werzî sehollbendan**

Carêkî dî
menfa aşiqî kirdewe
Menfa le hewrî hellkêşa û
ruxsarî le xoll girtewe.

Carêkî dî
evîn mindallî kirdewe
Nihênî hellî girtewe
Be balay tîşk da hellgera
Rohî le şexte gîrawî
be rêjney agir şuştewe.

I

Le êwarey êware da
nihênî rohî lasarim perjîn dekat
Rehêle riwalletî kallim desrrêtewe
Le binarî guman û bêaramî da
ser be liqî girr dekem û
xom be terze dadepoşim.

Sirke hewrêk le nêw dill da rê win dekat
Pelle xwênî ser dîwar û
gerdî menfa û
êware û
wilat terr dekat.
Em wilate daçorrawe dellêy delaqey birîn e
Be ser desrrêj da derrwanêt
dellêy hewrêkî şeket e
Be ser derwazey gerdûn da hellwasrawe.

Dahatû û pole goranî le to naçin

Bîrewerî û serbirrîn û
kêllgey befir û hellwasîn û
xorawabûn û namoyîş.
Çon lem menfa petaye da wek zerdegelay payizan
şostekanit dapoşîwe?
Wek rengî tînuwêtî û baran
Temenî xolawî ême û
perawêzî asman û asot tenîwe!
Ta dêt menfa:
Berîn û berîntir debêt!
Ta dêt birîn:
Qûl û qûll û qûlltir debêt
Ta dêt evîn:
Mehall û mehalltir debêt.

Estêreyek deçinmewe le nêw dill da penay dedem.
Le ber derwazey menfa da
êwareyek damdepoşêt ke baran û
daristan û
bîrewerî
be take rengêk detenêt!
Be ser hewrazî guman da helldezinêm
serim ber aso dekewêt
Le nêwanî
asmanî pîrozeyî û qûlayî çawekanit da
mawe û sinûrî rengekan bizir dekem,
Menfa û bulêllî ayinde û
her şitêk, feramoş dekem.

Nihênî rohî sererrom perjîn dekat
Demkate kêllgey winbûn û tirs û rinû
Wek birûske terrim dekat
demkate xellûz û sutû.

Nîştîmanim!
Çon xû be katewe bigirim?
Nîştîmanim!
Çon xû be dengewe bigirim?
Çon xû be rengewe bigirim?
Nîştîmanim!
Çend carî dî le menfa da debê bimirim?
Nîştîmanim!

II

Debêt behaney hewir bênmewe
ta biruske destemokem
Defterî xoll û rehêlle bixwênmewe
Debêt behaney hewir bênmewe
ta estêrey karwankuje
dund û
binar
bikem be hevall û dilldar.
Debêt behaney hewir bênmewe
ta gerdûn bikem be lane û
sinûrekan, weku zinar,
le nêw gîyan da
bitwênmewe.

III

Le tarîkî em şewe da
çirayek be liqî şew da helldewasim
Estêreyek deçinmewe
le nêw dill da penay dedem.
Le ber çorrawgey evîn da
gunahe mêjûyîyekanim deşomewe!
Be ser da merro!
Le golawî namoyî da nuqim debêt,
Be ser em hellme da merro!
Le nêw kolanî payîz da asê debît.
Eme helldêrî sûtan e
Nîştîmanî evîn nîye
Keprî xoll e
Durgey heres û  guman e.
Le pêşwazît da westawim
weku termêk çawerrwanî tateşor û kifin bikat.
Guman herasanim dekat
Tarîkay hellim dekat.
Ruxsarî le tem gîrawim wek wilatêkî bindeste û
be xo namo
debête mêrgî winbûn û
jan û
çeqo.
Le pêşwazît da westawim
Nihênî dagîrim dekat

Tarîkayî hellimdekat.

Şazade le nêw wenewiz da çaw helldênêt
Le ber awêney seholl da şakezîy xoy
be şaney baran dadenêt.
Sêwexanê!
Em şew le gerdûnî çawta lenger degirim.
Hatûm le maçanit bigirim.
Sêwexanê!
Em şew biruske zîn dekem, hellit degirim.

Be ser şanî daristan da serdekewim
Çirayek be liqî şew da helldewasim
Le nêwanî dû lutke da
hewrêk dekem be colane
Tawllêkî bê xak û estûnd,
Eşkewtêk
Pena dewenêk be hêlane.
Bo kiwêt berim sêwexanê!
Be şewî bawboranê!
Nagemewe Kurdstanê!

- Dû dilldarî bê wilat
çeperî çeqo debirrin
Dû dilldarî yaxî û lat
lawkî mehall deçirrin
Dû dilldarî rojhelat
alay birîn helldebirrin,
Ser be cengell deken û
êşik le gerdûn degirin
Dû dilldarî bê wilat
Dû dilldarî
yaxî û
lat!

Weku espêkî ballgirtû be wilatêk da radekeyin
ke wilatî ême nîye
Be ser kirrêwe û winbûn da hengaw denêyin
Estêreyek
le nêw dill da heşar dedeyin
Çirayek
be liqî xewin da,
Goranîyek
be balay qûçî aso da helldewasîn.

Rehêlle ruxsarî kallim desrrêtewe
Rêgayekan wek delîlêkî nabelled winim deken
Sinûrekan weku gelegurgî birsî têm deallên
Pallim dexen le ser tateşorî pişko,
le paşkoy zîlim debestin berew bîyabanî çeqo.

Bo kiwêt berim sêwexanê?
Em rojgare:
((Ne cêy fîraran e
ne cêy jinhellgiran e
ne cêy xoşmêran e)) (*)

Serdarî rohe şêtekem!
Bo kiwêt berim?
Em kernevallî kuştine
bo ême ye?
Em hemû pete zibrane
bo gerdinî sedcar rûşawî ême ye?
Bo kiwêt berim?
Bo kiwêt berim?
Eme kûlekey rohekem bîşkêne!
Eme dille nasorekem...
Çon em dillet bo binêrim?
Çon be nêw segî sinûr û
mîn û
kemîn û
telben da derbazî kem?
Be kam qasîdî bispêrim?
Çon em dillet bo binêrim?

Şazade le nêw wenewza çaw helldênêt
Şazade lankey ayinde radejênêt.
Dezanim
gîyane!
Dezanim
xoşewîstîyit tewqî ebedîy gerdin e.
Xoşewîstîyit sûtan e, dagîrkirdin e.
Bê toyiş serdarî rohekem
jiyan menfa û
menfayiş tunêlî mirdin e!

Leylam leşkirî tetar e
Leşkirî berberîstaney ereb û turk û qacar e

Le nêw gerdî sedekan da winim dekat,
Kudêta û bûmelerze ye
wilatî roh wêran dekat
Leylam xewnêkî lasar e
berew rêy mehallim debat
Dezanim
gîyane!
dezanim
.....................................
.....................................

Le tarîkî em şewe da
çirayek be liqî xewin da helldewasim
Serî mandûm le nêwanî dû şepol da heşar dedem.

Carêkî ke
evîn mindallî kirdewe
Carêkî dî
guman dagîrî kirdewe...
Le nêwan kanî û serab da
serî be daristan kird û
qollekanî be ser mehall û mêjû da
şorr kirdewe.

IV

Berew sinûrekan derrom
tallexwênêk weku mar be diwam da dekşêt
Pellehewrêk le pêyekanim deallêt.
Berew sinûrekan derrom
balam le ser darebenêk helldekollim
Rohim le ser zinarêk.

Le kiwêrra têhellçînewe?
Debêt çend cengell û lutke û sinûr bibirrîn
ta em asmane le pêstman bikeynewe?
Debê çendcar le kujran da rabînewe
ta şiwênewarî winbûn û
rim û
menfa,
şiwênewarî qamçî û zincîr bisrrînewe?

Le bîyabanêkî teng da

serabêk pelî kêşam û
cogeley lim rijaye jûrî dillmewe
Tînuwêtî rêy lê win kirdim
Lêm gerrê ba le penay em kelawerra
pellehewrêk berew ewdîw tilkemewe,
Ba seretayek bo birîn,
Manayek bo dadperwerî bidozmewe.
Pallman be gizingewe da
şepolî gerd winî kirdîn!
Pallman be dukellewe da
gijeba dagîrî kirdîn!

Bo temenman tenya maf zewit kirdine?
Xewbînînî berdem petî sêdare ye,
satî çawerrêkirdinî destrrêj û kewllkirdin e.
Ba em temene guşrawe le nêw xunaw da biçênîn! ...
Rojekanman le nêw winbûn da hellkeyin û
roh be jîlemo rabênîn.
Ba em temene doşrawe
satêk be gerdaw biçiwênîn!

Be ser merg û termî xom da hengawdenêm
Sêberekem
rêm pêdegirêt,
Talle xwênêk
weku mar be diwam da dekşêt
Le pall binarî agir da
piştim le gell taşeberdê cût dekem û
çaw debirrme ew asoyey bonî toy lê dêt.
Biruskeyek dirzê dexate asman û
le serrra
aso deqllîşêt.
Weku mindallêkî toqî û serim be koşt dekem û
ruxsarî zerd hellgerrawim be şakezî baranawîyit dadepoşim.

Çon bem kujrane razî bûyin?
Le diway xoman
şiwênewarêkman cênehêşt le ser kêllgey em barane
şetllê goranîman neçand
Keprêkman nekird be nisêy em sûtane.
Telbendêk be pasewan û
hawdemî em gorristane.
Çon bem sûtane razî bûyin?

Le diway xoman
hawarêkman le ser lutke nekird be ala û nîşane,
Mang be şayetî zemane!
Çon bem kujrane razî bûyin?
Çon bem sûtane razî bûyin?! (**)

Leylam le wêraney roh da şetllekan awrrişên dekat
Temî ser pencerey dill û
tirsî ser rûm desrrêtewe,
Temen be girr perjîn dekat.
To her serdarî em rohe dagîrsaweyit
bestey em geruwe nûsaweyit.
To her xewne lasarekey em şayire rawinraweyit
To her serdarî em rohe hellwasraweyit.

Weku espêkî ballgirtû be wilatêk da radekeyin
ke wilatî ême nîye.
Le nêwanî dû lutke da
hewrêk dekeyin be colane
Tawllêkî bê estûnd û xak,
eşkewtêk, pena dewenêk be hêlane.
Weku espêkî ballgirtû leber baran da radekeyin!
Bo kiwêt berim Sêwexanê?
Be şewî ba û boranê
nagemewe Kurdstanê!

Le kiwêrra têhellçînewe?
Çend carî dî
dastanî ciwanemergîman biçrrînewe?
Ta asman le nîga û pêstman,
Xwên le loke
Pet le gerdin
Tem le lutke
Çeqo le zam bikeynewe!

Çend carî dî?
Be birûske da serkewîn be sûtan da bêyne xwarê
Balaman le ser dareben hellkollîn û
gerûman le ser hawarê!
Çend carî dî?
Le kernevallî heres da rabînewe.
Be ser rêgay serbirrîn da biçînewe!
Çend carî dî?

Ke çûyne jêr em keprewe
hêşta mêjû serabêk bû aşiqanî xoy win dekird.
Ke çûyne naw em hewrewe
hêşta mêjû baranêk bû be ser zongaw da debarî,
Yan nokerêkî xesîw bû gemey le gell leşularî
şajin dekird.
Hêşta mêjû cengellêk bû...
..........................................
..........................................
Hêşta mêjû çillkî dest bû
Mêjû bîjûy sîyaset bû
Hêşta mêjû...

Le pall em hellemute da
be ser kirrêwe û zinar da hengaw denêm
Le ser lepî destekanim nihênî xoy dekatewe
Birûskeyek terrim dekat
Demkat be nisêy bîyaban
Reşbigîrî hellmdebirrêt
Be zebrî şeq demkat be çete,
Gorrhellken
Rêgir
Huştirxorke
Zêwan
Yaxî
Kennas
Ajaweçî
Turkî kêwî
Hemball
Pîyawkuj
Gurg û ...
Demkat be hawcûtî tawan!

— Emane kên bem nawexte
xew le çawî awayî û mindalan dedizin
+ ((Berberîstan in bo diwaniwêj xirrbûnewe
Beduwekan in be zebrî şimşêr xizawne awayîyewe.))(***)
— Emane çîn? Kam dirrinde û canewer in?
Korpe le amêzî dayik û maç le lêwî dilldar dedizin
+ Şirrexor û
şaqel şorr û
teplesûr û
qerepepax in ser le niwê
be qellxan û şimşêrewe berî dergeyan pê girtûyin

Bo bac
Zekat
Talan
hatûnewe.
Bedwekan in şakiçanman zewit deken,
Berberîstan in bo diwaniwêj xirr bûnewe.

Rehêle ruxsarî kallim desrrêtewe...
Halawî xwên hellimdegirêt
Nîgam deçnêtewe.
Le binarî sûtan û bêaramîy da
ser be liqî girr dekem û
xom be terze dadepoşim.
Bo ta êstaş,
ayinde û serwerî xotan le hellwasînma debînin?
Bo ta êstaş,
şaristanî û mêjûy xotan le dîlîyetîma debînin?
Bo ta êstaş?

Le kiwêrra têhellçînewe?
Çend carî dî?
Dastanî ciwanemegîman biçrrînewe.
Çend carî dî?
Le kujran da rabînewe.
Ta şiwênewarî winbûn û
şiwênewarî berberîstan bisrrînewe.
Le kiwêrra destpêkeynewe?

Êware bû
katêk hatîn em zemane
le cengell da dagîrsa bû.
Be ser kêl û minare da hellwasra bû
Katêk hatîn em zemane
qamçî destî zordaran bû
Kalay bazarrî sermaye û
deskelay destî tawan bû
Katêk hatîn
êware bû!

Le bîyabanêkî teng da serabêk pelkêşî kirdim,
Cogeley lim rijaye naxî dillmewe
Tînuwêtî dagîrî kirdim.
— Kake çekeke le şan ke!
— Kake birûske le şan ke!

Awazêk lem binarerra, be hêminî be ser roh da dête xwarê.
Awazêk çirç û loçî ruxsarim pirr dekatewe. Muwe spîyekanî serim ser le niwê reşdekatewe.
Demkat be aşiq, be mindall le baweşî winbûy dayikma, tawêk germim dekatewe.

Ke le dayik bû
daye rûtêtîy kirde ber korpey
Memkî birsêtîy xiste dem korpey.
Be ser pêyan kewit
Daye pêxawsîy kirde pêy korpey.

Le şew da mewdakan denûn
Sinûrekan detwênewe.
Le pall em hellemute da
be ser merg û termî xom da hengawdenêm
Estêreyek deçinemewe
Le nêw dill da penay dedem.
Le kernevallî sûtan da
rêjne hellimdekatewe
Menfam le bîr debatewe,
Berew berdeqareman û
Silêmanî û
Mehabad û
gomî Wan û
kelawekanî Qeladizêm debatewe.

Rêjne hellimdekatewe
Qollekanim dekat be keprî tûrreyî
Be biruske demşiwatewe.
Kake çekeket le şan ke!
Mêjû, şaristanî cengell, împiryalîzim, bîyaban, toranîzim, arabîzim, panêranîzim, sinûr, polîs, pitrodolar, zemane gullebaran ke!
Kake çekeket le şan ke!

Le cengell da
be xwên meslletî xwên dekirêt!
Kake çekeket le şan ke!
Le cengell da
be zebrî çek, meçek
Be lojîkî cengell heq destêndirêt!
Kake çekeket...
Kake!

V

Lem herême berdîne da
be ser kelawey mêjû da hengaw denêt
Darberrû dekat be zirê
Wek biruske lankey gerdûn radejênêt
Wêney hewir û pole gizing sinûrekan desrrêtewe
Mewda û dundekan detenêt.
Darberrû dekat be zira
bo newekan lawkî yaxîbûn deçrra.

VI

Pellehewrêk be ser em xakesûre da têdeperrêt.
Min ruxsarim be şepolêk dadepoşim.
Xew be wilatêkewe debînim ke wek rinû heres dênêt.
Serim dexeme nêwanî dû regî tînû
ta çepkê nihênî biçinmewe.
Çon be bê to bem koçkirdine razî bûm?
Em biruske wêll û şêt e
Le kiwêrra hat, şirrelêfey tarîkîy le ser hellgirtîn,
Leber çawî dost û dijmin rîsway kirdîn!

Lem binare çirre da, be ser mergî xom da derrom.
Agirê le ser balay baran dekemewe, ta xew le çawî heqîqet û gerdûn bidizim.
Mindalanî rûte û pêxwas be tûlerrêyekey ewber da
helldegerrên, ((Ey Reqîb)) û sirûdî însternasyonal dellênewe.
Lem binare çirre da hengaw denêm.
Be bazûy ruşawim asoy xolawî û jêrdeste dadepoşim,
ta alakem weku beyan le ser lutkey xollemêş, weku aştî le ser kelawey mêjû hellkem.

Le kiwêrra têhellçînewe?
Çend dastanî ciwanemergî û
çend lawkî sûrman çirrî
Sinûrêkman le nêwan tirs û xewin da nesrrîyewe!
Çend heres û
destrrêj û
lutkeman birrî
Cîyawazîman le nêwan torr û masî da
le nêwan pet û gerdin da nedozîyewe!

Le pall sermay binarêk da ser be nermeberdêk dekeyin.
Wek darberrûy dinyadîde, xoman be damenî mij û be çingegerd dadepoşîn.
Demanewêt kejawe bo wilatêk saz bikeyin, ke le menfa da wek rinû heres dênêt

Demanewêt nihênîyek zîn bikeyin, ke demankat be polegerdêkî tînû le gerdûn da demançênêt.
Demanewêt manayek be jiyan û dahatû
bibexşîn…
Demanewêt… Demanewêt…

Keçî le pirr dên û 326emaromand eden, şewekeman beşî
xewbînînêk nakat.
Ser le niwê birînekanman dekenewe be nîşane,
Ser le niwa be xwênî kallman, rûbaran deşonewe!
Gîyane!
Eme çi zeman û cengellêk e?
Gîyane
Eme çi segwerr û serdemêk e!

Ême çîman le zemawendî decall û gurg dawe?
Boçî lem karwan seraye
reşmallî zamman helldawe?
Hemûyan serwerîy xoyan le hellwasînma debînin.
Hemûyan sêrem lêdegirin,
bûnî xoyan le nebûnim da debînin.

Ho lawo... Lawo… Ho lawo!
Çon bergey em werze degirît?
Takey be kipî, tawêrî birînekanit helldegirît?
Takey le rûy karesat û
dîlî û
gilanî mêjû da
hellîyan debirrît?
Ger birînekanit tablon
bo le çiwarçêweyan nagirît?
Eger esp in
lixawyan ke!
Ger şazaden
şorreswarîyan pênîşande!
Eger hewr in, yan samall in
asmanêkyan bo peyda ke
Ger xerman in yan reşmall in
bistê xakyan bo azad ke!
Ho lawo!
Lawo
Ho lawo!

Ewê şewê be şeketî le şarewe gerraynewe.
Kirrêwe rêy lê û winkirdîn, birsêtî berew binara hellî girtîn.
Be qondaxî çekekanman, be pajnepêy qurrawîman dergay kewêllêkman kuta.
Mindallêkî rûte û
pêxawis, qijhengwînî dergakey lêkirdînewe û qîjandî!
— Pîyawkujîn e!
Êwe nebûn babo kuştim?
Le ser çî bû
babo kuştim?
Pîyawkujîn e!

Mindallêkî sûrey çawşîn, qijhengwînî, neynasîn û derî kirdin,
Be dem heniskî janewe, çend cinêwêkî pêdayin, çingetfêkî têgirtîn.
Mindallêkî sûrey çawşîn, rûte û pêxawis nemanzanî
kurrî kam kellepêşmergey ciwanemerg bû,
Nemanzanî boçî bawkman kuşti bû?!
Belam be rast ême bawkman
kuşti bû?!

Kê em girrey le nêw rohim da kirdewe?
Kê be xwênim binarekanî şuştewe?
Xewne kallekanmî dizî û
zamekanmî be nîşane dakirdewe?
Kê be xwênim binarekanî şuştewe?

Ho pellehewrî lay binar!
Ho tînuwêtî lutke û rûbar!
Em şew polêk termî bênaz mîwante
êşikçî xewnekanîyan bin.
Rêga neden carêkî dî
berberîstan zamekanyan bikulênnewe.
Ta be tenya cênemênin,
Berebeyan, tuxwa xunawrrşênyan ken!
Be pelkezêrrîne û gizing dayanpoşin.
Ho çoleke û lutke û hawar!
Ho tînuwêtî û lim û zinar
êwe pîyawkujan denasin
Tenya êwen
be şayetî mêjû deşên
Êwen
pîyawkujan
denasin!

Ême çîman le zemawendî decall û gurg dawe?
Boçî lem karwanseraye
reşmallî zamman helldawe?
Gîyane boçî
xene bo pirçî rişkawî bigrînewe?
Gîyane dîsan
be ser rêgay pişko û mîn da deçînewe.

Çon nazanî?
((Le kin em dêmîye wişkane le derya nîye bas.))
Çon nazanî?
((Le kin em kolkesofîyane le ayinde nîye bas.)) (****)

De lawo... Lawo... De lawo!
Çend sedeye? Xoyan le kewllî merr nawe
Çend sedeye? Be makyac,
demamik û tara
ruxsarî xoyan siwax dawe
Çend sedeye? Kule şimşêr û
xencer û
qînî xoyan le jêr tacegullîne da heşar dawe.

De lawo... Lawo... De lawo
Takey be kipî xermanî em azarane helldegirît?
Çend carî dî
le rûy merg û
ajawe û
werzî cengell da
birînekanit helldebirrît?

Ho lawo... Lawo... Ho lawo
Tadê menfa berîn û berîntir debêt
Tadê evîn mehall û mehalltir debêt
Tadê birîn qûll û
qûll û
qûlltir debêt!

Nîştîmanim!
Le kiwêrra têhellçînewe?
Çend carî dî?
Balaman le ser şepolan hellkollîn
gerûman le ser hawarê
Çend carî dî?

be biruske da serkewîn
be sûtan da bêynexwarê!

VII

Be ser şanî biruske da serdekewim
le dîyardekan wird debmewe,
Serim be ziryan despêrim
le pall dûrtirîn dundewe
Rojekanim wêney tawêrêkî toqî û
berew binarî dahatû
helldedêrim.

Be ser şanî daristan da serdekewim
Serim be şimşêr despêrim
Be nêw lêlayî guman û
hewrêkî lengergirtû da
rohî sirk û bêsêberim
Berew dollî bêkotayî
helldedêrim.

VIII

Ser be singî qupawim ke!
Ba henaseyekî pak û qûll hellkêşim
Min demewêt
le nêw xewnî wenewşeyî û allî to da
tabloy wilat be rengî awî bikêşim.

Ser be rohî hestawim ke!
Ta bitbînim
ta bo satêk, le nêw xewnî mindalane û kallî to da
wilat le amêz bigirm û
lankey ayinde rajênim
Destî tûrrem
le rûy serdem da hellbibirim,
Xom be biruske biçwênim.

Gîyane îmşew ta beyanî dergay rohim le ser pişt e
Ba gişt zordaranî mêjû teratênî tê da biken.
Ba segeberrela û ballinde bêlanekanîş le nêwî da aram bigirin.

Lem şewe da, zordaran û gerdû mijî sedekan xoyan berew binarî rohim dekutin û le wê lêy dehesênewe.
Dezanim berebeyan weku pîyalley meyxane
wêney rebîyeyekî tepî û be tenya be cêy dehêllin.
Dezanim...
Her to serdarî em rohe dagîrsawey
Bestey em geruwe nûsawey
heman xewne lasarekey
em şayire rawinrawey.

Lew hewraze mirdin wek siwarêkî reşpoş şorrdebêtewe
Wek polêk tem, le ser pencerey jûrekem helldenîşêt û şewbaşim
lê dekat. Min xomî lê nenas dekem. Hêşta goranîyekem tewaw
nekirduwe... Çawanî leylam nekirdote xew... Hêşta welamî namey
dostanim nenûsîwe.
Dezanim hêşta mêjû cengell e, yan tewîley zordaran e
Keçî îmşew carêkî dî biruske zîn dekem û helltidegirim.
Carêkîdî darberrû dekemewe zirê be bazûy pirolîtaryanem asoy xolawî û
jêrdeste dadepoşim, alakem wek beyan le ser lutkey xollemêş,
wek aştî le ser kelawey mêjû helldekem.
Werzêk dekeme nomall ke zeystane.
Le nakaw biruskeyek terrim dekat,
le asmanî wenewşeyîrra be sûtan da
dêmexwarê!

Tenya rêkewtêkî rût bû, ke be destî pêşmergeyekî rûtelley şîrperwer şehîd nebûm.
Tenya rêkewtêkî rût bû, ke to wek gulleyekî wêll
le nêw dillim da gîrsaytewe
Tenya rêkewtêkî rût bû…
Dezanim gîyane! Dezanim
Em heware ((Hewarêkî çi pirr haware bê to.)) (****)
Dezanim gîyane! Dezanim
em zemane, zemanêkî çi bê amane bê to!

Dezanim… Gîyane…Dezanim!
Dû dilldarî bê wilat în
çeperî çeqo debirrîn
Dû dilldarî yaxî û lat în
lawkî mehall deçirrîn
Dû dilldarî rojhelat în
alay birîn helldebirrîn
Ser be cengell dekeyn û
êşik le gerdûn degirîn
Dû dilldarî bê wilat în

Dû dilldarî rojhelat în!

Ba em hewrane retbin û denke limêkî sûtawî kenarî dillim terrneken.
Ba caş û bîjûy heres û firroke harekan,
maçî lêwman bidizin û be tenya le pall kelaweke da cê bimênim.
Dezanim ke em şanoye –le nakaw –
xoy pêçayewe, debêt şûşey boş ko bikemewe...
Debêt em nawe xawên bikemewe...
Yan debêt be destî lerzokim milim berew peteke hellbibirrim,
xencereke le nêw dillim da niqum bikem û carêkî dî lawkî ciwanemergîm biçirrmewe.
Toyiş (Madona) reşpoşekem, be tenya galîskey nebûn radekêşît,
Ciwanemergîm be firmêskan deşoytewe, jiyan le xem helldekêşît...
Dezanim.... Gîyane.... Dezanim
Belam xuşimdewêyit.
Dezanim
gîyane!
Dezanim
belam...

Êmşew hatûm le pall pişkoy ber baran da
bo dîdey pîrozeyît goranîy lasarî deçirrim
Le nêw segwerr û tawan da
bo berokit çepkêk estêre dadegirim
Le ser tawêrî tînuwêtî ruxsarî xom helldekollim
rê be rêjne û lafaw degirim.

Be nêw ajawe û segwerr da
berew lat dêm
Çepkêk estêre dadegirim.
Serim dekem be kejawey nihênîyekan
Alay biruske helldebirrim.
Le bîyabanî seholl da
le nêwan haje û şepol da
çirayek be bejnî–Ba–da helldewasim
Le gell to!
rêy nehat debirrim.

Carêkî dî
menfa aşiqî kirdewe.
Carêkî dî
evîn mindallî kirdewe.
Le tarîkî sedekan da
nihênî hellî girtewe,

le nêwan kanî û serab da
çiray guman û mehallî hellkirdewe
Be balay tîşk da hellgerra û
rohî tînûy be rêjney agir şuştewe
Carêkî dî
evîn mindallî kirdewe
Serî be singî derya kird
Qollekanî be ser ayinde û mêjû da
şorrkirdewe.

Sofya 1986

# Sûtan le ber baran da
# 1985

I

# Goranîy roh

## Tenya nebûm

Tenya nebûm
şew termêk bû le penam da rakişabû
Kat tem û mij û nalle bû.
Wilat çingêk gerdî dem–Ba –
le balay rohim ala bû.

Tenya nebûm
agirêk bûm û nihênî deykirdimewe
Kitêbêk bûm qûllîy derya deyxwêndmewe.

Sofya 1983

## Goranîy roh

1

Nîweşew e, debime aşnay rûbarêkî serhellgirtû
Debime asoy karwanêkî ber rehêlle û rêwinkirdû
Debime hewrêkî koçerî û
xakêkî le xwên da winbû.
Nîweşew e û le bulêllî werzekan da
rohim tem û piruşe ye rûy binarekan detenêt
Rohim bayekî tûrre ye ber tawêrekan dekewêt
Rûbarekan radejenêt.
Nîweşew e, rohî şeydam espêkî ballagirîn e û
hellimdegirêt
le gerdûnêkî namo da lenger degirêt.

Bem nîweşewe... Ey rohî lasar
Rohî sererro û le medar derçûm çîm be ser dênît?
Le tarîkayî kam dîlewerza damdegîrsênît?
Bem nîweşewe berew kiwêm debeyit
be çîm deçwênît?

Temêkî çirr hat daypoşîm û çû
le bîyabanî rohim da winbû
Ey ew yeqîney maskî wilat û dundit poşîwe
be xotim bigire
Ta le hejan û hestanî roh da feramoşit kem
Bo satêkîş bêt,
serim le şexte û jîlemo bigire.

2

Toy helloy kuştey dunde asêkan,
helloy berzefirr
Sedan şew le pall zuqmî kiwêstan da
le pall gewirr da
wêney gurgêkî zamdar û birsî rojit kirdewe
be şewnixûnî û
xewin û
goranî
Rohî tezîwit delawandewe
Baweşî tînût bo werzî xoll û
dahatûy lêll û
lutke girtewe.
Keçî lutkey xewin, dundî aşiqkuj
le nêw şexte da sir û tezîwe
Dellêy xencere û le roh çeqîwe.
Ey dundî xewne kallekan!
Dundî sêbere sewzekan
Takey hellwedaman dekeyit
çend car awareman dekeyit?

3

Bem nîweşewe rohî wirujaw
berew kiwêm debeyit?
Le kam telan da becêm dehêllît
Ruwew kam serab heterim dekeyit?
Le dagerran da, be kam kêleberd degîrsêytewe
Le pall kam nisê û
xozge û
dewen da
dehesêytewe?

Temêkî çirr hat daypoşîm û çû
le bîyabanî rohim da winbû
Le rûy heresî em werzane da
serî naw polût, serî ber terzet
bixe ser singim
Le daristanî zuqma hellimke û
bibe be hawrrê û şayetî mergim.

4

Nîweşewe û hêşta rohim helloyekî kiwêstanî ye
Nuqmî eşiq û
sererroyî û
goranî ye.
Rohî sedcar hellwasrawim
hêşta her Kurdstanî ye
Şeyday aştî û
dundî dûr û
birayetî û
yeksanî ye
Rohî le medar yaxî bûm le kelawey werzekan da
gulûkî şarstanî ye.

Sofya 1985

## Çawerrwanî

Ta çaw birrkat bestellek e, tarîkî ye
Zuqm û
tem û
metirsî ye
Ta çaw birrkat tenyayî ye
Gerdûn nuqmî xerîbî ye!

Ey dijwarî!
Em şew le kam derwazewe
le kam diriz û kam rojnewe
wek piruşey dem gerdelûl xot xizande
nêw rohmewe?
Min dezanim
çi birînêk balay em werzey tenîwe!

Min dezanim
çon tînuwêtî somayî çawan dadênêt,
Çi tawanêk em herêmey dapoşîwe.
Keçî em şew dest lem direxte befrîne nakemewe.
Em şew dellêy:
Êşik le serbestî degirim

Dellêy:
Honrawe denûsim.
Yan dellêy le xerîbîm da çawerrwanim:
Kurdstanim
bête jiwanim.

Taran 1981

## Şewanî çawerrwanî

Le berdemî derwazeyekî daxiraw da
le kolanî xerîbî da çawerrêtim
Çawerrwanîm: Hawarêk e
le gerûyekî xinkaw da dagîrsawe
Temêke gerdûn detenêt
tînwêtî ye be serabewe nûsawe.

Gîyane deşê, lem şewe bê estêre da
pêş be asoy winbûn bigirît
Yan le dirizî awênewe
pirçî baran dabihênît
Keçî baran çingêk dukellî naw ba ye
be nêwanî hawar û pêllu da derrwat.
Baran xoll e
Baran serabêkî zerde şipirzeyî û
mandûbûnman bo dehênêt
Kam serbestî?
Kam goranî
tîşk
hîwa
xoşewîstî
le jêr hewrî bestellek da çaw helldênêt?

Le berdemî derwazeyekî daxiraw da
Le pall hewrêkî gerrok da baweşt bo degirmewe
ta bitwanim
le nêw tawêrî mehall da aram bigirim
Ta bitwanim:
Be nêw werzî xoll û jan da
gorre winekem hellbigirim.

Nokan 1982

## Berrêkirdin

Be ser pirdî xoll û dukell da birrom
termekem nawete kollim
Le nêw ba da, le nêw tîşik da
gorrekey xom helldekollim!

Be ser temen da rêdekem
sate wişk û xolawyekan
le gell ba da berê dekem.

Tujelle 1980

## Werzî xoll

Başe em şew nayeme lat!
Le nêw şepolêk da denûm
Şostey serma û
tenyayî dekem be wilat.

Em şew rohim kenarêkî çollkiraw e
Baran ruxsarî mirdûye,
Gerdûn tem e û
şepolî deryaş nîyazme.

Wa em şewîş nayeme lat
le pişt medarî katewe
werzî xoll dekem be wilat.

Nokan 1982

## To

Be ser rohim da hengaw hellbêne
ke aso xew bêt,
Kat zerdegela û
baran serab bêt
to bimhejêne.

To daristanî baranît
tem û gerdî rûy ayindem desrrîyewe,
Be xewin û xakim deçwênît
Nihênî bûn
Nihênî mirdin û gerdûn
le nêw defterî rohim da denûsîyewe.

1982

## Ruxsart

Ruxsarit wek aso denwênêt
Ruxsarit wek serab û winbûn
wek derya derdekewî
Ruxsarit şepolî hetawe
weku gerd, le kêllgey gerdûn da
demçênêt!

Ruxsarit dûrryanî mirdin û mirdin e
Ne gîyane
dûrryanî mirdin û jiyan e
Le berdem nihênî û
sersamî û
sûtan da ram degirêt
be şêtim deçwênêt.

Şam 1982

## Be çît biçwênim?

Be çît biçwênim?
Be asoy baran?
Be mandûbûn û
xewin û
tînuwêtî
yan be daristan?

Be çît biçiwênim?
Be polêk hetaw?
Be wilatêkî le xwên da gilaw?
Yan be goranî
Be henasedan,
Heres û
lafaw?

To le bûn deçît, be çît neçwênim!
Le nebûn deçît, be çît biçwênim!

Sofya 1983

## Rabûn

Wek pole gerdêk
defterî hetaw dexwênîtewe
Wek bûmelerze,
rengî sinûr û mewda tellxekan
reş dekeytewe.

To le biruskeyit, yan nejadî aw?
Sêberî xewnît, yan kanî hetaw?

Le serbirrîn da,
wek gulûkî girr radebîtewe
Ser le niwê mêjû
— Be qellemî dirişt–denûsîtewe,
Werze befrîne berew ayinde degwazîtewe

Sofya 1984

## Goranîyek

Dîsan werzekan berew kiwê debeyit?
Le nêw tunêlî şexte û winbûn da
çon ser derdekeyit?
Mewdakan xoll in
Nêwanî roj û şewekan xoll e
Dey em werzane çon derbaz dekeyit?
Key em werzane
serfiraz dekeyit?

Sofya 1982

## Temenî dûr

***Bo Goran***

*Be ser şîra kesê zalle serbest bê*
*Berrela bê, be areqî îşiq mest bê*
**Goran**

**I**
## Şêtî ciwanî

Nîweşewan be tenya
rêga çollekan degirêt
Ser be nêw tarîkayî û tem winbûn da dekat
Be ser serma û baran da
Be ser çallî bê bin da
Be ser merg da bazde da
ta şeket û kas debêt
Derrwa û le dillî xoy da goranî dellêtewe
Girrî henawî sirrî, satêk nakujêtewe.
Keçî ke ciwanîy bînî
weku mindall, weku şêt
koşî bo degrêtewe
Le naxî têrraman û xeyall da nuqim debêt
Goranî û mandubûn û
xoyşî bîrdeçêtewe.

## II
## Gîyanî şipirze

Şayir pencerey dillî xoy le rûy–Ba–da dekirdewe
deypirsî bo?
Şîr xewnî mindallêkî bê lanke ye?
Liqe hetawî nêw aw e
Nîştîmanî aşiqêkî aware ye?
Boçî şîr le xewnîş da bangim dekat?
Tenkexemêke û gemaroy gîyanim dedat
Keçî gîyanî bê amanim
temumjî giwê daristanêkî çirr e
Awabûnî werzî bestellek û girr e
Le zerdeasoy xollewe
be şiwên şîra
bazdedate nêw cîhanêkî çollewe.

## III
## Dillî şayir

1
Hêşta dille nasorekem
halawî xoşewîstî ye
Nihênî ye werzekanî dapoşîwe
Ruxsarî mêjûy tenîwe
weku kêle tîşkî tînû,
le xakêkî bê asman da
Le rûbar û tawêr û
pişko çeqîwe.

2

Şayir halawî azarekanî le şîr degirêt
be celladanî jûr serî dellêt
Serim dabigirin
Dillim goranî û
rûbarî eşqî lêwe helldequllêt
((Destî zordar sed ser eka nagate dill)) (***)**

Tujelle 1980

# II
# Çiray gorristan

## Tenya nebûm (2)

Tenya nebû
le pall birsêtî û tawêr da
le nêwan zuqm û helldêr da
herêmêkî bo dilldarî binyatnawe
Le sêberî namoyî da
çepkê xewin û tînwêtîye dagîrsawe.
Tenya nebû
le nêw hellmî werzekan da

Termî xoy be koll da dawe
Lafawêk e û le yaxîbûn da hestawe
Bo serbestî
nîştîmanêkî–Le nebûn–binyatnawe.

## Sûtan leber baran da

1

Ke le binareke dûr kewtmewe
diwaamêzim le çîya xwênawyeke tund kird
Be pence bê nînokekanim, le ser berd û xollî
lutke û damênekan
le ser balay birsêtî
Le ser regî darekan
naweketim hellkollî.

Ke le binareke dûr kewtimewe
le nizîk dê
gorristane xollemêşîyekem lê rast bowe
Gorrekan hêşta
nalley xwênyan lêdebîstira
Le nêw baran û ziryanî ew êware samnake da
wek çira hellîyan dekirdim
berew tem û xollemêşî roxî mêjûyan debirdim.

Ewe tewjimî halawî xwên e
Wêney sêberî tînuwêtî û mirdin
Dekşêt be ser em berdelane da
yan tem û mije, mêjû helldegirêt.
Weku tarmayî le tarîkayî em dalane da
le nêw kolanî em jiyane da
be dirêjayî sall pêşim pê degirêt?

2

Rûm pê lem werze berdîne meke
Em meşxelaney serim natiwanim
lem helldêre da likê dar nîye,
Kêleberdêkî tîj û har nîye
biçeqête nêw qûlayî gîyanim

3

Em şewîş royî
keçî siwarekan seryan lênedayin
yan le ser lutke dûrekan agiryan nekirdewe.
Deşê lem şewane da sêlawêk bê,

yan le nakaw abloqeman den.
Ême ne reşmallî kenarman ko kirdotewe
ne sengerêkman le nêw şew da hellkenduwe
Her carêk lem kenare şêdare da le dayik bîn
Her lêreyş da
le nêw çawerrwanî û lim da
Le nêw golawêk da... Demirîn.
Baskit bêne
ba rakişêm û tawêk baweşênim ke
Bonî kifin û
bonî dîlî û
bonî pîyawe momîyakanim lê dûrxewe
Le nêw bulêllî em xamoşîye da
wek goranîy sûrî jiyan
be baweşêk evînewe
bibarê nêw birînewe
Destim bigre û
be hêmnî bimixe dunyay berînewe.

4

Ta... Xorî toman lê helldêt
le rûy nebûn da
Le rûy winbûn da
pê le çem denêyin
Pê le şew denêyin
Pê le birîn û tirs û tem denêyin
Le nêw halawî em kenare da
xoşewîstîy to le amêz denêyin.

5

Ey xoretawî hemû sedekan!
Çawerrêyin ta ewdemey bestellekî çiwardewreman detwênîtewe
Wek tewjimî sûrî mêjû ruxsarî rojanman
temenî kujaweman dadepoşît
Lem werze berdîne da
Pencereyekî berînman bo dekeytewe.
Ewsa êmeyiş le jêr saye sûreket da
befir û xollî sedekan le xoman detekênîn
Serî gorrekan degirîn û heta demirîn
leber baranî mêjû da radewestîn

1980

## Şewanî tenyayî

1

Şewêk heta beyanî
demangut her êsta dêyit
Cîhanî xemekanman
detenît be goranî.

Şewêk heta rojbowe
be bêkesî helllerzîn
Giryayin û to nehatît
Tirsayin û to nehatît
Henase û xwênman meyî
keçî to her nehatît
Satêk bimanhejênît
le tarîkayî dill da
çillêk tîşk biçênît.

2

Em şewîş ta beyanî
le gell gişt birisîyan da
çawerrêman dekirdît
keçî to her nehatît
Em şewe bişellqênît
Destêkî xoşewîstî
be serman da bihênît

3

Şew derrwat û dêtewe
Ême her çawerrêyin
Serêkman lê hellênêt.
Le şewî gorristan da
le nêw cengellistan da
wek mom daman gîrsênît.

Zellê 1979

## Siwarey Merîwan

Pencereyek dekemewe
be ser şewêk da derrwanêt
Kanîy metirsî û tawan e
Şewêk, bonî xwênî lê dêt
gorristanî deng û
estêre û
baran e.

Pencereyek dekemewe
le aso ra temumjêkî çirr dîyar e.
Wa em şewîş siwarekan negerranewe
Kesîş nehat
hewallêkî cengellekeman bo bênît.
Em herîme çend xemnak e
Çend xamoş e
dellêy berdêkî xinkaw e
le nêw winbûn da westaw e.

Pencereyek dekemewe
Ewe kê ye?
Pole tîşkêkî cêmawe,
Yan Siwarekey Merîwan e
Em şewey be pêş xoy dawe
be kolanî tirsa derrwa û
tarîkayî deşlleqênêt
Le nêw gorrstaneke da
çirakan dadegîrsênêt

Zellê 1979

## Gorre boşekan

Be bêdengî mallawayîm le espe gilawekem kird û
be nêw êware xwênawyeke da hengawim na.
Le ser yallekey ewber beramberî gijebayeke danîştim
Pallim be gorristanekewe da û ruxsarim
le nêw lepî destim da şardewe.
Gijebayek xollî mêjûy be ser da pijandim
berew serdemî mindallî,
birisêtî û
ciwanemergîy birdmewe.

Bem bêwexte bo kiwa deçêt?
Çi agirêk le nêw dillta dagîrsaw e
Biruskey kam xoşewîstî
kam nihênî le gîyanta çexmaxey dawe?

Carê zû ye ser hellmegire
nakirê dewrî awayîyeke çoll bikeyin
Hêşta ne rêjne xoşî kirdotewe,
ne lafaw nîştotewe.
Ew tiruskeyeş ke le ser girdeke,
wek estêreyekî dûr asmanî kun kirdibû
le naw hewrî newî da tiwayewe.
Êmeyiş ta êsta
daremeyt û kifinman amade nîn.
Pêş ewey laşekan bogen ken
baştir waye le nêw çalle befir da bîyan nêjîn.
Yan gorrî boşî
bapîranyan
pê pirrbkeynewe.

Zellê 1979

## Kifindiz

Her le êwarewe, daristane zerdhellgerrawekem cê hêşt
Çawim birrîye gorristaneke û
çîyakem le amêz na.
Herdû çingim pirr le xollemêş kird û
le naw gijeba befrînîyeke da heşarim da.

Ta roj debêtewe
halawî zerdî kifnekan ruxsarî aso detenêt
Dille pirr jîlemoyekem le jêr hewrî xollemêş da detwêtewe.

Le keyewe çawerêyin:
Rêjneyek daynekird em jîlemoye bişwatewe û
halawî em xake xwênawîye damirkênêtewe,
Befrêkî estûr nebarî termekan û
rêga dûrekan dapoşêt
Êmeyiş
tamanêkman be dewrî gorristaneke da hellneçinî!
Ewa çend şewêke
çiray gorristaneke rengî mirduwanî girtuwe
Zêwanekeyiş her le êwarewe denwêt
Deşê em şewîş kifindizan
çend gorrêkî dî helldenewe û
xew le çawî mirduwan bidizin
Gorrekan–be awalleyî–le ber sema da
mirduwekan–be rûtî–le ber ba da
becê bêllin.

Zellê 1979

## Awayî û pêşhat

**1**
**Segwer**

Be nêw tirsêkî kuşinde da ret bûyin
Be hêminî wek tarmayî be pena dîwarekan da derroyştîn
Detwit pê le jiyan û çarenûsî xoman denêyin
Segwerrêkî zor xamoşîy şewî deşlleqand û
awayî bêdardekirdewe.

Awayî bonî gorristan
bonî tawan
Bonî koyleyî lêdehat!
Jinêk le dergay hewşewe serî derhêna,
— Wek xoy le bela labida–be pele dergakey pêwe da.
Lewserî kolanewe kabirayek laytêkî tê girtîn
ke têman raxorrî xêra kujandîyewe
Tawêk şewekey lê tarîktir kirdîn
keçî ta gundekeman lê winbû
segekan–azadane–her dewerrîn û
dewerrîn.

**2**
**Şewgerr**

Ke le mewdiwa serit lêdayin be nêw rîze çinarekan da werewe
neka le rêge tirîfawîyeke da pêşt pê bigirin.
Le diwênê şewewe em naweyan tenîwe
Hellmî xwên berî asoy girtuwe
Pestîyekî qûllî xistote dilanewe
tirsîş:
Wek siwarêkî reşpoş be kolanan da degerrêt û
derga killom dirawekan dekutê.

Pîrêjnêk kitupirr niwêjekey birrî
be çirayekî kizewe be diway kurrekey da
— Yan be diway hawallêkî kurrekey da-
berew tarîkayî û winbûn şorrbowe
Lewa, le nêw gulleyekî agirdar da
Le pena tawêr û nebûn da
— Bo heta hetaye-mallêkî hêminî binyat na.

**3**
**Çawerrwanî**

Siware reşpoşekan hatin
wêney sêberî êware kolanyan girt
Serbanyan tenî
xewnî şîrînî mindalanyan girt
Gundekemanyan le nêw koyleyî û bang da dapoşî
Keçî pîyawe xesîwekan, hêşta behîwan
segekan basî em nawe biken,
Serfirazî û hêminî bo awayî bigêrrinewe
Ew seganey
şewan dewrî gorristaneke bernaden
beramberî terme şêwawekan helldetutên,
Lewdîw perjîne şikawekewe
le pişt sêberî çirakewe
temaşay zêwane xewalluweke deken.

**4**
**Diwa şiwênewar**

Agirêkî kizî le naw daristaneke da kirdewe
Be gela terrekan, be palltoyekey daypoşî.
Le xoy pirsî:
Em gorristane çon wa gewre bû?
Çon em xellkane hênde zû pîrbûn û
be ser temenî kurtîyan da çemanewe?
Her diwênê bû
le tafî lawî û neberdî da bûn,
Hîley espekanyan çîyay dehênaye lerzîn
Serfirazî û dillnîyayî be awayî debexşî.
Ew awayîye bênazey emrro çepkêk temî nêw hetaw e
Dellêy şaristanîy dukell daypoşîwe
Dellêy zewî qutî dawe
Gorristanekey lêderçêt
şiwênewarêkî dîkey nemawe!

Tujelle 1980

## Şewanî eşkewit

Be dirêjayî şew baran debarî
Segêk le nizîk mallîyanewe dewerrî
Le naw cêgawe, perdey pencerekey lada
Hewretirîşqeyek le nakaw tarîkayî şilleqand
Pêş çawî rûnak kirdewe.
Raçillekî û perdeke dadirayewe
belam xêra be xo da şikayewe witî:
((Girmey hewir le nêw eşkewt da samnaktir e;
Ew eşkewtey
şewan zarkekeyan be tawêr debest û
ta roj debowe
Êşkîyan le xewî pirr aramîy yektirî degirt
Îşkîyan le agir û xoşewîstî û
le komelle êsqanêkî be cêmaw degirt
Komelle êsqanêk
tewaw le qamîş deçû
Bonî serdemêkî tarîkî lê dehat
Wek dîwarî eşkewteke
Wek dem û çawêkî awlawî
kun kun bû bû.

1980

## Lutke

Le nizîk mallîyanewe hawarêk hat
be pele rabû, çirakey kujandewe
Le sîley pencerewe serincî kolanî da,
Rîzê gulley agirdar tunêlêkî rûnakî be şew da
Mallekey beramberîşyan çirayan kujandewe û
gerrek be tewawî le nêw tarîkî da niqûm bû:
Keçî le ser girdekey ewberewe
çirayek, wek estêreyekî kiz,
wek agirî ser lutkeyekî dûr, desûta;
Ew lutkeyey
riwangey dahatûy bû
Tarîk û rûnî beyanî deçû pallî pîwe deda
le jêr dewen û tawêrekanî da
serbestî û
xoşewîstî û
temenî xoy heşar deda.

Tujelle 1980

## Kelawekanî 24 î Nîsan (*)

Befrêkî estûr kelawekanî dapoşî bû
Şewba befrî ser tepollkekanî demallî û
rêga şikawekanî pê pirr dekirdewe
Hendê carîş
le dirzî dergawe tezûyekî sard
pirruşey–le gell xoy–debirde jûrewe.

Xozge! Em zistane diwayî nedehat
Befreke biçêtewe natwanîn lêre bijîn
Beramberî şaristanîy faşîst û em kelawane
beramberî bonî laşe rizîwekanî jêrîyan dabinîşîn;
Laşey birakanman...
Laşey ew dostaney demêke nemandîwin
Şewan çawerrêyin le dergay mallekanman biden!
Be cilêkî areqawî û
pirç û rîşêkî dirêjewe,
be kolle piştêkewe bêne jûrewe.

Tujelle 1980

## Têkdanewe

Be hewraze quçeke da helldegerra
le pall darêkda danîşt û
bo diwacar
le dollekey riwanî.
Dukellî kewêllekan wek pellehewrêkî nizim
layekî binarekey dapoşî bû.
Çi zistanêkî sextman lem binare da be ser bird!
Çi temenêkî ciwanman le nêw em kewêlane da naşt;
Ew kewêlaney
le ber rêjne û kirrêwe da dirustman kirdin
Ta diwênê bû...
Bonî wilat,
bonî hetaw
bonî serbestîyan lê dehat!
Keçî êsta be bêkesî le nêw dukell da mawnewe,
Dellêy be zebrî şimşêr dagîrman kirdûn
Be destî xoman têkman danewe!

1980

## Fallçî û mindall

Sêberî êware tewaw be ser kolaneke da kişabû
Xellkî be pele û hellwe da xoyan bo mallewe dekuta û
dergayan le ser xoyan killom deda
ta be dillêkî pirr le nasorewe
şewêkî tirîş be dîyar killollîy xoyanewe.
be dîyar bêdengî û tarîkîyewe roj bikenewe!
Segêk le dûrewe lurandî,
le nizîk mizgewtewe kundebeboyek be dengêkî nasaz deyxwênd.
Gewrekiçêk baweşî be mindallêk da kird û
be pirtaw birdîye jûrewe.
Pîrêjne fallçîyekeş
le ber dergay kewêllêk pirçî xoy derrnîyewe
Be denge giryanawîye lerzokekey bangî pêşhatêkî
samnakî deda.
Çend kesêk le dewrey pîrêjneke eblleq mabûn
keçî mindallêk
be dîwarekey ewber da helldemîza –le ber xoyewe –
be hat û hawar û
serî qurrawy nenke fallçîyekey pê dekenî.

Tujelle 1980

## Êwarey ew payîze

Le dirzî dergawe hewayekî sard dehate jûrê
Colaney bew parçe rojnamane dekird ke jengî dîware
Ruşawekeyan dapoşî bû.
Tezûyekî sard be leşî da hat!
Her diwênê şew hemû dirzekanî girt
şûşey şikawî pencerekey têgirt!

Kemêk mat bû
le cêgakey hesta û berew derga çû
Kute kaxeze firrêdrawekan le jêr pêy da,
wek gelapayîze xişexşêkî nasazîyan lêwe dehat;
Ew gelapayîzaney
rûy şeqamîyan tenî bû...
Toyiş êwaran be hêminî pêt lêdenan
Yexey palltoket helldabowe û detewîst
şitê le nêw bulêllî êware da bişarîtewe
Detewîst–bo hetahetaye–pirçî awrîşmîn
gift û bellênî jengawî
zerdexeney dilldare dêrîneket le bîr xot berîtewe.

1980

## Rêjen

Heta lewserî kolan awabû çawî lênetrukand.
Xemêkî nawext serî lê da
Bîrewerîyekan, wek polêk zerdewalley wiruja û
têy alan
Wîstî şiwênî bikewêt û silawêkî lêbikat.
Belam êsta ewan beyektirî namon
Dellêy ewan nebûn rojêk le rojan
wek dû laşe û gîyanêk dejyan
Le take estêreyek da diwa rojî xoyan debînî
Wêney dû mindall dewrî xoyan be goranî,
Pepûle,
tîşk detenî.

Çawî pirr le firmêsk bû...
Hengawêkî wêllî na, leber pêy xoy wirdbowe
Wek bîyewê
be rêjen da biperrêtewe
yan kiwêrerrêyek-le tarîkî da–bidozêtewe.

Tujelle 1980

## Xewnî temen

1

Dergay jûrekey le ser xoy daxist
Be hêminî,
be çiwar dewrey xoy da riwanî
Tawêk le dîware jengawyekan wirdbowe
Tezûyekî sard be leşî da hat.
Demuçawe berdînekan wek tarmayî
lêreş pêşt pêdegirin û
şeweket lê samnaktir deken
Rûpoşêkî reş be ser temenî kujawet da deden.

Dergay jûrekey kirdewe
be pele dayxistewe
Le nêw niwêne şirre sirrekey da pallkewit.
Wek şewanî jêr çepokî celladanî
jîşikasa xoy girmolle kird
Bedem bîrkirdineweyekî allozewe,
bedem wirrêneyekî sextewe xewî lêkewit.

Bem nîweşewe çît lê qewmawe?
Kê tawêrî em xemaney be kollit da dawe?
Be bêkesî
toy le roxî em şewe da
le nêw em dinya wine da firrêdawe?

2

Ser le beyanî
xor detwit le jûrekey da helatuwe,
Be sardîyewe serî berdînî hellbirrî
— Girîng nîye
A... Hîç girîng nîye!
Way gut û her zû demuçawe tirşawekey
le serînekey da niqum kirdewe
Bew hîwayey ser le niwê,
belam bo heta hetaye
binwêtewe.

Tujelle 1980

## Eger lêre nebît!

Êwaran
be lêrrewareke da ret debîn
Le nêwan xamoşî û liqe çirrekan da
xoman heşardedeyin
Çallêkî bê bin
bo bîreweryekan helldekenîn.

Êwaran
le werzî xollbarîn da
ke destewyexey metirsî debîn
berew baweşî şepolekan dekşêyin.

Ne baran dîyar e,
ne pellehewrêk
Gijebayekeş wek şewan dengî naye.
Ger şepolîş nebêt,
liqe çirrekanîş cêman bêllin
Ême pall be xoşewîstî û
pall be rûnakîyewe dedeyin
Le nêw stiranan da
xoman mat dekeyin!
Belam eger to lêre nebît,
yan xoşewîstîy toman lê winbêt
ewa pencey tezîwman helldewerin,
Le tarîkî da û
be rûtî
serî mandûman denêynewe

1979

## Le kiwê bitnêjim

*Bo hawrrêm Şefîq Kerîm*

Bayekî spî lew binarewe helldekat
gîyanî şipirzem detenêt
Gijugîyay gorristan û
areqey ser ruxsare ciwaneket dadepoşêt,
Xollî ser zamekanit be nêw êware da pexiş dekat.
Bayekî spî pirçe alloskaweket wêney poletîşkêkî nêw aw radejenêt
Bayekî spî zamekanim be xollemêş deşwatewe û
berew asoy lêllî winbûn hellmidegirêt
Pencekanim weku çîlke req û wişk dekatewe.
Be pencey sirr û bê nînok çepke gizingêk, bo zamekanit
çon biçnmewe?
Dastanî sûrt, le ser tawêr û balay êware
çon binusmewe?
Dillîşim şexte û girr tenîwyetî
çon termeketî
tîya bişarmewe?

Tujelle 1980

## Mallawayî

Bo hawre mam Resûl

Ruxsarman hêşta nuqmî hellçûn e
Nuqmî sersamî û le dayikbûn e
Becêman dêllît
Le durgey xoll da be cêman dêllît
Le herêmêkî pirr le heres da
Le deştî zuqma be cêman dêllît.

Hêşta werzekan le xwên da deglên
Be cêman dêllît!
Diway to berew kiwa wilat hellbigirîn?
Tarîkeşewan çon berew binke bigerrêynewe?
Le pall kam dund û pelle hewir da bihesêynewe
Kam xewin û aso le amêz bigirîn?

Be cêman dêllît, hêşta Kurdstan lankey azar e
Gerûyekî pirr xoll û hawar e
Becêman dêlêt hêşta Kurdstan
aşiq û heyran wêllî medar e.
Becêman dêllît
Lutke û werzekan dadegîrsênêt
Le nêw gîyanman da lafaw deçênît.
Sofya 1984

## Kolan

1

Kolan be yasay cengell û xemekanî rahatuwe.
le nêw xewne kallekanîya pallkewtuwe
Kolan xûy be karesat û
dîlî û
(Menii Tecewil) û
xûy be katewe girtuwe!
Kolan wêney befrî lapall
nisêy hemû werzekanî hellgirtuwe.
Hêşta kolan (bêcge le çekî modern û firrokey ceng)
Ber rûnakî sedey bîstem nekewtuwe،
Hêşta basî zîndanîyanî Dîyarbekir
Metirsî cengî etomî
Hêşta nawî (Têwdurakis)
Kompîyuter û
(Layihey mafî mirov) î nebîstuwe.

Le rûnakayî temgirtûy nêw kolan da
minalan şayîgemanê û hellmatên û cigên deken
Jinan basî kelayetîy mêrdekanyan
Basî filan û fîsar û

tequtoqî şewî pêşû,
diwahewallî kolan deken.
Le tarîkayî samnakî kolanîş da
dilldarekan beyek degen.

Kolan le şarêkî koyle û betall deçêt
Le herêmêkî xamoş û
birînî jêr postall deçêt!

2

Be dukellî şaristanî = be napallmêk
Kolan le ser nexşey gerrek sirrayewe
Şiwênewar û xewnekanî,
jengî sede dûrekan û
beserhatî newekanî pêçayewe.
Êsta kolanî xewne kallekan, lawkî xeme
Xakêkî dîl e û xelltanî tem e
Pollîk hawar e û kesê naybîstêt
Lekey şûreyî ser nêwçawanî
sedey cengell û
janî serdem e.

## Le nîweşew da

Le ber tewjimî kirrêweke da be cêyan hêştîn
Bem nîweşewe
termî baran û pişko denêjîn,
Bang û hawarman le nêw tawan da
debin be hellim
Diwa çorrexwênman
be ser ruxsarî şew da derrêjîn.

Bem nîweşewe
serma û soll nebêt
Şoste û metirsî û dunyay çoll nebêt
Kê hawserman e?
Kê agadari
bang û hawar û serbirrînman e?

Bem nîweşewe
aya detwanîn be bazûy rûtman
dîwarî sextî tarîkî bibirrîn
Tekan be werzî koyleyî bideyin
pêş be tawan û metirsî bigirîn?

Leber tewjimî kirrêweke da
takey goranî nakamî biçirrîn
Were ta zûye... Tund amêz lêk deyin
Le naw satêkî sir û mezin da,
pêkewe bimirîn.

# Rêjne
# 1979

## Em mirove

1

Be mindallî
dillî be hajey çeman dekrayewe,
be dem estêrewe pêdekenî.
Be mindallî
fêrbû kej û çoleke û kanî xoşbiwêt
Fêrbû dillî bo ew barane lêbidat,
ke pêwendî dekene pê ta nebarê
Be ser cestey rojekan da
bête xwarê.
Be mindallî
fêrbû le rûbarî mend û
le estêrey karwankuje guman bikat!

Em mirove
hendêk car le tenyayî da
xemekanî wek çira dadegîrsênêt,
Hendêk carîş
çepkêk hetawî serbirraw helldegirêt
wek şêt be nêw kolanekan da degerrêt.

Em miroveyiş
wek to jiyanî pêxoşe.
Katêk le gell yarekey da sema dekat,
yan le kenarî rûbarêk dadenîşin
Pencekanî le nêw pirçîya niqum dekat
wa dezanêt
siwarî estêreyek buwe û
be nêw gerdûn da radekat.

Em miroveyiş
şeyday mosîqaw ciwanî ye
Em miroveyiş
wek to jiyanî pêxoşe

Belam katêk ke debînêt nîştîmanî
le ser şostekan kewtuwe,
Nîştîmanî
le jêr sêberî çeqo da pallkewtuwe
ta detwanêt

dergay şar berd baran dekat.
Ta detwanêt
nefiret le paşakan dekat.

2

Em mirove
le goşeyekî em dinya berînewe
çawekanî be barteqay panî asman kirdotewe
- Dellêy tenya em careye
zemîn bem core debînît
dellêy yekem care zemîn
be rûtewe pêdekenêt.
Çawekanî
be barteqay panî gerdûn kirdotewe
Be hêminî
le dîyardekan wird debîyewe
Bîr le şite allozekan dekeyewe!
Ewetanê
bem nîweşewe samnake
bem befir û ba û barane
em zemîne
berew baweşî heqîqet degwazîyewe.

Bexda 1976

## Seîde şêt

Çi azarêk bû
berew em sate xemnakey hênayit?
Berew nêw liq û pope çirrekan
Berew em eşqe û
kenarî şewî ebedî hênayit?

Çi azarêk bû?
Kêwî tenyayî û şepolekanî naye ser şanit,
le nêw tawêr û befir û polû da
nîştecêyî kirdît?

To em awazem mede be giwê da!
Ba lewe zîyatir wirr û kas nebim,
Bonî gorristan nemkat be hellim.
Ba lewe zîyatir le nêw kolanî xerîbî û şew da
sergerdan nebim.

Rojêkyan mindall bûynewe
Beyekewe
be diway pepûle û gizing da helldehatîn,
Le aso ra hewirman berdedayewe
Le nêwan liqekanewe
Le penay em dîwarewe
temaşay gerdûnman dekird.
Ke berew mall gerraynewe
le nêw tem û çiraxanî em şare da
winim kirdît,
Be diway to da
serim be nêw tunêlî jiyan da kird û

pêwey neçûm.

To em awazem mede be giwê da
Ewa eşqî to
aşnay kêwî bîyabanim dekat
Demkat be dastan
Demkat be pişko
Be çingexollêk
demdate destî kirrêwew baran
Le gell bêdengî û tawêrekan da
dempêçêtewe...
Le nêw serab û dollî neman da
demşarêtewe.

Bexda 1978

## Rêjne

1

Berew lat hatim
şanim daye ber termî beyanî
Le gell hengawî nisêy pêkirawma
asoyekî sûr,
Janî sedekan
be diwam da dekşan.

2

Weku biruske berew lat hatim
Kêw û bîyabanim dekird be kanî
Amêzim deda le rêjnew ziryan
Gerûm dekirde laney çirîke û
pişko û goranî!

3

Derwazey şaryan le rû daxistim
Le jêr sêberî êwareyek da
çingim bo tîşk û serma girtewe,
Daristanêkî çirim dagîrsand
kanîy seholl û
estêrekanim gerim dahêna
Be çepke şîrêk
ruxsarî asom gerim kirdewe.

4

Derwazey şaryan le rû daxistûm
Pallim be hewir û lutkey girrdawe
Wilatekem û
estêreyekî retêndirawim be koll da dawe
Sînem tenûrî xoşewîstî ye
Kanîy hetaw e
Nihênî zewî û
dillî hezaran birsî û awarem tîya heşardaw e.

5

Hatûm pêkewe leber rêjne da
le rûy desrrêj da
rîzêk bibestîn,
Be bazuwekanman
Be çekekanman
asmanî şar û aso rabigirîn.

Sofya 1978

## Le dirzî tarîkîyewe

Rêjne baraneke birûskey da
dergay jûrekey pêwe da
Be naw bonî xak û
birîskuhurrî şitekan da ret bû.
-Em afrete bo damênî pelkezêrrîne dadedirrêt?
Bo serî xoy be tawêr û şoste û şêlman da dedat?
Bo pêş be êware degirê?

Êwareyekî wa mat
le penay dîwarî tirs da rayangirtît
Be dîyartewe liqekanyan deşkandewe
Pişkokanyan dedaye ber terse û serma.
Toyiş be bêdengîyit,
be hêzî bazuwe rûşawekanit
şûret be dewrî jiyan da helldeçinî
Le penayek da
xot weku jîşik xirr dekirdewe
Le delaqey tarîkîyewe
Le dem û çawî berdîn
Le kellbe û hepey segî har
Le pirsîyar morr debûytewe.
Sofya 1978

## Werzî sehollbendan
*Bo Awrehmanî Xidir Baneyî*

Le gell kirrêwey şewêk da hatim bo lat
Le katêk da qewarey birînekanit
be befrî sûr dadepoşî
goranît dekird be wilat.
Le katêk da hatim bo lat
bazuwekanit
hereshênanî kêwêkîyan ragirtbû
Çawekanit
weku dû çiray nêw kewêllî hejaran
le şewezengî ((Rayat)) da dadegîrsan.

Hatim bo lat
katêk çingit pirr le agir û pişko bû
Demuçawî tarîkayî û rûbarekanit pêderrişand
Le werzî sehollbendan da
hellmî xwênit dadegîrsand

Hatim bo lat... Hatim bo lat!
Ta biruske û goranî bikeyin be wilat.
Bexda 1977

## Le awêne da

Le awênewe dû çaw derwanin
Birsêtî… Dewar
Kirrêwe… Kêşe
Demuçawêkî şêwaw debînin
be balay lutke û tîşka helldezinên
Şiwên pêy dengêkî xinkêndiraw û
hewir helldegirin.

Dû çawî bizêw le awêneş da debirîskênewe,
hetawêkî sûr dedrewşênnewe.

Awênekeyan tîrebaran kird
Dû çaw le parçe wirdekanewe
dellêyî estêrey demewbeyanin
Bo asmanêkî rûn û berîntir
Bo wilatêkî hêmin derrwanin.

Bexda 1978

## Le ber rêjne da

Gelêk car
be penay asoyekî şêdar da ret debîn
Baweş bo pelkezêrrînew bonî zewî degrînewe
yan berew roxî rûbarêk mildenêyin
Beramber awazêkî xemnak û
poletîşkêkî be cêmaw dadenîşîn.

Gelêk car
le jûrêk da çaw bo delaqeyek degêrrîn
Tarîkayî û dîwarekan binkoll dekeyn û
hîwakanmanî tê da deçênîn.

Gelê carîş
le katî bawbaran da
xoman be ser çirakan da helldekêşîn
Giwê bo henasey ballindey sermabirdû helldexeyin
Belam katêk leber rêjnew
le rûy desrrêj da dewestîn
carêk,
tenya carêk demirîn.

Bexda 1978

## Derwêş

Ew derwêşey
dillî leber hetawî eşiq da helldexist
Pallî be asowe deda û
le ser dillope baranêk
Le ser gonay êwaranêk
Ruxsarî xway resim dekird
Şewêk le gell nermebayêkî fênik da
berrê kewit,
Çemekanî kirde ber û
be ser kêwî nihênîyekan da serkewit.
Katê çawim pêkewtewe
keşkollekey
pir le rûnakî û baran bû.
Polêk gizing be serîyewe nîştbowe û
serî mandûy
be amêzî germî xewnekan kirdibû
Rûbarêk le jêrpêllû da pallkewti bû
Le gell xoy da
nawnîşanî deryay hellgirt bû.

Bexda 1978

## Be bêdengî dêt û derrwat

Be bêdengî
be laman da têdeperrêt
ke le rûbarekan dedat
Katêk degate ser lutke billindekan
wek meşxellêk
dadegîrsêt.

Be bêdengî dêt
taşeberdekan detwênêtewe
Deyankat be mall
Deyankat be yar
Goranîy niwêyan pêdellêtewe,
Pellehewrêkî dawe be koll da
werze mirduwekan dejênêtewe.

Êwaranêkî direng
katê le gell polê ballinde û cirîwey estêre da
berew rîze çinarî bermalan şorrdebîyewe.
Nan û şîr û xoşewîstî
be ser dûrgeyekî esmer û tînû da debeşîyewe.
Rawit denên
Yasawllekanî xelîfey ((Durgey Newt)),
dûrgey menfa
rawit denên
be şimşêrêkî kulewe nîştîmaneket raw denên.

Nîştîmanim
be her xakêk da têperrim
Be her kêwêk da serkewim
Le her rûbar û deryayek biperrmewe
be herfî girr nawekey toy lê denûsim
Katêk bo lay toyiş dêmewe
dastanî
xak û kêw û rûbarekan
hî deryakan
le ser lutkey kejanit denûsmewe.

Be laman da ret debêt
weku bonî xakêkî paş baranî nawext
têkellî hewa debêt.

Be bêdengî dêt û derrwat
Ewey boman cêdehêllêt
çepkehetawêkî sûr e
Le şewêkî tarîk û engusteçaw da
Le beyanêkî xinkaw da
helldête nêw çawanmewe
Tavgey eşqêkî bekulle
derrjête henawmanewe.

Be bêdengî dêy
taşeberdekan detwênîtewe,
deyankeyit be mall
Deyankeyit be yar
Goranî niwêyan pê dellêytewe,
Pellehewrêkit dawe be koll da
werze mirduwekan dejênîtewe.

Bexda 1977

## Em rûbareman xoşdewê

1

Le şewêkî temumij da
sînet dedaye ber şemallî kiwêstan
Neyan dehêşt
tozêk heway pak hellbimjît,
Neyan dehêşt
satêk bîr le dilldareket bikeytewe.

2

Le şewêkî temawî da
dem bo halawî xwêneket dekeyewe
Be naxî xot da
be naxî temumij da şorrdebîyewe
Be rûbarî firmêskêk da deperrîyewe
çawekanî tîya xinkawe.

3

Ger detwanît
delaqeyek lew şewe keyit
Carêkî dî be rêgay beyan da birroyit
Ger detwanît
bigeyite ew estêraney
le naw xwên da kujawnewe...
Ger detwanît
biçîye nêw çawî hellowe.

4

Wek asmanêk
estêreyan kujandîyewe
Wek aşiqêk
dilldarîyan lê şardîyewe,
Wek wilatêk
nawekeyan le ser nexişe sirrandîyewe.

5

Em rûbare
hêşta rengî xwêneketî bernedawe
heta êstayiş bonî toman bo dehênêt.
Ême
em rûbare le gell xoman da helldegirîn
be şepole sûrekanî
dillman deşoyin.
Ême hajey em rûbareman xoşdewêt
Rengî sûrî em rûbareman xoşdewêt
Bexda 1977

## Eva

Ke agir bûyit
ne det sûtanim
ne germit dekirdimewe!
Ke rûbar bûyit
ne det xinkandim
ne satêk
le baweşî şepolêk da ratdejandim!
Ewa êstayiş
gerdelûlêkî bêdengît
rojî deyan car helldekeyit
Ne tawêk lam aram degirît
Ne carêk, her tenya carêk
le gell xot da hellimdegirît!

1977

## Şaîrêk xoşîdewîstî

Şaîrêk xoşî dewîstît
Şîrekanî bo dekirdît be colane
Şewan le serî denustît.

Şayirêk pellehewrêk bû
sêberî bo balat dekird
Çend dillope awringêk bû pirç û gonatî terrdekird.
Şayirêk xoşî dewîstît
toy kirdibû be peykerêk deyperstît.

Baranêk ît be ser gîyanim da debarêyit
Ke le dillma kodebîyewe aram nagirît
wek kotirêk le şeqey ball dedeyit, detarêyit

Ew estêrey şewan be asman da dekşêt
ber lewey bigate derya
le girrî xoy da desûtêt
Ew estêre sererro ye
dillî min e
le soraxî çawanit da
weku berdî bingom win e.

Cêm mehêlle
Min bebê to
kejêkî bê kanî û befir û daristan im
Min bebê to
estêreyekî aware û bê asman im

Şayirêk xoşî dewîstît
Şayirêk pellehewrêk bû
sêberî bo balat dekird
Çend dillope awringêk bû
pirç û gonatî terrdekird.

Şayirêk xoşî dewîstî
wek peykerêk deyperstî.

Bexda 1977

# II

## Zorman pêgutin

*Bo hawrrêm kak Celal Debax*

Pêman dewitin
em werze talleyiş
pelkî zêrrînî xoşewîstîman helldewerênêt
Goranîyekanman dekat be hellim
Jan û giryan û
kot û pêwendî niwêman bo dênêt.

Pêman dewitin
em estêreyeş:
Karwankuje ye
Ême be rûtî çon rûbikeyne em serbirrîne
Xem û azarman hênde kem nîye
eweta gîyanman kanî birîn e.

Pêman dewtin
çon dest bixeyne destî şeytan û
le pirsey xwên da serçopî bigirîn?
Pêman dewitin
çon kifnî allî şehîdan bidirrîn?

Hawrrêy xoşewîst!
Hawrrêy xebat û azadî û mergim
Zorman pêwitin,
Belam kemîyan bîst
hawrrêy xoşewîst!

Sofya 1978

**Wilatekem**

Wilatekem sedan salle xwên deçênêt,
kirasî girr dekate ber rollekanî
Pencey be xwênî newekan denexşênêt.

Gîyane megrî!
Ewetanê şehîdekan hatûnewe
Were dilldare wineket bidozewe.
De bimkuje
belam megirî!

Çon nazanît dilldareket
rêbwarî rêgey hetaw e
Pirçî beyan û biruske şane dekat
baweş be lutke û goranî û asoyekî sûr da dekat.

De to megirî!
Çon nazanît wilatekem
pencey be xwênî newekan denexşênêt!
Wilatekem
le jêr şimşêr û ber petî sêdareş da
xewdebînêt… Xew debînêt.
Bexda 1976

## Serdan

Le nawexta
ser be jûrekem da dekat
Sêberêkî xwênawî be diway xoy da radekêşêt.
Palltoyekey, gulle û hellim û
bîrewerî şehîdanî lêwe derrjêt.
Tîşkî werîwî çirakem
ruxsare temawîyekem dadepoşêt.

Le nawexta
gomî bêdengîyim deşlleqênêt
Le naw qefezî em sate serşête da derim dênêt
Beyekewe
çing le baran û hetaw û rege qûllekan gîrdekeyin
Beyekewe
çaw debirrîne heqîqet û nihênîyekan.

Bexda 1977

**Tiwanewe**

Pole xwênêkî rawinraw
Çepkêk xoll û
bonî darêkî sûtawî hellgirtbû,
Asmanî dabû be xoy da
zewî le jêr nisêkey da raxistbû.
Be ser serî em şarewe
tînuwêtî lengerî pêgirt
Hatin kemînîyan bo dana
Cade û kolanyan lê tenî
Pole xwên wek çepketîşkêk
ablloqe û desrrêjî birrî
Hat be liqî şîrêkmewe gîrsayewe
Amêzî lê qaymkird û
le nêw janî wişekan da tiwayewe.

Bexda 1977

## Le dayikbûn

Le kewêllêkî sermabirdû da
Le ber çorrawge
le gell birisêtî û tirs û tezû da
Bê maman, bê kes, le dayik debêt
Le eşkewtêkî dukelawî da
Le nêw hawar da
Le paşkoy zîl da
Le jêr dewar da
Le dayik debêt!

Le nêw birîn da le dayik debêt
Le serbirrîn da le dayik debêt
Le borduman da
Le nêw sûtan da
mindallêkî kurd le dayik debêt.

Mindallekurdêk
Bo yaxîbûn û pêşmergayetî
le dayik debêt.

## Temumij

Ewe teme binarekanî tenîwe,
Werzekanî dapoşêwe
yan henasey gelekem e?
Ey laney şîrînî rencder û awarekan
em şew dergay dilltim le rû da damexe!
Minîş wek to
pencere bo baran û gizing dekemewe...
Minîş wek to
deçme nêwçawî hellowe.

Bexda 1977

## Tallek Gizing

Talle gizing xwênasa sûr
be asowe hellwasraw e.
Le kemer û balay êware allaw e.
Talle gizing dellêy şepol û haje ye
be rûbarewe nûsaw e
Wek hawrrêkem
baweşî le lutke dawe
Eşiq û
azadî û
dahatûy
le kollnaw e.

## Xoşardinewe

Befrêk le werzî zistan cêmabû
le nêw çallêk da
le jêr sêberî asmanêkî pirr estêre da
xoy heşar dabû.
Bo xewnekanî
nîştîmanêkî niwêy binyatnabû.

Hawîn hat zanî
pîyawanî paşa dên deygwaznewe
Lutke û asman û estêrekanî lê deşarinewe
Befir û jiyan û bûnî xoy nebêt
Çekêkî tirî
nebû bergirî
pê le xoy bikat
Boye xoydaye ber tîşkî hetaw
ta bibêt be aw
Be nêw zewî da şorr bibêtewe
Bibêt be hellim
xoy le nêw tîşka bişarêtewe.

Bexda 1978

## Xelat

Hêndey zanî le çiwarlawe
xamoşî gemaroy dawe!

Çon hênde zû
şar hogirî xamoşî bû
Deng û rengman
dillman nuqmî xamoşî bû!

Bê xem binûn!
Xamoşî bote çeperman.
Xamoşî bote sengerman.

Kê em şew xelatî kirdîn?
Be hêminî mollî dayin û
destemoy xamoşîy kirdîn?

## Gerranewe

*Bo Fehid*

Hemû şewêk, hawrêyekem
be hêminî ser be mallî birsî û hejaran da dekat
le soraxî gewrew biçûkyan depirsêt
Basî rastî,
dadperwerî û
sosîyalîzmyan bo dekat.
Ke deygirin... Emcareyan milî be petewe naken
le kenarî rûbarêk da deysûtênin,
Xollemêşe ciwanekey deden be aw da
Keçî le beyanî rojî ayinde da
carêkî dî, hawrrêyekem
çepke tîşk deçnêtewe
Be deste çepe birrawekey
nan û
gull û
alayekî sûr helldegirêt,
bBerew em şare dêtewe.

1978

## Wilat

Çunke wilat eşkewtêkî tengeber e
Yaxîbûn hawirr û çeper e.
Ta wilat hellmî ber ba bêt
Çingêk kefî rûy derya bêt
Medarman werzî winbûn e
Serabêke ruwew helldêr û roçûn e.

Çunku wilat birînêkî ber neşter e
Yaxîbûn as û raber e.

*

Leber ewey bê wilatîn
werzekanman xollbarîn e
Bestelle û serbirrîn e
Temen tînuwêtî û serab û
polêk xewnî nêw perjîn e.
Leber ewey bê wilatîn
be nêw tunêlî agir da
ruwew gullew merg hatîn.

## Rêgay tifeng

Asmanêkî şîn û xincîlanem hebû
dagîrkeran
be ser serimyan da rûxand.
Çorrexwênêkî reş,
çepkêk xewnî hengwînî,
çend kitêbêkim hebû
ewîşyan bird be talan.
Belam katêk
hatin pêstekem bigirun
Demuçawim bişêwênin
befir û biruskem kirde ber
wilatekem naye koll û
rêgay tifengim girte ber.

1978

**Goranîyek**

Ew şewaney le ser pişko ratdekêşin
yan le nêw desrrêjî gulle da cêdemênêt
Kê dezanêt
balat be balay girr degirî û
şextey werzekan deşkênît?
Kê dezanêt
çon dest be serî bêkesî û
awareyî û
janî newekan da dênêt?
Le gorristanî gîyanman da
çirakan dadegîrsênît
Ême nebêt
kê dezana
to çon mêjû dehejênît?

# Pişkokan degeşênewe
# 1976

# I

## Şewêk le ser gorrî Welî Dêwane

Ey Dîwane!
Em şew penam hênawe ta xem û kullî
qûlayî henaw û dillî
wêranemit bo hellrrêjim
Be dû lêwî let û petim
honraweyekî reşpoşt bo bibêjim.

Ey Dêwane!
Katêk le rûy tîn û halawî hetaw da
Le nêw lîtey gomî misî qallkiraw da
pelkî sewzî darî temenim dewerand
weku Ferhad bebê wiçan
paç û kiwînim le rûy Bêstunî jiyan da
radeweşand
Peykerî letenanêkim dadetaşî
le nêw gomî areqem da bo mindalanim dexusand
Le pirr hewrêk daykird be ser mallekem da
mindalanim bûn be xellûz
awarem le şarekem da.

Ey Dêwane!
Şarekeman çawgey azar û giryan e
Hemû kun û qujbinêkî pirr le jan e
((Êl)) aware û hellweda ye,
bê kiwêstan e
Xellkî le cîyatî balay ((Şem))
wêll û şeyday letêk nan e.

Ey Dêwane!
Eger carêk lamserlayî be nêw şar da rabibûrît,
çawêk be rûy
tem lênîştûy
kelawekan da bigêrrît
Min dillnîyanim ((Şemit)) le yad deçêtewe
Le taw azarî em xellke
gîyanit weku gîyanî mandûm detwêtewe.

Ey Dêwane!
Têkrra em kej û kêwane
le gell gîyanî hezareha bêtawan da
le nêw têzab û barût da win kirawe
Tu Xwa boçî? Dengî Yezdan
le şarekem da xinkaw e!
Tu Xwa boçî?
dengî Yezdan
le şarekem da
xinkaw e!

Ey Dêwane!
Hemû rojêk le nakaw em Kurdistane
leber çawim debêt be tem
Debêt be tem û bar dekat
bo serûy asmanî hewtem

Ey Dêwane!
Key le nêw cogeley xwên da
le nêw lûley
tifengî destî pêşmergey
((Ezmerr)) û ((Serî Sefîn)) û ((Hendirên)) da
xorêkî geş xoy denwênêt
Regî azar û birsêtî
le nêw şar da desûtênêt
Xollemêşî mindallekanmim bo dênêt
Gîyanim le nêw şedawî jan da derdênêt

Ey Dêwane!
Xozge em şew miştêk azar
le xermanî zamekanim deçnîtewe,
Xozge be kifnî xwênawît
tozêk firmêsk le rûmetim,
Le rûmetî let û petim
desrrêtewe
Ey Dêwane!

Bexda 1971

## **Derga le rûy em kizebaye daxe!**

*Bo Qubad Hasan*

Em kizebaye pencekanit wek gelay payîz helldewerênêt
Qaçekanit wek befir detwênêtewe.
Em kizebaye henasekanit dedzêt û
le gell jan da det pêçêtewe

Ewende çawerra meke!
Newek le çawerrwanîy da bibît be topellê hellim û
boşayî qutit biden.
Derga le rûy em kizebaye daxe!
Ewa pişkoy êsqanit bûn be xollemêş
Diwa dillopî xwênit meyî
Derga le rûy em kizebaye daxe!

Rûbart bo derya giwastewe
em şewe her diwayî nehat
Bonî kifne zerd hellgerrawekanit le sîyekant da tiwandewe
keçî em şew her diwayî nehat.
Em kêleye hellmeqene!
Gîyane to bo ewende lasar ît
Serî em gorreşit helldayewe?
Renge êsta Qubad* lêre barî kirdibêt û
le kenarî mêjû pîyase bikat,
Yan nîştîmanêkî dî bo awarekan binyat binêt
Dûrîş nîye êsta le nêw dillî min da
rakişabêt.
Bexda 1975

## Pişkokan degeşênewe

I

Çawim lête
serit nawete ser singî kaniyawekan
Hewir sêberit bo dekat.
Çawim lête
pişkokan degeşênîyewe
bo mindalle awarekan
Le dûrewe çawim lête
her çiwar pelî birrawî xot le koll nawe û
şan dedeyte ber kêwekan.
Çolekekan ser helldegirin
le gell reşeba û rûbar da ser helldegirin
Berew nîştîmanêkî dûr
çepkêk le xwêneket deben
bo pirçî asoyekî sûr.

II

Hawrrê!
Ewe befrawî kejan e, yan xwênekey to ye
têkelawî rûbar debêt?
Ewe gaşeberd e, yan kelle serî bizmarrrêjkirawî to ye
bem serewlêje da xilor debêtewe?
Ho hawrra gîyan!
Ewe regî dar beruwe yan demarî to ye
bem xake berdîne da çote xwarê!
Ho hawrrê gîyan!

To be wêney darberrûyekî sûtêndiraw,
To be wêney darberrûyekî serbirraw,
heta xak û xoşewîstî û hetaw mabêt
her dejît û
her dejît û
dejîtewe.
Xeme çînayetîyekanit dekeyte koll
carêkî keyiş
sedcarî keyiş
be ser rêgay serbirrîn da deçîtewe.

Bexda 1976

## Çend bîreweriyek le jûrêkî bê dîwar da

Hemû şewêk
katêk be şiwênserî winbûm da degerrêm
tarîkî le nêw kolanî şarêkî bêdanîştû da
riwanînekanim serdebirrêt.
Tarmayî destêkî bê pence
le ser bizmar damdekutêt
Hengawî gewrekanî şar
weku çeqo, be ser şostey gilênem da
be herêmî birînim da têdeperrêt.

Emrro le gorristanewe laşeyekî zîndûyan hênayewe ke le zûyekewe mirdibû. Gutîyan:
Ne kes denasêtewe ne kesîş deynasêtewe, çunke wayan hallî kirduwe: Her katêk nihênî gorr bidirkênêt desbecê demirêt!
Şar peşoka... Agirî tirs û sersamî le nêw şademarî
danîştiwanî da killpey send! Belam min hîç sersam nîm, çunku maweyek lemewber le gell hawrrêyekim le jûrêkî jengawî û xembar da dejîyam, keçî emrro kes nazanêt:
Laşekey areqey ser rûy
kam rûbarî mandû desrrêt!
Xewnekanî le nêw limî
kam bîyabanî tînû da firrêdrawin.

Be pele helatim… Dillnîyabûm ke hawrrêyekem nîye
Witim: Bellku ewe Xwaye bawkim bêt zîndû bûbêtewe.

Ho babe gîyan!
Lêzmey baranî hez û arezûy bînînêk
xewî pêllûm derretênêt
Le çiwarçêwey xollî leşma
dirrkî azar deçeqênêt.

Ho babe gîyan!
Wa çend salle
be şiwên laşe bê gorreket da ewdallim

key tarmayît le dademallim?

Ho xanime xembarekem!
Ewa êsta dûr le çawe reşekanit
Dûr le çawe geşekanit
Dûr le bawkim
Dûr le hawrrê dizrawekem
le jûrêkî bê dîwar da
detwêmewe le nêw kefî çawerrwanîy
espêkî mandûy bê siwar da.

Ho xatûne çawrreşekem!
Bangit dekem
belam gerûm dengim le sêdare dedat
Nabê billêm
minare bote kêlî şar
Nabê billêm xoşim dewêyit
Nabê billêm
kiwanê hawrrê dizrawekem?
Ey xatûne xembarekem!
Xoşim dewêyit
Xoşim dewêyit
Bijî hawrrê kujrawekem!

Le berebeyanî 15 / 11 / 1969 da, katêk hewallî mirdinî xomyan damê çend satêk bo temenî ciwanemergîm giryam. Berew baweşî hewrêkî bê baran royiştim. Hewreke pêkê wîskî hell da û witî: Min natiwanim berew dûrgeyekit berim, ke mirdin neygirêtewe. Witim:
Dillnîyabim serxoş nît?
Witî: Be mercêk detwanim ke...
Berlewey welamekem bidate desthelatim.
Sererrimî siwarekanim le gilênem da şardewe, perroyekî reşim–be boney mirdinmewe–be nêwçawanim da hellwasî û xom firrêdaye naw şeqame
dizrawekanewe.

Şeqamekan xoşewîstî nagirnexo!
Şeqamekan bergî kelleçîyekanyan
be berdakirawe.
((To billêy emane bo mirdinî min aheng bigêrrin?))
Em pirsîyare çend killyêk firmêskî
le çawe lêllekanim dizî.
Sozanîyekan gemaroyan dam
-Kurre nerroy!
-Bîgirin xoyetî!
-Bîgirin...

Carêkî tir le pirrmey giryanim da,
belam em careyan bo sozanîyan bû.

Ke aware û birsîy em şaran
dest le nêw destî–Ba–denên,
Gorrekeyan dexene ser lepî destîyan
Be ser laşey mirdûman da
Be ser laşey sirrbûman da
berew ewdî û dîwarekan hengaw denên
Dergay zamî singî çîya dizrawekan
bo pêşwazî
karwanêkî serhellgirtû dekirêtewe
Serî winim
le gell henasey hetaw da
bo jûrî leşim dêtewe
Hawrrê kujrawekeşim degerrêtewe.

Bexda 1973

## Nexşeyek

1

Merro... Merro!
Lem nîweşewe sûre da
tenya rêga dizrawekan,
Tenya rêga xinkawekan
baweşîyan bo awareyît girtotewe
Wirdexollî boşayîyekan
demîyan nawete ser demî zamekanit.
Bo kiwê derroyit?
Bo kê birînî jiyanit be xwêy mirdin,
be agirî winbûn deşoyit?
Bo kiwê derroyit?

+ Be benderî xwênekem da deperrmewe
le nêw dirzî gulleyek da
baweşêkî gerim bo xom dedozmewe.

-Merro... Merro!
Dilldareket le pall şurey
rûxawî şarêk da demî bo henasey mandût
kirdotewe
Çawerrête:
"Nehatewe... Nehatewe
Key dilldare awarekem
zamekanî
be firmêskim deşwatewe?
Nehatewe... Nehatewe."

Dilldareket, le çawerrwanît da
çirrnûk le asman gîr dekat
Gilêney hetaw dekollêt
Rûmetî–Ba–zamdar dekat!
Bigerrêwe... Bigerrêwe!
Dilldareket bo mebestî gerranewet
hanay niza bo Xwa debat...

Kors:

Birro.... Birro
Be peyjey biruske da serbikewe,
Dergay serdaban bişkêne
Le sûçe tarîkekan da
beydaxî şiwên pencekanit biçeqêne

Birro...! Birro...!
Şiwên hengawî rûbarekan desrrinewe
Baran le jêr minarekan da serdebirrin.
Tînuwêtî werzekan dexwat
Areqey kêllgekan dexwat
Çon sengerêk cê bihêllim
le nêw dillma hellkendirabêt?
Çon bitwanim destberdarî mîlletêk bim
xewnekanî be paçî jan û birsêtî
let kirabêt?
Be benderî xwênekem da deperrmewe
Le nêw dirizî gulleyek da
baweşêkî gerim bo xom dedozmewe.

Kors:
Naçêtewe
Gulleyek e bo fîşekdan naçêtewe
Naçêtewe... Naçêtewe
Xwênî rijaw çon bo nêw leş deçêtewe?

2

Derrwat... Derrwat
Agir le kemînî çawya êşik degirêt
Le sîney da azar û xemekanman
heşar dedat.
Derrwat... Derrwat
Be jêr pêstî aw da derrwat
Le wilatî befir û xem û birsêtî da,
Le pênawî le dayikbûnêkî tazey şitekan da
şehîd debêt
Şehîd debêt le daremeyit, le gorrekan
yaxî debêt.
Bexda 1973

## Le yadit bêt

Ew kataney bûmelerze
le xwênta hestaye ser pê
Rûbarekan le çawta xoyan şuştewe
Kemaneket le agirdanî tifeng da heşar dedeyit
Rêgakan depêçîtewe û
be ser pirdî henaset da
hengaw denêyit,
Xwên xollî ser nêwçawanit rademallêt
Bîreweryekanit demjêt.
Hengaw denêyit
Sengerekan be xot nagirin
Sengerekan nagirîte xot
Be nêw dukellî mirdin da deperrîyewe
Le yadit bêt!
Nan û xewin û xoşewîstî
bo mindalle awarekan
Bo mindalle birsîyekan bihênewe
Le yadit bêt
çepketîşkêk bo pirçî yar biçine.

1973

## Ho darberruwe xembareke!

Ho darberruwe xembareke!
Ewa le tînuwan yan le nêw dukell da wa hellbizirrkawît
Eger lew serewjêre sexte nerrwabayit
ne ruxsart wa helldepirruka û
ne hêndeyiş tînû debûyit
Êstaş eger çing lem xak û xolle berbideyit
serî berzit denewêt û
heprun be heprunîş debît!

Ho darberruwe xembareke!
Were regekanit leber tavgey xwênim hellxe
Bellku bo çend satêk ew tînwêtîyet bişkêt
ke le yekem rojî bûntewe
le gell xot da hellit girtuwe.

Bexda 1975

## Beserhatî darberruweke

Darberrûyek, katêk wîstîyan
heway kiwêstanî lê bibirrin
Le dilldar û befrawî kejî dabibirrin
Katêk wîstîyan hellî kenin
be dîyarîyewe sêberekey serbibirrin
heta şil bû liq û gelay werîwî xoy
lawandewe
Xoy be ser xak, be ser xoll da
nuştandewe
Liq û popî be zewî da birde xwarê
Dillî be ser taşeberdêkî zibirda
be ser reg û liq û popîya tuwandewe.

Bexda 1976

## Vîktor Gara

Rûbar baweşêk şepolî hellgirtuwe,
Hewir: Baran,
Xwa: Tenyayî
Gorristan kipî û samnakî
Toyiş azarî çewsawekanî serzewît
hellgirtuwe.

Dellêy hemû şeqamekan
bergî xwênyan leberdaye,
Rûbarekan bûne hellim û
xwên cêgay girtûnetewe.
Be xot dade!
Toyiş wek şarî Santîyago
serpoşî xwên be xot dade
Be xot dade...
Be xot dade!

Çawekanit sûjinekan detirsên in
Janekanit celladekan debezên in
Destekanit serî çeqokan debirr in.

Weku zamêkî yaxî bû
be ser giwêzan da radekeyit
berew qonaxêk mildenêyit
Şehîdekan çawyan birrîwete aso û
zamîyan ruwe û gulle û nêze
hellxistuwe.

Be xotdade!
Toyiş be wêney çewsawekanî şareket
kirasî gulle leberke û
serpoşî xwên be xot dade
Be xot dade...
Be xot dade!

Bexda 1974

# II

## Bimparêze

Topelle xwênêkî lêll im
le gell qullpî birsêtî da
be ser lepî qetmaxekan da rijaw im
Le nêwanî
boşayî man û neman da
hellwasraw im.

Bimparêze!
Le girrî xoşewîstî da bimparêze
Bimparêze.... Bimparêze!
Le çepokî mirdin nebêt
le her şitêk bimparêze.

## Çaw damexe!

Kat... Le çawekanit da demrêt
Kat... Le çawekanit da le dayik debêt
Çaw damexe!... Çaw damexe!
Xwênî hawrrê dizawekem
le rûbarî çawekantewe dêt
Têkelawî
birînî temenim debêt.

## Xoşim dewêyit

Ewey deyewêt wilatî
xoşewîstîtim lê win kat
wêneket
le nêw dillim da bisrrêtewe
Ba hengawî rûbarekan
bistêk berew diwawe bibat.

## Ey xot netwit?

Berd debarêt
Sêberekan serberewxwar rawit denên
Xellkî çawyan birrîwete zamekanit
Çawerrwanin:
Bitixonewe:
Wek çon derya şepolekan dexwatewe
Bitixonewe.

Dezanît bo
rûbar berew serçawe nagerrêtewe?
Dezanît bo
mist le direwşe dekşêtewe?
Ey ke gulle berengarî pola debêt
bo lêy helldebezêtewe?
Dezanît bo
kenar leber hajey şepol
dekşêtewe?
Dezanît bo
xoşim wîstît?

To detwanît şanit bideyte ber barî
em rêgaye?
Hewilldedem
to detwanît berzayîyekanî nêwanman
text bikeyit?
Wek keştîyek le bendereket yaxî bît?
Hewill dedem... Hewill... De… Dem.

Hewill dedeyit!
Keçî le pirr jûrekem be cê dehêllît
Wek şêt baweş be şeqamekan da dekeyit,
be diway tem da.
Be diway serab da radekeyit.

Şeqamekan dert deken
Şewan ta berî beyanî detwêytewe
Le naxî birînî xot da detwêytewe!
Ey xot netwit:
"Min camêk nîm
be lêwî borjwakanewe! "
Ey xot netwit:
Min camêk nîm...
Ey xot netwit...
Ey...

Nawî tom bîrdeçêtewe
wek ew şaîrey le janî şewekanya
wişey le bîr deçêtewe
Nawî tom
bîr deçêtewe *

## Honraweyekî bê naw

Kiçî şermin
demewêt xom le qûlayî
çawekanta bitwênmewe
Rojanî sextî bê xorî
temenî diwênêy beserçûm
Dastanî pirr le nasorî
Sibeynêy le dayik nebûm
le defterî jêr pêllût da bixwênmewe
Hezar hîwa le ((Seywan)) î henawma
bijênêtewe.

Kiçî şermin
nekey le berdem şepolî
nîgay pirr tasem da rakeyit
Le rûm dergay çawe şînekanit daxeyit
Neku gîyanî agirawîyim
pêllûy çawekanit kun kat
Sêlawî xwên
bê seruşwên
tabloy dastanekem win kat.

Bexda 1970

## Bo kîjêkî hunermend

Hemû rojêk
le katî aheng û seamay gizingî berî beyan da
Le asmanî bê baran da
perroyekî çillkinî bor
şiwên maçî xor
le ser kullmî kelî jînim desrrêtewe
Dillopî firmêskî azar
le nêw zamî pirr heniskma detwêtewe
Sertapa şar weku bizem
bizey hîway nepişkutûm
le jêr pêy befrî tarîk da detlêtewe.

Hemû rojêk
le gell rewtî nîgay dûrma
hezar wêney bê nawnîşan be ser singî
şeqamî teskî pirr jengî
naw mêşkim da dexulêtewe
Jengî yasay nalebarî nêw em şare
le qûlayî gomî dillma
peng dexwa û kodebêtewe.

Ey hunermend!
Tenya dengî pirr telî kemanî gerût
killpey girrêk le zistanî temenim da denêtewe
Parçe parçe sehollî reşî pejarem
le naw dillya detwêtewe
Zamekanim be esrînî
çawî firîştey derûnî
geşt sarrêj debêtewe.

Were gîyane beste billê
ba le naw şepolî deryay awazî keman û
şimşallî gerût da
azarî xom bedî bikem
Azarî gişt çewsawanî em zemîne
bê ewîne
bedî bikem!

Bexda 1971

## Seretay dilldarîyek

Fêrit kirdim
be diway welamî pirsîyarê
be helldêr û telanî merg da serkewim
Be nêw boşayî zewî da biçime xwarê.
Tenya to buyit manay jiyanit fêr kirdim
Be waneyekî bê kota goşit kirdim.
Boye gîyane
xoşim dewêyit
le çawekanma peykert bo detaşim.

Bexda 1972

## Kenarekan deyxonewe

Hemû şewêk
katêk xew le jêr pêllum da xoy deçênêt
bêagayîm hellim degirêt
be ser dûrgey tenyayî da dembarênêt
Çawerrwanim
destekanî bixate nêw destî wêllim
Le kiwêrerrêy berdem be heştêkî dûr da
nîga bêt bo çawî lêllim.

Ewetanê le çawerrwanî hatinta
be sewllî girr,
le ser ruxsarî rûbare lasarekan
tabloket dekêşim,
Deykem be diruşmêkî xwênawî
be şeqamî mirdin da hellî dewasim.
Belam le pirr
şepol dêt û qutî dedat
Kenar wêney qumeawêk
deyxwatewe.

Bexda 1973

## Nameyekî balldar

Gîyane! Herçend temî dûrît
weku çarşêw le balat da
le awêney sergonat da
xoy pêçawe
Nîgay wêllim
le bîyabanêka le taw awî deryay çawekanit
gerûy hawarî nûsawe!
le gell ewey gîyanim be sêdarey şew da hellwasrawe
Belam gîyane!
Hemû katêk dîmenî tom leber çawe.

Le tûştirîn rojî jînma
Le germey giryan û şînma
to debînim
Le nêw qullpî pêkenînma
Le delaqey nêw kewêllî
niqûm bûy gomî esrînma
Le nêw dillope areqey nêwçewanî
çewsawanî
şarî mat û bê ewînma
To debînim
To debînim.

## Diwa dîyarî

Gîyane... Diwa dîyarîm parçe şîirêk e
le tallî pirçî xorêkî şey da honrawetewe
Be xamey pencey yezdanî ciwanî
le ser rûy gullî berî beyanî
nûsrawetewe.
Rûy dêrrekanî
be wêney balay koşkî dilldarîm
razawetewe
Korpey awat û hîwa le nêwîya
pêllûy nûsawî geşawetewe.
Bexda 1970

# III

## Le nêw dillope firmêskêk da

Xamey zincîrkirawî destim
le taw nalley zamî hestim
firmêskêkî sûrî geşî
rijande ser gonay korpey
çawnepişkutûy baweşî.

Firmêskî sûr bû be tabloy ew raberey
ew pêşewa peyamberey
ke dengî le nêw dukellî gerdelûlî
pirr eylulî
reş da xinka
Pişkoy wişey
le çall nira
Hemû leşî
le pênawî rêbwarêkî
abrû reşî şeqamî tarîkî mêjû
bû be sutû
Bû be sutû!

*

Le zamî tabloy zîndûrra
nalleyekî tasa û derçû
le gell dengî gerûy nusawma têkell bû:
-Le katêk da
şartan be girollebenî şewgarî mêjû tenra bû
rûy asmantan be dukellî
henawî reştan sûta bû

Le katêk da
herdû desttan be zincîrî
((Anubanîn)) î bestira bû,
Lêwekantan be nêzey ((Îştar)) dirwa bû
Min bûm wîstim
rehêlley tarîkî mêjûy pirr efsanetan ramallim
Kot û pêwend le gerdinî temenî jîntan damallim.
Min bûm goy memkî pirr şîrî wişekanim
denaye nêw demî korpey şorrşî bê nawnîşantan
Xorî hîwa û kollnedanim
dehênaye nêw cîhanî ba beyantan.
Keçî êwe
le diway ewey be şimşêrî riq û kîne serim debirrin
le bîyabanêkî çoll da cêm dehêllin
Laperrey mêjûyişim dedirrin?!

Bexda 1971

## Tabloyekî şarekem

Le çiwardewrî şarekem da
Le baxçey beharekem da
dexulêmewe
Le gêjawî sersamî da
detlêmewe.

Be her layek da derrwanim
le rûy nîgay çawekanim
perdey tarîk hellxiraw e
Hemû şiwênê
weku diwênê
be şûrey beriz tendiraw e
Milwankey zêrr le gerdinî
şarekem da dakendiraw e.

Ballî be samî nîweşew
be zordarî
çawî hezaran rêbwarî
kirdote xew.

Şarekem wek gomêkî mend
le şiwênî xoy da westaw e
Le jêr barî kot û pêwend
doş damaw e!

Takey gomî çawekanim
gorrstanî nîgay mirdûy bê gîyan debêt?
Takey bizey ser lêwî dill
xorakî henasey germî xezan debêt?
Takey awa nîştîmanim
bê behar û
bê Newroz û beyan debêt?

Bexda 1971

## Katêk zamekan helldeçin

Taku emrro
cîhan kîşwerêkî win e, çawerrêy–Kollompis-êk e
Ellqerrêzî dergakanî bitrazênêt
Jiyan yek- dû denik xoll e
le nêw çingî reşeba da denallênêt.

Lewetey hem
şeyday bistêk zewîm xomî tê da molldem
Çoleke le ser dar
le jêr giwêsebanekan da helldenîşêt!

Em beyanîye
debê pişkoy dîmenekan
le goşey çawekanim da bitwênmewe
Êsqane tezîwekanim pirrkem le girr
Bûmelerzey xinkêndirawî gundekeman bijênmewe.
Belam boçî? Her dîmenêk
gulley dengêk le astim da deteqênêt:
- Mirdûyit… Mirdûyit
Tenya le yadî komellêk
mirdûy weku xota zîndûyit.

+ Boçî mirdûm?
Eweta çorrçorre xwênim
derrjênme naw xwêntanewe
Boçî mirdûm?
Zamekanim reng derrjên
be ser deşt da, be ser doll da
Be ser laşey zemînêkî pirr le xoll da
Hengawekanim miturfey temenî sawam denêjin
le baweşî kîşwerêkî winî çoll da.
Kiwa ew kesey şarekey lê kawilkirdim?
Kiwa ew destey kewillî kirdim?

Qeladizê 1972

## Sê name

1

Firîştekem!
Lew rojewe bo yekem car
pêllûy nûsawî xor pişkut
Laşey zemîn... Laşey sirrbût
Pirrşingî rûnakî berkewit
Çewisandinewe, xosepandin
le nêw bîrî xellk da derkewit
Lew rojewe taku amrro
birjangekanit derdênin.
Lew rojewe laşey sawat
estêrey geşî pirr hîwat
be dukellî sedan çiray
sûtawî naw her ((Çiwar Çira)) î çawekanit
dexinkênin weku emrro
Weku emrro.

2

Firîştekem!
Le birînî tînûy xwênî tollet da
destî xwênawî sedeha mêrweswarî
wek ((Naramsîn)), wekû ((Holako)) debînim
Sedanî wek bawkî ((Awêstaş)) debînim
Hawar dekat:
- Bo mintan kuşt?
Boçî şimşêrî jengawîy bêganetan
be xwênim şuşt?
Bo mintan kuşt? Bo mintan kuşt?

3

Firîştekem!
Dîmenî to hemû demêk
le gell zengî pêşrrewî qetarî hetaw
wek melêkî ser lêşêwaw
le nêw daristanî bîrma le firrîn daye
Hewrî nêw derûnim le taw
lêwî hellqirçawî mêjûy pirr efsanet
le şîn daye
Gîyanim bo derbazî gîyanit
le şorrşêkî şêtane û pirr qîn daye.

Bexda 1971

## Cengawerêkî winkiraw

Le şarêkî pirr xencer da
be naw pêçî kolanêkî tengeber da derroyiştim
Dewrupiştim,
be tarmarîy reş tenra bû
Laşey xellkî serberewjûr
be balay dîwarekan da hellwasrabû.

Baranî cestey zamdarim le nêw tem da,
le azar da... Le matem da
Arawî bo leşî siruşt degirtewe
Jengî konî ser ruxsarî
wişkî şarî
deşuştewe.
Birjangim baweşî bo çewsawan degirtewe
Bergî birrwa,
bergî şerrî diwanehatû be beryan da dekirdewe.

Le kiwê hatûm? Bo kiwê derrom? Min çikarem?
Xellkî kam dê, yan kam şarem?

Ta diwênê bû
le berdem gijebay dirr da
le nêw şewî pirr çeper da
pirçî xorim derrinîyewe
Gullim bo yexey em şare deçinîyewe.
Belam emrro min çikarem?
Xellkî kam dê, yan kam şarem?

Qeladize 1971

## Beserhatî nîgakanim

Le nêw dirzî dergay zîndanî çawmewe
nîgakanim
be şiwên yek da hatine derê
Be ser şeqamî telbendî
Be nêw dillî şar da kewtine ra.
Bew hîwayey be awringî
behar, jengî
Zincîrî çend sallî xoyan bişonewe
Bew hêwayey çepke gull û nêrgizî sûr
biken be dîyarî bo ((Kawe))
Bo ((Gîvara))
Bo ewaney
gîyanyan le rêyî maçî gonay xor sûtawe.

Nîgakanim kewtine gerran
be kolan da... Be bazarr da,
le gell xwên da gerran... Gerran
Be nêw hemû demarêkî leşî şar da.
Le akam da be mirdûyî
le gell rişanewe destêkî lerzok da

hatinederê
Be naw dirzî penceyekî bê nînok da.

Le taw janî nîgay wêllî pirr le tasem
şar bû be tem
Bû be tem û berzbowe
Bo serûy asmanî hewtem.
Asman girya
Zemîn girya
ta dû çawî bê firmêskî yezdan girya
le taw nallem.

Kê bû nîgakanî kuştim?
Kê bergî reşî pê poşîm
Pêkî xozgey nekranewey
dergay zîndanî pê noşîm?
Kê bû nîgakanî kuştim?
Kê bû nîgakanî kuştim?

Qeladizê 1971

## Sikalay estêreyekî tasaw

Diwênê estêrey sîlawî asoy jiyan
diwafirmêskî qetîsmawî
rijaye ser termî beyan
Diwabirjangî hellwerîwî
kewte nêwkoşî perjînî
bê ewînî baxçey zistan.

Xoşewîstim!
Estêrekey asoy reşman
le nêw qûlayî zîndanî
derûnî mirdûy bê gîyanî
be tasawî
çend wişeyekî xinkawî
çirpand be giwêy xewtuwekan da
Axnîye nêw dillî ferhengî rizîwî
jêr xollemêş:
- Key tîşkî çawî birwatan daristanî
nêw zistanî
pirr bestellek desûtênêt?
Tolle... Tolley
hezar salley
çewsawekan le serkirdey
supay şewezeng destênêt?
Key burkanî jêr kelepçe
le dilltan da ser derdênêt?
Şurey berzî telarekan derûxênêt
Newrozêkî rast û rewan
bo Kurdistan
be dest dênêt.

Bexda 1971

## Sê pelle hewir û biruskeyek

1

Gillopî roxî cadekan
teqîn... Şikan,
Rêbwarekan, lewdî û demî
durawî rê, be matemî
carêkî tir
bo karwanî bêseruşwên giryan...
Giryan.

2

Momî şadî le asoy jîn
be gerdelûlî riq û kîn
kujayewe
Mirwarî geş diwa pirşingî
zerdexeney pirr giryanî
le nêw gerûy
pirr le zerûy
deryayek da tiwayewe
Carêkî tir
şano pêllûy lêk nayewe.

3

Le çiwarçêwey dîwarî bîrî alloz da
pêşangakan kiranewe
Be sed core wêney mirdûy pirr efsane
razanewe.
Piştî perrekanî jiyan
le jêr barî
pirr azarî
xetî qebe û nallebarî
serdemî ((Somer)) û ((Aşûr)) çemanewe.

4

Be meşxellî girrî tolle
defey singî
şewezengî
rêgay sext desûtênim.
Rêyekî niwê bo karwanî
aware bû denexşênim.

Bexda 1971

## Nexşey birraw

Be dukellî bay henasey
sutemeroy pirr le tasey
derûnî zor lêkrawan
le ser perrey deftey jîn
nûsîm nêwî peyamberêkî rûy zemîn.

Be cirîwey estêrey asman
Be lêwî xwênawî pişkoy giwê agirdan
Kêşam le serpêllûy asoy
reşî jiyanî xemnakim
Girrî tabloy şorrşêkî
hellnegîrsawî nêw xakim.

Nûsîm nawî
ew birrwayey wekû xorî berbeyan e
Killpey zamî pirr şalawî
naw derûnî çewsawan e
Take çekî azad bûnî Kurdstan e.

Bexda 1

## Perawêzî honrawekan

### 1-Ewînname

Witeyek

(*) Bo ziyatir birrwane: Refîq Sabîr, Hayko: Nawdartirîn şîirî Yabanî ye. Em base, le nîsanî 2015 be dû beş le rojnamey (Çawdêr) da billaw kirayewe.

**(*) Honrawey min bîrî zêdekem dekem**

Amajeye bo honraweyekî şaîrî Swêdî Vêrinen Von Heydinştam 1859 - 1940.

**(*) 29 Hayko**

Diwandin û bangkirdinî ballinde û ajell le Haykoy Yabanî da zor berçaw dekewin, bo nimûne:

Ke demirim
demewê to, kulleke!
zêwanim bît.
(Îssa Kobataşî 1763 - 1827)

Yan:

Were beçke çolekeke!
Ke dayik û bawkit nemawin
le gell min yarî bike.
(Hayko. Rûp 38)

(**) **29 Hayko**

Amajeye bo witeyekî Mesîh ke pêş le sêdaredanî dellêt:

"Xwaye… Xwaye bo be tenya be cêt hêşitm".

## 2-Xewnêkî walla

**Honrawey Ruwanîn be tarîkî da, kopley deyem**
(*) Amaje ye be kopleşî'rêkî şa'îrî Swêdî, Tomas Tranistromer, ke dellê:
Le qûllayî zewî da
rohim weku hesareyek
be bêdengî dexzêt.
**Honrawey Şewî yellda**
(*) Amajeye be honraweyekî Ehmed Herdî ke dellêt:
Hemû rojî le ber seyrî bitî ew bejn û ballaye
le ser rêta ewestim min heta ku awî pêm daye.

## 3-Rûnbûnewe

**Honrawey Be zirêyekewe le meydenî mêjû:**
(*) ((Girtinî pişîlereşe le jûrêkî tarîk da)) amajeye bo qiseyekî Konfoşyos ke dellê: Asan niye le jûrêkî tarîk da pişîley reş bigirît, be taybetî eger jûreke pişîley her tê da nebêt!
**Honrawey Zêwan:**
(*) ((Gijugîyay nêw baxçeke)) amajeye bo ((Têz) ) êkî dewlletî êraq ke le katî Enfal da le nêwbirdinî deyan hezar kurdî wek binyatnanî baxçeyekî qewmîy erebî be xellkî ereb pêşan deda, wata kurd wek gijugîya û poxllewatî nêw baxçeke wêne kirabû.
**Honrawey Şewî kirîstal:**
(*) Şewî Kirîstal: Ew şeweye ke nazîstekanî ellman, diway ewey deselatyan girte dest, pelamarêkî firawanî cûlekekanî ellmanyayan da û mall û samanyan zewtkirdin, rewaney ordugay taybetîyan kirdin ta le wê be komell le nêwîyan berin.
**Honrawey Şewanî axawtin:**
(*) Lazaros: Mesîh katêk çuwe ser gorrî Lazaros, ke le eşkewt deçû û be berdêk zarkekey gîra bû, be ((Marta))y xuşkî Lazarosî wit berdeke la biben... Mesîh be dengêkî billind hawarî lê kird: ((Lazaros were derê!))
Lazaros, ke (çiwar roj bû mird bû) dest û pêy be kifin û ruxsarî be desesirrêk pêçrabûn, le naw gorrekey hate derê. Mesîh be xellkekey wit: Bîkenewe ba birrwat. Birrwane: Încîlî Yohenna, îshahî yanzeyem

## 4-Jiwanî rûnakî

**Honrawey Mêdîtasîun:**
(*) Sîbîla: Sibîl jinefallçî le mêtolojyay girîkî da
(**) Kordêlîya–Cordelia sêyemîn yan biçuktirîn kiçî şa Lîr, le şanonamey ((Şa Lîr)) nûsînî Şekispîr, ke le diwa satekanî temenî pîrî, zebûnî û bêdeselatîy bawkî da behanayewe dêt.
(***) ((Bûme serhelqey gunahkaran) ) amaje ye bo şîrêkî mewlana Xalîdî Neqşbendî ke dellêt:
Min ke serhelqey gunahkaran im
Sertoqî cergey şermesaran im

Sertapa xerîq luccey usiyan im
Siftey nayrey nar hîrman im

**Honrawey Hesretekanî Odêsa:**

(*) Pênêlopê Penelope : Jinî Odêsa, qaremanî êposî Odêsa, nûsînî Homêros. Homeros ke diway şerrî Tiroya, Odêsa û hawrrêkanî le rêgay gerranewe berew mall, tuşî komellêk şerr û muxamere debin û hemû hawrrêkanî Odêsa le nêw deçin. Odêsa diway de sallêk dabirran le xêzanekey, be rêgay pirr le samnakîy derya da, degatewe lay jinekey.

**Honrawey Azadî:**

(*) ((Bendbûnim le to da azadî me)) Amaje ye bo dêrreşîirêkî romannûs û şaîrî Swêdî Yoran Tunstirom.

**Honrawey Gerranewe:**

(*) ((Bo kesêk lew qulayîyewe nehatewe? )) Amaje ye bo witeyekî Dantî le {Komîdyay Xudayî} da.

## 5-Awêne û sêber

**Honrawey Eger rojêk le rojan:**

(*) ((Le çawerrwanî berberîstan da)) Amaje ye bo honraweyekî şaîrî girîk Kostantîn Kavafî be nawî "Le çawerrwanî berberîstan da "ke bas dekat çon gelêkî xawen şaristaniyekî beriz, bewperrî xoşî û şewqewe, çawerrê deken ke leşkirî berberîstan bêt wilatekeyan dagîr bikat.

**Honrwey Mewday nêwanman wilat me**

* (Şa'îrî Rohfeqîr) Amaje ye bo honraweyekî şa'îr Feqiyê Teyran, ke dellê:
Ez naçim dîwan mîra nabim şaruwê koç û sera
Naçim dîwana mîr û hakima Feqiyê Teyran e rebenê dila
Hebûne dengbêj û şa'îr bi rûh û dila pirr feqîr
Mîr û bega ra sitrane bê qîmet û melûl mane

**Honrawey Rêgayekan napaktirîn delîlin:**

(*) {Xwaye gîyan–xwaye gîyan....} Amaje ye bo witeyekî Mesîh ke pêş le sêdaredanî dellêt: Xwaye! Bo destberdarim bûyit?

## 6-Werzeberdîne

(*) Amaje ye bo honrawey (Darî azadî) nûsînî Fayeq Bêkes
(*) Kilîyan pitirosîyan: Nawêkî ermenîyane ye û mebest le kesêkî dîyarîkiraw niye.
(***) Amaje ye bo honraweyekî Goran ke bo hîway kurrî nûsîwe.

## 7-Werzî sehollbendan

(*) Le beytî folkorî ((Sêwexanê)) wergîrawe.
(**) Min razî nebûm:
Ke hellîyan girtî
Min razî nebûm:
Dagîrîyan kirdî
Min razî nebûm: Ke çekyan kirdî
weku kalayek herracyan kirdî

Min razî nebûm...
Min razî nebûm...
(***) Em dû dêrre şîire be kemêk destkarîyewe le honraweyekî şaîrî nasrawî Îraq "Seidî Yusif "wergîrawe ke dellê:
"Albirabire istecmao lîlselat alaxîre arbabuhum… Bedao dexelo alqarye bîlsêf"
Birrwane: Seidî Yusif, qesaid aqil simten, dar alfarabî, Bêrut, 1979 laperrey 51, 69.
(****) dû dêrrî honraweyekî "Nalî "n

## 8-Sotan leber baran da

**Honrawey Kelawekanî 24 î nîsan**

* Rojî 24 î nîsanî sallî 1974, şarî Qelladizê bordman kira.

### Honrawey Temenî dûr

*Dêreşî'rîkî Goranî şa'îre.

## 9-Pişkokan degeşênewe

*** Honrawey Derga le rûy em kizebaye pêwede**

Qubad, mebest (Qubad Hesen Hacî Mehmûd) e ke le bordmanekey Qelladizê, le rojî 24/4/1974 da şehîd kira.

* **Honrawey Ey xot netwitit**

(Nawî tom bîr deçêtewe...) Honraweyekî Mayakovskî, Îlhamî ew kople şî're ye.

# Çend rûnkirdineweyek

* Em kitêbe le sêzde komelle honrawe û çepkêk honrawey dîke pêkhatuwe. Honrawekan le salanî 1976–2017 da belawbûnetewe.
* Hendêk honrawey(helbest) belawkirawe hen, ke lem kitêbe da nîn. Em core honrawane eger pêştir le çapî yekemî komelle honraweyek da belaw kirabinewe û êsta labirabin leber eweye ke honrawekan, be boçûnî xom, bayexêkî hunerîy ewtoyan niye. Belam eger honrawekan pêştir le şiwênî dî belawkirabnewe ewa, le katî amadekirdinî em dîwane bo çap, wêney ew honrawanem leber dest da nebûn.
* Le sallî 1993 da şeş komelle honrawey nêw em kitêbe, ke le salanî 1970–1990 da nûsrawin, le gell pêşekîye da, le bergêk da be nawî ((dîwanî Refîq Sabîr)) le Swêd çapkiran.
* Hendêk lew honrawaney ke le salanî 1970–1971 da nûsrawin, katî xoy leber sansor, yan leber hoy teknîkî, netwanra le gell (Pişkokan Degeşênewe) çap bikrên, boye diwatir, le sallî 1979 da kewtine nêw (Rêjne) we. Lêre da be başim zanî ew honrawane bigêrrmewe bo cêgay asayî xoyan. Herwa lem kitêbe da beşî sêyemî komelle honrawey (Sûtan leber baran da) çapî yekem, Lenden, xiraye nêw (Rêjne) çunku babetî honrawekan le Rêjne we nîzîktir in. Leber heman ho hendêk honrawey (Rûnbûnewe) le gell çepkêk honrawey belaw nekirawe (Le jiyan dirêjitir) da ko kiranewe.
* Hendêk honrawey (Pişkokan degeşênewe û Rêjne) rituşêkî huneriyan kirawe. Renge em ritûşe, le şiwênî tirîş da berçaw bikewêt.
* (Rêjne) û çapî duwemî (Pişkokan degeşênewe), ke le sallî 1979 da le layen kitêbxaney Seydîyan–Mihabad belawkiranewe, hendê helley zilî çap û montajiyan têkewtuwe. Lewane, bo nimûne, laperre 77 î (Pişkokan degeşênewe) honrawey (Namêkî wêll) xizênrawete nêw (Rêjne) û be corêkî naşîyane (ke le herfî taypeke û corî montaj û manay şîireke da be zeqî derdekewêt) be laperre 77 î (Rêjne) ewe çespkirawe! Sererray ewey pêşkeşkirdinî şîirêk be helle le honrawey (Em rûbareman xoş dewêt) dûbare botewe. Herwa pêdeçê pexişxaneke pêyî heyif bûbêt laperrêkî (Pişkokan degeşênewe) be spêtî bimênêtewe, boye honraweyekyan dûbare kirdotewe! Diyare hîç kam lem helane le çapî yekemî (Pişkokan degeşênewe) da berçawnakewin.
* Çend dêrêk le (Lawkî Hellebce) û (Werzî sehollbendan) û hendêk honrawey tir, ke zîyatir dûbarekirdinewe bûn, labirawin.

## **Ferhengok:**

A

Adgar: Dêm, serûçav
Agrawî: Agirîn
Ajawe: Gêleşûk, şêlûbêl, fitne
Amêz: Himbêz
Aporre: Qerebalix, komeka xelkê
Aşna: Nas
Aware: Mişext, derbider
Awêne: Xodîk, eynik, nînik
Awête: Têkel, têkelbûn
Ayinde: Ppaşeroj, dahatî

B

Barteqa: Bi qasî, hindî, weku
Baweş: Himbêz
Bê maman: Bê dapîrk
Bê xorî: Bê tav
Bêaramî: Bêtenayî, peşêwî
Bêdar: Bê xew, hişyar
Bêgane: Biyanî, nenas

Bêhude: Bêmana, bêarmanc
Bêjû: Bîjî
Bêkotayî: Bê  dawî, tewaw nebû, bêkota
Belese: Yaxî, ji kontrolê derketin, serpêçîkar
Berîn: Fireh
Berîntir: Firehtir, pantir
Beswê: Azar, jan, dags, êş
Beswê: bi azar û pirr jan, bi xem û kovan
Billêse: Guriya agirî, kilpe, ronahiya agirî,
Binar: Qerax, kenar
Binêje: Bi veşêre
Birjank: Mijîlank
Bitnêjim: Bi veşêrim, bin ax bikim
Bitwênmewe: Bihelînim
Bizêw: Ne tebitî, ne hecimtî
Bizir: Winda, berze
Bizirkandin:  Reng têkçûn
Bogen: Genî, rizî
Bolu: Bizot, pişko, pengir
Boşayî: Valayî
Bulêl: Tarîgewrik
Bûmelerze: Bîvelerz, erdhej

C

Çeleng: Zîrek, mêrxas, aza
Cengel: Darristan
Ceste: Laş, leş
Cewher: Naverok
Cimk: Cêwî, cêmik, diwane
Cinê: Dijîn, xeber
Ciwanaw: Ava ciwan,  ji du peyva lîkdaye ciwan û av
Ciwanaw: Rind, pirr ciwan
Colane: Hêsk

Ç

Çîlke: Tayekê darê hişk
Çilkin: Pîs, kirêt
Çirîke: Qêrîn, hewar
Çirrîn: Gotin, stirana dibêje
Çoleke: Çûk, çîçik

D

Daçoraw: Bêhêz
Dadepoşê: Dipêçe, pêdadan
Dagîrsand: Hilkir, agir pêxistin
Dalan: Kolana teng
Dareben: Dara kezwanê
Dawell: Bûka baranê, dallehu, dawill
Daxiraw: Girtî, daxistî
Dedêrê: Distire
Delîl: Rêşander, çawsax, rêber
Demamik: Kevlojank, mask
Denûm: Dê razên, dê nivim
Denwênê: Xuya dike
Derroyiştim: Diçûm
Derrwanim: Temaşa dikim
Derwaze: Derazînk
Dever: Navçe, cih, şiwên, cêga
Dîl: Êxsîr, desteserkirî
Dirext: Dar
Dirrdong: Dûdill, bi guman
Dirûd: Dia, tika ji Xwedê, rica
Dozîn: Lêgeryan, pişkinîn
Dund: Kop, ser, lutkey şax, tropkî çiya
Dûrge: Girav, cezîre

E

Efrandin: Dahênan
Espeşê: Hespê zîrek

F

Feramoş: Ji bîr kirî
Fêw: Nexweşiya tepê, serii
Firmêsk: Rondik, hêstir

G

Galîske: Erebene
Gelarêzan: Payîz, pelwerîn
Gelegurg: Revda gura, Revda  gurga
Gemaro: Dûrpêç, muhasere

Geme: Yarî, leyîztin
Gemje: Nezan, gêj, ehmeq
Gerd: Toz
Gerdaw: Bahoz, Lihî, lafaw, baw û baran
Gerdelûl: Bahoz
Gerû: Qirrik, hefk
Geşt: Rêwîtî, qonax, sefer, wexer
Gewalle: Pelên ewrî, gevalle
Gijeba: Bakuzîrk, bayê bi lez
Gilan: Hilingiftin
Gilo: Gorr, çal, qebir
Gîrawe: Girtiye
Girr: Agir
Gîrsaw: Hilkirî
Gizing: Elind, ronahiya demê berbangê
Gizing: Ronahiya berê spêdê
Goşe: Qulaç, kujî
Gumrra: Rê berze

H

Haje: Wişêna avê
Halaw: Hilim
Hall, hallat:  Zikrê derwêşan, ji halçû
Hawsê: Cîran
Heda: Aram, tena, oqre
Hedadan: Tenabûn, arambûn
Hejan: Azirîn, inirrîn
Helamût: Zinar, çiyayê asê
Hellet: Asê, hellemut, cihê herî asê yê çiyay
Helliweda: Debeder, aware, derbederê çolê
Helwasîn: Helawîstin, li sêdarê dan
Hêmin: Tena, aram, rehet
Henase: Bêhin, nefes
Hengaw: Gav, pêngav
Herasan: Bêzar, şilejaw, weris
Heres: Renî, şape, herrifandina berfê
Honrawe: Helbest, hozan
Huştirxorke: Giyayek e li biyaban şîn dibe

J

Jakaw: Qurmiçî, çilmisî
Jîlemo: Pelên agirî yên bê gurrî, Pişko, bizût

K

Kajellak: Qafê serî, keleser, cumcume
Kalan: Kavlan, kêlan, kavlankê  xencer û şîrî
Kalla: Kelûpel
Kas: Gêj, wirr
Katê: Demê, wextê, weqtê
Kej: Çiya, şax
Kejawe: Çavkanî, serekanî
Kel: Kop, serê çiyay
Kelawe: Wêran, xapor, kavil
Kêlge: Mêrg
Kelle: Qafê serî
Kennas: Paqijker, ew kesê cade û kolanan paqij dike
Kernevall: Ahenga pirr şahî û govend
Kêşe: Şerenîx, mesele, pirs
Kêw: Çiya, şax
Kewêl: Kolk, gov
Kewşe: Pêlav, sol
Kezî: Bisk, şakezî, şabisk
Kilawrojne. Kuleka biçûk, pencere
Kilpe: Sînahî, ronahia kêm
Kip: Bêdeng, tena
Kogell: Xelk, komeka mirovan
Kolare: Firoka kaxexî
Kot: Pasewan, nobedar
Kotere: Dareka birî, qeteka darî
Kurey dilma: Koçkê dilê min, menqela dilê min
Kwîstan: Zozan

L

Lane: Dargûşe, landik
Lane: War, cih
Lasar: Netebitî, bizêw, sererro.
Lêl: Şêlî
Lengergirtin: Rawestana teyran li esmanan
Lojîk: Locîk, mentîq
Lûtke: Kop, serê çiyay

M

Madona: Jina paqij, Madonnamiryemî pakîze.
Malawayî: Xatirxastin
Mangeşew: Taveheyv
Matem: Şîn û tazî
Mawe: Qonax, mewda, mesafe
Mêgel: Kerî, keriyê pezî
Mend: Borr, ava rawestiyayî û bê pêl
Merg: Mirin
Meslet: Rêkkeftin, li hev hatina aştiyane
Meşxel: Xetîre, çira
Miturfe: Rind, şox, ciwan

N

Nakam: Dilşkestî, bêumêd
Nakaw: Ji nişka ve
Namoyî: xerîbî
Nasor: Birîn, azar
Nêjran: Binax bûn, hatine veşartin
Nemam: Şitil
Neşter: Çeqoka pirr tûj, kêra laşî pê dibirrin
Newekan: Nevî, torrin
Nim: Teratî, terrayî
Nisê: Sih, sîber
Nixro: Deverû, hilingiftin, devûdev ketin
Nostalciya: Bêriya welatî, xerîbiya welatî
Nuştandewe: Xwe bi erdî ve girt

P

Pelkezêrîne: Keskesor
Pelkezêrrîne: Keskûsor, kolkezêrîne,
Pêlût: Perda ser çavî
Pence: Tilî, tibil
Pengir: Pişko, polo, sikil
Pepûle: Belatînk, perperok, perwane, minminok
Perco: Muicîze
Peresêlke: Hacîreş, kurî meqes
Peşêw: Pena, cihê xweveşartinê
Pêşkar: Xizmetkar, berdest
Peşokaw: Gêj, sewdaser, serlêşêwaw, şilejaw

Pet: Werîs, sêdare
Peta: Taûn, nexoşiyeka pîs
Pird: Pir, cisir
Pirdebaz: Bazeber
Pişko: Pelê agirî, bizût
Piwaw: Rizî
Pol: Revde, kom
Polû: Pelê agirî, bizût. Pişko
Protêst: Nerazî

Q

Qersîl: Giyayekê pênegehiştî
Qetran: Tarîstan, pirr tarî
Qûl: Kûr
Qûlayî: Kûratî

R

Rakişabû: Dirêjkirî
Rasan: Xwe berhevkirin ji bo lêdanê, pelamardan
Ravekirdin: Şirove kirin, şîkirdinewe, lêkdanewe.
Raz: Nihênî, sirr
Rêbwar: Rêvîng, rêwî
Rêjne: Baraneka xurt
Rend: Mêrxas, aza, zîrek
Ret bû: Derbaz bû
Rewîn: Revîn, helatin
Rimb: Rim, sehim
Ruxsar: Rû, dêm

S

Samnak: Tirs, sehim
Sara: Deşt, çol
Satê: Demekê, bêhnekê
Seg: Koçik, se
Segwerr: Rewîna koçika
Sehol: Qeşa, berf
Senger: Çeper, xendek
Serab: Leylan
Sergerdan: Posîde, damay,bêomêd
Sersam: Heyirî, mat
Serşan: Sermil

Sêrmonî:. Merasîm, Cermony
Sewzî: Şînayî, keskatî, tolk, kerifs, giya
Sîma: Dêm, rû
Sirik: kîvî, nekehî,  fêrî nav malê nebûy, nerahatî
Siwax: Boyax
Siwê: Hesret, tase
Sorax: Rewş, kawdan
Swê: Hesret, tase

Ş

Şalaw: Hêrriş, pelamar
Şan: Mil
Şayet: Şahid
Şefeq: Berê spêdê, aso,
Şeket: Westiyay, mandî, hîlak
Şepol: Pêl
Şeqam: Rê, cade
Sêre: Stêrka tivengê
Sêregirtin: Nîşan lê kirin, stêrk lê kirin
Şêt: Dîn, bêaqil
Şêwand: Têk da
Şêwaw: Têkçûyî, bêserûber
Şewnim: Xunav
Şexte: Qeşa, qerîsok
Şeypûor: Zirna leşkerî, boq
Şilwê: Şêlî, lêll
Şimşêr: Şîr
Şîrre: Nirrîn, berz, bilind, tûre
Şoreswar: Egîd,  siwarê zîrek
Şoste: Qeraxê rê, aliyê rê

T

Taman: Perjîn, tian, çeper
Taraw: Mişext, serhelgirtî, çûna bêveger
Tarmayî: Helamet, reşek
Tase: Bîrakirin, pir hez û iştiyaq
Taşeberd: Kevrekê mezin
Tateşor: Texteşo, textê miriya li ser dişon
Taw:  Kêliyek, demekê kêm, satêk
Taw: Hesret, tase û arezû
Tawêr: Kevir, helan

Tavge: Sîlav, şelal
Tê hellçûnewe: Dûbare dest pê kirin
Temawî: Tem û mij
Tengeber: Rêyeke teng. Kolana teng
Tenya: Tenê
Tepîw: Ketî, herriftî
Terze: Gijlok, teyrok
Tesk: Teng, zirav
Tewêle: Axura dewara
Tezû: Tezînk
Tijî: Pirr, gelek
Tînû: Têhnî
Tirîfe: Ronahiya heyvê
Tîşk: Tîroj

W

Wêl: Berze, winda
Werz: Demsal
Wirşe: Birîsî, girşe
Wirya be: Hişyar be, agehdar be

X

Xak: Erd
Xamoş: Mat û bêdeng
Xelûz: Rejî, komir
Xemnak: Xemgîn
Xerman: Bêder, coxîn
Xinkaw: Xiniqî
Xinkêndiraw: Xeniqandî
Xol: Ax, gil
Xolawî: Tozgirtî
Xolemêş: Xwelî, xolî
Xor: Roj
Xoşbîn: Geşbîn, bi umêd
Xunaw: Xunav, awring, şewnim

Z

Zam: Birîn, azar
Zark, yan zalk: Kun, Kuneka şkeftê, medxel
Zêd: War, niştîman, welat, cihê ji dayikbûnê,
Zemawend: Govend, dawet, şahî

Zemîn: Erd
Zerdeper: Ronahiya berî şevê
Zerdexene: Girrnijîn
Zêwan, yan zêdewan: Pasewan, nobedarê  gorristanê
Zîl: Tirumbêla leşkerî, kamyon.
Zinar: Kevir, helan, gaşeberd, berê mezn
Zînko: Serkê zîna hespî
Zirê: Metal, ji bo şerî bikar tînin
Ziryan: Bakuzîrk, bayê başûr, befir û ba bi hev re
Zongaw: Gol, ava rawistiya, carna genî dibe

# Pêşgotin
# Ewînname 2017

**I**
Witeyek
Rûnakî
Le gell ciwanî
Rojgarî ewîn
Stayiş
Be rutî ciwantir î
Kizebonêk
Şabon
Şew bû
Taraw
Diway to
Her to
Ciwanî her lawe
Ta berge bigrim
**II**
Car be carê
Le kiwêm!
Her xoyetî
Tenyayî
Ewê şewê
Xulyayek
Bo mirdin
Şaîrê demirê
Min bîrî zêdekem dekem
Şaciwanî germiyan
Awêtebûn

**III**

Bellam le hemûyan ciwantir (29 Hayko û haykoy azad)

# Xewnêkî walla 2014

Diway to
Ruwanîn be tarîkî da
Satêk û temenêk
Beber baran da
Bê hîwa çon bijîm
Awêzanbûn
Ew kataney
Baxî rûnakî
Şewî yellda
Piyawêkî tenya
Jiwan
Berew kiwê

# Le jiyan dirêjtir 2006

Le jiyan dirêjtir
Pencerey walla
Jiwange
Legel zemen da
Çûn
Gerran
Bo tenyayî
Le roxî darristaneke da
Rût le beramber xot da
Tabloyek
Bêgeranewe çûn
Rênîşander
Berew dûrî
Sefer
Berw kiwêman debat zeman?
Helbijardin

# Rûnbûnewe 2001

**I**

Sêrmonî
Be zirêyekewe le meidenî mêjû
Koçêkî dî
Zêwan
Pêşwazî
Şewî kirîstall
Diwajwan

**II**

Şewanî axawtin
Portirêtî hunermendêk
Gulleberd

**III**

Goranîyek bo ciwanî
Bellênşkênî
Ta bitbinim
Aşnabûn
Le herkwê bît
Pêkewe
Legell toda
Pena
Bêdengbûnit
To hîwat pêdam
Xewin Xewin

# Jiwanî rûnakî 1997

## I

Eger bitiwanim
Mêdîtasyon
Hesiretekanî odêsa
Şewrrew

## II

Pencereyek dekemewe
Azadî
Geda
Bînîn
Werzêkî niwê

Zemanî evîn
Beyanî bû
Tablo
Dahênan
Jiwan
Şewçira
Perelêl

**III Şewane**
Destekanit nagene şew
Gerranewe
Şewnşîn
Şewekanim
Gumanbar
Leberbaran da

# Awênew sêber 1996

Pirsîyar e bê welamekan
Mewday nêwanman: Wilatme
Pakbûnewe
Eger rojêk le rojan
Le xorgîranî kolaneke da
Rêgayekan napaktirîn delîlin

# Werzeberdîne 1992

Werzeberdîne

# Karwansera 1990

Honraweyek bo dayikim
Sêwexan
Kenar…Kenar
Colane
Ewê şewê
Terim
Honirawey aw
Karwansera
Werzî cengell

Nexişe
Portirêtî

## Raz û guman

Beyan
Raz
Namo
Bêdarî
Hellbûn
Kejawe
Tîşik
Tiruske
Legell em koçe koç meke!
Be nêw tem da
Bazû
Cîyawazî
Tînû
Sûtan
Geridelûl
Karwan
Hengaw
Namo
Rabûn
Mehall
Adgar
Nihênî
Êşkgir
To
Tenyayî
Ala
Serdarî girr
Mask
Tenya carê
Siwar
Goranîyek
Lasar
Nehat
Ta bimênim
Rabûn (2)
Çira
Bekwêda hatî
Yellmas Guney

Şayet

# Lawkî Hellebcey 1989

Lawkî hellebce

# Werzî sehollbendan 1987

Werzî sehollbendan

# Sûtan le ber baranda 1985

## I Goranîy roh

Tenya nebûm
Goranîy roh
Çawerrwanî
Şewanî çawerrwanî
Berrêkirdin...!
Werzî xoll
To
Ruxsart
Beçît biçiwênim...?
Rabûn
Goranîyek

## II Çiray gorrristan

Tenya nebûm (2)
Sûtan leber baran da
Şewanî tenyayî
Siwarey merîwan
Gorre boşekan
Kifndiz
Awayî û pêşihat
Şewanî eşkewit
Lutke
Kelawekanî 24î nîsan
Têkidanewe
Fallçî û mindall

Êwarey ew payze
Rêjen
Xewnî temen
Eger lêre nebêt
Lekwê bitinêjim
Mallawayî
Kolan
Le nîweşewda
Temenî dûr

# Rêjne 1979

## I

Em mirove
Seîde şêt
Rêjne
Le dirizî tarîkîyewe
Werzî sehollbendan
Le awêne da
Leber rêjne da
Derwêş
Be bêdengî dêt û derriwa
Em rûbareman xoşdewê
Êva
Şayirê xoşî dewîstît

## II

Zorman pê gutin
Wilatekem
Serdan
tiwanewe
Le dayikbûn
Temumij
Tallek gizing
Xoşardinewe
Xelat
Gerranewe
Wilat
Rêgay tifeng
Goranîyek

# Pişkokan degeşênewe 1976

## I

Şewêk le ser gorrî welî dêwane
Derga le rûy em kizebaye pêwede
Pişkokan degeşênewe
Çend bîreweriyek le jûrêkî bê dîwar da
Nexişeyek bo
Le yadit bêt
Ho dariberruwe xembarek e
Be serhatî dariberruweke
Vîktor gara

## II

Le nêw dillope firmêskêk da
Tabloyekî şarekem
Katêk zamekan helldeçin
Sê name
Cengawerêkî winkiraw
Beserhatî nîgakanim
Sikalay estêreyekî tasaw
Sê pellehewr û biruskeyek
Nexişey birrway cengawerêk

## III

Bim parêz e
Çaw damexe!
Xoşim dewêyî
Ey xot netut
Honiraweyekî bê naw
Bo kîjêkî hunermend
Seretay dilldarîyek

## Perawêzî honrawekan
## Çend rûnkirdineweyêk
## Ferhengok